

# HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTİ



\$ 6 (Etranger)

HEJMAR 2/GULAN 1984

40 FF

# ESPOIR

HÈVÎ

Revue culturelle kurde  
No 2 - Mai 1984

Prix : 40 FF

Directeur de la publication : Helkewt Hekim

Réalisation : Joséfa Bertolino, Ali Bucak et Mohamad Hassan

Collaborateurs : Ibrahim AHMED (Angleterre), Rojen BARNAS (Suède), Ferat CEWERÎ (Suède), Dr. Kemal FUAD (Berlin), Dr. Cemşid HEYDERÎ (Suède), KENDAL (France), MALMISANIJ (France), Simko NAKAM (France), Ferhad ŞAKELÎ (Suède), Hesen SEYF (France), ZILFÎ (Berlin).

## SOMMAIRE

- A la mémoire de Tewfiq Wehbî - <i>Joyce Blau</i>	13
- Souvenirs d'Ihsan Nourî Pacha sur la révolte kurde d'Agri (1927-1930)	17
- Quelques problèmes de la linguistique kurde - <i>F. Sakeli</i>	29
- Notes sur le poète Batêyî - <i>R. Barnas</i>	35
- La légende de Binevsa Narîn et Cembeliyê Hekkarê - <i>recueillie par Roger Lescot</i>	39
- L'assemblée des prophètes (nouvelle) - <i>S. Sorekli</i>	55
- Poèmes inédits - <i>O. Sebri, R. Simo, Cankurd, Rézan, E.S. Seydo</i>	61
- Publications récentes	67
<b>EN KURDE DUMILÎ</b>	
- Le poème de la naissance «Mewlûd», en dumili - <i>C. Bedirxan</i>	77
- Variantes dialectales en dumili - <i>Malmisanij</i>	86
- Le village de Michaël - <i>Ali Kiliç</i>	107
- Le Folklore dumili - <i>Zilfi</i>	109
<b>EN KURDE MÉRIDIONAL</b>	
- Hommage à Tewfiq Wehbî - <i>Ali Kemal, Dr. Kemal Fuad, Hawar</i>	198
- Le symbolisme et Rimbaud - <i>Simko Nakam</i>	180
- Etude sur la nouvelle kurde - <i>Dr. Cemşid Heyderi</i>	156
- A propos de la fondation de Suleymaniyê - <i>Helkewt Hekim</i>	137
- La peinture kurde	128

La revue Hêvî (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette,  
75010 PARIS – FRANCE. Tél : 824 64 64.

# HÊVÎ

---

KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ

---



HEJMAR 2/GULAN 1984

Imprimé en France  
Copyright INSTITUT KURDE  
1984  
No ISSN 0761 - 1242  
Imp. T.I.P.E.  
11-13 rue Progrès 93100 Montreuil  
Tél.: 859 18 86

**Kurmanç di dewleta dinê da  
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?  
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?**

*Ehmedê Xani (sedsala XVII)*

# SERECEM

## KURMANCÎ

- Ji «Hêvî» yê re name	8
- Bîranîna Tewfîq Wehbî - <i>Joyce Blau</i>	13

## BELGE

- Bîranînên Ihsan Nûrî Paşa	17
-----------------------------	----

## ZIMAN Û EDEBIYAT

- Çend aliyên rewşa zimanê kurdî - <i>Ferhad Şakeli</i>	29
- Li ser Batêyî çend gotin - <i>Rojen Barnas</i>	35
- Binevşâ Narîn û Cembelyê Hekkarê	39
- Civata Pêxemberan - <i>Sahînê Soreklî</i>	55

## HELBEST

- Ziman - <i>Osman Sebrî</i>	61
- Biyanî - <i>Reşîd Simo</i>	62
- Welatê zayînên teze - <i>Cankurd</i>	64
- Vî pesanî - <i>Rêzan</i>	65
- Hevala min - <i>Emîn S. Seydo</i>	66

## PIRTÜKÊN NÛ

67
----



## DUMILÎ

- Zarê dumilî û mewlûda Usman Efendî - <i>Celedat Bedirxan</i>	77
- Dimilkî miyan di ciyaya vatişan - <i>Malmisanij</i>	86
- Ay wext - <i>Heyder</i>	104
- Bêrî - <i>Malmisanij</i>	105
- Dewa mixeylî de - <i>Ali Kiliç</i>	107
- Folklorê Kurdî ebe zarava dimilkî II - <i>Zilfi</i>	109

## KURMANCIYA XWARÊ

- Namey hawrêyan	203
- Mamosta Tewfîq Wehbî koçî diwayî kird	198
- Bîrewerî - <i>Ali Kemal</i>	196
- Be boney koçî diwayî Mamosta Tewfîq Wehbîyewe - <i>Dr Kemal Fuad</i>	192
- Bo koçî diwayî Mamosta Tewfîq Wehbî - <i>Hawar</i>	184
- Sembolîzm û Rimbaud - <i>Simko Nakam</i>	180
- Roşnayî û tişk, serinc û rexne le lêkolinewey çîrokî kurdî le Iraq da - <i>Dr Cemşîd Heyderî</i>	156
- Çend serincêkî seretayî derbarey dirustbûni şarî Silêmani - <i>Helkewt Hekim</i>	137
- Pişangay tabloy kurdî	128



Hejmara pêşîna kovara «Hêvî» bala gelek xwendayêñ kurd kişand. Ji çar aliyên dinê, ji Kaliforniya ta Taşkentê, ji Swêd ta Erebistana Siûdî, Hindistan û Awîstraliya, ji welêt, hejmareke bilinda welatiyêñ me şabûna xwe, pîroziyêñ xwe bi me dan zanîn, hêvî û xweziyêñ xwe diyar kirin, pêşvebirin û gesandina vê xebatê xwastin.

Ev bal û piştîvaniya dilgerm ji bo hevkarêñ «Hêvî» yê zehf giranbiha û binerx in. Em ji hemiyan re spasiyêñ xwe pêşkêş dikin û emê hewl bidin ku her hejmara kovaré ji ya berê dewlementir û têrkertir be.

Piraniya xwendevanan dixwazin ku «Hêvî» qet nebe ji sê mehan carekê derkeve. Ev daxwaz ji me re gelek li cî xuya ye, lê mixabin, bi derbekê pêkanâna wê hêsa nîne. Kovareke weka «Hêvî» yê ji bo jîndariya xwe hewcê du hezar kiriyarêñ bi pergal û mintezem e. Em ji bîr nekin ku libêñ ji Kurdistan re an ji Kurdêñ welatê sosyalist re şandî bê dirav diçin. Kengî Kurdêñ rûniştevanêñ welatêñ din alîkarî bikin û du hezar kiriyar peyda kin ewê «Hêvî» dikaribe ji sê mehan, heta ji du mehan carek derkeve, bibe cîgehê dialoga edebiya Kurdêñ her aliyên Kurdistanê. «Bi xweziya dest nagihê baqê qeziyan» gotine pêşiyêñ me. Divê ku hevalêñ dilxwaz, bi mesûliyet û berpirsiyari, milê xwe hildin, alîkariya me bikin.

Li Awrûpa Rojava qasî nîv milyon Kurd hene ; hejmara wan ji ya çend dewletêñ Awrûpayê yên xwedî serxwebûn, hikûmat û sefaret (Islanda, Malta, Luksembûrg, hwd ...) zêdetir e. Roja ku ew xwedî li parastin û pêşvebirina çanda kurdî derkevin, di hoyêñ azadiya Awrûpa de kirina pir tiştan mimkin dibe. Em ji bîr nekin ku hin cemaetêñ bê dewlet ên ku ji Kurda kêmîtirin îro bi zimanê xwe rojnamêñ rojê û kovaran dertînin, xwendegah û çapxanêñ wan hene. Paşdamayin, şerpezetî û parekendeyî sernivîsa timîdoma gelê kurd nîne. Divê ku xwendayêñ kurd, welatparêzêñ kurd li héviyê nebin ku ewê hinêñ din van karêñ çandiyêñ bingehî bibin serî, an «kengî şoreş biser ket ewê her pirs helbibe». Di şerê çandî de cih girtin, bîrûbaweriyêñ wan her çi dibin, erk û wezifa her Kurdê welatparêz e. Û ev erk bi xwendin, belavkirin û alîkariya çapa kurdî dest pê dike.

Hin heval ji mêj ve bi dilsozî alîkariya vê xebatê dikin, tê de bêşdar in. Em ji hemû welatiyêñ me yên ku dixwazin erka xwe ya bingehî û minimum li hemberî gelê kurd û çanda wî bicîh bînin dibêjin : dergehêñ hevkarî û xizmetê ji hemûyan re vekirî ne.

HÊVÎ

# ji HÊVÎ yê re name

*Emê di her hejmara «Hêvî» yê de çend ji nameyên ku li ser nivîsarên hejmarên berê hatine sandin derêxin. Ev rûpel ne tenê ji welamén (mesajên) pîroziyê re lé ji rexne, xwestek û şiretan re jî vekirî ne.*

**Nameya Seydayê Osman Sebrî (Sûriye)**

... Herçî ez bi xwe heya ku hebim kir û tevera min, bi her awayî ji hevkariya we û bendewariya kovara Hêvî yê ra ye. Di nav vê nameyê da helbesteyeki û rexneyên xwe derheqê biryara we da ji kovara Hêvî ra dişnim. Kama min di rexneyê da ew e ku kêmanî xebata we da nemine û mecaleke xurt bi pêşkevin. Di çav gel û biyaniyan da bigihêن wareki bilind. Çi tiştê ji bo Enstitû û Hêvî ji min bêté xwestin bî dilücan dê ji bo pêkanîna daxwaza we xwe biwestinim (...)

*Tevî vê namê Seyda rexneya xwe sandiye. Va ye menhuya (metna) wê ya temamî ...*

**ÇEND REXNE JI KALEMEREKÎ KURD**

Dixwazim biryara ku Enstituyê derheqê elîfbê da girtî û hin tiştên din rexne bikim. Hêvîkar im ku rexneyên min hevalan dilgîr nekin û li rexneyên min hûr bin, ka çiqas der hin rastiyen didin ber çavan.

1 - Di warê elîfbêya kurdî da min bîryara we di hejmara Hêvî ya pêşin da xwend. Tevî ku bi durustiya bîryarê ne bawer im jî, ji îro bi şûnda di nivîsanên xwe da dê bi

biryara Enstituyê bême girêdan û jê dernakevim. Ji ber ku ziman ne yê min tenê ye, lê zimanê neteweyê kurd e. Ne heqê kîjan Kurdî ye ku bi serê xwe di zimanê gel da tişteki kêm an zêde bike. Ev yeka han karê komel û civatêñ zanistî ye, ku li pêşberî gel berpirsiyar in. Karê me yek-kesan ew e ku zanîn û baweriya xwe bidin ber çavêñ komel û civatêñ berpirsiyar. Gava gotina me nehat bihistin, divê em bawer bin ku bi karê xwe rabûn û ji berpisiyariyê bi dûr ketin.

2 - Hûn di biryara xwe da dibêjin : di pêşende da gava gel xwe hewceyî van tîpan dît dikare têxe nav elîfbê. Ziman bi elîfbê tête nivîsin, gava em vê bihêlin ji gel ra, ma karê we di vê navê da ci ye ? İro himê ziman têye danîn, ji îro bi şûnda ci xebat bibe dê li ser hîmê ku hûn datînin bête daçikandin. Heke hîmê we daniye rast be dê rast bimîne, na gava xwar be dê xwar bimîne. Ez pirr hêvîkar bûm ku hûn neketana şâşıya ku Mistefa Kemal di warê elîfbêya tirkî da ketê. Ji ber kîmaniya elîfbêya tirkî dema dixwazin bêjeyek firansizî, îngilizî an almanî binivîsin ji ber kîmaniya di elîfbê da bi elîfbêyên wan welatan dinivîsin. Ji lewra nivîsevanê tirk ji bo bikare wê bêjeyê herweki di wan zimanan da bîlêv dibe binivîse, divê elîfbêya wan hersê miletan binase, an na bêjeya biyanî herwekî divê nayête nivîsin. Dil dixwest ku hûn neketana şâşıya ku Mistefa Kemal ketibûyê, lê mixabin we jî da ser şopa wî.

3 - Gava em bînin dengê ku di elîfbêyên firansizî, îngilîzî, almanî da bi 2 an 3 awayan têr nivîsin bidin ber çavan, elîfbêyên wan ji 37 tipan (ango dengan) ne këmtir in. Ma holê xweş e, an ji her denge-ki ra tîpek ?

4 - Di cihané da hé kesi ne dîtiye ku neteweyek çar tîpén ku di zimané wî da hene berde an bavêje. Ev yeka han iro we kiri. Jê péve du tîpén ku di elîfbêya Celadet da hûx berdidin ! Ma ki dikare bêje ku ev herdu deng di elîfbêya kurdî da nînîn ?

5 - Hûn di biryara xwe da dibêjin me elîfbêya latînî qebûl kiriye. Ev gotin ne di cihê xwe da ye. A rast me tîpén latînî ji bo nivisandina zimanê xwe bijartiye, ne elîfbêya wan. Elîfbê dengê ku di zimanekî da hene. Herçî tip, durv (şekîl) ê ku ew deng pê têne nivîsin. Elîfbêyên her neteweyî bi awakî ne, ango goreyi dengê ku di zimanen wan da hene. Elîfbêya kurdî ji divê goreyi dengê ku di hemî zaravayên Kurdan da hene, ne goreyi zimanê latînî.

6 - Hûn di biryara xwe da dibêjin : em ji bo ; , ş gelek dijwariyan dibînin. Celadet Bedirxan mirovokî bi serê xwe bû, gava bi heyîna wan û tîpén hûx di zimanê kurdî da bawer bû ew tip dane çekirin. Hûn komelik ku berpirsiyariya ziman digrin ser xwe û dixwazine pirtûkan bidin çapkiran, ma hûn nikarin çend tipan bidin çekirin ? A rast ew e ku hûn dixwazin tîpén ku zimanê we pê bê nivîsin li herderê hebin û hûn pêra newestin.

7 - Zaravayê kurmancî firehtirê zaravayên zimanê kurdî ye û nîvê Kurdan pê dipeyiye. Lé ji bexteresiya me em Kurmancî digel zaravayê xwe bendewar nebûne û bi şûnda maye. Herçî zaravayê Soranî bi xebata zana nivîsevanen wan geleki bi pêş ketiye. Hûn tînine di Kovara Hêvî da 60 rûpeli didine zaravayê Kurmancî û 120 rûpelan didine zaravayê Soranî ! Nizanîm ev kira han ciqasder di cihê xwe da ye ? Divê para zaravayê Kurmancî duqtatî yê Soranî be, ji ber ku Kurmancî pirr bi şûnda maye.

8 - Di nivisanen xwe da hûn ji zaravayê soranî ra kurmanciya xwarê dibêjine. Ev binavkirin ne di cihê xwe da ye. Kurmancî ew zaravayê ku tipa j té da ye. Di zaravayê soranî da j nîne. Binghê wê bêjeyê ev e :

kurd man j ango «mirovê kurd ku bi J dipekiye ; «Lê ji bo sivikpeyvinê c xistine cihê j. Li nik me bi zaravayê soranî ra kurdeke digotin. Sedema wê, soranî tîpa k têxin dawiya gelek bêjeyan. Em dikarin ji Kurdêna xwarê ra Soranî an Kurdeke bêjin, lê ne Kurmancî.

- Di bin navê kovara Hêvî da holê nivîsinê rastir dibinim :

## HÊVÎ

Kovara çand a tevayî

Digel pîrozî û dûmkirinek hêja ji kovara me ya kurdî ra.

(Me divê, bi kurtî, dîtinên xwe li ser rexneyên Seyda pêşkêş kin.

1) Alfabetek ku bersîva bilêvkirina bêjeyen hemû zimanen bide, mixabin, heta niha li tu ciyekî ne hatiye icad kîrin û em nizanîn gelo pêkanîna tiştîki wisa mimkin e an na. Alfabeaya fonetika navnetewî bi xwe ançax bi kérî bilêvkirina zimanen avrûpayî té, bersîva zimanen samî, asyayî (çînî, vietnamî, hwd ...) û afrikayî nade. Ku em çend tip bi ser alfabeaya kurdî ve zêde kin da ku ew bersîva bilêvkirina fransizî, îngilîzî û almanî bide, ewê ew alfabe dîsa têrî bilêvkirina zimanen giringen weki rûsî, çînî yewnanî neke.

Lewra di vî warî de, amanc çêkirina alfabetek hêsa ji bo hewcedariyên zimanê kurdî ye.

2) Di alfabeteyen fransizî û îngilîzî de 26 tip hene. Lé ji bo nivisandina hin gotinên ku ji zimanen weki erebi an yewnani hatine stendin du an sê tipan gihadine hev, bilêvkirineke nû dane wan. Mesela di fransizî de dengen kurdîyên c, ç, x, q bi awayê jêrin tén nivîsin :

c : dj ç : tch

x : kh q : gh

Lé ji bo bilêvkirina hin dengen rûsî an çînî ne alfaba fransizî, ne ya îngilîzî bersiv nadin.

Di kurdî de jî ji bo nivîsîna hin gotinên ku ji erebi hatine stendin bikaranîna hûx yê Mir Celadet pêketî ye, dev ji wan nayê berdan. Lé di alfaba Hawarê de jî bikaranîna wan ixtiyarî bû.

3) Gotina Seyda ye : ya rastî ev e ku mirov bêje alfabetek kurdî bi tîpén latînî, ne ku

*alfabeya latînî.*

4) *Gava ku em dibêjin ku bikaranîna hin nîşanên wekî ^ û ş di aliyê pratîk de dijwariyan peyda dike, em qala dijwariyê xwe, yêñ Enstîtuyê nakin. Ji bo me bi a we, di hoyêñ welitekî wekî Fransa de, mirov dikare tîp û nîşanên ku dixwaze bide çéki-rin. Lê ku em belavbûna nivîsandina kurdî bixwazin, ku em hévi bikin ku çapxaneyêñ kurdî li gelek ciyan bén danîn, me divê pirsén teknîk û teknoloji yê ji bîr nekin.*

5) *Hêçî pêwistiya pêşvebirina kurmancî, em bê gûman sedî sed bi Seyda ra ne ú di vê rê de tiştê ku bi me biqede emê pêk bînin. Lê ev xebata han xebateke dûr û dirêj e, ya salan e.)*

\* \*

\*

... Zor spas dikim ji bo kovara «Hêvi». Yekem car paş maweyekê dûr, em dikarin bi zimanê xwe pirtûk bixwînin. Hêviya min ev e ku ji her hejmarê ji me re verê kin, çûnke hevalen me yêñ kurd ên vir jê kelk bigrin, istifade bikin. Serkewtî û serfiraz bin.

Brayê we Mustefa A.  
Bhopal, Hindistan

\* \*

\*

... Ez bi kovara «Hêvi» gelek kêfxwesû dil şad bûm. Di aliyê çapkirinê da gelek sipehî û di aliyê naveroka xwe da jî têr tije ye û bi zimanek rast hatiye dagirtin.

Lê ji ber ku «Hêvi» kovara Enstîtuya Kurdî ye û ji her Kurdê ku destê wî pêñûs digre ra wê bibe sipartek, ew çend şaşiyêñ biçükên ku di warê ziman da té

xuya dikin, jê ra dibin kêmâsi. Ew şaşiyêñ ku min li gor zanîna xwe té de dîtine ev in :

Rûpel 17, rêz 9-10 : «Em ji hemû welatiyêñ xwe hévi dikin ku di vî warî de berpirsiyariya xwe ji bîr me kin».

Rûpel 18, rêz 10-11 : «Di vê navê de ji hemû nivîskarêñ kurd tika dikin : em heryek di tengâ xwe de gotinêñ nû çê mekin».

Diviya bû di şûna «ji bîr me kin» da ji bîr nekin û di şûna «em heryek di tengâ xwe de gotinêñ nû çê mekin» da çê nekin bata nivisin. Lewra di baweriya min da «me» ya neyiniyê tenê û tenê di fermaña hezir û yekser da té bikaranîn.

Di rûpela 29 da gelo çîma şûna «mezintirîn» da mezintirînê natîye nivîsandin. An ev şaşiyêñ çapê ne ? Bi daxwaza serfiraziyê silav û hezki-rinêñ xwe pêşkêş dikim.

Zinar Şîro  
Swêd.

*(Neyiniya fermanê ji bo kesê duwemîn timî bi me çê dibe. Her wekî :  
ketin :*

*Bikeve Mekeve  
Bikevin Mekevin*

dîtin :

*Bibîne Mebîne  
Bibînin Mebînin*

*Ji bo kesén din bi ne çê dibe. Misal:  
Bila nekeve (kesê 3a), Bila nekevin (kesén 3a). Lê di zimanê peyvandinê de, pirîcar ev teşe tékel dibin û em ji hevalê hemberê xwe re di şûna mekeve de nekeve dibêjin.*

*Heçî rûpela 29, meremê bi du awayan gotin mimkin e :*

- a) Mezintirîn helbestvanê tirk  
b) Mezintirînê helbestvanêñ tirk)*

## XEBATÊN ENSTITUYA KURDÎ

Derveyî légerîn û xebatê zanistî, Enstitu bi nivîsin, çapkîrin û belav kirina kitêb, ferheng, kovar, kaset û sêlikên mûsîqî û filmên bi zimanê kurdî, an li ser Kurdan bilî dibe.

Di milê din de, Enstitu her vîne (texlit) belge, kitêb, arşîv, foto, diyapoziyî, kaset û filmên kurdî û li ser Kurdan dicivine, li pêmahiya (mîrasa) çandîya gelê kurd xweyî derdikeve, dixwaze wê ji windabûnê xelas ke.

Li Enstituyê wisa jî fêrên (dersên) ziman û mûsîqî, konferansên nasîna Kurdan, raberî û pîşangeyên hinerî têk pêk anîn.

### KOVAR

Ji bil «Hêvî» yê, Enstitu kovarên jérîn jî çap dikê :

- Bultena peywendî û agahdariyê : ji du mehan carekê bi zimanê almanî, fransizî, ingilîzî, ispanyolî, italyanî, kurdî û tirkî dertê. Her hejmareke bultenê dora cil rüpelâ ye, agahdarî û xeberên karêni Enstituyê û bendênu ku di çapa awrûpayî de li ser pirsêni jiyana rojane (saxî, xwendin, hwd ...) yên karkerêni kurdên Almanyê ye.

Kiriyariya salewextî : 12 dollar

- MIZGİN : kovareke bi kurdî û almanî ye, ji du mehan carekê li Bonnê bi hevkariya Enstituya Kurdî (şaxê Almanyê) û Xaça Sora Almanî derdikeve. Ev kovar bi giranî li ser pirsên jiyana rojane (saxî, xwendin, hwd ...) yên karkerêni kurdên Almanyê ye.

Bihayê hejmara : 3 dollar

- STUDIA KURDICA : Malbenda Légerîn a Enstituyê vê kovara zanistî ji bo ronakbirêni gelên cîranêni Kurdan ji şalê 2 caran derdixe.

Hejmara pêşîna kovarê di çile ya 1984 de bi erekî û farisî derketiye. 128 rüpel e. Ewê ji hejmara 2 pê ve beşêke tirkî ji hebe.

Kiriyariya salewextî : 12 dollar.

### VIDEO

Enstitu ewê di 1984 de bi zimanê kurdî 5 filmên video çê ke. Filma pêşîn «Denge Kurdistanê» (62 deqîqe), bi sistemên VHS (PAL û SECAM) û Betamax (PAL û SECAM) derketiye.

Bîha : 30 dollar

### KASET

Ewê Enstitu di 1984 de dora 20 kasetên mûsîqiya kurdî derîne. Ji niha ve 8 ji wan derketiye. Her yek saetek dom dike û 4,5 dollar e.

Enstitu derveyî weşanên xwe her cûre kitêb, kaset û sêlikên bi zimanê kurdî an li ser Kurdan di gelek welatên Awrûpa, Amerika, Rohelata Navin û Awîstralîyê de belav dike.

Hun dikarin ji me lista weşanên frotinê bixwazin.

Ji bo agahdariya zêde kerem kin werin Enstituyê an ji me re binivîsin.

## alîkari ji bo ferhenga kurdî - fransizî

Enstîtu ferhengeke kurdî - fransizî çêdike. Ev xebat karênu ku Kamuran A. Bedirxan di sî salênu dawînên jiyana xwe de pêk anî bû didomîne û temam dike. Ta niha qasî 55 000 gotin hatine berhev kirin û wergerandina fransizîya gotinênu ku bi tîpênu A, B, C dest pê dikin qediyaye, tîpâ D jî di ber qedandinê de ye.

Ev ferheng ewê mezintirîn û firehtirîn ferhenga zimanê kurdî be û dixwaze, qet ne be, piraniya mezina dewlemendiyênu zimanê me diyar bike. Piştî çapa wê ya fransizî, ewê çapen bi zimanênu din (tirkî, almanî, ingilîzî, erebî, farisî) bén amade kirin.

Ziman malê hemû Kurdan e. Weki derya ye, kûr û fireh e. Çi şivan, çi gavan, çi koçer, çi cotkar, çi dengbêj, çi nivîskar, her welatikî me wekî masiyan di nav vê deryayê de mezin bûye û jê parekê stendiye. Enstîtu di xebata xwe de hewcê zanîn û alîkariya hemû welatiyênu me yên bixîret e. Em dixwazin ku kevirê her Kurdekkî dilsoz di vê avahiya giştî de hebe. Kerem kin, navêni giya û daran, ên hêşînatî û meywan, ên rawir û teyran, ên haleten kar an gotinênu ku hun bawer dikin nadir û kêmîdîtî ne ji me re bişînin. Ku dikaribin her gotinekê piçek izah kin an wergerandina wê bi zimanênu ku hun pê çêtir dizanî li kêleka wê deynin baştı dibe. Heçî navê giya û daran, heta dikaribin diyar bikin bejna wan çend bilind e, li ku hêşîn dibin (di erden avî an bejî de, li devêne çema an li çolan), berên wan çawan in, çi reng in, çiqas gir in, tênu xwarin an na, tama wan çawa ye ? Ku dikaribin pelek ji darê an jî berê wê, an wêne (resm) yê giya an teyr bişînin hê jî çêtir dibe. Tikaya dawîn : ji bîr me kin di nameya xwe de bêjin hun ji kîjan bajar an navçeyâ Kurdistanê ne.

Ji niha ve, spasen germîn ji bo alîkariya we.

\* \* \* \*

*Nameyan li ser navnîsana jérîn bişînin : Ferhenga Kurdi, Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS, FRANCE.*

# BÎRANÎNA TEWFÎQ WEHBÎ

Joyce BLAU

*Mamosta Tewfiq Wehbî roja 5-1-1984 li Londonê çû rehmetê. Di vê hejmara xwe de «HÊVÎ», bi kurmancî û bi kurmanciya xwarê jiyana zaneyê me yé navdar, Hîmdarê Şerefê ê Enstituya Kurdi, bi bîr tîne. Benda jérîn Dr. Joyce Blau, mamosteya zimanê kurdî li Zaningeha Parisê nivisiye.*

Jiyana welatparêz û zaneyê kurdê binavûdeng Tewfiq Wehbî bi dîroka Iraqê ve xurt girêdayî ye.

Tewfiq Wehbî di sala 1891 de li Şwartê, di navçeya Sileymaniyê, di maleke dewlemedend de hatiye dinê. Ev navçe wê heyamê di bin destê Imparatoriya Osmanî de bû û dema reştitîra dîroka xwe dijî. Sultan Ebdul Hemîd ê Sor li ser text bû û bi hêviya ku ewê Islam dikaribe imparatoriyê ji jihevketin û hilweşandinê bifilitinê siyaseteke pan-islamî dimeşand. Di warê aborî (ekonomik) de imparatorî şerpeze bû û tenê bi saya alikariya dewletên awrûpayî li piyan dima. Ew dewlet jî, di gerewa alikariya xwe, dest danî bûn ser hatinê û bêşen osmaniyan. Di fetlaneka sedsalê de, pêşveçûna sermayedariyê li Awrûpa û li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê gihiştî bû gehîneka (qonaxa) emperyalizmê : Rohelat ku ta wê demê bêtiri bazarek bû ji bo sermaye û frotişkên awrûpayî berebere dibû kolonî. Britanî çav berdidin navçeya Iraqê ku li ser riya Hindistanê ye.

Bajarê Sileymaniyê giringîya xwe ji karxaneyên xwe yên çek û silah dikişand. Di dawiya sedsala dawîn de li wir qet nebe sed û pêncî çekxane û çêkerên navdarên çekan hebûn. Çekên ku wan çê dikir li her du aliyên sînorên tirk û iranî kiryoxtan diditin. Li Sileymaniyê «intelligentsia» yeke kurdî peyda bû bû ku ewê di vejîna edebiyata kurdî de roleke giran bileyze.

Dêübavê Tewfiq Wehbî wî dişinin idadiya leşkeriya osmanî a Bexdayê. Di 1908 de, Tewfiq, di 17 saliya xwe de, xwendina xwe diqedine û di 1911 de wî dişinin Arnawutistanê, ku di ordiya osmanî de şerê welatparêzen arnawut bike. Ew wisa jî di 1911-1912 de li dijî Italyayê şer dike. Tirkîye, ku di wê navê de rejîma xwe guherti bû, ji mexlûbiyetekê diçû ya din. Gava ku Şerê Cihanî diteqe, Imparatoriya Osmanî sefîn Almanyê heldibijêre. Almanya, bi gelempêri, di perçiqandina hereketên neteweyîyên kurdî de alikariya osmani-

ya kiri bû û xwe wekî piştîvanê yekitiya imparatoriya osmanî nîşan da bû. Serokên tirk bi serketina Almanan û xasme bi maxlûbiyeta Rusya Çarı, dijmîne wanê timî, bawer bûn û dixwestin, bi saya şer, milkênu ku winda kiri bûn ji nû ve bi dest xin, meznahiya borî ya İmparatoriya xwe vejînin. Şerê Rûs û Osmanî çibigre bi temamî li Kurdistanê derbas bû û ji bo gelê kurd mirin, malwêranî, xelayî anî, mûsîbetekê mezin bû.

Hê di 1916 de, Dewletê Hevalbend İmparatoriye di nav hev de par ve kiri bûn. Ewê Mezopotamiya bigihîsta Ingilîstanê, wilayêtê Mûsilê bi keta bin destê Fransayê. Piştî maxlûbiyeta xwe, İmparatoriya Osmanî mecbûr ma di payîza 1918 de mutareka Moudrosé, ku ji bo wê yekcar xirab bû, imza kir.

Peymana Aşîtiyê ku di 10 tebaxa 1920 de bi Tirkiyê re hate imza kirin ji bo Kurda naskirina navneteweyî ya mafê wan ê serxwebûna millî dianî. Bûyerên piştî vê peymanê qewimî pîrsa kurdî nizimandin pîrsa sernivîsta Kurdên wilayetê Mûsilê.

Tevgera neteweyî ya kurdî di navçeya Iraqê de bi gelemerî dijî-tirk bû û ji Ingilîzan, hêviya danîna dewleteka kurda serbixwe dikirin. Navenda (merkeza), wê tevgerê ji tam li navçeya Sileymaniyê bû. Siyaseta ingiliz dixwast, di gehînuka pêşin de, Iraqê ji İmparatoriya Osmanî vejetine. Wadêni dijîhev hatin dayîn ji neteweparêzên ereb û kurd re. Ewan wisa jî pişta serokên Kurdên dilxwazên Ingilîz girt. Ingilîzan di nav van serokan de Şêx Mahmûd Barzincî helbijartın. Şêx Mahmûd serekeşirek nifûzdar û yek ji mezinîn Tariqeta bîhikm a Qadirîya bû û serokên kurdên xwedî giranî wek yên qebîla Jafan, eşîrên Hemawendant li pişta wî bûn. Britaniyan di 1919 de Şêx Mahmûd Barzincî *Hukumdarê* navçeyen Sileymaniye, Hewlêr û Kerkûkê tayîn kirin û müşawirekî siyasiyî ingilîz danîn cem wî. Lê gava ku Kurd têgihiştin ku tucar néteke Ingilîza danîna dewleteka kurda serbixwe tune bûye nava Şêx Mahmûd û Ingilîzan xerab bû. Lewra, di 1920 de, dema ku Ingilîza Faysal Haşimiyyê Erebistanê anîn ser textê Iraqê û xwestin wî bi referendumekê qralê Iraqê ilan kin, Kurdên Sileymaniyê referendumê ji binî boykot kirin, yên Kerkûkê ji li dij deng dan.

Şêx Mahmûd li diji Ingilîzan serî hilanî. Britanî di milekî de bi hovîti bajarê Sileymaniyê bombaran dikirin ji bo perçiqandina serhilanînê û di milê din, rê didan Kurdan ku idara navçeyen kurdi têxin destê xwe, destê karmendîn (memûrên) kurd. Diviya bû ku tu şopa tirkî û tirkîtiyê nemîne. Ew li Sileymaniyê çapxaneyek datînin, alîkariyê didin hemû kesen ku bi kurdî dinivîsin. Ev karekî hêsa ne bû, ji ber ku ta wê rojê nivîsına kurdî tenê di şe'r û helbestan da hati bû bikar anîn.

Wezareta Perwerdeyî (terbiyye) ya Neteweyî a Bexdayê di destpêkê de zimanê kurdi bi alfaba latînî nivîsinê diderî. Kitêbokek, *kitab - i awlamîn - i qiraat - i kurdî*, alfabetek latînî pêşneyar dikir û wê bi tirkî û farisî izah dikir. Nivîskarêne wê du mamosteyen Sileymaniyê, Mihemed Zekî Efendi û Mîrza Mihemed Başka bûn. Serhezar (Major) E.B.Soane, rohelatnas û kurdîzan, û seroksed W.J Farrel alîkariya wan kirine.

Di 1928 de Sa'îd Sidqî (Mele Seîd) rêzimana kurdî ya pêşîn bi kurdîya navendî derdixe. Wezareta Iraqi ya Perwerdeyi ya Neteweyî wê ji bo her pênc sinifên Xwendega pêşîn qebûl dike. Mele Seîd ji alfaba erebî-farisi û ya osmanî istifade dike û alfabeyek kurdî pêk tîne. Dîsa li Bexdayê, çend meh bi şûn de, di 1929 de, çapa duwemîn a *Alifba-y kurdî* a Ahmed i Aziz Axa der dike-ve (41 rûpel).

Bi dilûcan netewaparêz, Tewfiq Wehbî di wan salan de vejetinxwaziya kurdî dike. Di 1922, Ingilîz wî tayîni bajarê Ranya dikin wekî «assistant political officer» (Zabitê siyasiyê alîkar) li cem serokekî kurd. Ew wisa jî dikeve komisyona pêşîn a ku biryara danîna ordiya Iraqê li ber modelê Ingilîz dide. Di 1925 de, ew dibe fermandarê Xwendegeha Qraliyetê a Leşkeriya Iraqê. Paya Mîralayîyê (koloneli) didinê û wî di 1929 de maweyekî ji bo xwendinê dişînin Kolleja Zabitê Bilindpaye li bajarê Kentê, nêzî Londonê.

Li ser daxwaza Wezareta Iraqi ya Çandê, Tewfiq Wehbî di 1923 de dest bi pêkanîna rêzimanene kurdî, li ser modelê ya zimanê ingilizi, kiri bû. Di tebax 1929 de, birê pêşînê *destûr-i ziman-i kurdî* li Bexdayê derdikeve. Ew tê de, alfabeyek pêşneyar dike ku iro jî, tevî çend guhêrandinê piçûk, xwendayêñ Kurdêñ Iraq û Iranê bi gelempêrî bikar tînin. Vê alfaba bi tipêñ erebi li Sovyetistanê jî di ferhengê soranî-rûsî de bikar tînin. Rêzimana Tewfiq Wehbî dibe bingehê xebata neslén dahatûyêñ rêzimanzanêñ kurdêñ Iraqê.

Bikaranîna alfabeaya latinî ji salén 1920 pê ve bala Kurdêñ xwenda û ro-nakbîr kişandiye. Lewre, alfaba erebî-farisi ya guherandî bi hin dudîlî hate qebûl kirin. Tewfiq Wehbî li ser vê pirsê jî xebitî û alfabeyek latinî çêkir û xwast wê bi kitêboka xwe *Xwendewari baw* (1933, 44 rûpel) belaw ke.

Lê ev cêribandin neçûn serî. Di alikî de hikûmata merkezî di van cêribandinan de xwastineke vejetandinê didit û li hemberî wan der diket ; di milê din de Kurd bixwe jî, ku li Iraqê bû bûn hindikahî û mecbûrî hinbûna zimanê resmî û alfabeaya wê ya erebî bin da ku dikaribin di idarêñ dewletê de bilind bin, xwe ne didan ber hinbûna alfabeyek nû.

Bêplanî û «bêpergâli» ya serhilanînê Şêx Mahmûd Barzinci li dijî hikûmata Iraqê û li dijî Britaniyan Tewfiq Wehbî xeyalşkestî dike. Ew terka Sileymaniye dike. Hin Kurdêñ netewaparêz lê bêbextî dikin. Hikûmata Iraqê wî digire û ew 42 roj di zîndanê de dimîne. Piştî ku tê berdan, Tewfiq Wehbî dikeve idara dewletê : di 1930 dibe waliyê Sileymaniye, ji 1936 ta 1938 mudirê Nafi'ê, dûre mudirê Mifetişîya Giştî ; ji 1944 ta 1946 wezirê Aboriya Neteweyî û yê Perwerdeyya Neteweyî. Ew di 1947 de dibe dewsgirê wezirê Parastinê (Difa'ê) û di 1950 de wezirê Saxiyê. Di helbijartinê 1948 û 1956 de ew ji Senatoya Iraqê re hati bû bijartin û heyânî 1958 jî senator bû. Piştî ku Ebdulkerim Qasim bi darbeyek leşkeri Xanedana Haşimî diqelibine û tê ser hikm, Tewfiq Wehbî terka Iraqê dide. Ew hingê 67 sali ye. Tê li taxekî rex Londonê bicih dibe û heta mirina xwe, 5.1.1984, li wir tevî jina xwe û her du kurêñ xwe dijî. Li gora wesjeta wî, cenazê wî şandin li çiyayê Pire Magrun, ku çiyayekî bilind û ciwanî hakimê Deşta Sileymaniye ye, veşartin.

Tewfîq Wehbî tucar dev ji xebatêن xwe yên zanistî berneda. Ew di 1966 de, bi tevkariya hevalê xwe yê kevn û sadiq C.J. Edmonds, ku mişawirê siyasiyê britanî bû li Iraqê ji 1918 ta salêن 1950, xebata xwe ya navdartirin *Kurdish-English Dictionary* (Ferhenga kurdî-îngilizi) çap dike.

Tewfîq Wehbî di kovarêن kurdî yên Iraqê de gelek bendaran nivisiye : *Diyar-i Kurdistan* (1925-1926), *Gelawêj* (1939 ta 1949), *Deng-i Getî Taze* (1943-1947), *Pêşkewtin* (1958), kovara *Korî Zanyariy Kurdiy* Bexda (1973). Qasî bîst xebatêن wî yên li ser ziman, dîroka dinan, hwd. hene. Yek ji xebatêن wî bêqeyd nahêle ; polemîk, axaftin, minaqeşan didin peyda kirin. Li derweyî welêt, ew di kovara Komela Xwendekarêن Kurd Li Derveyî Welêt *Kurdistan* (1965), di *Kurdica* (1968), kovara Komîta Pêşvebirina Kurdistanê ku li Britaniya Mezin derdiçû de dinivisine.

Ew di 1943 ferhengeke erebî-kurdî temam kiribû û tê de hewl dabû kurdî ji gotinêن biyanî xwerû bike.

Di 1956 de li Bexdayê bi zimanê erebî *qawa'id al-lugha al-kurdiyya* (rêzimana kurdî) çap kiri ye ku ew wergerandina erebî ya her du feslên birê pêşîn ê *destûr-i ziman-i kurdî* ye.

Tewfîq Wehbî pêlekê li ser eslê navêن ciyan dixebite : Bexda (1950), Altun Kupru (1956), Kirkuk (1958), Şahrezor (1961). Ew di 1957 de li Bexdayê kitêbokekî 44 rûpel li ser eslê navê Bahram Gur, prensî Sasani û di 1965 de li Londonê jî bi îngilîzî kitêbokek li ser eslê Kurda û zimanê wan der dixe.

Tewfîq Wehbî xweş bi tirkî, farisî, erebî, çend zaravayêن kurdî, îngilizî, fransizî û almanî dizanibû û li ser farisiya navîn, farisiya kevn û avestî xebitî bû ji bo baştir tê bigihê zimanê kurdî ji ku tê.

Di 1961 de, wekî piraniya Kurdan, ew jî pişta şoreşa Kurdistana Iraqê di bin serokatiya Mela Mistefa Barzanî dike ; danûstanêن wî û Barzanî ta dawiyê baş bûn. Ew Kurda gazî yekîtiyê dike û piştivaniya mizakereyêن navbera hikûmatê û hêzén kurd dike.

Mala Tewfîq Wehbî li Londonê jî bo Kurda bû bû navendekî çandî. Bi sedan Kurdêن ji her emri dicûn jê şiret dixwastin, kitêban deyn dikirin an li ber destêن wî hîn dibûn, dixebeitin. Dijminêن wî yên bêgidîtir jî cameriya bêhidûd a vî zilamê ku xwe bi tevahî dabû pêşveçûna Kurdan û pêşvebirina lêge-rînen kurdî, inkar nakin.

# **BELGE**

## **Biraninên Ihsan Nûri Paşa**

*Nivîskaré van bîranînan, Ihsan Nûri sala 1892 li Bedlîsê, li taxa Ali - Kolî hatiye dinê. Bedlîs yek ji bajarên Kurdistana Bakûr e, bi sedsalan merkeza mîraniya kurd a Şerefxanan bûye.*

*Piştî qedandina xwendegeha leşkerîya «Harbiye» ya Sten-bolê, Ihsan Nûri, wekî gelek zabitên Kurdên din, teví şerê serxwebûna Tirkiyê dibe û té de şehrezayî û mérxasiya xwe nîşan dide.*

*Gava ku serokên Komara Tirkiyê di sala 1924 de, ji qewlên ku dabûn kurdan vedigerin û dest bi siyaseteke dijî - kurd dikin, Ihsan Nûri pére têdighê ku dem dema şer e û xwe digihîne serê ciyan - ji bo hêzén kurd amade ke. Ev heyama jiyana wî ta sala 1930 dom dike. Piştî serhilanîna Agriyé, di 1930 de derbasî Iranê dibe û li wir ta mirina xwe, 46 sal di nav tunebûnê, di nav dijwariyên maddî û manewî de diborîne.*

*Di van salên direjênen sirgûnê de, Ihsan Nûri, bi dizî, du kitêban dinivisine : «Serhilanîna Agri» û «Jiyana Min». Kitêba dawîn tenê bi kurdî nivîsiye, lé ya pêşîn bi farisi, kurmancî û soranî aniye qelemê. Herema wî, Yaşar Ihsan Xanim, jî pirtûkek bi navê «Çiroka jiyana min» nivîsiye.*

*Ji ber sansûra giran a Savaka Şahê Iranê ev her sé kitêb qala qewimandinên ta sala 1930 dikin û li ser salên dijwarên sirgûnê bêdeng dimînin. Yaşar Ihsan Xanim, ku niha bêtirî 80 salî ye, iro li Tehranê teví zir - keça xwe Zehra dijî.*

*Em gelek spasdarên wê ne ku kerem kiriye van destnivîsan spartîye me da ku ew bêñ çap û belav kirin, rûpeleke nенasa dîroka gelê kurd derkeve ronahiyê.*

*Di vê hejmara «Hêvî» yê de em dest bi çap kirina bîrrê pêşîn é «Serhilanîna Agri» dikin. Heta ji me bê emê ji eslê destnivîsê re sadiq bimînin û gotinên nivîskar, ku hin ji wan heye ku ji xwendevanan re giran bixuyin, ne guhérin. Dûmahîk ewê di hejmarên «Hêvî» yê yêñ din de derkeve.*

*Me vê kitêbê ji niha ve wegerandiye zimanê fransizî û ji bo ku léger û dîrokzanên biyanî karibin istifade bikin ewê Enstituya Kurdî wê di payîza 1984 de çap ke.*

**PEREŞ**



AGRÎ 1929 - İhsan Nûrî Paşa û jina wî Yaşar Xanim

## SERHILANÎNA ÇIYAYÊ AGRÎ

Serhilanîna Agrî laperek ji mêjûyê<sup>1</sup> xunarî pir bi şanazî<sup>2</sup> yê neteweyê kurdê aryayî ye di riya serbestî û azadiya xwe ya netewayetî de. Serhilanîna Agrî hawara dilşewêta neteweyê kurdê bêyar û yarerneyê, azar û şekençek diyar kiriye ... Serhilanîna Agrî qîrîna serbixoyî ya xelqê kurdê dil û reben û belengaz e li hember hemû gel û komelan. Serhilanîna Agrî belgeyek e bi xwîna kal û pîr, xort û mindalên kurd hatiye nivîsandin û bi destê nuwînerên xwe sipartîye.

Têkoşerên kurd di nav Agrî de<sup>3</sup> bi dinya ragihandine ku li dilê ev netewê çiyayê eşq û iştayaqa ji bo serbixoyî dişewite.

Eva pirtûka piçûk tenê bona nasandina têkoşerên netewayetî kurd li nav Kurdistanâ Tirkiyê nîne ; belkû li nav çar salén ku alaya serbixoyê kurd li ser qûçen çiyayê Agri, li bin parastina çekdarên giyanbazên ev netewa de pêl lê dida û leşkerên tirk nikari bûn wê berjêr kin, şerkarên kurd li vî çiyayê pîroz nişan dane. Neteweyê kurd, di camêrî, azayeti û şerkarî de ji bav û kale xwe ve qareman e. Li vê babetê da nîvrotir kurd, Lorê Şivakare ligel Kurdên Erzûrûm, tewayifê Koçan li rohelatî Iran, li gel tewayifê kurdê Iskenderon ciyawaziyan nîne, tewawî regezê Arya xavenê ev sifetan in. Tê gotin giyanbazî Agriyan her taybeti wan nîne, bi rastî şamilê hemû regezî kurd e. Nîşaneyek evî qaremanî, Kurdê bakûré Iraq e !

\*  
\* \*

Berya ku ez li ser qewimandinên çiyayê Agrî binivîsim, min çêtir dît işa-ret kim ku şoreşgerên kurd li penavê azadiya netewayê xwe de bi pakî xwîn

---

1 - *mêjû : dîrok*

2 - *şanazî : iftixar*

3 - *li vir yeş gotin hene ku nayên xwendin.*

rijandine.

Ev qas ku li bîrim heye, Kurdê Turkiyê ta 1514 bi tehrê milûkê tewaifi dijîyan. Li wê mêtûyî da Yavuz Sultan Selim, împaratorê osmanî ku xilafeta islami jî girti bû, bi desyarî Mela Idrîsê Bedlîsi li gel umerayên kurd qerar da-bûn ku ewê umerayên Kurdistan li ser hevingeyên xwe disa serbixwe hukimdarî kin, bi navê xwe sikke derxin, ji hevre nuwîner bisînin û salê meblexekî pere bona nîgehdiariya ordiya Xelife bi padîşahî osmanî bidin ; heke şer çêbû bi hev alikarî bidin. Xelife bi neşra fermanekî vê qerara resmî kir.

Paşê, Sultan Murad, padîşahê osmanî, umerayên kurda li dijî hev tehrîk kir, hikûmatê wan ji beyn bir. Ta salên 1690 hikûmetên Bedlîs, Amadiye û Hekarê serbixoyî xwe parasti bûn. Tirka di 1697 hikûmeta mîrê Bedlîsê ji beyn birin, malê wî şêlandin<sup>4</sup>.

Di 1832 de Kor Mihemed Paşa li Rewandûzê, di Welatê Soran de dest bi şoreşê dike, çend mirov dişine Rusiyê<sup>5</sup>ji bo çekirina topan hin bin. Di vegerê de ew li Rewandûzê ji bona ordiya kurd topan çê dikin. İro jî ji wan topan li Rewandûzê hene.

Di 1843 de, Mîr Bedirxan, hikumdarê Botan, şoreş kir, ta nêzikayê Wan çû. Kurapek wî<sup>6</sup>li nav Cizirê li dijî wî şer kir, Cizirê girt. Mîr mecbûr ma ji Tirka şikest xwar. Romî wî ligel tevayî jin û zarêñ wî ji welat dûr xistin, birin Stembol<sup>7</sup>, li wê derê binecî kirin.

Di salên 1880-1881de, Şêx Ubeydullah li Şemdinan şoreş kir, vê navçê girt, zivirî Iran, hevingeyek ji Iran girt. Paşê, li navbeyna du ordiyan de ma, şikest xwar. Romî ewî girtin, tevî jin û zarêñ wî, şandin Hicazê û ew li wêderê çû rehma Xwedê.

Di 1914 de, Seyid Eli, kurê Şêx Celaleddin, bi hevkariya Mela Selîm li hevingeya Hizan - nahiyeya Bedlîsê - şoreş kirin, bi du hezar çekdarén kurd rîketin ser bajarê Bedlîsê, bi alikariya xelqê şar çend taxên bajêr girtin. Hawarê Romê gîhişt û ewan şikest xwarin, zivirîyan Hizanê. Romê dora wan girtin. Seyid Eli teslim bû. Romî ewî di nav bajarê Bedlîsê li gel hevalên wî dar da-kirin.

Mela Selîm bi Balyozxaneya Rusî pena bir<sup>8</sup>. Şerê Mezinê ewel çê bû; Romî Mela Selîm ji balyozxanê derxistin û wî tevî hevalên wî bi dar kişandin.

Pey Şerê Mezin, Kurdên Iraqê ji hukmê Romê xelas bûn. Muahedeya (peymana) Sevr bi serbixoyî Kurdistan qerar da ; Dewleta Stembol jî wê qebûl kir. Mistefa Kemal Paşa, ku paşê bû serekê Komara Tirkîyê, ewî qebûl nekir ;

4 - mêtûyî Osmani Ewliya çelebi qala hikûmeta Mîrê Bedlîsê dike.

5 - Dîroknîvisen din dibéjin Misrê, cem Mihemed Eli Paşa.

6 - Ihsan Nûri di wê de xelet e, ew kurapê wî nîn bû xwaziyê wî yezdan şer bû. Viyê han piştî vê bêbextiyê, di 1855 de yek ji mezintirin serhîlaninêñ kurd li dijî Osmaniya saz kir.

7 - Bedir Khan Beg berê sîrgûnê Varna kiri bûn. Paşê wî şandin Girîte û ji wir ji Şamê û ew di sala 1868 de li Şamê, di şest û şes saliya xwe da çû rehmetê. Zaroyen wî hatin li Stembolê bicih bûn.

8 - Pena birin : iltica kirin ; penaber : multecî

qanûnek derxist ku li nav sînorêن Tirkîyê ji xeynî Tirk miletên din nînin, hemû Tirk in.

Ber vê yekê, Xalid Begê Cibrani, qomandarê firqeyên eşayîr, li nav şarê Erzurûm da bi hevkariya zabitên kurd, regezî Tirkîyê, dijî vê, Komîtey Istiqlalê Kurdistanê teşkil da.

Di 1924 de, Ihsan Nûri Cibrani - nivîskar - bi hevaliya çar zabitên kurd regezê tirk bi navên Rasim, Tewfiq, Xorşid, Ali Riza, tevî eskerên xwe li Beytetşebal bo azadiya Kurdistan helsan, miwefeq nebûn. Ali Riza giriftar û esker perakende bû. Pey vê, Xalid Beg jî li Erzurûmê girtin, anîne Bedlisê.

Di 1925 de, Şêx Seîdê Pîranê şoreş kir, bajêrê Xarpêtê girt. Hawara leşkereñ tirk bi riya hesinî gihîst, şikest xwar. Hevalek wî bi navê Qasim Cibrani, sergurdê eşair, xiyanet kir ; Şêx li gel hevalen wî girtin, li nav Diyarbekrê bi dar dakirin. Navêن zatêن ku li gel ve bi dar kêşane li jêr da dînîvisim : *Doktor Fuad, Palolî Ali Riza, Şêx Şerif, Şex Ebdullah, Sîrmanlî Husin, Tepecikli Şêx Muhammed, Balazade Buhaeddin, Şêx İbrahim, Cabaqçûrlî Teyib, Çorumlî Hecî Husin, Şerif Ebdurrehim, Tewfiq Axa, Kemal Fevzi Bedlisi, Şex Abdülqadir Nehrî* - reisê sabiqê Kurdistan Tealî Cemiyeti li Stembol - 27 nîsan 1925.

Li axirî 1925, Şêx Abdullah Gélanîzade, kurê Şêx Abdulqadirê Nehrî, li hevingeya Nehrê şoreş kir, tabûrek eskerê Romê dîl girt, paşê şikest xwar û bi welatê Iraqê penah bir.

Xalid Begê Cibrani, Yusîf Ziya - mebûsê sabiqê Bedlisê li Meclîsa Millî ya Tirkîyê - biraderen Ali Riza û zavayê wan jî li nav Bedlisê kuştin.

Di 1926 de, Bro Heski Tellî, ji êla Celalî, li çiyayê Agrî isyan kir, xwe kişi çiya. Di 1927 de nivîskar, Ihsan Nûri, xwe bi Agrî gihad, idareya şoriş bi dest girt, ji aliyê Komîteyî Xoybûn qomisérê fevqeladeyî eskerî intixab bû. Di wê salê de bayraxa sêrengîn a istiqlala Kurdistanê, ku di sala 1920 Cemiyeta Kurdistan Tealî qebûl kiri bû, ji aliyê Xoybûn şandin Agrî, Ihsan Nûri ewelin car wê di Agrî de bilind kir.

## AGRÎ

Marşa niştimanî ya Agrî ev bû :

*Agrî, Agrî tu agir bûy  
Li nav ketî, ser bilind bûy  
Li ser Kurdistanê çira bûy  
Hilbe Agrî, hilbe Agrî*

Li paş silav û jirikî zaf be peşîya te ey Agrî ! Te ey çiyayê berz û dilrevîn ku tim ziyaretgahê rolekanî (zaroyêن) ku zuret bûye û tebeqatê yexin mîna laperayê mêjûyê (rûpelên dîrokê) rûyê hev ketine minavika ji serhilanîna mêjûyê ji bîr çûye, çîroka dibêje.

Ey Agrî, navê te mêjûyê kenêt ra xuya dike. Nûr û seraser agir baranit li dilê qernêن kevn, dorûberê te bi nûr û germî parasti bû. Noke ji nav dilê lawa-

nêt pelîseyê agir dejîne. Pey silav û tazîm li pêşîya heykelê berazende û pir ihitiramêt ez yek ji lawanê heqîr û piçûkê te dixwazim çend lapere ji mêtûyê pir bi şanazê te re vekim.

Agrî : ev çiyayê bilind ku li bakûrê rohelatê sînorê Kurdistana Tirkîyê ser bi esman kêşaye, wek diwarek vî welati ji çengê bêgane parastiye, heta iro kesî ne qedyaye derkeve serê wî. Mesihî dibêjin ku keştiya Nuh li ser vî çiyayı rûniştiye. Belam, Quranê Kerîm wisa nabêje, dîferme ku keştiya Nuh li ser Çiyayê Cûd, li nîvroyê ev selatê rûniştiye. Delilan min ji nav pertûka rîşeyê regezê T. Hard nivisîne.

Ciyayê Agrî çaxek secdegahî Zerdeştiyan bûye. Nak bi navê ko roleyên (zaroyên) canbêzarên kurd ewelin car li ser qoçen wî, li ber çavê neyarê zordar, ala sêrenga serbixoyî kurd daçikandê bi rejandina xwîna xwe, xwe çend sal parast, bû qiblegeha Kurda.

Navê pir bi şanazî ye Agrî - li kevn da Agirî - ku nîşana agirperan bûye, eviya bi pêçevaneyê çend hezar temeneş wefadarê roleyên (zaroyên) din. Vira xuyan dike Agrî qet ji bîr nayê kirin.

Ji Agrî re, Asûriya «Orarto», Ibraniya «Ararat», mêtûnivîsê yunani Herodot Alarad gotine. Navê Orarto ewel Selem Neser, padişahê Asûr, li sala 1260 de bi riya li berd (kevir) nivisinê daniye. De Morgan, mêtûnivîsê navbang, dibêje dewleta zordara Ararat 2000 sal pêşîya mîladê, hebûye. Ew muquayeseyî asarê bin erdê ku li şarê Wan, paytext, û cihayê din ên malbenda Ararat peyda bûne li gel asarê ku li kenarê Derya Reş bi dest hatiye dike. Diyar e, rûniştevanê herdu hevînge medeniyeta müştereka wan hebûye. Tê bawer kirin ku sinorê Dewleta Ararat ta bi Deryayê Reş derazê wan hebûye.<sup>9</sup>

Agrî, tê gotin, ji binemalê mezinê GUTTÎ bûye, maweyek li bin ferman revayê xelekanê dinê hev regezê xwe wekê Subaro Nayirê da bû. Le seretaya (destpêka) qîrnê heştemîn berî mîladê, gihiştiye ev pere radeyê hêz û zordare xwe.

Li nav salên 825-800 berî mîladê, padişahê Agrî Minvaş, ko Minaş Çexayê Avesta, Menoçekê Şahname dibe.

Bi aliyê nîvro hêriş kir helmetî Atur Nayipol û Selman Neyer. Tür û Selmanê velam daye û bi nîvroyê deryaçeyê Rizaiyê berdê nivisarek li cî hişt. Wê çaxê navê Rizaiyê Çêçes çikes bûye !

Herodot dibêje li dorüberê çiyayê Ararat hozê Alarot haldira diperestin. Neyer niştimanê wê heyâ Arasê navende zaniye. Ev navçe niştimanê ji Medan, taîfeyê Arêzant bûye, diyar e navê Ararat ji wê maye.

Hebûnî ciyek bi navê Xaldiya li nezikayeti Terebzon ev baweriya teyid dike ku sinorê dewletê Ararat ta Deryayê Reş fireh bûye.

Qudret girtinî dewleta Med di bin serokatiya şahînşahê mezin Hoxşetere hîmî dewleta Ararat lerzand. Car caran padişahê Ararat ji binemalê Manaî bû ku li nîvroyê rojavaye deryaçeyê Çêçes - Rezaiyê - bû (...)<sup>10</sup>. Li salê 600

9 - Di destnivîsê de 5 réz baş nayé tégihiştin

10 - Di destivîsê de 3-4 réz baş nayé xwendin.

berya miladê Ararat êdî dewletekî bi hêz nebû, bere bere erdê wê kete destê Fillan.

Herodot dînivîse ku şarsaniyeta (medeniyeta) Araratiyan ji ya Filla berzitir (bilintir) bûye, dîn û ayînê wan vegirtine, cûne ser baweriya wan. Ev cî ra neslêt bi haldî Hayistan û ji xwe ra jî Hayek gotin û Çiyayê Agirî bû neçîrgayê padışahêن Fille.

Çiyayê Agirî berya Şerê Mezinê ewel ciyê gihîştina sînorêن Rûs û Iran û Osmani bû. Paş kommunîst bûyina Rûsa, sînoran Fille girtin. Paşê, Osmaniya bi alikariya Kurda ji destêن Fille derxistin. Ji vî ciyê re Tirk ji Agirî dibêjin. Pey şerê Agirî navê Qerekosê guhêrin, wilayetê Agirî nav danê.

Li dewrê zor kevn de Kurd ji agir re azer digotin. Navê çiya jî azer bûye, paşê Ager kirine, Ager pêre bûye Agirîn, ku ji ser ve berjêr û sar bûye, iro jî kifş e, çar aliyê serê ciyê kevirên reş ên mezin in, Kurd jê re ker dibêjin.

Çiyayek mezinê din jî le mêt ve dîsa agirperan bûye, li nîvroyê rojavayê ye, Tendûrek navê wî ye. Li ser wî da ciyek mîna tenûr heye, hîlmeke germ jê derdikeve. Kurd hinek nexwesêن xwe dibin nav vê tenûrê datînin, şifa dibîne, çak dibe.

\*

\* \*

## BRO HESKÎ TELLÎ

Ibrahim Axa ku Bro Heskî Tellî digotin jî êla Celalî û ji binemalê Hese Sorî bû. Paşê bi miqabilê fedakarî ji riya azadiya miletê xwe mimesîlê netewê Kurd bû li heyeta Xoybûn, pey re meqamê paşayı danê. Mala wî li bin tarê Çiyayê Agirî bû. Li nav Şerê Mezinê ewel li gel Gor Heso Qotikî (mala wî jî li Agirî da bû) û li gel çekdarêن xwe pêşıya eskerêن Rûs girti bûn, nehiştî bûn ew bikevin Çiyayê Agirî. Lê Rûsa qerar dan qend û şekir û birincê wan bidin, ew jî pişta ordiya rûs xera nekin.

Dû raperîna kommunista, hêzên çekdarêن rûs ji erdê Osmaniyan fere kişiyan, çûn. Lê ciyê wan çekdarêن fille girtin. Hêzên Gor Heso û Bro Heskî rê nedidan Fillan. Rojek Gor Heso girt ser riya Bayzîdê, lê di şerê Filla de şehîd ket. Bro Heskî idara hêzên Agriyê bi dest girt avêt ser Bayzîdê û şarê Bayzîdê ji Filla girt, hê jî ordiya osmanî negihiştibû wan deran. Çend roj paşê Osmanî gihiştin, şar teslim girtin. Heskî li gel xuşka Mehîmûd Efendi, reîsê belediya Bayzîdê, zewicî, li bajêrê Bayzîd dukanek vekir, li wêderê ma, lê jin û zarêن wî li Ararat diman.

Di rojêن Şêx Seîdê Mezin, Hesko ji dewlet ra sadiq ma. Pey girtinî Şêx Seîd, kurê wî Alî Riza û çend mezinê, xêlê Hesenî dixwastin bifelitin, bi fermaña dewleta Tirkîyê alîkariya xêlê Kor Huseyn Paşa û delalî riya Iran ra bi wan girtin. Xoşbextane ne qedandin, evanan ji sînorê Iran derbas bûn, hatine Iranê. Paş temirandina şoreşa Şêx Seîd, dewleta Tirkîyê reîsêن Kurda li gel jin û mindalén wan ve bi rojavayê Anadolê şandin. Dostêن Bro jê re digotin em te ji vê derxin ; Bro digot : «Min bi dewleta Tirkîyê zor xizmetên mezin

kirine, iro jî dikandarı dikim. Bi hîç kesî karim nîne, ez dostê dewlet im, ewe ji bo ci min derînin». Ew qet nedifikirî ku regezê Kurda li cem Tîrka xizmet kirine an nekirine, Kurd ciyawazê wan nîne. Rojek teze şefeq aveti bû ; axirê zivistanê, sal 1926 bû. Mala Bro, jin û zarok, li gundê Siflikê, li Agrî, teze ji xew'rabû bûn, pez û dewaran rê dikirin.

Bro bi xwe bi me digo : «Kurê piçükê Ilxanî min bi lez ji Agrî hat. Ez li mala Bayzîdê rûniştî bûm, xwirîniya xwe dixwar. Kurê min bi min go : «Bîst siwarêñ tirk bi zabitek şefeqê hatin gund, pirsa te kirin. Me xulamê me şand li hespê te bigere ; ew siwarî hespê te bû, hespê revand. Çend siwarêñ tirk ketin pey wî, çaxê di Cebê Kunbetî de qelibin, dengê tifingan hat. Dayika min bi zabitê siwara ra goti bû : Bro li gund nîne. Ez û gundiyan me fehm nekir, ev dengê tifinga ci bû.»

Min ji kurê xwe re got : «Zû bizivire gund, ji siwaran re bêjin : bavê min çûye Qızıl Dizé». Ez di riya Qotisê têm, tifing û fişengan bîne kenarê çem.»

Ew çû. Ez rabûm der ketim derva, pêşıya mizgeftê, rû bi qîblê sekinim, gotim : Xwedêyo, tu dizanî min tu xerabî bi dewletê re ne kiriye. Ez di nav şarê Bayzîdê me, ewanan çûne li gund li min digerin. Ev jî lutfa te ye, tu tifinga min bi destê min bighîne, idî herçî irada te ye, li ser çavê min. Ez di pêşıya dukana da derbaz bûm, ji şar derketim, ji ser Qotisê min xwe gihand kenarê çem. Pezêt min li wê derê bû. Min ji şivanê xwe pirsî ci qewimiye ? Go : «Eske hate gund, te peyda ne kirin ; çend siwar ketin pey hespê te. Li Cebê Kunbetê de çend qaçaxên Keskoyî hebûn, li esker dabûn, neferek birîndar kiri bûn.»

Min ewî şand gund. Wî tifingan anî, go «Siwar çûne, birîndar li mala te hiştine.»

Cûne gund. Birîndar tevî du Kurdan şand şarê Bayzîdê. Axirê zivistanê bû. Agrî hêjî kirase spî ji serê xwe der nexisti bû. Tê gotin ku kiraseñ jin û zaren Kurda li çolan, singê spîye wan li ber nokê rimêñ eskeren Romê qol qol bûye, laşen nazdarê wan wehş û teyran dirandine. Agrî xwe pêça bû li nîvanê ewran li mişa kuştargeya xwîndara derva mîze dikir, hêstiran dirêt li ser axê. Dengê nalenalê ji nav ewran ku ji lêdana bayê bi kenarê zinarê bilind û bi devê şikeftên kûr û tırsnak ji gewriya boxaz girtî ve derdiket, li gerranê çep gerde gerdim cinêvi dida, nifrîn doşand. Wan roja bi bîr anî ku ji xeşm û xezb ji devê xwe agir diperand, ciyan û deştan dilerzand.

*Agir dirijand ser seran  
Ronahî direşand her dera  
Erdê dihejand car caran  
Hilbe Agrî, hilbe Agrî !*

Ji siwarêñ ku pey hespê Bro keti bûn nişkeve dengê çend tifingan hat. Nêziki gundê Cebe Kunbetî guleyên çend red û bedel bûn. Li vî gûndî çend nefer ji Xêlê Keskoyî frari hebûn, pêşıya eskera girtin, yek ji wan kuştin, eskerek ji birîndar kirin. Adetê Kurda ye, velamê hembera bê cewab nahêlin. Ev ewelin qurban bû di vê hilperîna xûnîna devayî destdirêjan hate pêskêş

kirin. Tirkâ qabil ne bûn ku li nav şikeftên kûr û tarî û li pişta zinarênil bilindên tirsnak ci bebr û piling û şera cî girtî û li xew dane, razane, şiyar kirina wan çiqas bi tirs e !

Agrî disa xortiya birkirî ji xwe re bi ser girti bû, mîna hespêñ esîl û baneşatêñ Ereb ku li dengê defê dikevin pêkol û leyizkê ; bi gûmana wan şer çê bûye, diçin gezva, ev çiyayê kal û temendirêj û bi deng li nav çend rojan da davêne kîrasê spiyê xwe, hemêza dayikî a xwe ji bona meyvandariya roleyêñ (zaroyêñ) şerkerêñ pir şehametaneyêñ xwe cî hazir dikir. Ëdî pê hisiya bû ku tolêñ jin û zar, kal û xortê şehîdane té girtin, şad bû. Her wekî xencerek li ser singê neyaz çiqandî rast, ravesta bû. Ji stêranî niştimanî Agrî ra, ku xortêñ kurd bi hevra dixwendin, guh dida, ji gurûr û meznatiya xwe re çend beraber didit.

Gundêñ bin piyê Agrî vala kirin, rûniştevanêñ wan gunda hêdî hêdî bi pişt girêñ Agri hilkişan. Qomandanê tirk, bi gûnana xwe, bi dek û dolab dikare Bro Heskî bixapîne, ji pişta qoça derxe. Mirovek şand cem Bro, xwast li nav gundê Helac hevdu bibînin.

Bro li babeti ev çapvêketinî digot : « Ez xwe bi xwe gotim, eva Tirkâ dersa şeytan xwendîye. Reng e bi min giliyin bikin, ixfal kim, bawer kim, xwe bi destê wan bidim, bona vî bi dilmancêñ ! qomandar her ci go tu eynen bi min venegerîne, tiştêñ din bêje. Ez cûm ; qomandar zaf qise dikir, dilmancêñ bo min kurt dikir, çend gilî dikir, qomandar dipirsî : « Axa, digo ci ? » Min digotim hiç tênegihiştim ! Rastî jî wisa bû.

Çaxê dît hîç tênegihiêm, go : « Em û hun hemû misilman in. Tu mirovê xwe kêşaye çiya, dişinî dizî dikan, malê misilmanan tînin. Eva gunahekî mezîn e. Werin itaetê Dewletê bikin, li nav gundê xwe, ligel jin û zaroyêñ xwe asûde bijin ! » Dilmancêna evî bi min got ; mi bi velame gotim : bo qomandara bêje, evî têgihîştim ! Ez muti'î Dewlet bûm. Min her fermanê Dewletê icra dikir. Li mala xwe bi asûdegî dijim, dikandarî dikirim. Hun xwastin min ji mal û mindalê min dûr xin, çîma ? Ev bêedaletiya Dewletê ye ; bona ji zilm û azara wê xelas bin, me xaniyê xwe, gundê xwe bi cî hişt, bi van çiyan penah birin.

Dewleta we nehişt asûde bimînim, meşxûlê kesb û karê xwe bibim. Bona têrkirina zikê jin û zaran, naçar im mirina xwe bi çav bigirim, belk, pezek bi dest xim, zikê birçiya têr kim ! Lêbelê hun karbidestêñ dewlet li pişta masê, li ser kursî rûdinin, bereketa céba iniletê û kasén dewletê vala dikan. Insafen bêje, kijanî ji me diziya mezîn dikan, gunahê kijanî ji me zaftir e ! »

Qomandar mêze kir Bro Heskî nayê xapandin. Eskerê xwe anî li pêsiya Agrî çadir daçikand. Hevalsengerêñ Bro zor kêm bûn, li çavnêriya lepandina esker bûn. Belam nizani bûn, neyar şevê çadirêñ xwe bi ronahî hiştîye, çıragara netemiriye, ji tariya şevê kelk girtiye, ji ordûgahê derketiye, çûne dewranî giran, piştê li penagahêñ Bro girtiye. Hewa teze piçek ronahî bû ku dengê top û tifing û metralyoz bilind bû, gule li serê Kurdan barin. Bro metîrsi, talû-

ka mezina ku qewimiye fehm kir. Hêzên Bro, du bra, du brazî, sê kur, çend kurap, çend mal ji xêli Hesê Sorî, desteyek Mûsa Berkî, peyayêن Mihoyê Bekir û çend pêşmergên Keskoysi bûn. Hemû tifing bi dest, bi hêz çûn pêsiya neyar. Şer giran bû. Dengê top û tifengan çiyan girti bûn. Agri dît ku brayê şerkar û azayê Bro Heskî, Ehmed Axa û brayê Miho Bekir şehîd ketin û Bro Heskî brîndar bû. Lê hêzên neyar beramber roleyên (zaroyên) mîrxas û şerkarên kurd tab neanî, çokê da erdê, top û tifingên xwe bi destê Kurda hişt, revî. Agri dîsa dît ku kurên nebezê kurd neyaran dîl girt, paşê bexşî, ta Tirk bêjin roleyên Agrî mîr in, neyara dîl digrin, lê diborin, serbest dihêlin.

Pasevanê<sup>12</sup> Agrî cara ewel daxa çavê bi Tirkâ didan. Topan ku ji destê neyar girti bûn, nizani bûn çawa bixebeitinin, şarezayê wan nebûn, topê bi cî hiştin. Ewî, wekî para mezin ji bo çiyayê Agrî hesibandin. Fermandarê tirk ji bo ev areqeyê şermê, ev şikesta mezin hindik sar bike, bi alîkariya rûniştevanê rojavayê Agrî, ku li bin fermana wan bûn, bi şevê ciyê veşartina topê peyda kir, çend ker û çend reşemal û topê, ku bi xaye bû, bir. Mîrén Bro dereng bi ev reşediziya wan xeberdar bûn, pey ketin lê kelk negirtin. Şerê germ di nav wan da neqewimî.

\* \*  
\*

Çekdarêن Bro sala 1926 li ser sînga Agrî bi asûdeyî derbas kîrin. Her vê çaxê da bû ku Temirê ŞEMKÎ, serekê xêlê Şenikan ku li navçeya Tozheyê rûdinê, mîrekî çê, Kurdekî têgihiştî, kesê ku ji canê xwe dibore li penavê aza-diya netewayeti, mîrxasî, curet û şehametê wî li nav hevalan deng dabû, li gel brayê xwe Şarko hatin Agrî.

Ser û bendê biharê bû. Agrî her wekû dayika dilşewitî, ji zaryêن xwe re bo parastinê, rûyê singê pirgermê xwe diçespand, kincê kesk li xwe kîrî, roleyên mîrxasên xwe li ser singê xwe hemêz kiri bû.

Şêx Evdilqadir ku yekik ji serekî beşkê kozê Sakan li nav çiyayê Agrî bû. Sala dûrxistina serokên kurd, dewlet ewî jî li gel xîzanê wî bo navçeya Izmir sirgün kiri bû, li gel braziyê xwe Salih ew ji ciyê sirgünê helatin, xwe gi-handin Agrî, beşê kozê Sakan ku li Agrî bendî bûn, teví wî bûn.

Hewa germ bû, çiya dikari bû mîvan qebûl ke, êdî pêwîst bû Bro pelamar bike. Rojek beyanî (sibehê) rûniştevanê Bayzîd ji dengên tifinga Agrîya can bîhurin, ji xewa şerîn şiyar bûn. Bi gotina Romê qaçaxa rîkêli ser Bayzîd kiri bûn. Ta êvar şer kîrin, lê neqedandin şar rabigirin, zivirin Agrî. Rabîe Xanîm, jîna piçûka Bro, li Bayzîdê mabû. Bro bi sivikî ligel çend şerkeran çû ket nav şarê Bayzîd, jîna xwe girt anî Agrî.

Ev serhilanîna Dewleta Romê hişyar kir, bi tîrsî Agriyan ra rageyand, bir-yar da çawa bibe ev agira bitemêre. Destpêka payîza 1927 bû ; tumenek Rûmî

12 - pasevan : parezgar, muhafiz ; pelamar : éris ; pênav : régah, rî ; kelk girtin : istifade kîrin ; nuwîner : noner temsîlkar ; welam : peyman, mesaj.

xwast ku yekser here Agrî, hêzên Kurdan belav ke. Rûniştevanê bakûri Agrî di itaeta dewlet bûn. Eskerên Romê ji wî ali hat, qûçen bilindên Agrî girtin, li neqaba Agrî - nav Agriya mezin û piçûk - çadir çekandin, dest bi şer kirin. Pêşmergên Agrî jin û zarêن xwe piştî sînor bi navçeyê Tambat, nav xêlê Sakanê Iran şandin, pişta xwe bi sînorê bêlayê (bêterefê) Iran, berê xwe bi neyar dan..

Pêş hatina neyaran, girtin desteyek pêşmerge ji şarezayêن xwe bi çiya kelk girtin, xwe bi pişta neyar gihadin, dest bi şer kirin. Hinekî Kurdêن Sakanê Iran ji bo alikariya brayêن xwe hatin. Romî bi aliyê nîviro xwe para kişandin. Pey vê, hin hêzên peyayêن Romê ku li etrafê neqeba Agrî şer dikirin, hatin revanan bona telafiya paşkêsiya hêzên nîvroyê xwe. Pelamarê giran kirin, dixwestin xwe bi hêzê nîvroyê xwe bigihînin. Hêzên rojava ên Romê ji bi wan ra komek dikirin. Şer zehf giran û bêaman bû. Canbêzarêن Agrî bi mérxaşî şer dikirin. Carek hewa qelibî, baranek zor şedîd dest pê kir barî. Ewrêن reşen stûr rûyê Agrî girtin, ev kuştargeha ji çavdîtin veşart.

Agrî bi hawara lawêن qaremanêن xwe hatibû. Şergerên kurd ev derefşa ji dest nedan, niştevan mîna şêr û pilinga lav kuştê pelamar kirin. Çaxê mij bilind bû, Agrî hate dîtin, hêzên rûmî yêن şkestî perakende bû bûn. Kurda çek ü tifing û eskerên rûmî digirtin, belam hewlê wan nebû dil bigirin. Nav dîlan çend zabit hebûn ku pey 24 saet berdan, şandin Bayzîdê, azad kirin. Ji ber ku nanê wan nebû ku zikê dîlan têr kin. Di vî şerî de gelek tifing û fîşek ketin destêن Kurda. Nîşana vê zaferê li nav şerkarêن Agrî diyar bû. Tê gotin ku dengbêjê xeybî xîtab bi Agrî digot :

*Newalén te tejî xûn bû  
Xelxele tejî cendek bû  
Rast e berî agir tu bûy  
Îro agir lawêd te bûn.*

Hêj dar desteyê têkşkanî Romî Agriyê bi cî nehiştî bûn serokatiya Romî agadar bû ku Ihsan Nûrî ji li nav Kurdê Agrî ye.

Ihsan Nûrî bi bîst siwarêن Heyderî û kurxaltê wî Şêfdîn Beg, kurê reisê berî Fethullah Beg merhûm û çend mérêن Hesenî, bona dîtin û zanîna wezê eftkarê Kurda sînorê Tirkîyê bihûrî, bi navçeyêن Heyderan û Hesena cû bû, li nêzikî Xenis bihîst ku Romî ordî şandiye ser çiyayê Agrî, zivirî, xwe gihad Agrî.

## IHSAN NÛRÎ KÎ BÛ ?

Ihsan Nûrî ji Kurdên Bedlisê, ji kozê Cibran bû. Yek ji zabîten kurdê regezi Turkiye bû. Çar sal berê li şarê Bayzîdê qomandarê hêzên sînorê Turkiye-Iran bû. Navçeya Agrî baş nas dikir. Noke li nav rêzê parastina mafê netewayê kurd û dawaya hildana hakimiyeta Romê ji temamê Kurdistan bû.

Ihsan Nûrî li sala 1919 li nav nuwînerên zabîten garnîzona Stenbol bû, bona yaride daye Mustafa Kemal Paşa, bi paldanî ev civat bi yek alay hêz ber

ziddî dewleta Ferid Paşa, ku neyarê Hêzên Millî bû, isyan kir, suqtê dewleta Ferid Paşa ra zudtir kir. Ji nafermanê û hêzê çekdarê xwe dest kêşa. Karên mi-himî din ku li ordu kirî û konferansên şerê ku li navendênu tûmen, li nav şarênen (bajarêñ) Igdir û Sérte da bû, di nava ordiyê da deng dabû. Paş çêbûna Komara Turkiyê, dît wadênu azadî ku li Kurdan dabûn rast derneketin. Tev Komîteya Serbixoyî Kurdistan ku li nav şarê Erzurûm, li bin seroktiya Xalid Begê Cibranî, qomandarê tumenê eşair dizi va çê bû bû. Li sala 1924, li gundê Beytuşşebab nêziki sînorê Irak, li gel çar zabitên kurdnejad Ramî Rasim, Tewfik Xorşîd, Ali Riza Beg bo serbexoyî Kurdistan qiyam kirin, belam şikest xwarin. Ali Riza Beg ket destê Romê.

Min postekê esker ji xorêtê nebezê kurda da çekirin, ala Kurdistanê serbixoyî ra li qoçen Agrî daçıqand. Hêzê şkestxurî Romî ku li etrafa bajêrê Bayzîd bûn, ji ber ala azadî kurd dicûn, dûr diketin. Pasevanê qaremanên Agrî ev ala ji dûr ve hurra dikışan, çepleyan didan. Li vê çaxê, li Agrî teşkîlateke eskerî, idareyeke Kurdî hebû. Ala Kurda bi pêl lê dida ; bi ev çesnebezê nîvroyê Agrî kete bin deselatê idareya Kurdistana Aza. Şerkeranên Agrî ji vê zafera mezin şadûman bûn, bi dengê gurr û bilind ku ciyayan dihejand marşa nete-weyîya xwe dixwendin, digotin :

*Serq û xerb bask vegirtiye  
Ser singê xwe lav girtiye  
Kurda re tu kabe bûyî  
Hilbe Agrî, hilbe Agrî !*

Gundêni vî aliyê ciya bi destê tekoşeranên kurd dîsa ava bûn.

Çaxê ev şer li Agrî da bû, li ciyê dûr da Kongreke mezina netewayeti kurd li hev civiya bû, komîteyek bi navê Xoybûn - İstîqlal - teşkil kiri bû. Ihsan Nûrî komsûre fevqeladeyê eskerî helbijartin, idara şer sparti ne wî.

Qaremanên kurd dan ser riya Agriyê. Ferzende Beg ku ji eşira Hesenî bû û di dema şerê Şêx Seidê Mezin da bajêrê Melazgirtê ji destê Romê derxistibû, ligel brayê xwe Kazim Beg, kurapê wî û çend mîrên Hesenî xwe gihan-din bi Agrî. Xalis Beg, kurê Abdulmecid Begê Sipkî, Taceddin Beg, ji serokîn xêlê Zerkî, Edoyê Eziziyê Heyderî, reisek canbêzaran, Ehmedê Haci Bro ligel çend brayên xwe, Seyid Abdulwehab Efendî û kurapê wî Seyid Resûlê Berzencî ku ji ciyê durxistina xwe, Izmir, helati bûn, yek li dû yekî hatin Agrî.

*(Dumahîk heye)*

# ZIMAN

## ÇEND ALIYÊN REWŞA ZIMANÊ KURDÎ

Ferhad ŞAKELİ \*

Mebesta min ji vê nivîsinê û vekolinê ew e ku basê hinde rastî û meselên zimanê kurdî bikim û ez bawer im her Kurdek xwe piçek bi zimanê kurdî ve mijûl kiribit yê pê agahdar e. Lê, bêgûman, kêm kes hene xwe bi vê çendê ve mandî kiribit û têgehiştibin ... çunku ev ne karekê hasan e û ji her kesekî nahêt.

Li destpêkê bila em vê pirsiyarê ji xwe bikin : erê em, Kurd, ku bi hezaran sal in li nav van çiya û newal û dola da dijîn û her çar layên me milet û xelk û sinûrên cuda cuda ne, me zimanê xwe yê taybetî heye ku ji zimanê wî xelkê dewr û berê me cuda bit ? Yan kurt û kirmancî bipirsin : Kurdan zimanê xwe heye, ango kurdî ziman e yan ne ?

Wisa xuya dibit ku tişte van herdû pirsiyara ji hev cuda diket her darriştina pirsiyarê ye, lê rastî ew e ku pirsiyara yekem çend rastî û meselên hey girêdayine bi layê civakiyê jiyana kurdewarîyê ve ku eger mirov bi pişt guhê xwe ve bavêt ne tiştekî dirust e û mirov ji riya vekolîna zanistî der dikevit. Herçende pirsiyara duhem weha ye ku eger mirov gehiştibe encamekî dikare tenê bi «a» ya «ne» bersîv bi dit.

Ez dê réka pirsiyara dûyê bigirim û dê bêjim belê zimanê kurdî heye. Helbijardina réka pirsiyara yekem herçende karekê pêwîst û xweş e, lê min réka dûyê girt ji ber ev çend hîoyêñ girîng .

1 - Ez bawer im zimanê kurdî heye û tenê hinde neyar û mejî-hışkên miletên serdest in ku xwe ji vê rastiyê dûr dixin û ne bes dibêjin kurdî ne ziman e, belkû dibêjin Kurd bi xwe ne milet in.

2 - Ev babete pirtir babetê wan vekolîna ye yên ku bi zimanên biyanî têñ nivîsin ne ku bi zimanê kurdî.

3 - Behra pirtir ji wan kesêñ xwe bi kurdolojîyê ve mijûl û xerîk kirî ne, çi Kurd û çi biyanî, ewçend liser vê meselê nivisîne, ez li wê bawerê me ku dûbare kirina vê çendê ne tiştek pêwîst e û çi tişteke nû lê zêde naket.

\* Ferhad ŞAKELÎ nivîskar û helbestvanek Kurdistanâ Iraqê y.e. Piranî bi kurmanciya jérin (sorani) dînîvîse. Vê bendê yekser bi kurmanciya bakûr nivîsiyc.

## ZIMAN YAN ÇIYA ?

Li bîra min da ye gava min li Zanistgeya Bexda - besê zimanê kurdî - dixwend, mamostayê dîroke hercar digot : «Çiya miletê kurd parastiye. Bi Xwedê eger ev çiya nebana, nuha zûda dehbe û dirrinda em xwaribayin». Ne dûr e ev mamostayê ha, li encamê xwendin û vekolînên dîroka kurd gehîşti-bite vê rastiyê û vê behayê mezin bidete çiyayên Kurdistanê û bikete faktora parastina gelê kurd ... Lê, bêgûman, Kurd ne tenê li çiya dijin û axa Kurdistanê jî ne hemû çiya ye ... Eve bi hizaran sal in Kurd li deşte jî dijin û ne bes xwe ji hirç û hova parastine, belkû hemû hêrişen Kemalistên faşist ji bo turkandin (Turk kirina) Kurda û helkêşana rih û rişalên zimanê kurdî û nehêştina hemû şop û diyardeyên neteweyî (1) û hemî hewl û pêkolen faşistên Iraqî ji bo Arabandin (Areb kirina) gelê kurd serê hemîyan şorr kir û miletê kurd, wekû Mam Hêmînê şâ'ir dibêje, gerimtir bû di xebata xwe da jibo mafê xweyê rast û rewa û berhingarê celladê xwe bû û neheliya û ne jî dihele.

Zimanê kurdî - bi baweriya min - mezintirin û giringtirin peywendiye ku neteweya kurd pêk ve girêdaye û digel peywendi û faktorên din neteweya kurd pêk hînaye û rolekê mezin û giran hebûye ji bo parastina miletê kurd û cuda kirina wî ji miletên dewr û berê wî. (2)

Herçende zimanê kurdî ev rolê giran hebûye û heye, lê eger mirov hûr te-maşa bike dê bibinit vekolînên zimanê kurdî negehiştiye loka giringî û hêjayî ya zimanê kurdî. Xuya ye ev jî girêdayê ew rewşê sext û nexweş e ku gelê kurd têda dijî. Lê her çawa bit nabe eve çende bikin pasawden (justification) ku destên xwe dahelîn û bi karekê gelek zehmet bizanin, bi taybetî ew Kur-dên li derveyê welatî dijin ku deliveya pitir ji hemî layan ve bo helkeftî.

## ZIMANÊ EDEBÎYÊ YEKGIRTÎ

Jibo ku neteweyek bikarit kultura xwe ya taybetî pêşve bibe û pişkdarîyê di jîna vê serdemê mirovayetîyê da biket ... yan eger nekarit jî her agehîdarê vê peşkeftinê bit, ne bes e zimanek hebit pê bipeyve, belkû gerek e zimanê edebîyê yekgirtî jî hebe.

Bawer nakim zimanvanêt hiç wletekî û gelekî li vê cihanê (dinyayê) wekî zimanvanêt kurd hest bi vê meselê bikin û wekû miletê kurd ji vê nexweşîye binalin.

Me zimanekê heye - zimanê kurdî -, lê zimanekê me yê edebiyê yekgirtî, zimanekê me yê standard tune, eve jî maka gelek asteng û giriftarî û problema ye û gerek e bi vekolin û tûjandinê çareyeke bo vê meselê bibînin. Peyda kirina zimanekê wusa karekê gelek girîng û mezin e û dikeve ser milê roşenbîr û xwendevanan û pêwîst e amanca me hemîya be û her nivîskarekî kurd bîr li vê çendê bikit.

Tênegehîstin û piştguhxistina vê çendê - bo her mebestek - be ziyaneka gelek mezin digehîne me û ji şêlikirina rastiyê pê ve ci tişteke din pêşkêş

naket.

Ji bo ku em bikarin zimanekê yekgirtî peyda bikin û çê bikin, gerek e em bi giyanek zanistî û dilsojî ve bixebeitin û hizr û bîrên teng û dever-peris-tiyê ji serê xwe bavêjin û derbixin û divê em weha bîr nekin ku gava em bi diyaléktekê (zaravayekê) dinivîsin êdî her bîst milyon Kurd dê bi dû me kevin û bidin şopa me û bi axaftina me bikin. Ev cor bîrkirin û hizirkirin ne tenê tu tiştek pêşkêşî me nakit, belkû dê rastiyê jî gelek cara li me şêlî bike.

Bo nimûne eger mirovek hat û hinde zanyarî li ser diyalékteka kurdî hebû - her ew diyalékta ew dizane - belav kirin û kirine yasayeke giştî bo fonî-mên zimanê kurdî yan gramatîka zimanê kurdî û ew rastî bi pişt guhê xwe ve avêt ku zimanek me yê edebî nîne, bégûman eve ne karekê rast e û eger li ciye vê çendê destnivîseke kevin sax bike (vejîne) yan du tişta wergerîne ser zimanê kurdî gelek baştir dibe.

Zimanê edebîyê yekgirtîyê kurdî, wekû mamosta Jemal NEBEZ dibêje, ew ziman e «yê ku Kurdên hemû parçeyên Kurdistanê û cihanê, bêy ku guh bidit cudahîya wî digel diyalékta wî, té bigehit û pê bixwênit û binivisit» (3).

Çê dibe dirust bûna zimanekê weha wexteke geleke dirêj pê bivêt, lê her çawa bit me ev rêge bi tenê heye ... Tu ji kîjan çinê bî, yan çawa bîr dikî ne giring e, ziman zimanê hemû milet e... herçende her çînekê rengeke taybetiyê xwe heye û jibo derbirîna hestê xwe û parastina berjewendiya xwe bi kar tîne. (4)

Zimanê kurdî jî zimanê hemû Kurda ye, cotkar, kirêkar, axa, şêx, mela, derebeg û xwendewar û nexwendewar û her yek ji wan bo derbirîna hestê xwe û parastina berjewendiya xwe bi rengeke taybetî bi kar tîne.

Bégûman jibo cébecé kirina her amanceka pîroz û mezin xebateka mezin pê divêt û, bo ku dirustkirina zimanek standard bo miletê kurd hêvîyeka gelek mezin û pîroz e û peywendîdar e digel pêşkeftin û paşeroja miletê me û roleke giran û mezin di pêkhênan û geşkirina bîra netewayetî ya pêşverû dibîne, her wekî çawan hizr û bîren netewayetîyê jî roleke mezin dibînin jibo yekgirtin û pêşve birina zimanî.

## ZIMAN Û DESTELATA NAWENDÎ

Gelek di cihê xwe da ye li vêrê em vê pîrsiyarê ji xwe bikin : baş e eger dirûstbûna zimanê edebîyê yekgirtî hinde pêwîst û pêdivê bit û amanceka hinde pîroz û mezin bit û roleke hinde mezin bigêre, boçî heta niha (êsta) ev zimanê çê nebûye û boçî gavêt fireh nehatine avêtin jibo vê amancê ...? Jibo ku em bersiveka rast û zanistî bidin, gerek e em vegerine dîroka miletê kurd û zimanê kurdî ... Li vêrê ev tişt dihête ber çavê me ku gelê kurd destelateka nawendî nîne, destelateka weha ku li çarçeveyeke politîkî û aborî û civakî da bi xwe bi rê ve bibet.

Di dîroka gelê kurd da gelek cara çê bûye ku Kurd bûne xudan mîrge û qeware û dewletên biçûk û digel van qewara zimanê kurdî jî geş bûye û pêş ketiye û ji sinûrên diyalékt û nawçeyî yêng teng derketiye û hinde cara jî, ji

çarçevê vê qewarê jî derkeftî û ber bi sêntralîze kîrinê çûye. Berûvajî demê rewş û kawdanêd reş û tarî bi ser miletê kurd da dihatin û agirê raperin û bizava rizgarîxwazîyê kiz dibû ya vedimrî, herişa dujmin û neyara ne bes ax û mirovê kurd digirt, belkû ziman û kultûra kurdî jî digirt û ziyaneka mezin lê dixist.

Eger em vê hoyê bi mezintirîn faktor bizanîn ku zimanê kurdî yê edebî dirust nebûye, çend hoyen din jî hene ku rolê xwe hebûne û bi baweriya min em dikarin bi vî carî bidin xuya kirin :

1 - Parçe parça bûna Kurdistanê di nav çar-pênc welatên ji hev cuda peydabûna sinûrén destkird û çekirî di nav Kurdistanê da bû hoyâ hindê ku Kurd jî yek dûr bibin û peywendîyên wan digel hev bêne qetandin, bêne birîn ... eve jî li encamê kareke xirab gehande zimanê kurdî.

2 - Rola negatîv û wêrankarane û xerabkerê kultûra gelên ereb û tirk û fars ... çunkû ev miletan xudan destelat bûn û li hemû serdem û gavekê da pêkola kirine ku kultûra xwe bi zor bi ser Kurda da bînin.

3 - Rola negatîv û xerabkerê İslâmê ... ku wekû ayinekî mora netewayet jî pêve heye.

4 - Nebûna jîneke kultûrî ya damezrayî û rîk pek (tekûz) û berdewam li Kurdistanê.

5 - Nebûna dezge û nawendên kultûrî ku bikarin li ser pêşkeftin û paşeroja zimanê kurdî bîryarên weha bidin ku bêne pejîrandin û di praktikê da cê bi cê bibin.

6 - Nebûna pilaneka yekgirtî, hewldan û bizav û pêkola serbixwe û cuda cuda ya zimanvan û roşenbîrên kurd.

7 - Nivîsîna zimanê kurdî bi sê rengên alfabetîn cuda cuda : erebî, latînî, û sîrilîk û her yek ji van elfabêya jî bi çend rînivîs ên ciyawaz têne nivîsin, bi taybetî erebî û latinî.

8 - Giyanê deverperestî û nezanistîyê gelek zimanvan û ronakbîrên kurd.

9 - Sistî û bêxemîya gelek zimanvan û ronakbîrên kurd û nebûna pilan û nexşeyeke pêk û tekûz û zanistî.

Min li vêrê hindek ji wan hoyan xist berçav û bêgûman gelek hoy û egerên din jî hene ku herkes li gora hîzr û bîrên xwe dikare nîşan bidit û bide xuya kirin. Lî ev hoy û egera hemû tişteke zor bê beha ye bi pêş wê ve ku Kurda destelateka nawendî (merkezî), û taybetî nîne. Maka hemû êş û

giriftarî û paşkeftina zimanê me ew e ku me li wê axa me serê xwe lê hilandî mafê çarenûsa xwe nîne û eve ne bes problêmeke politîk e, belkû ya civakî û aborî û kultûrî ye jî.

## NEXŞEYEK SEYR

Li Kurdistana iro eger em bixwazin nexşeyê rewşa ziman û jîna kultûrî ya xwe bikêşin, dê bibînin nexşeyeke seyr û entîke dihêt ber çavê me :

1 - Nebûna zimanê edebîyê yekgirtî ... zimanekî weha ku «Kurdên hemû parçeyên Kurdistanê û cihanê bê guhdana ciyawaziya diyalêkta wan, tê bigehin û pê bixwînin û pê binîvisin.

2 - Jibo dirûstkirina zimaneye wisa, heta niha jî ne pilanek û ne bîrkirineka zanistî û ne bizaveka rêk û pek tune.

3 - Çar diyalêktê ji yek cuda ku her yek ji wan li deverike bi kar dihêt kurmanciya bakûr (jûrî), kurmanciya başûr (jêrî), Lurrî, Goranî, Zazayî. Heryek ji van diyalêkta jî, ji çend beş û tayê din pêk hatiye.

4 - Zimanê kurdî bi sê rengên alfabetâya dihête nivîsin : erebî, latînî û sîrîlîk.

5 - Di nivîsin û xwendin û weşanan da du diyalêktê serekî bi kar tê : Kurmanciya bakûr (jûrî) û Kurmanciya başûr (jêrî) û li navbera van herdû diyalêkta jî sinûreke hind estûre heye ku bi zehmet karekî li hevdu bikin.

6 - Pile û loka nexwendewarîyê li Kurdistanê pirr bilind e, herçende di vê warê da hemû parçeyên Kurdistanê ne wekû hev in û ne hasan e mirov bikare statîstîkeka rêk û rewan bi kar bîne, lê mirov li vir dikare zanyarîyen Dr. Ebdulrehman Qasimlû belav kirî li ser Kurdistanâ Iranê bi kar bîne. (Ev jîmara rewa rewşa Kurdistanâ Iranê dipeyvin, sala 1975 û jibo wan kesen ji deh saliyê mezintir in) (5).

Li hemû Kurdistanâ Iranê 70% xelk nexwendewar e û 80% jin nexwendewar in.

Li bajêrên Kurdistanâ Iranê 40% xelk nexwendewar e û 60% jin nexwendewar in.

Li gundê Kurdistanâ Iranê 85% xelk nexwendewar e û 95% jin nexwendewar in.

Em nikarin vê bikeyne nimûne bo hemû Kurdistanê ..., çunkû li Kurdistanâ Tirkîyê ku ji hemû parçeyên Kurdistanê mezintir e rewşa nexwendewarî-

yê gelek xerabtir e, lê Kurdistana Iraqê ji Kurdistana Iranê jî baştir e. Lê her çawa bit em vê zanînê bikine binaxe û şengistê rewşa xwendewarî û nexwendewariyê em digehîne encameke gelek bitirs, çunkû gerek e bizarin ew 30 % ê xelkê Kurdistanê ku xwendewar in jî ... ne bi zimanê kurdî dixwînin, belkû bi zimanên dî ... Li Iraqê û Sûryê bi erebî, li Iranê bi farisî, li Tirkîye bi tirkî û li Sovyet bi rûsî û çend zimanên din jî. Gelo ji vana, çend dizanin bi zimanê xwe yê kurdî bixwînin û binivîsin ? Bersiva pirsiyareke weha dê rastîya alozî û nexweşîya kultûr û zimanê kurdî nîşana me bidit.

## SERINCA DUWAYÎ

Bi rastî ... herçend di vê vekolînê da, çend layên ciyawaz ji rewşa zimanê kurdî hatin nîşandan, lê em dikarin bêjin eve bi tenê skêcek e, ne ku bas û vekolineka giştî û tevayî. Ji bili vê çendê jî wekû min di destpêkê da got, mebesta min ew e hinde rastî û meselên ziman û kultûra kurdî nîşan bidim û xuyakirina vê bibite hoy eger ku em çareyek bibînin.

Her weha, di vê nîvîsinê da ez neçûm bi layên hûr û kûrênu mirov tenê li ser rûpelên kovarênu ku bi rêk û pêkî û berdewam derdikevin, dikare gotûbêj li ser bike, ne ku belavok û çapkirawên Ewropa yênu ku salê (yan werzekî) carekê derdikevin, û ji layekê din jî ve baskirina wan nikare giftûgoyeka zanistî û rêk û pêk peyda bike ... çunkû, mixabin, li vê dûrwelatîyê ... kêm kes hene yênu ku xwe bi van tişta ve mijûl û mandî bikin.

Ez dixwazim li vê delîvê da bêjim ku bi rastî cihê daxê ye ku xwendewar û ronakbîrênu kurd li Ewrûpa (ya li derveyî welêt, bi giştî) bir li ziman û kultûra xwe nakin. Mirov dibîne gelek kes dû zimanên ewrûpayî fêr dibin (hîn dibin) ... lê bizavê nakin diyalêkteska din ya zimanê kurdî fêr bibin, yan ewênu kurdî bi alfabetêa erebî dinivîsin xwe fêr kin alfabetêa latînî û ewênu kurdî bi tîpênu latînî dixwînin û dinivîsin, xwe hîn bikin kurdî bi tîpênu erebî jî bixwînin û binivîsin.

---

1 - ARFA, Hassan : *The Kurds*, Oxford University Press, 1966, p.45.

2 - QASIMLU, Dr. Ebdulrehman : *Kurdistan û Kurd (çapa kurdî)*, 1973, Bexda, r.300-305

3 - NEBEZ, Jemal : *Zimanî yekgirtuy kurdî*, 1976, r.5.

4 - STALIN, J.V : *Marxism and problems of linguistics*, Foreign Languages press, Peking 1972, pp. 10-12.

5 - CHALIAND, Gérard (ed.) : *People Without a Country, The Kurds and Kurdistan*, Zed Press, 1980, p. 112.

# LI SER BATÊYÎ ÇEND GOTIN

R. BARNAS

*Meclisa bê saz û heyhey min nevêt naçimeyê  
Bê def û bê çeng û bê ney min nevêt naçimeyê  
Bezmeya bê yarê Batêy min nevêt naçimeyê  
Bê feraxet yarê Battî işwekara min neha:.*

*Batêyî \**

Xanî-Mem û Zîn, Cezerî-Dîwan, Herîrî-Helbesta nîvisandî ya pêşin di edebiyata kurdî de çawa muteradifê hevûdu bin : Batêyî an Mele Ahmedê Batî û Mewlûda Kurmancî her wisa bê hevûdu nayên bilêvkirin. Ew mewlûda ku :

*«Hemdê bê hed bo Xwedayê alemin  
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn»*

dest pé dike, ji aliyê her kurmancê sunnî ve di jiyana xwe de bi hindiki gelek caran bi wecd û jixweveçûyînek dînî ve hatiye guhdarikirin. Hin ferd û beyitên wê, ji aliyê xwenda û nexwenda ve jiber têن zanîn.

Bê şik bareya mewlûdê, li ser bûyina pêxemberê dînê îslamê ye. Lê, ev ne çîrokek besit e. Bi munasebeta bûyina Hezretî Muhammed, di çerçewa fel-sefa îslamî de «Tekwîn» an afirandina kainatê jî bi şîriyeteke bilind hatiye dayin.

Di medresen Kurdistanê de piştî xwendina Qur'anê bê îstisna mewlûda Batêyî tê xwendin. Di îslamiya Kurdistanê ya sunnî de feqehêk berî her tiştî divê bi xwendina du tiştan bizanibe : a yekem «Yasin», ya duyem xwendina mewlûdê. Bêşik ev aliyê wê i dînî ye. Lê di aliyê sen'et û edebiyatê de mewlû-

---

\* *Dîwana Kurmancî, Ebdulreqîb Yûsif-Baxa (Bexda) 1971, çapî ewel, çapxaneyî e Necef.*

da Batêyî yek ji hêjatirîn eserên edebiyata kurmanciyê ye. Helbet ji kurmanciye mebesta me, kurmanciya jorê ye.

Hetanî şai'rên Hawarê (Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can), şai'rên edebiyata kurmancî gişt mutasawwif in. Di bareya şai'rê me î pêşîn Eliyê Herîrî de zanîneke me î fereh tune ye. Lê herçî mayî di evîna xwe î mirovî de jî, di kujekî di quncikekî de xwe avêtine dawê Xwedê an yê pêxember. Di daxwaziya «dewlet» Xanî de bi xwe «dewleteke rût» tune, «dîn û dewlet» heye:

*Ger dé hebûya me ittifaqek  
Vêkra bikira me inqiyadek  
Tekmîl dikir me dîn û dewlet  
Tehsîl dikir me ilm û hikmet  
Xani, Mem û Zin*

Batêyî bê fetl û çiv sofî ye. Ew evîndarê pêxemberê islamê Hezretî Muhemmed e. Bi evîna wî, bi evîna şefaeta wî keledoşî dibe :

*Hilo rabe Ebul-Qasim hilo ey qasidê Ekber  
Hilo fexra Benî-Hâsim hilo rabe tu i rehber.*

*Hilo carek ji wê xakê siyarê heft eflakê  
Belê sultanê lewlakê tu i ey saqiyê kewser.*

*Here pêşî Xwedayê me rehîm û rehnumayê me  
Şefaet ke xetayê me li dîwanê bike mehder. \**

Di lêhûrbûna şai'rekî de çend niqte hene :

- 1 - Zman û uslûb
- 2 - Wezin û qafîye
- 3 - Aheng û lîrizma
- 4 - Afirandin û nûyîti
- 5 - Îdeolojî an felsefe.

Di şai'rên kurmanc ên klasîk de, yên zmanê wan herî sivik û xwerû ne Batêyî û Feqehê Teyran in. Teví ku şai're pêşîn e, zmanê Herîrî jî sivik û xwerû ye.

Batêyî mewlûdê bi zmanekî sivik û xwerû nivisandiye ku ev xwerû bûn, bi nîsbeta zmanê dîwanê yê Cezerî û yê Mem û Zîna Ehmedê Xanî çi bigre ji sedî heftê-heştê ye.

Batêyî hem bi zmanê muxlaqê dîwanî û hem jî bi zarê gundiyan dikare biaxife di şî'rên xwe de :

*Ey ne'tê tu ez e'rs heta ferşê şehîra  
Ey pertewa nûra te cihan geşte munîra*

*Ey seyidê a'lem bike perwayê esîra  
Qed kane lek-el-fesl û lek-el-cûd û kesîra  
Ursîlte ilel xelqî besîren we nezîra. \**

Di hemberî vî zmanê muxlaq de, ew dikare wek gundiye kî kurmanc bêje :

*Ji Çirya Paşiyê pê da Melayê Bateyê kanê  
Sefer kêşa be Miksê da li ser qewlê Zivistanê.*

*Zivistanê evê yolê evê berryê evê çolê  
Mijê avête der dolê xunavê girtî Kîstanê*

*Binê daxa me êxsîra xezel zer bûn rezê mîra  
Reyhan barî di avê da reyhan barî di eywanê.*

Bi devoka Botan-Hekarê herwekî meriv gazi hevalekî xwe bike, bêjê «Hilo Hesen ! » an «Hilo Fatê ! » wisa xîtabî pêxember kirin, ji hostayıya zman bikaranînê tê.

Di şî'ra kurmancî de hunermendiya bikaranîna wezna arûzê û dewle-mendiya qafiyê de du hosta hene : Cezerî û Batêyî. Tu şai'rekî me i dinê naghîje aheng û lîrizma van her du hostayan.

*Derd û dax im, bê qerar im, bê bihar im, bê çemen  
Bê hebîb im, bê tebib im, hem xerîb im, bê weten  
Şibhê Ye'qûbî ji eşqa Yûsifê gul-pirehen  
Mûnisê derd û xeman im, sakînê beyt-el-hezen  
Tarûmar im, intizar im ; şehsiwara min nehat.*

*Pertewa şem'a cemalê min disojit dem be dem  
Iştiyaqa zilf û xalan têk kirim deryayê xem  
Dame ber pêça firaqê weslê qet nakit kerem  
Ma medetkarê me bit «îna fetehna» sibh û dem  
Werne sotim ateşî dil şehriyara min nehat.*

*Meclîsa bê saz û heyhey min nevêt naçimeyê  
Bê defû bê çeng û bê ney min nevêt naçimeyê  
Bezmeya bê yarê Batey min nevêt naçimeyê  
Bê feraxet yarê Batî işwekaza min nehat.*

Bê lê artîlinâ zman, gotin, mîna herikîna avê bikaranîna zmên, bi müsîqî rabûn û rûniştina pêlên ahengê û li gora xîtab û mebestê ; kurmanciya xwerû an zmanê dîwanî bi hostayı bikaranîn, lê di dawiyê de newestandina xwenda û guhdar : ev e, şî'ra Melayê Batî an Batêyî.

Bi a min mezinahiya Xanî, ne ji şai'rî û hunermendiya wî ye, lê ji ber aliye wî yê ideolojik e : ew dewleta kurd, rizgariya Kurdistanê dixwaze. Di sedsaleya wî û ya berî wî de, di nav mîrekên Kurdistanê de lipijîn, raperîkîna li hemberî Osmaniyan hene. Li Çiyayê Şengalê misêwa serxwerabûn hene. Evdal Xan Mîrê Bedlisê bi mîrxasî li hember Melek Ahmed Paşayê Osmanî şer dike. Bo çera pezê xwe i li zozanan Mihemed Beg Mîrê Melazirê û hin mîrekên Kurdistanê bi leşker û eşîrên xwe ve di milê paşayê osmanî de şerê Xanê Bedlisê dikirin. Xanî di van heyaman de gihişt.

Gelo di sedsaleyên Herîrî, Cezerî û Batêyî de rewşa civakî û siyasi çawa bûn. Zanîneke me i zelal der vê xisûsê de tûne ye. Gava tarixa me i siyasi bê berhevkinin û bihevxitin, derbareya tarixa me ya edebî de fikra xwe bi awakî rastir gotin hê mimkin dibe.

Şai'r dev û guhê civaka xwe ye : hezkirin, daxwazî, ecibandin û darazên (hukum) civaka xwe ; bi kurtî, bi tundî beyan dike. Ha em dinêrin Eliyê Herîrî herwekî esman biqelişê û jê were, wisa tê û dest bi şî'ra nivîsandî dike

*Dilê mehzûn kefaret bit ke im şeb taze mîhman têt  
Be mizgîni besaret bit ke mîhman canê canan têt.*

*Ke mîhman canê canan e, le ser çehvî me mîhman e  
Be mala cumleî can e, ke şahê cumleî can têt. \**

Belê Herîrî «le ser çehvî me» hat, lê çawa hat ? Hoyêن civak-aborî û yên siyasi ci bûn ku Herîrî dest bi şî'ra nivîsandî ya kurmancî kir ? Ü çima Cezerî got :

*Ger lu-luê mensûrê ji nezmê tu dixwazî  
Wer şî're Melê bîn, te bi Şirazî ci hacet.*

Ev pesindayneke rût bû an ji medresan lieta qesrên mîrekên Kurdan bi rêgeha edebiyata dîwanî di bin gefén «Şiraziyan» de bûn ? Li ber edebiyata farisi kurmancî di xeterê de bû ? An bi mebesta serxwebûna xwe mîrekên Kurda xwestin edebiyata xwe ya serayê biafirînin û vê bi Herîrî û Cezerî dan kirin ? Gelo Mewlûda Batêyî mertalê xwe parastina Kurmancî bû li hember siyera erebî an ayînên erebî yên dîtir ? Belê ev gişt pirs in, hezr in. Heta tarixa siyasi ya Kurdistanê bi awakî zelal neyê bihevxitin, bersîvdana van pirsan jî ewê ji daxwaziyê şexsî wê de neçe.

Em paşıya gotinê dîsa bi Batêyî bînin :

*Dîlberek min dî di xew da, dêm wekî bedla şefeq da  
W'ez kirim dîwan û sewda, ax gelo derman heye ?*

*Dêm wekî bedra hîlal e, şu'le ye b'husn û cemal e  
Nezerek bo min helal e, min diye fetwa heye.*

# ÇIROK

## BINEVŞA NARİN û CEMBELIYÊ HEKKARÊ<sup>1</sup>

Cembeliyê Hekkarê<sup>2</sup> hebû, li çiyayê Hekkêr bû, reisê hezar û pênc sed xortê herdemlawin bû. Pir axaki baş bû ; du jinê wî hebûn bi kêri şixolê malê û mîvana nedihatîn. Aşiq Hemo<sup>3</sup> hebû, ew jî sitranvanê Cembelî bû, hema xortekî spehî bû Aşiq Hemo, kîf ji Cembeli re dikir. Rojekî Aşiq Hemo hat aliyê malê, go : «Xatûn taştê bidim min». Taştê nedan, Aşiq Hemo ji xatûnê xwe gelek bihecî. Hate aliyê odê, ji Cembelî re got : «Axayê min, Xatûnê di min bi kêri şixolê malê nayên, go ezê ji te re herim li jineke çê bigerim». Cembeli ji Aşiq Hemo re got, go : «Çend roja tuê herî bigerî ?» Go : «Mehekê mole tê bidî min, ez vegeryam, ez vedigerim, ez venegeriyam di mehkê de, serê min jê bike.» Cembelî go : «Here, moleya mehkê ji te re». Aşiq Hemo serê sibehê hat aliyê malê, go : «Ka xatûn bidin min taştê». Go : «Tuê herî kî derê serê vê sibehê ?» Go : «Hûn nema bi kêri şixolê malê tê, ezê herim ji axakê xwe re bigerim li jinek çê.» Xatûn gelekê jê bihecî, go : «Kuro, rabe ji vê derê, nehêli ko ez darekî bikşinim ji çîtê, ezê bi saxî bidim te ezabê qebrê.»

Aşiq Hemo radibe, berê xwe da beriya dora Hemis û Hemayê, sê roja û sê şeva geriya, li dora Hemis û Hemayê. Tiştek nedî, tiştek bi ser nekir, tu jinê mîna şibê axê xwe nedî. Ji dora Hemis û Hemayê derbaz bû, berê xwe da dora Ceritên û Tudmir û bajarê Sixnê tu pîrekê minasibê axê xwe li wan dera nedî. Bêhist go : «Bi Xwedê, jinê minasib hene li dora bajarê Rehaê û Dêre Zorê». Berê xwe dayê Reha û Dêre Zorê ji xwe re dibêje : li ser axayê xwe, dibê : «Axayê min Cembeliyê Hekkarê xortekî minasibî, reisê hezar û pênc sed xortê herdemlawin e». Ji xwe re Aşiq Hemo ji Dêre Zorê bi der ket, bi dilkî bi kulî şikestî, berê xwe da ava Xebûr, li nav Erebên dora Xebûrê geriya heyâ

1 - Vê çirokê rohelatnas û kurdîzanê fransiz rehmetiyê Roger Lescot (1914-1975) di sala 1931, 5é tebaxê, li gundê Mitelê ji devê Mişoyê Awan, dengbêjê Berazan nivîsiye. Dest-nivisa wê di Arşîvîn Enstituya Kurdî de ye.

2- Cihna Cebeliyê Hekkérê hatiye nivisin.

3- Geh Hemo geh Emo hatiye nivisin.

derbas bû bajarê Heyseça, tu tişt li wan dera jî biser nekir ; berê xwe da çiyayê Evdil Ezîzê, ji wê de, berê xwe da bajarê Ras el Eynê, li wan dera geriya negeriya, tu jinê minasibê axê xwe Cembeliyê Hekkarê nedî. Ji wê derê berê xwe da deşta Sirûcê, nav êla Bozan Begê û Hirço axa, li wan dera geriya, çavê xwe digerîne li nav ebra, li bin çit û perda, yek minasibê axê xwe nabîne. Ji wê derbas bû, berê xwe da welatê Mêrdinê. Li bajarê Mêrdinê li sük û çarşıya geriya, li rîya pîreka gava derin hemamê, Aşiq Hemo xîyalâ xwe dide bejna wan û meşa wan, kesî naecebîne. Ji wê derê berê xwe da bajarê Diyarbekrê, li deşta Diyarbekrê gund bi gund geriya. Tu pîrekê minasibê axê xwe nedî. Ji Bajarê Diyarbekrê derket, deşta Diyarbekrê xelas kir, kete bajarê Swêrekê, di hindirê bajarê Swêrekê digeriya, sê roja û sê şeva li bajarê Swêrekê ma. Ji bajarê Swêrekê bi derket, berê xwe da çiyayê Qerejdaxê.

Çiyayê Qerejdaxê çiyayeki xweş e timam kanî ne, xelkê wan derdi Kevin kona. Aşiq Hemo rahişt rebaba xwe û kete nav konê Qerejdaxiyan ; şes roja li çiyayê Qerejdaxê nav kona geriya ; tu jinê minasibê axê xwe nedî. Ji çiyayê Qerejdaxê vege riya, berê xwe da destê û bi destê de dimesiya. Hat giha Tora Mihelmiya, jinê minasib di Tora Mihelmiya de hene pir bedew in. Aqilê wî li wê de jî ji kesî nebîrî. Ji wê de, berê xwe da Cizîra Bota. Sê roj û sê şeva ji xwe re di nav Cizîrê de geriya. Ji nav Cizîrê bi derket, hate nav Gergerîya ; ji xwe re li nav Gergeriya geriya, ew jî koçer in. Li konan di nav konê wan de digere, jinek minasibê axê xwe nabîne ; tê li konê Şemera, li nav êla Şemera, pênc roja, Aşiq Hemo ji xwe re digere. Şes mehê Aşiq Hemo qedîyan ; Aşiq Hemo bi dilkî kul digere, dibê : «Wellah mi jinek rind minasibê axê xwe jî min nedî û ez nema wêrim herim mal, wê axê min serê min jê bike. Axê min Cembeli ji min re got mehik, ev şes mehê min qedîyan ez digerim..»

Aşiq Hemo ji nav êlê Şemera derket, ji xwe re digirî û li halê xwe dibêje, gelikî perişan bûye. Carikê nerî di pêsiya wî, wekê leyланikê xuya ye. Cari-kê meşîya nézikayê lê kir, nerî ko qederê sed konikî xuya yin. Geha zilamekî, go : «Silamo elêkom.» Go : «Ehla û merheba». Go : «Birayê delal, ez zilamekî xerîb im ; merivên xerîb kor in, çavê wan girêdayî ne, ez nizanîm bê ev kon konê kê ne. Ez dixwazim ko ez meznê van kona nas bikim, herim bin konê wî, ji xwe re tiştî jê bixwazim.» Ewî zilamî ji Aşiq Hemo re got, go : «Ev kon konê Narîn axa, bavê Binevşê<sup>4</sup> en, tuê herê bin konê wî, teleba te çî ye wê bide te». E Aşiq Hemo bi wî zilamî ve bû bele, go : «Ev Binevşê Qîza Narîn axa çawa ye ?» Ewî zilamê ji Hemo re go : «Erê ya xortê xerîb, tu zilamekî mîna min feqîr i, tu çi li Binevşê dipirsî ?» È go : «Wallah, ez dixwazim ez bipirsim hema wisa». Go «Ev Binevşê qızık pir bedew e, Derwêş axa heye, jér dibéjin Derwêşê Neripêş, ew jî té Binevşê dixwaze. Ew li beriya Hellê, hidûdê bîra Mêşê ye ; hezar û hef sed kon di bin emrê wî de ne.» Aşiq Hemo ji wî zilamî qetiya, berê xwe da mala Binevşê. Carikê bi rê de Hemo dimeşî, nihêrî ko kanikê heye, li pêsiya wî yê, sê qîz in li ser kaniyê avê

---

4- *Di hin ciyan de Benefş, Binefş an Binewş hatiye nivisîn.*

dadigirin. Qızık di nav wan de gellekî minasib e. Gava çavê Aşıq Hemo bi çavê Binevşê kebaniya bi kar ket, Aşıq Hemo li wê derê ket, dilê wî eşiya. Carikê wan qıza nérî ko zilamek hat, nézikayê li wan kir û hebkê li wan nérî û ewê zilam ket. Binevşê û her du hevalên xwe çûn ser meytê Aşıq Hemo, hebik av reşandin ser çavê wî, go : «Gelê xuha, hûn ji xwe re li vî xortê sipehi binérin, ketiye feqîrtiyê. Xwedê Tiala feqîrtiyê bi ser kesî de neyne, kiraskî ji qîrê ye, solikê ji hesin e ; wexta ko li pêşîra Benî Adem dikevî, jê nare, heyâ diyarê rehmetê axê gorê ye.» Gava wer dibêjin Aşıq Hemo çavê xwe ve dike, radihêje darê rebaba xwe û li ser axê xwe yê Cembeliyê Hekkarê dibêje. Binevşê ji xwe re té fekirî, go : «Ya Rebbî, ev xortê wiha çeleng û minasib e, gelo niha axayê wî çawa ye ?» Aşıq Hemo heyanî du saeta ne hişt ko ew qız herin, hingî ko dibêjî li ser Cembelî û serê kilamê û binê kilamê, dibê «Axayê min Cembeliyê Hekkarê ye», Binevşê ji Aşıq Hemo re got, go : «Ya mitirbo, ji xêra Xwedê re, min axayê te bidîna, bê axayê te bi ci nîşanê ye, tu vê stranê hemî ji bo wî dibêjî». Go : «Axayê min minasibî, yek mîna te ye, iro serê şes mehê min e, ez li bajar û şahrestana û li nav Ereb û koçera, ez ji axayê xwe re li jinik çê digerim, yekê mîna te.» Wê gavê, Binevşê ji Aşıq Hemo re digot : «Sozê min bi te re bê, gelik axa û axeler min dixwazin, ez kesî nastînim, zewaca mîra li min heram bî dû çavê axayê te Cembeliyê Hekkarê».

Ewê gavê, saeta wan qedîya bêtir, rahiştin cêrê xwe yê avê li ser milê xwe danîn, Hemo ji qazîka ji xwe re rûnişt, ica li meşa Binevşê nérî, ji bona ko meşa Binevşê biecibîne. Aşıq Hemo rabû ser xwe hêdî hêdî bi dû wan de meşîya, çû nav kona, rojekê li wê derê ma, adinê rojê berê xwe da Cembeliyê Hekkarê

Emê Hemokê xulam li wê derê bihêlin, emê bêñ cem Cembeliyê Hekkarê. Şes mehê wî qedîyan, gellîki Cembelî ji Aşıq Hemo hej dikir ; li ser Aşıq Hemo qeherî. Jinik Aşıq Hemo hebû, jê re digotin Pîr Fatikê, ew jî di dû Hemo de hengî girya çavê wê kor bûn. Cembeli emrê ser eşîra xwe kir, go : «Di dû Hemo re kesik ji we ez nahêlim libasê spî li xwe bikî.» Temamiya eşîra Cembeli libasê reş li xwe kirin.

Emê bêñ cem Aşıq Hemo. Ji xwe re dimeşî ; carek giha çiyayê Hekkarê nerî ko şivanekî li ber pez e, cilê şivên reş in. Go : «Şivan, tuê şivanê kî yê ?» Go : «Ez şivanê Cembeliyê Hekkarê me». Go : «Çima cilê te reş in ?» Go : «Bi riya xwe de bimeşe, kullê me gelek in, tevra me ke». Go : «Xwedê hebîna, tuê ji mi re bêjî, bê ci qewimîye ?». Aşıq Hemo rûnişt ji xwe re û girya. Go : «Wey li min çav kor bî, li min çok şikestî, tırsa min di dû min re tiştik bi Axayê min hatibî». Ji şivên re go : «Şivan, Xwedê hebîna, tuê ji min re bêjî bi ci qewimîye li Cembeli Hekkarê». Go : «Bi Xwedê, ya xortê delal, Aşıq Hemo hebû, axayê me Cembeli pir jê hej dikir. Aşıqê wî bû û xulamê wî bû. Iro serê şes meha ye çûye xerîbiyê, ne cewabik, ne tiştik jê ve bihistiye. Pîr Fatikî hebû, pîreka Aşıq Hemo bû ew jî feqîrê hengî di dû wî ve girya, çavê xwe kor kirin. Cembeli emrê ser eşîra xwe kir, go : «Di dû Aşıq Hemo re cilê spî ez qebûl nakim kesek ji we li xwe bikî, içarê me reşa xwe li ser Aşıq Hemo girê dayê.» Aşıq Hemo ji şivên re go : «Şivan, tuê herî mizgîniyê bibî ji Cembeli re,

bibêjî : «Vayê Aşiq Hemo hat». Şivan gava ko Aşiq Hemo wer jê re got, pezê xwe li çolê bê xwedî hişt û berê xwe da meclîsa Cembeliyê Hekkarê teyrê Sincar, doxanê nig biqayış, reisê hezar û pênc sed xortê herdemlawîn. Go : «Mizgîna min li te be, ya axayê min, vayê Aşiq Hemo ji welatê xerîbê û xûrbetê hat.» Cembeli rabû ser xwe, hezar û pênc sed xortê hemdemlawîn bi xwe re hilanî û pêrgî Aşiq Hemo ve çû. Aşiq Hemo qeddimî ber Cembelî, dest û pê wî ramîsa, li ser serê xwe danî, go : «Ya Rebbî, el hemdû lillah û şikir, îca jî axayê xwe bi saxî dî !» Ewê rojê ji xwe re iştaxilîn, bû êvar ; Cembeli ban Aşiq Hemo kir, di bin konê xwe de danî, go : «Ya Aşiq Hemo tuê iro ji axakê xwe pir hej diki, tuê îcarê ji min re bas bikî, iro şes mehê te qediyane tu çûyî bigerî, binerî, bê tu di ku re çû û tu di ku re hatî ; işe ko tuê pê çû bû, bê te çawa kir ?» Digo : «Axayê min, tiştê bi serê min de hat, vê neqlê, vê çûnê ez pir pê perişan bûm, iro şes mehê min e ez digerim, carna jê diketim çolê û xewlecîya, carna jê ez diketim şeneciya. Ewila ko ez çûm axayê min, min xwe berda deşta Hemis û Hemayê, li deşta Hemis û Hemayê, axayê min, ez geriyam ; û min konik girt û yek berda, ez diketim bin konê mezina, alem li min top dibî, ez ji wan re kêfê dikim, dûre qızê Axelera û mezina nav û dengê min û kéfa min dibhîzin, axayê mino, îcarê dişînin dû min, ez ji wan re rebaba xwe datînim ser çoga xwe, ez ji wan re distrêm û li rebabê dixînim, serê strana min û binê strana min, axayê min ez navê Cembeli xwe pê dixînim. Ez çavê xwe digerînim jinik minasib ez nabînim, xelq li min dimînin ecêbmayî dibêjin axayê wî gelo ci axa ye, hilqeyşî ev Aşiq liser axayê xwe wilo dibêjî. Îcarê ji wê derê min berê xwe da dora Tudmir û Cerîten, axayê mino, ez derbas bûm dora Sixnê. Erebê dora Sixnê tewrê aqilê min ji wan nebîri, ez li wê derê neskinîm. Min ji xwe re pîrsî, xelqê got : pîrekin, qızın minasib li alîyê bajarê Raqayê û şixolê Dêra Zorê hene, esmer in, genimgwîn in, lêv deqandî ne, poz bixizén in, guh bi gohar in, nig bi xerxal in, dest bibazin in, çav bi kil in, enî bi derman in. Min ribaba xwe helanî, min go, ezê berê xwe bidim bajarê Raqa û di ber ava Xêbûrê nav Ereba re, ji wan re dibêjin Erebê Şewaê, ezê derbas bibim hindirê Deşta Sirûcê. Erê axayê mino axayê min pir li ber dilê min şérîn e, belki ez yekê ji Deşta Sirûcê ji wan esmerê genimgwîn û xwîşerîn ji axayê xwe re bibînim, ez salixkî jê hilînim, ezê nişanê wê ji axayê xwe re bibim. Axayê mino ez ketim nava Deşta Sirûcê geriyam, min çavê xwe gerand, tu jinê minasibê te, axayê mino, min di Deşta Sirûcê de nedine. Min riya Cizirê girt, ez derbas bûm ser Cizirê, Deşta Sirûcê re, min berê xwe da bajarê Hesêça. Erê axayê mino dilê min dilekî wa li dîn e ; min got ezê rabim darê ribaba xwe hilînim eva meha min qediya ye, min tu pîrekê minasibê axayê xwe nedîne. Bajarê Hesêçarê nezikî girê Kewkeb e, girkî bilind e. Erebê Şemera û Fethana û Eneza têñ û li dorê datînin. Min di dilê xwe de nêt kir, min go : «Ezê herim nav ebrê wan bigerim, bê ez jinikê minasib ji axayê xwe re nabînim. Ko min li wê de jî nedî, ezê berê xwe bidim çiyayê Evdil Ezizê û min da serê Kaniyê û bilezinim ; hegê min li wê de jî ne dî, ezê berê xwe bidim dora Diyarbekrê derbas bibim çiyayê Qerejdaxê, tê de sê sed û şes kanî ne ; ez li wê de jî li cem axa û Axelera û eşrafa çavê xwe digerînim û nagerînim, erê axayê mino tu jinê

minasibê axayê xwe nabînim, û ez radibim darê ribaba xwe heltînim, lez dikim û dilezinim, berê xwe didim deşta Diyarbekrê re, derbas bibim nav Hebîsbînya û dikevîm, welatê Mêrdînê, hakimê mino, axayê mino, ez zilamekî xerîb im, kesî nas nakim, ez di devê rîya hemamçıya de rûdinêm û kemînê datînim, ez dibêjîm : ko ez qîzikê minasibê axê xwe bibînim, ezê li eslê wê bipirsim, li bavê wê bipirsim, ezê herim mala wan, rabûn û rûniştina wê qîzê, erê axayê mino ezê bibînim ; ez zilamekî aşiq im, lewxeta min xweş e, kesik min naqewirîne ; ez dikim û nakim tu jinê minasibê axayê xwe li ewê dera jî nabînim. Ez ji wê derê jî radibim û dilezinim ; berê xwe didim Tora Mihelmiya û axayê mino, dilezinim, li Tora Mihelmiya heya Estilê û Midyatê, ez ji xwe re digerînim ; pîrekê wêna minasib in, meşwerdek in, newqxezal in, çavreş in, xwîşêrin in, hema minasibê axê xwe ez di nav wan de jî nabînim. Berê xwe didim nav Rima, derbas dibim, dora Cezîra Bota jêr dibêjin û ji xwe re dilezinim. Axayê mino, ez gelikî perişan dibim, ji bona xatirê axayê xwe, ez vê felekê li serê xwe digerînim ; ji wê de jî radibim, û bi der dikevîm û dilezinim, berê xwe didim nav êla Gergeriya, digerim nav êla Gergeriya û çavê xwe digerînim. Sadûn Axa axê Gergeriya ye, ez dikevîm bin konê Sadûn axê Gergeriya, ji xwe re bi sariya sibehê ye, carekê dinêrim, qîzikê dew dikile, xweşîna qolê zêra, beniyê xaziya tê. Min go : «Qey ya hespikê fala ye, sikehê xwe ji erdê rakiriye, tev li qeydê û merbeta rakiri ye dimeşe, min go, qey baş-bazirganê salê ji bajarê Bexdadê barxanê hikûmetê bar kiriye, kirî herî Bajare Stembûlê.» Min carkê nêri ko qîzikî, sibhan ji hukmê Rebbê Alemê re, ko wilô ebadilaha sipehî dikê. Axayê mino, ez qeddimî, gelikî kêfa min hat, min got ev qîzikê minasibê, axayê min e, ezê nişana wê ji axayê xwe re bibim, ez li bin konê Sadûn Axa bavê Nicmê sê roja û sê şeva mam, min go : «Ezê vê qîzê qenc biceribînim, bêesîli bikêri axayê mi tê wele nayê». Wellah axayê mino, min carikê nêri, he vê qîzê rahiştî tasê û ji piyakî av vexwar, min go : «Bi Xwedê, ev qîza hana ne minasibê axayê min e, hebki bê edebî pê re heye, bi kêri axayê min nayê». Rojikê nasibê vê qîzê bi axayê min re bibe, wê bibîne ko ev qiz hebki bê edeb e wê ji min re bibêje : «Aşiq Hemo ne tu bi û ne navê te bi û ne jina ko te ji min re di». Taba mini şeş meha, wê çaxê wê ber telef herî. Ya axayê mino, minê nan û xwûyê Cembelyê Hekkarê li xwe heram bikira, ji bona wilô ez rabûm ji bin konê Sadûn Axê Gergerî, ez der ketim û min berê xwe da çol û Kerbela, û ez ji xwe re dilezinim, ez nema zanim bê ezê ku herim. Dinya germa havînî ye, carekê min nêri di wê beriyê de li pêsiya min leyланik xuya ye ; min go : qey ji vê leyłana wekê mijê ye ; carekê ez qeddimî müştarıkî, min xiyalâ xwe daye, min nihîrî ko ev kon in. Zilamekî ji nav wan kona tê, pêrgî min bû, min jê re silava kir, silava min vegerand, wî zilamî ji min re got, go : «Ya xortê delal, ci li te qewimîye di vê germa havînî de tu digerî ?». Go : «Te jinê bimêr revandine, wêla te mérin kuştine, wêla te gundin şewitandine ?» Min go : «Na wellah, min ne gund şewitandine û min ne mér kuştine û min ne jin revandine, tu ji min re bêji, bê ev konê hana kê ne, axê wan kîjan e ? Ez zilamekî xwedî kiflet bûm, li welatê me salê xelê hatin, ez hatime û vî welatê we ji xwe re li cem axelera digerim, herkeskî û ciwanmê-

riya xwe». Go axayê mino, ewî zilamî ji min re got, go : «Ev kon konê Narîn Axa bavê Binevşê ne.» Ë min jê re got, min go : «Xortê delal, Xwedê hebîna Binevşê çawa ye ?» Go : «Lawo, bi riya xwe de bimeşî, feqîrtiya bi serê te de hatiye, hîna tu dev ji halê xwe nagerî.» Ë min go : «Ya xortê delal, Xwedê hebîna, tuê salixê Binevşâ Narîn ji min re bide». Go : «Lawo, ev Binevşê qîzîkê pir bedew e, bedewbûn ji kesî re nehêştî ye. Wexta ko radibî ser xwe, sî û sê çiv dikevin bejna wê. Çavin reş li ser in mîna hibra ser qaxetê ; eniya wê fireh e mînayê gokmeydanê heyvê, bêhna sî û sê dermanê etara ji neqeba sêng û berê wê tê. Derwêş Axa tê wêna dixwazî, Binevşê wî nastîni, dibêji wê rojekê Derwêş Axa bê bi bavê wê re şer bike. Hema destê Derwêş Axa ji bona xatirê Binevşê li bavê Binevşê nagerî.» Ewê çaxê, go axayê mino, min ew zilam ber da, min go : «Here ya, birê delal, oxira te a xêrê be !» Ew zilam ji teniştâ min meşîya, axayê mino, min berê xwe da kona û mi lezand, û hebki kêfa min wê çaxê hat. Min nézikayê li kona kir, carkê min nêrî ; şînayik xuya ye. Min xwe li şînayikê girt û min lezand, carkê min nêrî, ko kaniyek e, aveke spî ji wê kaniyê diherike wek ava kewserê ye. Min xiyala xwe dayê, axayê mino, ko sê qîzê li ser kaniyê ne ; her du qîzê din jî minasib in, hema Binevşâ Narîn, ez bi eniya bavê te kim, hilqeysî ez geriyam ez hatim wî cî, axayê mino, min ne qîza wer diye û ne tu carî heya ez bimirim ez dibînim : çavê min lê ket, axayê mino, û min hew xwe dî ; min dî carekê di ser min re mîna tebiba sekînîne ; hinik av reşandin, dev û ruyê min ; min çavê xwe vekir ; wê gavê, axayê mino, min dî şewqîkê da dev û ruyê min, bêhna dermana ez helanîm ; min go qey ez ketim bihiştâ Baqî. Carkê min çavê xwe rakir, nêrî ko ev her sê qîz di ser min ra mîna sê teyrê baz sekînîne. Gava ez çav li Binevşâ Narîn ketim, ewê çaxê min ribaba xwe ji kîse wê derxist û min li ser çoga xwe danî, min kokik ji eva minasib lê kir û min qolifand ser lewxeta kurmancî û min bi dilkî bi kul ji xwe re got. Min go : «Ax ez ketime halê xerab, ji xêra Xwedê re berî mirina xwe ez car din bighama cem axayê xwe Cembeliyê Hekkarê, axayê hezar û penc sed xortê herdemlawîn, teyrê Sincar, doxanê nig biqaiş, axayê bi nîşan, dilê min li yan e, serd û izbatê axayê min hene, zilamekî qehreman e, xwediyê sıfıra giran e ; ji ber deh tabûr esker re rabe».

Min dî Binevşê go : «Ya xortê delal, wellah, tu xortekî minasib î, axayê te niha çawan e». Min go : «Axayê min minasibê qîzeke mîna te bedewê, biedebê, rindê, kibarê, galgalxweşî madevekirîyê devlikên e» Go : «Ji xêra Xwedê re, min axayê te bidîma, bê axayê te bi ci terzî ye ?» Min go : «Xatûna min, dilê min hidî sécar bi min hidî, tu rabî, bi dev ûлевê xwe ê şekirî li ser vê kaniyê bi min mitirbê re sozekê giran şixolê jinê çê bidî. Dilê min li diya, sê car dilê min li diya, wadê Xwedê li canê min mitirbî keviya ji bona xatirê qedehê çavê te nê reş ezê axayê xwe Cembeliyê Hekkarê bînim vî cerdiya». Min dî Binevşê digo axao, Binevşê ban min dikir, digo : «Navê te bi xêr ?» Min go : «Navê min Aşiq Hemo » Go : «Ya Aşiq Hemo, bera dilê min dilkê wa biyane, zewaca mîra di dû çavê Cembeli axê te re li min heram be, heya min daxînin tirbê û li ser tirba min bibê xerînê tevr û van bêran e ; kulê axayê te pir in di ser dilê min de şak û per berdane». Wê gavê, radihiştî cérê xwe ê avê,

her dû qîz pê re meşiyane, berê xwe dan konane. Ez li wê derê rûniştim, ji qazî de min xwe iştixiland heya ev qîz meşiyane, min ji xwe re temeşa kir li meşa Binevşê, meşik kubarî giran e, min eciband, ko minasibê axayê min e».

Ewê gavê, Cembelî û Aşıq Hemo ji hev re mijûl dibin, herdu xatûn têñ gohdariyê li wan dikin, dengê wan dere xatûna. Wexta Cembelî radibe, ji hindirê odê xatûn ban Aşıq Hemo dikin. Xatûna biçük dibêje : «Aşıq Hemo ez ketim bextê te û Xwedê ; ezê bazine destê xwe û xerxalê nigê xwe û zêrê ber enya xwe û goharê guhê xwe temama xîşrê xwe bifroşim bikim pere bidim te, tuê ji axê re, ji Cembelî Axa re basa Binevşâ Narîn tuê bi xerabî bikê.» Dû re xatûna mezin ban Aşıq Hemo kir go : «Aşıq Hemo ezê sed zêrê osmanlı bidim te û basa Binevşâ Narîn bi xirabî ji va re bêjî, ji bona xatirê ko nerî ji xwe re neyne». Go : «Wellahî, hûn sed zêrê, du sed zêrê hûn bidin min, elle tiştê ko çavê min dîtiyê û guhê min bihîstiye ezê ji axayê xwe re bêjim, li gora şirê xwe ezê biştexelim. Ez gelikî te'ebim û perişan bûme ji bona xatirê Cembeli Axa». Wê gavê Cembelî û Aşıq Hemo rabûn ser xwe, bîst kerî mî bi xwe re hilanîn, sed lokê deva ê nêr, bîst hespê kihêl, sed tifingê çapılı, xorçika xwe tije zêrê zer kirin û berê xwe da mala bavê Binevşâ Narîn ko herin ji xwe re Binevşâ Narîn bixwazî. Tu nabêji li wê derê Derwêşê Nerîpêş tê li talanê bavê Binevşê dixe, heyanî golikê ber devê kona vedike û bi destê Binevşê digirê û ji xwe re dibe. Binevşê radibe, kevirkî tîne, lê dinivise, dibê : «Cembeliyê Hekkarê hege tuê miştaqê min î, tuê bi dû min de li dinyayê bigeri.» Wexta ko Cembeli û Aşıq Hemo nézikayê li şwîna warê bavê Binevşê dikin, carekê qedûmê Aşıq Hemo dişkê, wê gavê Aşıq Hemo ji Cembelî re go : «Ya axayê min, bi Xwedê ev war şwîna konê mala bavê Binevşâ Narîn e». Li wê derê, Cembeli zilamekî biaqil bû, ji hespê xwe daket, li wan dera geriya li şûna kona, carkê nerî kevirkê reş. Binevşê nivîsandiye, gotiye : «Ya Cembeliyê Hekkarê, hegê tu miştaqê min î, tuê bi dû min de bê.» Wê gavê, Cembeli ji Aşıq Hemo re go : «Ya Aşıq Hemo, û ya hezar û pênc sed xortê herdemlawîn, li min helal bikin ezê herim !» Hemûçik rûniştin, bi dû Cembeli digiryan, go : «Ya axayê me, te em kirin pezê bê şivan, naxira bê gavan ; te em berdan çola bê xwedî û bê xwedan.» Wê gavê, Cembeli xatir ji wan xwest û meşiya, konaxek helanî û yek danî. Ji xwe re bi dinyayê meşiya. Aşıq Hemo û hezar û pênc sed xortê herdemlawîn vegeriyan çiyayê Hekkarê û Cembeli ket welatê xerîb û xurbetê.

Rojkê ji rojê Xwedê Cembeli di xwe fekirî, go : ne bazara rojkê û didwa ye ko ez bi siwarî bigerim. Ez ketim welatê xerîb û xurbetê nema kesik min nas dike. Li wê derê, hespê xwe û libsê xwe emaneti cem zilamekî kir. Ji xwe re kulavekî şixolê şivana peyda kir û li xwe kir. Darîki şivana xist destê xwe ji déla bastonê zîvê ve rahiştê darê şivantiyê, ji déla kurk û hewranê giran ve, kullavê şivantîye li xwe kir. Ji déla qere cizmê ve çarox û gora xistin nigê xwe. Ji déla şerwalê tereblosî ve çekê feqîra li xwe kirî, ji xwe re dimeşî. Rojekê ji rojê Xwedê, Cembeli giha nav konê Şêxê Ereba. Carekê Cembeli gellikî perişan bûyê, gellikî ketiye halê xerab. Sibehê, kes li kona tune ; çûne çola. Carekê Cembeli nêrî ko pîrikê rûniştîye li ber sêlê û nén dipêji. Cembeli di pîrê

bihirt, qû li ber siya kon, ji xwe re rûnişt, fedî dike, ko ji xwe re nanî bixwaze. Pîrê carekê di ser milê xwe re fetilî nêri ko şivanekî xwe da pêşıya kon û çokê xwe berdan, erdê û ji xwe re rûnişt. Ban kir pîrê, «Xwedê hebîna, tuê derziyê bidî min, stirî di nigê min de şikestiye ; ezê derxinim.» Gava pîrê li ştexaliya Cembelî nêri, pîrê rabû ser xwe û qedimî bi Cembelî ve, pîrê ne bi dilki dil ket Cembelî, bi heft dilan dil ketiye Cembelî, dilê pîrê ket bejn û bala Cembelî. Pîrê qedimî ber Cembelî go : «Hilêni, ya xortê delal, devê min nagerî ko ez ji te re bêjim şivano.» Ez zanim tu ne şivan i, ya tuê ji ber hikûmetê mehkûm bûyi û ya mohbeta derdê dila li te xistiye. Serê vê sibehê tu wiha perişan bûye.» Cembelî go : «Amojinê, na wellah, ez zilamekî xwedî kiflet im, li welatê me salê xelê bi ser me de hat, zarokê min bi ser min digiriyâ, ji qehra re min berê xwe da welatê xeribiyê û ez meşiyam, min go qey ezê li cem cuwamérkî bibim şivan. Tu karê din ji min nayê ; ya salekê, ya şes meha ezê pez biçérînim, çend qurûskî bibim ji kifletê xwe pê derxinim ji salê xelê.»

Cembelî û pîrê diştexilin, carekê Cembelî nêri ko xumxumik ji wê de tê, Cembelî guh lê nekiriyê, di fikra wî de ko hespê fe'la ye, tev li qeyd û merbeta felitiye direvî ; di fikra Cembelî di go qey karwanekî qantirê di wan bi zengilîn û bi xeşxeşkin, ev xomin ji vî karwanî ye. Nizanî ko Wedihê qîza Şêxê Ereba ye ji bêriya miya tê. Carekê pîrê ban kir go : «Wedihê dilê min dilki dibê ye, heyf û xebîneta lawê bava ko dikevin feqîrtiyê ye ; feqîrtî xerab i kira-sekî ji qîrê ye. Olecaxé Rebbé Alemê bi serê xortê xelkê di tê ye. Tu werî ji xwe re binêri di vî xortê xelkê ye. Ev xort bejna wî, bejna kurk û hawranî giran e, ne bejna kulavê şivantiyê ye ; destê vî xortî destê bastonê zîvî ye, ne destê darê şivantiyê ye ; nigê wî ê cizma ye, ê qondera û mehsa ye û ne nigê çarox û gorê ye. Ez nizanim ne mehkûmê hikûmetê ye, belê ez té difekirim mohbeta derdê dila lé ketiye, berê xwe daye dinyayê piş ta xwe daye felekê ye ?»

Gava wilo dibêje, Wedihê qîza Şêxê Ereba ji nabêna çit û perda ban dike, digo : «Xortê delal, tu were vexwe fincanik qehwê ye, bela hişê te bêye. Ez zanim tu elimiye qehwê ye.» Cembelî digo : «Ya xuşka delal, ya xatûna min, Xwedê emrê te dirêj bike, réya min dûr e, qisûra min top bavê binê qonderê ye, destûra min bidî, ez ji xwe re herim pê ye. Derdekê li dilê min ketiye, ez ne dînivim û ez ne dîmî nim pê ye, hesretik xerab e di dilê min de ye, jê der nakeve, heyani diyarê rehmetê, axê gorê ye.» Wedihê ban dikirî şivan, digo : «Were» ; Cembelî dihatî, xwe daye ber pêşıya kon, eyb dikî ko biqedimî hinda çit û perdê ye. Wedihê rabû, serê hekim û çoga, qedimî ; gava ko rabû, çavê wê li çavê Cembelî ket, ne bi dilki dil ketiyê, bi heft dila dil ketiye, aqilê wê bi serê wê de çelq bû ye. Destê xwe avêt misîn û cimcimê qehwêye. Ji Cembelî re keland, qehwakê meqbûlê şixulê Yemenê ye, berda fincana li ser tiliyê zerê zeytûnê, mina mûmiyê şîmê ye. Diqedimînî dibê : «Hewil mévanô, devê min nagerî ko ez ji te re bêjim şivano !» Cembelî gelkî bêriya qehwê kiri bû, rahişt fincanê qehwê, vexwar, aqilê wî hat serê wî, go : « Xatûn, Xwedê emrê te dirêj bike ! Tuê destûra min bidî, riya dûr e, ezê herim pê ye.» Wedihê ban kir, go : «Şivano, dilê min dilki dibê ye, sebir bike heyâ êvarê bavê min

çûye nav kona, wê bêye ; şivanikê mala bavê min heye, îsal heft salê wî ji bavê min re dike şivantiyê ye. Heké tuê birast digerê li şivantiyê ye, ezê li wî şivanî bigerim û li mahnakê ye. Ezê wî şivanî derxim, te têxim şûnê ye. Gava ko ez rahêjim elba kenêrê, berê xwe bidim bêriyê ye, wexta ko tuê ji min re bigrî serê miya, ez bikim helêbiyê ye, çavê min li bejna te kevî ji min re çêtirî, ji mal û milkê dinyê ye.» Cembelî digot : « Xatûna min, destûra min bide, riya min dûr e, ezê ji xwe re herim pê ye.» Digo : « Şivano hegê tu nagerî li şivantiyê ye, navmalikî mala bavê min heye, îsal heft salê wî li nav malê ye, radihêji sifré dibi aliyê odê, ji aliyê odê radihêji tîne aliyê malê ye, ezê bi wî navmalê bigerim û li mahnakê ye. Ezê wî derxînim te déxim şûnê ye ; wexta mêvanê mala bavê min bêne, tuê bê aliyê malê rahêji sifré ye, gava tu bê çavê min li bejn û dîndara te kevî ji min re çêtirî ji mal û milkê dinyê ye, wê sebr û dîndara min gellikî bi te bêye.»

Digo : « Xatûna min ez zilamekî xerîb im, bavê te zahîn e, Şêxê Ereba ye. Di emrê xwe de min ranehiştiye sifré ye ; tirsa min, gava mêvanê bavê te bêne, ez ji aliyê malê rahêjim sifré ye, bibim aliyê odê ye, ez nizanim nêl bela bikim li dora sifré ye, wê çaxê, wê bavê te ji min re bêje ne tu bî ne nanê te bî û ne sifra te bê, wê yek car kêfa min bişkêye ; heqê te li min tunîne, rîya min dûr e, tuê bihêle ezê ji xwe re herim pê ye.» Digo : « Şivano, dilê min dilkî dibêye, qehweçikî mala bavê min heye, îsal heft salê wî dikelêne qehwê ye ; wê bavê min bêye, ezê ji bona xatirê dîndara te ji aliyê çit û perdê xwe herim aliyê odê ye. Wê bavê min bêje xér e qîza min, ezê li qehweçîye mala bavê xwe bigerim û li mahnakê ye, ezê eybikê ji qehweçî re derxim, bela bavê min berde qehweçî, te têxi şûnê ye. Serê sibehê, tuê qehwê bikelînî, tuê bê nav çit û perdê min bi mahna qehwê ye ; wê gavê ezê destûra te li neqeba cotê memkê xwe bidim mînayê du sêvê şixolê dora Xelatê ye ; bêna çel û pênc dermanê etara ji navbêna séng û berê min têye ; tuê devê xwe têxê, inşallah tuê poşman nabî li dinyê ye.» Cembelî digo : « Xatûna min, di emrê xwe de, min ne dîye qehwê ye, ez nizanim çê bikim qehwê ye, tirsa min serê sibehê zû bavê te ji min bixwazî qehwê ye, ez nizanim bikelînim qehwê ye, wê bavê te bêjî ne tu bî ne qehwa te bî, berê ez zilamekî dilşikestî me, wê yekcar kêfa min bişkêye.» Wedîhê go : « Şivano, dilê min dilkî dibêye, ezê herim cem bavê xwe, ji bavê xwe re bêjim : bavo, nobetçikê ji min re lazim e, ko şev li dora çit û perdê min bişînî nobetê ye. Wexta bavê min bê ji çolê ye, ezê herim pêşiyê ye, ezê jê re bêjim : « Yabo ez qîz im ditirsim bişevê ye, nobetçikî ji min re lazim e ko rahêje darê tifingê ye ji moxrib heyânî fereca sibehê bikşîni nobetê ye, bela tifingikê bi te dê, qatik çekê minasib bela li te kê ; gava saet bibe yekê şevê ye, ezê ban te kim, navbêna çit û perdê ye ; wê gavê sîng û berê min li te helal bin, tuê ji xwe re lê bikê kêfê û seyranê ye, heyâ fereca sibeyê tuê car din rahêji tifinga xwe, xwe bişedînî û derkevî piş kon, bikşîni nobetê ye.» Cembelî digo : « Xatûna min dilê min dibê ye, Xwedê hebina, di emre xwe de min ranehiştiye darê tifingê yê ; ez zilamekî xwedî keflet im, xwedî zarok im, tirsa min ez fakêtê lêxim li tifingê ye, wê bi min de biteqî, zarokê min bimînin li çolê Xwedê ye. Tuê destûra min bidî, riya min dûr e, ezê ji xwe re herim pê ye.»

Wedîhê digo : « Erê şivano dilê min dibê ye, sê car dilê min dibê ye, ji gava din de çiqas ji te re dibêjim û nabêjim tu navekî rê ye. Ezê rabim, darekî bikşinim ji navbêna çit û perdê ye, wada Xwedê li canê min qîzê keti be, ezê bi saxî bi te dim ezabê qebrê ye. Gava tuê ji bin konê me bimeşî, ezê ban kim zarokê êlê ye, bela bi dû te kevin bi kevkanîka bikin ko serê te bi bîst cîha bişkêye. Wexta êvarê bavê min bêye, ezê bêjim ev zilameki diz e, ezê bikim ko te bigire, te téxe axorê hespê ye.» Cembeli wê gavê tirsiya, go Xwedê mirov bisitirine ji weynê jinê vê wextê ye. » È go : « Xatûna min, kêfa te ye. » Gava êvarê Şêxê Ereba tê malê ye, Wedîhê digo : « Bavo, nobetçikê ji min re lazim e ko rahêje darê tifingê ji moxrib heyanî fereca sibehê li pişta çit û perdê min bike nobetê ye. » Şêxê Ereba digo : « erê qîza min, emê ji te re biggerin li zilameki çê ye. » Go : « Bavo, zilameki xerîb e hatiye nav ebrê me, ji xwe re digerî li şivantiyê ye ; bedlik çekê bidiyê ye û tifingekê bavê piyê wî, bela li ber çit û perdê min bike nobetê ye. » Şêxê Ereba bedlik çekê minasib li Cembeliyê Hekkarê kir, tifingik avêt piyê wî. Cembeli li pişt çit û perda mîna her-sesiya bû fîfkîkê wî wê şevê heyâ nîvê şevê ye. Bi çavê Wedîhê nebûye xewê şevê ye.

Nîvê şevê ban dikir, digo : « Hewil navbêna çit û perda, ya mîvanê minê ezîz, li ser doşeka. Heyanî du saeta, sê saeta ji nîvê şevê çû, ji xwe re kêf û laqerdi kirin, ji nîvê şevê pê va, ji hevdu aciz bûn, Wedîhê serê xwe danî, racket, Cembeli rabû, ew cilê xwe danîn û tifinga xwe danî, kulavê xwe ê şivantiyê anî, li xwe kir, çaroxê xwe şidandin û hêdika ji navbêna çit û perda der ket û ji xwe re reviya. Wedîhê carkê şiyar bû nerî ko ne kesikî li wan dera tune, carkê nerî ko tifingê daniye, malê xwe danîne û cilê xwe ê berê li xwe kiriye û reviyaye. Wedîhê rabû serqot û piştvekirî û bi şimik bi çola ket û bi dû Cembeli de ji xwe re digirî û dibê : Şivano ! Carkê Wedîhê çû li şivanê mala bavê xwe bi tewfiqa Xwedê rast hat. Şivanê mala bavê wê pêrgî wê ve hat, go « Wah ! wah ! Wedîhê tu dîn bûyî, tu har bûyî ? » Go : « Şivano, ez ketim bextê te û Xwedê, şivanekî kulavê wî weke ê te bû, darê wî weke ê te bû, çaroxê wî weke ê te bû, hema suretê wî ne mîna ê te bû, te ne dî li van dera ? » Şîvên go : « Xatûna min, vegere, ji te re eyb e, qey te xewnîk diye ? » Wê gavê şîvên bi destê Wedîhê girt, dimeşin di rê de, hişê Wedîhê hat serê wê go : « Şivano, ketim bextê te û Xwedê, tuê mala bavê min şiyar nekî ». Şivan li wê derê vegeriya ber pezê xwe û Wedîhê bi dilkî bikul hat navbêna çit û perdê xwe, rûnişt û ji xwe re giriya.

Cembeli meşîya, wê şevê reviya heyanî ko lê bû sibeh, nesekinî, sê roja û sê şeva Cembeli ji xwe re meşîya. Rojekê, derbas bû beriya Hellê, hidûdê bîra Mêşê, li zilameki rastê dibê : « Zilamo, ez ketim bextê te û Xwedê, iro sê roj û sê şevê min qedîyan, ez digerim li çolê Xwedê. Ez zilameki wunda bûyî me, tuê ji min re bêje, bê ev der kî der e, navê vi cî ci ye ? » Go : « Kuro, ev derê jér dibêjin beriya Hellê, hidûdê Mêşê, ev mekanê Derwêş Axa ê reîsê hezar û hev sed konî ». È Cembeli go : « Ya xortê delal, konê Derwêş Axa dûr manî, nézik manî ? » Go : « Tuê bi meşê qonaxa sê roja bi beriyê de tuê bigihêji konê Derwêş Axa. » Cembeli ji xwe re bi rê de dimeşî, gelikî perişan bû, çaroxê wî

getiyan, tişt di nigê wî de nema, pê li siterîya dike, di nigê wî de dişkên. Cembeli ji xwe re dikulî û dimeşî. Cembeli go : «Ya Rebbî, dilê min dilki dibêye, ez gelikî ketime perişaniyê ye ; tırsa min ez bimirim di welatê xerîb û xurbetê ye, ez nakekım ber xema çiyayê Hekkarê wê bimîni bê xwedî, ez dikevim ber xema Binevşâ Narîn kebaniya bikar, tırsa min û hesreta wê di dilê min de bi mîne, heyanî diyarê rehmetê, axê gorê ye, derdê Binevşâ Narîn di min ketiye, derdikî xedar e, ez ne dimrim û ne dimînim pê ye.»

Ji xwe re Cembeli dimeşî carekê dinêri ko konê Derwêş Axa xwuyanî bûn. Cembeli ji xwe re dimeşî, dikevî nav kona, xelq lê rast tê, dibéjin bi Xwedê şivanê Derwêş qewlê wî qediya ye, serê salê ye, wê ji cem wî derkevî, ji xwe re li şivanîkî digeri. Wê gavê Cembeli go : «Ya Rebbî, el hemdülillah û şikir ko şivan qewlê wî qediya ye, ezê ji xwe re tê kevîm ber pez, belkî hêvi Xwedê Binevşâ Narîn carikê ji malê aciz bibê, bêje ezê herim bêriyê ye. Bela çavê min li çavê Binevşê kevî, wê gavê bela Rebbê Alemê emanetê xwe ji min bistîne li wê derê ye.» Yekî bi destê Cembeli girt, bir cem Derwêş Axa go : «Kuro, tu çi kesik î ?» Go : «Wellah axa, ez zilamekî xerîb im, ez ji xwe re digerim li şivantiyê ye.» Hezar û hev sed mî li cem Derwêş Axa hene, kerîk dan Cembeli, nanê wî xistin têrê, li ser pişta ker şidandin û berê wî dan çolê û nav pez ; pez teslimî Cembeli kirin. Cembeli berê pez da çolê ; û sünd xwar go ez vî pezî venagerînim li mal heyanî ko nebî serê biharê, timama wî nezê û berxa neyne û berxê wan mezin nebin, li min heram bî ez vî pezî venagerînim bi alî mal de. Ko şes mehê min qedîyan, wê xelqê û Derwêş Axa bibéjin : «Qey xelqê şivan kuştiye û ji xwe re talan birine». Wexta ko bibê serê biharê, dinya germ bibe, wê çaxê, wexta qêtixî û berîvana ye, ezê wê gavê pez binim nézikayê li kona bikim, wê mizgîni herî ji Derwêş Axa re wê bêjî : «Va ye, pezê te û şivanê te pez anîn, hat serê bêriyê» ; wê çaxê, wê Binevşê rabe bibêje ezê herim ji xwe rê li pez temaşe bikim, iro şes meh e ev pez di gelûya de ye û li çolê ye, xwarna xweş dixwî, niha gelkî qelew bûye. Wê gavê, wê Binevşê bê bêriyê, ezê mîyê xwe hema bielimînim wekî te'limê, ezê rûnim li ser kevirê şivantiyê, ezê ban kim mîya, wê yeka bi yeka bi te'lim bê, ezê serê miya bigirim, wê Binevşê elba kenêrê deyne erdê, wê bike helêbiyê.

Cembeli berê pezê xwe da çolê. Ji xwe re rahişte darê bilûrê, nizanî li bilûrê xe, go : «Ya Rebbî, tu bi qedrê heqq ezzet û celalê navê xwe kî, tuê tiliyê min bielimîni bilûrê !» Xwedê Teala, wulo hej kir Cembeli ji xwe re elimi bilûrê. Gava pif dikî bilûrê û bi ser di fikran dikevî, ji xem û xeyalê dilê xwe re dibêjî. Şes mehê wî qedîyan porê wî dirêj bû, daketi ser stuyê wî, sipiya hêlinê xwe di ber stuyê kulavê wî de çê kirin. Şes mehê wî qedîyan, Cembeli pez li malê û li kona vegerand. Pêrî zilamekî bû, go : «Kuro, ev pezê kê ye ?» Go : «Ev pezê Derwêş Axa ye». Cewab hat ji Derwêş Axa re ; go : «Bi Xwedê va pezê te hat, yek bûye didu ye, gellikî pezê kêfxweş bûye.» Gava cewab ji Derwêş Axa re hat, wê gavê emri ser bêrivana kirin go : «pez hatiye û serê bêriyê hûnê herin pez bidoşin». Wê gavê, li beriya Hellê, hidûdê bîra Mêşê, Cembeli ji xwe re rûdinê miqabilê kona, carekê dinêre bêrivan derdikevin bêriyê ye, yeka yeka, dido dido, bihev dikevin û berê xwe didin çolê ye ; gellik

şivan li dora Cembelî ne, xatûnê wan têne û li şivanê xwe dikine «çakxêriyê ye» : bi ser şivana de vala dikan tûrê rengînî ji beniya, ji bastêqê, ji mewîja, ji hejira tê de ye. Carekê gellekî dilê Cembelî ji néza dêşê ye, çavê Cembelî li rê ye ; carikê nêri ko yeke ji kona derket, meşik li serê, mînayê meşa qetikê ye, ji xwe re dimeşeye, qondirak birxa kirî li pê ye, xeftanekî şangeylenî lê ye ; fitla şarê xistiye çerx û govendê birohêye, ji wê de tê ye yeke ne kin e û ne dirêj e. Cembelî xiyala xwe daye, nêri ko Binevşê ji wê de tê beriyê ye, bi dilkî kuli şikestî, dawiya bêrîvana ditêye, û ji xwe re dibêjî û dilorîne, serê kilamê, binê kilamê navê Cembeliyê Hekkarê teyrê Sincar, doxanê nig biqaîş û pêdixîne dibê : «Delorî ê Cembeliyê min delorî, emrê min bi heyran serê min bi gorî ! Ezê Cembeliyê piçûk di xewa şérîn xînim û bidestê Cembeliyê mezin bigirim bibim welatê jorê. Ezê Derwêş Axa bi hezar û heft sed malan bikim qurbana serê Cembeliyê mezin. Dilê min dibê ye sê carê dilê min dibê ye, isal şes salê min qediya derdê Cembeliyê Hekkarê ez xistime, ez ne dimirim û ne dimînim pê ye. Lawikê min heye, mi navê Cembelî lê kiriye, wexta ez ban dikimê, sebra min bi navê wî tê ye.» Binevşê digo : «Bela mîrê meriya bi dilê meriya bî, bela nan hebî û dew tune bî, bela xwarina meriya garisê bi gilgil bî ; bela lehêfa meriya ezmanê bilind bî ; bela doşeka meriya ji erda şîl bî ; bela belifa meriya ji kevir bî ; bela tûrê parsê tim li mil bî ; bela binê tûrê meriya biqul bî ; bela cîhê meriya ne li vir bî, li sînorê Ecem û gêwir bî. Bela mîrê meriya ne bi dilê meriya bî, bela sibê heya êvarê ne kar bî, ne şixul bî, xwarin û libas pir bî ; dilê meriya tim bikul bî.»

Li wê derê, Cembelî fêm kir qenc ko ev Binevşê ye. Cembelî rûnişt li ser kevrê şivantiyê, dengkî ban kir go : «Xatûna min dilê min dilkî dibê ye, tu na tırsî ji xofa Rebbê Alemê ye, ji gava din da bêrîvan hatine bêrîyê ye, li şivanê xwe dikan çaxêriyê ye. Bi ser wan de vala dikan tûrê rengînî ji beniya, ji bastêqê, ji mewîja, ji hejîra, ji gwîza tê de ye. Ji şivanê xwe re tînin taştê ye. Tuê bi rûki reşî, bi destekî vala bi ser min feqîrê Xwedê de tê ye. Tu natırsî ji xofa Xwedê tu bi destê vala bi ser min tê ye. De kanî li beriya Hellê, hidûdê bîra Mêşê ye ramisanekê bidî min yetîmê Xwedê ye. Ji min re çêtir e ji xwarnê ye. Tu mînayê xezalekê şixolê dora Kerbelê ye. Wexta serê sibehê xortê xelqê pev dikevin cotê tajîya davêne meresê ye, berê xwe didin seyd û nêçîrê ; xezal ji ber wan radibin cotê tajîya ber didin li pê ye, ne digirin û ne digêne, heyanî li wan êvar, şev bi ser wan de tê ye. Kulê xezala bi wan seydvaniya re derî gorêye. Tu mînayê belendîrikê şuxilê dora Zozanê Şerefđinê ye, wextêserê biharê tucar derin Zozanê Şerefđinê pez davéjin ber kirînê û firotanê ye, kerîya diki-rin, dixin ber şivana ; di nav wî pezê de, tu mînayê belendîrikê şixolê dora Şerefđinê ko xwe didi milê kerî û berê şivan. Berê pez didin bajarê Şamê û Helebê ye ; ebadile der dikevin pêşîya pezê sor ko tê ji zozanê Şerefđin diçê aliyê Ezromêye. Şivan pez dajon, dikan qisim, te xwe daye milê kerîya, çavê xelqê li te dikevi, pişta te bi soringî, qerikî bi golikê, xelq dimînin ecêbma-yê li vê belendîrê ye ; tuê li beriya Hellê hidûdê bîra Mêşê ramisanekê bide min yetîmê Xwedê ye ji binya guharê zérînî, ji qiriqa xwe ya dirêj. Hesretekî xerabî bela di dilê min şivanî de nerî heyanî diyare rehmetê, axê gorê ye.»

Binevşê dengekî ban dikirî : «Şivano, min gwê te di gora nod û neh bavê te kiro, çewa şivanê meriya bî, kükikê ber devê deriyê meriya bî, ji meriya re bêjî van pirsan û van şoran e. Ezê rabim li Derwêş Axa bi gazi kim bila bê serê te ji gewdehê te hilqetîne.» Wê gavê, Cembeli ban dikir, digo : «Xatûnê, dilê min dilkî dibê ye ; ez ketim bextê namûsa jina çê ye ; tuê li qisûra nenêre, qisûra bavêjî binê qonderê ye. Galgalê biçukan e efûa meznan e, min go qey adeta we jî wek adeta welatê me ye.» Go : «Kuro, welatê we ji kî derê ye ?» Go : «Erê xatûna min dilê min dilkî dibê ye : Xwedê xerab bike mala xwedîyê feqîrtiyê ye ; feqîrtî kirasekî ji qîrê ye. Ezê li cem Cembelyê Hekkarê şivan bûm, li welatê me, salê xelê û celê tê ye. Ez zilamekî xwedî kiflet bûm, min rahişt darê şivantiyê, kulavê şivantiyê ye. Min go qey nêzîki gundê me, ezê ji xwe re, ya salekê, ya şes meha, ezê ji xwe re bikim şivantiyê ye ; çend qoruskî ji zarokê xwe re bibim, wan pê derxînim ji salê xelê ye. Rebbê Alemê qismetê min anî vê derê ye. Gava ko ez li cem Cembelyê Hekkarê şivan bûm, bêriwan û xatûn dihatin bêriyê ye. Ez zilamekî aşiq im henekçî me, wê çaxê min radihiştî kevkanîkê xwe, ez diçûm peşiyê ye ; mi ber dida xatûna û berîvana min bi kevkanîkê xwe heyanî serê hêsiya kona, min digo kanê bînin, bê we ji min re ci anîye xwarinê ye. Ya xatûna minê, ez ketim bextê te û bextê Xwedê ye, tuê li qisûra min nenerê, min go qey adeta we jî wek adeta me ye ; tuê herî ji Derwêş Axa re bêjî vê pirsê vê şolê ye. Derwêş Axa zilamekî bê wijdan e, wê bê serê min jê ke ev şes mehê min in ezê li çola me, çavê min ne ketiye, benî ademê vê wextê ye. Zarokê min, çavê wana li rê ye, niha dibêjin wextê bavê me ji welatê xerib û xurbetê bê ye.

Gava evê galgalê ji Binevşê re dibê ye, çogê Binevşê bi carkê re dişkêye, Binevşê ban dikir, digo : «Şivano, serê min bi qurbano, emrê mi bi heyrano, dilê min, dilekî dibê ye çeçeyse galgal û gotinê te ji min re gotin, xeberê te timam min efû kirin, min avêtin binê qonderê ye.» Binevşê go : «Şivano, madam tuê li cim Cembelyê Hekkarê şivan bû, tu werî ji min re serê mîha bigirî, ezê bikim helêbiyê ye ; her ji bîst xebera carkê ji min re basa Cembelyê Hekkarê bike, ji min re çêtir i ji mal û milkê dinyê ye, hesretî xerab e bela bi min re nerî diyarê rehmetê axê gorê ye ; derdê Cembelyê Hekkarê li min ketiye, ez ne dimirim û ne dimînim pê ye. Bexşîşa xwe, tu ci bixwazî, ezê ji te re mewcûd bikim li vê cerdêye.» Wê gavê Cembeli rûnişt li ser kevrê şivantiyê ye, rahiştî darê bilûrê bi ser bilûrê de ser xweş ketiye û ji kulê dilê xwe re dibêje, ban dike di bilûrê de, dibê : «De bêre, Kirê bêre, Belê bêre, Şimê bêre, Rŵinê bêre, heke hûn neçin bêre, Xwedê bike di nav we keve, gur û kér e ! Wê gavê, mî bûne wek talimê danî dû hevdû û hatine. Binevşê rûnişt û Cembeli bi serê miya digire û Binevşê dike helebiyê ye. Cembeli di xwe fekiri go bi Xwedê, mi ji xwe re têr li bejna Binevşê nenerî, wisa rûniştî nabî, ko ez wê ranekim. Cembeli digo : «Xatûna min, dilê min dilkî dibê ye, li welatê Cembeli Axa gava bêriwan dihatin bêriyê ye, basbasa radibûn, destê wan dieşîya, min ji dêla wan ve wana biserê miya digirt, min dikir helebiyê ye.» Binevşê digo : «Şivano, serê min bi qurbano, were rûnê, ezê rabim bigirim serê mîya ji te re, tuê bikê helebiyê ye. Ji min re basa Cembeli bikê ji min re çêtirê ji mal û milkê

dinyê ye. Wade li canê min keti bî iro pê ve ezê bi saetekê berê berîvana bêm bêriyê ye.» Binevşê rabû, Cembelî rahişt kenêrê, xist nav rana miyê ye. Ji xwe re dike helêbiyê ye, sira bayê xerbî tê ye li bejna Binevşê dixe bêna dermana bi ser Cembelî de tê ye. Tu nabê miyeke kerrî di nava pezê Cembelî de ye ne-elimiye telimî û terbiyê ye. Gava Cembelî ban mîha dike, dora wê mihê tê ye, mî kerr e nariyê dengê bilûrê ye ; tu nabê mî dibezi tê xwe diqelibine li elba kenêrê, vala dike erdê ye. Heriya mihê dialiqî di xencera daban, li ser bihistikê û çar tiliya dikşîni ji qefa wê ye. Haya Cembelî jê tune ko xencera daban kişiyyayê ji qeftê ye. Şewqa ruyê daye xencera daban, ketiye hindirê elba şîr, navrana mîhê ye. Carkê Binevşê nerî ko şewqekî ketiye elba kenêrê ye, go qey şewqa qolê zêra ye xwe daye elba kenêrê ye. Destê xwe avêt desmalik herîrê qurma ser qolê zêra şidand, hîna ew şewq li şwînê ye. Go qey şewqa goharê min e ketiye elba şîr, nav rana mîhê ye. Destê xwe avêt kitana Melesî, goharê xwe xistin bin kitanê ye, hîna ew şewq li şwînê ye. Carekê Binevşê li ber Cembeli nêrî kèleka wî de ko xencera li ser bihistkê kişiyyaye, li ser bihistekê û çar tiliya şewqa xencerê daye elba şîr nav rana mîhê ye. Binevşê bihist nav û dengê xencera daban a Cembelî, naskir, qêrîn ji Binevşê hat, xwe avêt pêşîra Cembelî, gote ji bo min kevnajina te xwe xistî vî halê xerab, li wê derê kulavê şivantiyê avêté erdê ye ; li ser kulavê şivantiyê ji xwe re dikine kêf û seyranmîş ye, heyanî ko rojka wan qoliftî bûye hikmê évarê ye. Cembelîyê piçûk li malê di dergûşa xwe de gelkî digirî, bêrivan hemû ji çola hatin kes nema. Diya Derwêş Axa ban Derwêş Axa kir, go : «Derwêş Axa rabe were Cembelîyê piçûk di dergûşê de biheci hengê digirî ; bêrivan hemû hatin û Binevşê nehat. Em nizanin ne markî pê ve da, em nizanin ne hina revand, siwar be, here binêre bê ci pê hat.» Wê gavê, Derwêş Axa siwar bû, berê xwe da hinda beriyê û dilezinî, Carikê Cembelî ji Binevşê re go : «Ya Binevşê wellah weha Derwêş Axa hat, em ci tebdîrê bidinê ?» Binevşê go rabe, bike qerebalix bêje ez qolincî bûme, ezê qondera xwe deynim û herim pez li te vegerînim ; gava Derwêş Axa bê, nezikayê li me bike, ısal şes salê min ez li cem im, hîna ez pê re neştexilîme. Wê gavê, ezê ji Derwêş Axa re bibêjîm : ne tu bî, ne pezê te bî, ne şivanê te bî ! Ji wexta ko ez hatim ji mal, nêrîm ko şivan bi qolinckê ketiye, qarînik wê li erd e yek li ezmana ye û li wan dera ne av heye ne tiştik heye, dilê min pê şewiti, mi nihêrî ko ev şivan gelki perişan bûye ; ez geh derim pez vedigerînim, ez geh têm ser laşê şivên.» È Derwêş Axa go : «Ya Binevşê rabe li hespê min siwar bibe şivên bavê pişt xwe û berê xwe bide kona.» Binevşê rabû, li hespê Derwêş Axa siwar bû û Cembelî di pişt xwe siwar kir û berê xwe da kona. Hat ber derê kon, laşê Cembelî avêt erdê. Diya Derwêş got : «Ya Binevşê, tu ji Xwedê natirsî, te laşê wî şivanî, wî feqîrî aveti devê derê me ; tada ko bi pezê we re iro şes meha dîye. Jê re hinik av germ bike ji bo Xwedê, hinik sabûn bidiyê, bela serê xwe pê bişo û bîstkê di bin kon de rakeve belkê qolinca wî jê here.» Wê çaxê, Binevşê rabû êzing anîn, agir kir, teşta mezin tije av kir, qenc germ bû, qalibek sabûna bênxwêş dayê, Cembelî laşê xwe ket û firqand. Go : «Bedlik çekê Derwêş Axa jî jê re derxîne, bela li xwe ke !» Bedlik çek dayê, Cembelî li xwe kir û jê re qatik lehêf û

doşek danî di nav de raket.

Bû moxrib, Binevşê rabû bîst derzî, sî derzî anîn, xist bin Cembeliyê biçûk, lawê xwe. Îca Cembeliyê biçûk li ser wan derziya dihejîne. Serê derziya tûj in, li laşê Cembeliyê biçûk diçikin, ranakeve û Binevşê dilorîne dibê : «Delorî, ê Cembeliyê min de lorî, emrê min bi heyran, serê min bi gorî ! Ezê Cembeliyê piçûk di xewa şérîn xînim, destê Cembeliyê mezin bigrin bibim welatê jorê. Ezê Derwêş Axa bi hezar û heft sed mala bikim qurbana serê Cembeliyê mezin.» Hengî dengê Binevşê xweş e, êla Derwêş Axa sê şeva raneketin. Şeva çara derzî ji bin lawê xwe derxistin, lawik raket û ew êl tev de raketin, rabû hespê Derwêş Axa şidand û hespek ji xwe re ; çiqeyse xîşrê wê ko hebû zîv û zérê wê ko hebû hinan ji sindoqê derxist, xiste eqîba û li ser pişta hespa şidandin. Cembelî rahişte rima Derwêş Axa û şûrê wî xist stûyê xwe û bi ser pişta hespa ketin û hevdu revandin berê xwe dan çiyayê Hekkêr û meşyan. Ew bi mîradê xwe şâ bûn û em jî bi mîradê xwe şâ bibin.

## KITÊBXANA ENSTÎTUYÊ

Kitêbxana Enstîtuyê dixwaze bibe hîmê Kitêbxana Neteweyîya Kurdistanê. Tê de niha bi 25 zimanan bêtirî 2600 cild kitêb hene. Hin ji van kitêban gelek kevn in, di sedsalên XVIII û XIX de çap bûne. Hin destnivîs jî hene.

Ji kovarên kevn, civanbendê (kolleksiyonê) Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û Kurdistan (Iran) temam bûne, ên kovarên din tê berhev kirin.

Di vê navê de Enstîtu, belgeyên arşîvên dîplomatîk, film, wêne û diapozîtif, kaset û sêlikên kurdî jî dicivîne. Ta îro dora 2000 diapozîtif, 26 film û qasî 130 saet müsiqiya kurdî hatine civandin.

Bê guman, ev hê destpêk e ; karê salekî ye. Divê ku em afirandinê li ser ziman, dîrok û çanda xwe diyar kin, binasin û bi dinyayê bidin nasîn. Civandina arşîvên me yên neteweyî, dewlemendkirina kitêbxana me ya neteweyî karê her welatparêzî kurd, her Kurdekî bixîret e.

Li kitêb, kovar, film, wêne, kaset û belgeyên li ser Kurdish bigerin ; we bi çi zimanî çi peyda kir ji kitêbxana Enstîtuyê re bişînin. Çavêن xwe li dengbêj û çîrokbejan, xasme li yên pîr, bigerînin. Stran û çîro-ên wan bigrin kasetan û ji me re verékin. Bila, bi mirima wan, keriyek ji folklor a gelê me winda me be, ji biran neçe.

PARASTINA ÇANDA KURDÎ, KARÊ ME HEMÜYAN E.

## CIVATA PÊXEMBERAN

Şahînê SOREKLÎ

Tu deriyên wek vî derî Ehmedê Oso hîn ne dîti bûn. Çil û çar salên jîyana wî li gundê Etmanekê derbas bûbûn. Du-sê caran di umrê xwe de ew çûbû bajêr ; carekî bo rihela zewaca xwe, carekî bo nexweşiya kurê xwe û carekî jî cendirman ew tev neh-deh mirovén din biri bûn girtîgeha bajêr pêku şerek di navbera gundiyan de cîh girti bû. Tu deriyên wisa mezin û bi neqîş û xemlên wilo çeleng li bajêr jî tune bûn. Ehmed nézikî li derî kir û hîn difikirî gelo ew li kijan beşê derî xe, dema ku bi nişkekî ve camerek laşmezin, bejindirêj û bi heybet li pêş çavêن wî derket.

- Ehmedê Oso ! Tu çi digerî li va deran ?

Ehmed ji guhêن xwe bawer nekir. Sûretê wî ji şermê sor bû û bê ku xwe zept ke, devê wî li hev gerî û got :

- Silabû Elêk.

Mirovê laşmezin li Ehmed niherî û keniya.

- Ev bûn jor hezar sal, hun Kurd bûne Musilman lê belêm dîsa jî hun nedizanîn bi rastî bibêjin **ESSELAAAMÛ ELEIKUM WE REHMETULLAHÎ WE BEREKATUH**. Ehmedê kurê Oso, tu zû bersîva min bide, tu çi digerî li vir ?

Ehmed xwe da hev, hebkî din berbi mîrik çû û bersîva wî dayê.

- Ez hatim Şêx Gêlanî bibînim. Bi serê kurê min be, divê ez bi CENABÎ ŞEX re bê derengî bipeyivim.

Peyayê zexim li Ehmed mêze kir û dîsa keniya :

- Kuro bextereşo, ev cîh ne şûna weli û şêxan e ; ev qonaxa pêxemberan e.

Ehmed lepê xwe yê rastê hebkî rakir jor, ber bi rastê wergerand û bi zimanek xweş qezî kir :

- Rehme li bavê te be. Pêxember hîn ji şêxan çêtir in. Bi kerema xwe rê bide min ez Hezretî Muhemed bibînim û yan jî Hezretî Isa. Ger wexta wan nebe zirar nake, ezê bi Hezretî Müsa û yan İbrahim il Xelîl re bipeyi-vim.

Camêr li Ehmed sér kir, serê xwe leqand û got :

- Qedexe ye bo qûl ew vî derî derbas kin.

Ehmed her du destên xwe vekirin, serê xwe bi hélekî de xwar kir û di ber camêr geriya :

- Ez di bextê bavê te da me, peyayê şîr-helal ; tu min şûn ve venegerînî. Zor pêwîst e ez bi pêxemberekî, yan welikî, yan seydakî û yan şêxekî re şorê bikim. Ez di dawa bavê te da me, tu min destvala li riya mal siwar nekî.

Camêr li Ehmed niherî û dît çawa kurê Oso serê xwe xwar kirîye. Dilê wî bi Ehmed şewiti, tev ku wî baş dizanibû ku ev serxwarkirina hawak ji fen û fûtêni mirovén cotkar bû, yên ku bi sedsalan bêçare û bindest mabûn û ji derdê sultan û beg û axe û şêx û qamçûrcî û leşker û cendirman metodek serxwarkirinê peyda kiri bûn bo ew bêçarebûna xwe nişan bidin û dilên yên din bi halê xwe bişewitînin.

- Ehmedê kurê Oso, got peyayê zexim, lêbelê îcar bê ken, iro civatek pêxemberan heye. Ezê te berdim hindir odeya xwe. Tu dikanî di teqa camîn re ji xwe re li pêxemberan tameşe kî. Ci di salonê de cih digre, mirov ji odê de dibîne bê ku bi xwe ji yên di hindir salonê ve were xuya kirin. Divê ku tu ji min re sond bixwî ku tu ti teşqelan nekî û dû kutabûna civata pêxemberan bê deng di ev derî re weri der.

Tew bê ku bi aqilê xwe bişêwire, Ehmed şarten mîrik qebûl kir û sond xwar.

- Mal-ava, di dilê xwe got Ehmed, Mirov her roj li pêxemberan rast nayê. Ezê vê fersenda zérîn çawa ji dest xwe berdim ! Wey xwedê ji ev peya yê bi dîn û iman razî be.

\* \*

\*

Salon bi carekî de tiji ronahi bû. Tu çirayên wisa bi şewq Ehmed di umrê xwe de hîn ne dîti bûn. Hejmara gupe-gupa dilê wî bi carekî de rabû jor dema deriyek biçûk di quncikekî salonê de vebû û hin mirovén bi kincêñ gewr, ye<sup>k</sup> li dû yekî, ketin hindir. Her pêxemberekî şûna xwe li paş maseki girt. Rûyên pêxemberan ji Ehmed ve xuya ne dikirin. Ji sûretê Ehmed ve xuya dikir ku ew hebki dilsar bû bû, wek mirovek yê ku cizdanekî bi rê ve dibîne û hévi dike cizdan tiji pere be, lêbelê ji 2-3 panxirotan bêtir di cizdîn de nabîne. Dû demek kin, çiran dest pê kirin melûl bibin. Li pêş pêxemberan du perdeyên mezîn ronahî bûn. Ev perdan sînema bajêr ya servekîri anîn bîra Ehmed. Dema ew bo rihela xwe çûbû bajêr, pismamê wî ew biri bû sînemê bo ew tev li keçikên çîqrût û lêvsor sér kin.

Li ser perdeya yekemin dukanek nayê hesaban xuya kir. Mezinbûn û fi-rehbûna dukanê nediket aqilan. Jin û peyan erebeyên hesinî li pêş xwe dajotin û tijî hûr mûr dikirin. Her erebekî ji barê etarekî bêtir tiştê de hebû. Dukan wek mezatek sergirtî bû û ji derzî û dezî de bigir heta sêv û pûrteqalan té de hebûn. Carekî beşek dukanê zor baş hat xuya kirin. Ehmed ecêbma-

yî ma ji ber ku di vî besê dukanê de hûr mûr tenê bo pisîk û segan dihat firotin. Xwarina qutiyân, ya tûrikan, xwarina nerm, ya hişk, goşte gan, miyan, kêrguyan, masiyan, hwd ; hevsar, dermanê sipî û kêçan, sabûnên reng rengî, şe û firçe û pir tiştên din.

- Xweziya min bi dilê kûçik û pisîkên vî welatî be, got Ehmed di dilê xwe de, ev sedi sed cinnet e.

Di vê deqê de, perdeya din jî dest pêkir wêneyan bide nişan : zarokên reşik, zarokên esmer, bi hezaran zarokên birçi û tazî. Zikên wan repitî, çiqên wan wek qîtikan, çavêن wan di kortê de, porê wan weşiyayî, sûretên wan çerm û hestî û dengek zirav ji wan dihat der:

- Birçi me, birçi me, birçi me, anê birçi me !

Li ser perdeya yekemîn wêne hat guhertin. Li wenatek cîhanê hin mirovan berê lûleyên tifingên xwe didan serên gayên xwe, ew dikujtin û laşen wan davêtin kortek mezin. Ev mirovan ji rojnamevankî re digotin :

- Ger hikûmat destûr nede me, em goşte gayên xwe bihatir bifroşin, emê roj bi roj hin gayên xwe bikujin.

Dûre gemîyek li ser perdê derket ya ku bi mencenîqan pûrteqal davêtin hindir behrê ji ber ku tucarêن pûrteqalan nedixwastin pûrteqal li bajêr pir bibin çimkî piraniya pûrteqalan heqên wan erzan dike. Carekî dengê zengilekî hat û wêne hatin guhertin. Li ser perdakî hakimekî şes meh ceza didan xortek gundî ji ber ku wî bizinek ji şivanê gundek din dizî bû. Di perda din de cendirman bi hukmê zorê alikarî bo hikûmatê ji gundiyan distandin. Zengil dîsa lêket. Wêne niha êdî zütir diliyiyan. Li ser perdakî dadîgehek hikûmatekî cezê mirinê dida du xortan ji ber ku wan gule qurşin aveti bûn tombîlek leşkerên hikûmatê. Li ser perda din leşkerên wê hikûmatê bi sedan mirov dikujtin. Zengil dîsa lêket. Li ser perdakî, dadîgehek wenatek mezin 30 sal ceza didan xortek reş ji ber ku wî pere ji bankekî dizî bûn. Di perda din de şirketên wî welatî bi milyonan pere ji welatên paşvemayî û belengaz derdixistin. Li ser perdakî serokên hin welatan gotina azadî û serbestî û biratiya mirovan dikirin û li ser perda din jî balafir û zirxliyên wan agir berdidan ser azadîxwazên welatên wan û yên din. Bo hikûmat û leşkerên wan kuştin û talankirin qanûn û edalet bû ; ruxseta wan hebû ew bi hezaran mirov bikujin, di girtîgehan kin û xelkê welatên xwe talan kin, lêbelê bo ewen ne bi ruxset kuştina müşkekî jî cerîmet û «terorîzm» dihat hesibandin.

Carekî li ser perdakî weneyek xuya kir. Ehmed dît çawa çar pênc pêxember bi hevre rabûn û destek xwe ber perdê dirêj kirin. Di wêneyê de pirtûk dihatin şewitandin, ji ber ku ew bi zimanek qedexe-bûyi hatibûn çap kirin. Hin pêxemberan serên xwe ji qehran dihejandin. Dû re zengil bi dirêjî lêket. Hejmara perdan gihişt heftan û li ser wan wêne hatin pêşkêş kirin. Ji her çar hêlén salonê deng ji sandiqên reş dihatin der. Çavêن Ehmed bûn wek tasân ; û projektora tirkîya li ser sinor hat bîra wî, stûyê wî bû wek yê dik, guhêñ wî bûn wek antêla radyo ya muxtarê gund ; ango Ehmedê Oso ne dizani bû li ku sér ke û li ku sér neke, guhêñ xwe bide ser dengê van sandıqa li hêla çepê lê ya li hêla rastê, ya li pêşî lê ya li paşî. Ji beşekî ev deng dihat :

- Ey xudayê li jor, ey pêxember ! Bavê min kuştin, birayê min kuştin û şeva bihuri jî kurê min tev heft xortên din kuştin, lepênen wan ji wan qut kirin, serênen wan dûr xistin û laşen wan avêtin çem. Bes e êdî ; werin alîkariya me !

Ji beşek din dihat ev deng :

- Jina min nexweş e, pere tune ez bibim ser tixtor, zarokên min tazî birçî. Ey xudayê delal, ey xudayê cîhanê, bo çi te baran li ser me birî, zad û genimên me hişk kirin, de ezé berê xwe bidim kijan derî ?

Ji hin hêlan dihat dengê girî û nalîna nesaxan, ji hin beşan dihat dengê kenê mirovan ... Çavêن Ehmed jî heyirî bûn berê xwe bide kijan perdê û wêneyê : muftî û melan, serok û wezîran, qehpe û qûndan, yên rapaşî keran dikin, cendirme û mamûran, qumendar û xwînrêjan, derewçîn û bêbextan, lê bindest û belengazan ? Kurê Oso ne dizani bû guhêñ xwe bide ser dengê qulpiķen zikteran, nalîn û qîrina yên şewiti, yên xanî li ser hilweşiyayı, yan ser girî û gazindén séwîyan ? Ji hemû quncik û beşen dinê wêne dihatin ber çavên pêxemberan : kuştin, sejêkirin, talankirin, agir, bombe, gule, mirina zarokan, jinan, pîr û kalan, bindestbûna gelan, rindî û pîsi, ken û girî ; nexweşxanên pak û fireh hember niviştên şêx û melan, cihêñ bi ronahî û gündêñ tarî û şevreş, tombîlên reng rengî û kerên bi çerm û hestî, balafirêñ ji deng bezatir û zarokên bê xwendin, qonaxên 40 qatî û qubêñ kelpîçin ... Di hindir salonê de dîsa çira vêketin. Perde neman wêneyan raber dikin û dengê sandiqan jî hat seknandin. Pêxemberan bi destêñ xwe li pêşîrêñ xwe dixistin. Tev ku dengén wan nedihat Ehmed, ji wî ve baş xuya dikir ku ew digrîne.

Ehmedê Oso ji xwe re bala xwe da pêxemberan û bi rastî dilê wî bi wan şewiti. Lîbelê ji hêlekî de jî bêçarebûna wan û pasîv-mayîna wan li hember ev tiştên li cihanê cih digrin Ehmed xulemîş kirin. Bê ku hezirê xwe ke rabû ser xwe û qîrî :

- Girîn tu faydê li kesî nake. Belengaz û perişan bi şev û roj berê xwe di-din we û ji we alîkarî hêvi dikin. Hûn bi hêstirêñ xwe dixwazin agirê di hindir dilêñ wan de vemrînin ? Ma bi girî çi dibe ? Ger hêstiran fayde bikirana kesek li ser erdê birçî û tî nedima. Wax, wax, xwelî li serê me fiqaran be ... Aşkere xuya bû ku pêxemberan dengê Ehmed ne dibîstin û haya wan ji wî tune bû. Ehmed dest pêkir bi her du destêñ xwe li camê xwe :

- Ez dixwazim Xwedê bi xwe bibînim û bi wî re şorê bikim. Ez dixwazim ...

Bi carekî ve peyayê zexim ket hindir, destek xwe da ser devê Ehmed û bi destê din ew şûn ve kişand.

- Ma tu dixwazî ez te rakim jor û bavêjim erdê ? Ma te sondê xwe ji xwe bîra kir ? Ma min ji te re ne got ev şûn ne bo yên wek te ye ?

Bi rastî Ehmed ji tirsa re bizdoyî bû. Mirovê laşmezin bi çepelên wî girt, bir jêr û di deriyê mezin re avêt der.

\* \*

\*

Di hindir xanîki kelpiçin de peyak ramediya bû. Deng û his jê nedihat. Jinek lihevhatî ber serê wî rûniştî bû û cixare dikişand. Mérê wê şeva bihuri, dû yasiyan ji gundê şêx hatî bû û ber têkeve şeltê li ser mirîd û éldefiyan û şisan peyivî bû. Dû rohilat mîrik ji xew ranebû bû. Nazé, kulfeta (jina) wî, deng le kiri bû, ew hizandi bû, leqandi bû, çikir ci nekiri bû mérê wê ji xew ranebû bû ; tew deng jî ji wî derneketi bû. Lawê wan yê mezin çû bû pey şêx, lêbelê şêx çûbû gundek din. Li gund tu tixtor tune bûn, neji tombîl hebûn bo wî rakin bajêr. Pîrek gund pîvaz şikandi bû û da bû ber pozê wî ; peyan ava sar li wî kiri bûn, zanayê gund «Sûret Yasîn» li ser xwendi bû, jina wî karek serjê kiri bû û goştê karê li gund belav kiri bû, lêbelê bê fayde.

Nazo serê xwe li ser her ~~mîren~~ xwe leqand û hîn dest pê kir bibêje :

- Ax li min rebenê ; de rabe êdî Ehmedê min, ronediyê min...

Dema mérê wê veciniqî, çongên wî heziyan, qîrî û xwe ji nîşkava ji şeltê çê kir, rabû ser lingan. Bi qîrîna wî re kurê wî jî ket hindir û bi alîkariya dayka xwe bavê xwe rûnişkandin da. Nazo zû tasek av hanî û ber ve devê Ehmed bir :

- Vexwe, vexwe ; xêr e, îsella xêr e. Małava te em gîh bizdoyî kirin. Gelo ev ci bêtar bû hat serê te ?

Ehmedê Oso xwe da hev û bersîva Nazo da :

- Berî ez razêm, min «Ayetul Kursî» xwend û ji xwedê rica kir, ew Şêx Gêlanî di xewnê de bişîne cem min, bo ez ji wî çend tiştan daxwaz bikim. Lêbelê ez bi xeletî çûm li civata pêxemberan rast hatim. «Neûzû billah, neûzû billah», nale li çavêş şeytan yê kullî kor were ...

Nazo serê xwe dîsa leqand û bi dilek tiji kul û keser :

- Aax, ax, Ehmedê Oso, tu ci digerî li kaş ta bibînî xewnên şaş.

## **DEWLEMENDIYÊN ZIMANÊ ME**

Zimanê gelê me ji ali navêni tişt û heyinêni jiyanâ rojane ve yekcar dewlemend e. Piraniya bajariyan bi van ziravî û zengîniyêni ziman kêm dizanin. Gelo we dizanibû ku Kurd bi navê 36 texlît tirî, 13 vîne hêjîr û 9 cûre hirmê dizanin ?

### **NAVÊN TIRÎ**

**Tiriyê Reş :** ispendêwi, tayîfi, finik, hebêbi, soreva, reşê mewîja, reşê kevnêr, reşê koxer, dirêjihê reş, reşê feqîr, reşê sisik hûr, sorik, şitwîyê reş.

**Tiriyê Spî :** deywanî, gurnik, eniobengiyo, xilsik, lib dirêjik, kerkûş, koxer, misebq, mezrone, zeyti, zeynebi, qurfok, gewre, mîranî, bênavik, binîtatî, sincêri, heftcar, dilbarsî, zerik, hesenî, şitwî, tortork.

### **NAVÊN HIRMIYAN**

Topoli, hirmiya zerik, miseba (zû dighin), heziranî, elisork, şewkîl an sekûl, şitwî, rezî, seqebî.

### **NAVÊN HEJÎRAN**

Bêhnatî, rejik, sêhrek (berê wan pûçe), sincarî, rîhanî, zer, payîzi, qerpalî, şitwî, şîne, reş, sor, xinxalî.

Egid Dijwar

*Gelo di nav xwendevanêni «Hêvî» yê de kesêni ku navêni masiyan û daran baş dizanibin hene ? Zanîna xwe ji xwe re mehêlin bi alîkariya «Hêvî» yê bîghînin Kurdêni din ji.*

# **HELBEST**

## **ZIMAN**

*Osman SEBRÎ*

*Dil pirr dixwaze ku HÊVÎ hêviya Kurdan be,  
Di warê ziman û zanistî her xwedî şan be.*

*Zaravayên me bighîne serhev di pêşende,  
Kurdan nehêle di nava cîhanê şermende.*

*Heya bi îro em tenê bê zar û ziman bûn,  
Di nava gelan pirr bi şûnda gelek nezan bûn.*

*Îro jî dibînim gelek xwendayên me Kurdan,  
Gelparêz in ew haya wana nîne ji zînnan.*

*Çawan bê ziman gel di cîhan tête parastin ?  
Bi çi lebatî maf û rûmet hatine xwestin ...*

*Tenê bi ziman mirov cuda bûye ji dehban,  
Pê xwend zana bû firriya xwe gîhande ezman.*

*Lewra divê em ji bo ziman xwe biwestînin,  
Heya bikarin Kurdan ji tengiyê derînin.*

*Bijîn kesên ku ji bo ziman dikin xebatê,  
Ew in berê gel diguhêzin rêya felatê.*

*20-1-1984*

## BIYANÎ

*Reşîd SIMO*

*Li welatê xwe biyanî bûm  
Min bazda û fîriyam  
Bi çol û kerbelan,  
Bi banî û ezmanan ketim  
Li dawî ya cîhanê rawestiyam  
Da ku, ji biyaniyê felat bibim  
Ji bindestî û koletiyê rizgar bibim  
Ji min e ...  
Ez bi bihuştê ketim  
Ji dojehê bi dûr ketim  
Ew êş, derd û kul  
Giş ji bîra bûn.*

*Piştî ku hinekî  
Bên bi ber min hat  
Hiş hate serê min  
Min li hawîrdora xwe nêrî  
Hey wax, li minê ...  
Ew kul û derdêñ han  
Hemîyan bi min re bazdane  
Gavekê ji, ji min bi dûr neketine  
Derdé biyaniyê hîn girantir bû  
Berê li welat  
Ji me re digotin :  
Hûn Kurd in, cin û warê we nîne  
Ewê ku Kurd  
Bila biçe Kurdistanê  
Ma gelo Kurdistan  
Li kîjan deverê ye ?*

*Ew devera ku em tê de dijiyan  
Ji hezar salan de  
Bav û bavpîrên me  
Tê de westiyane  
Bi xwîn û xwîdanê avdane  
Ma qaşo, qey ew ne Kurdistan e ?  
An, Tirk, Ereb û Ecemistan e ?  
Lê belê, doza me  
Pir dûr û dirêj e  
Ewê girtî ye, zingar û qirêj e.*

*Îro, dibêjine min :  
Çima te dev ji welatê xwe berdaye ?  
Çima tu têyî pariyê devê me dixwî ?  
Ma em mirêbê we derekan in ?  
Em bikin hûn jî bixwin  
Haydê kelereşino  
Ji welatê me biqeşin  
Ev welat, welatê me ye  
Welatê serzer û çavşîna ye*

*Bela me biyanîyêñ kurdan  
Berê yek bû, lê nuha bûne du  
Him biyanî ne, him jî sereş in  
Li welatan digerim, kes li min na be xwedî  
Li boyaxê digerim, nema bi kér min té  
Zimanân dixwînim, nema fêr dibim  
Li kar digerim, nema bi dest dikeve  
Bûme çilek li deriyan dixînim  
Da ku pariyê nan jî zaroyan re werînim*

*«Lalo bibêj, kero bibîs»*

## WELATÊ ZAYÎNÊN TEZE

CANKURD

*Pîroz be li we zayîna teze*

*Dayîna we ...*

*Silavêñ germ li xaka genim lê şîn dibe*

*Kulîlk té de vedibe bihn dide ...*

*Silav ji zarowan re, ên ku Manda xwe li ser qûmê*

*Di defteran de*

*Li lîstgehan rêz dîkin*

*Silav ji dayikêñ pîr re, ewêñ ku êzingan*

*Li zivistanê*

*Di bahozêñ berfanî de*

*Boyî destpêka buharê dicivînin,*

*Agirekî germ tariya koletiyê*

*Herheyînê biçirîne ...*

*Silav ji wa çirûska sor re, ewa ku axaftinêñ azadiyê û serxwebûnê*

*Di sînoran re*

*Di gedûkêñ çiyayêñ ku bihevde girêdayî*

*Digihîne cihana kehr ...*

*Silav ji we re, ji héviyê re*

*Ya ku weke sazeke pîr û wenda*

*Ji nû ve dikeve têlêñ dilovanan*

*Ji nû ve buharê hişyar dike*

*Bulbulan bi zar û ziman dike*

*Jîna me dixemilîne, dilşa dike ...*

*Silav ji we re, birano !*

*Kurêñ welatê ku ji bîr bûye*

*Di dîrokê de herdem talan bûye*

*Lê Îro ... weke Volkanê pîr ji nû ve hişyar bûye ...*

15.1.1984

## VÎ PESARÎ

*Dr. RÊZAN*

*Pesaro ! nehati bûm pirsan kejî kim  
Li navê te,  
Nehati bûm  
Bejna te bipîvîm bi kunê derziyê,  
Ne bazirgana, çinokan  
Rêzkim li xanê mirovan ...*

*Va werza beyar bû, çol bû  
Gîsin şikiya  
Li nav zanga û rîşan da,  
Li asî serneketinê  
Barê ziwanê min hêrî,  
Arvan anî,  
Li gewerê birçîtiyê  
Sêla dilekan min ar kir,  
Aram bijart,  
Jema min bû  
Her dem dixwar ...*

*Pesaro ! bersiv şêlû bûn  
Dixulkulîn ji Cobaran,  
Şindokiyê şivîlan bûm,  
Qijaviya hemêz kirim*

*Pejna leyланê xapandim.  
Li ber şêmikê şiketa  
Dergevan bûm  
Tari dipa  
Li ber gola genî  
Min lêksi dixwandin  
Ji masyanra  
Ji şevneşina  
Min meya tal dimijî  
Sermest dibûm  
Bi şîrinbêjén derewîn,  
Dikuzim ji êş û jana ...  
  
Pesaro ! ez natirsim ji gel û gura,  
Ji rojên girj, ji sêdarê.  
Tova gul û gulşena me,  
Weşa biharê diçinim  
Di govdî asoyî sor da,  
Rimjîm li esamî zama  
Ewran derzî dikim bi zîpkên baranê,  
Dêmonim ... li reşantiyê  
Dile xwe vêdixim, réyê nîşan dikim  
Ji bendiyana, hejaranra.*

*11.12.1983*

## HEVALA MIN

*Emin Silêman SEYDO*

*Ez mêvanê dilê te me  
Evîndarê bejna te me  
Pir hêsîrê çavê te me  
Ji keçika ez yarê te me  
Rûxweşika min*

*Lêv şêrîn û dev xwesikê  
Birhan êdî zirav bikê  
Çavan ji şevê reş bikê  
Tilyan bi mûmya zer bikê  
Serbilinda min*

*Jar û hejar im bi evînê  
Serxweş û mest im li ser Zînê  
Bi endéra re meş civînê  
Ez Seydo me tu ji jînê  
Valintina min*

*Bîna biyoke ez gêj kirim  
Li bexçê gula ez bêhiş kirim  
Kerr û kor û bidar kirim*

*Ez şehîdê bejna te me  
Hevala min*

*Cînz\* û palto li ser bejna xwe ke  
Çentê biçûk di destê xwe ke  
Şeveq û ronak bi navê xwe ke  
Vi hêsîrî bi benda xwe ke  
Delala min*

*Bihevre em biçin sînema  
Derxin ji dil kul û xema  
Bi kêfxweşî em bîghên sema  
Tiştê nexweş êdî nema  
Sérîna min*

*Nama çêke bi kurdî  
Tim bibêje vî derdî  
Zor û stem me pir dî  
Çi heval bû mi ji xwe r'dî  
Kurdistana min*

---

\* Salê jeans

# PIRTÜKÊN NÛ

*Di hejmara me ya pêşîn de lîsteke pirtûkên di salêن 1981-1982 de bi kurdî, an bi zimanên biyanî li ser Kurdistan çapbûyî hati bû dayin. Lîsta jêrin dûmahîka wê ye û wê temam dike.*

## BIJİŞKİ

**BOREKAYÎ** Seddiq Safizade, Tebb-ê su'nnat i der miyanê Kordha (bijiskiya kevneşopî di nav Kurdish de), çapxana Atai, Tehran, 1982, 200 rûpel. Bi zimanê farisi.

Navên giya û nebatênu ku li Kurdistanê Iranê peyda dibin, bi rîza alfabetî hatiye dayin. Nivîskar xisûsiyetên her yek ji wan ci ne, rûniştevanê navçeyên kurd çawa wan bikar tînin, ci eşan bi wan derman dikin diyar dike.

A.M.

## DİROK

**ARFA Hasan, Kordha.** Wergerandiye farisi Seyyid Mohammed Semedî, 1982, 152 rûpel.

Ev pirtûk wergerandina farisi ya «*The Kurds, an historical and political study*» (Oxford University Press, London, 1966, 178 rûpel). Nivîskarê wê generalê ordiya Iranê (1944-1946) û sefîrê Iranê li Turkiyê (1958-1961) bûye.

A.M.

**EAGLETON, W., Cumhûriyê 1946 Kordestan.** Wergerandina farisi ya Seyyid Mohammed Semedî, Mahabad, çapxana Seyyidîan, 1982, 132 rûpel.

Pirtûk di sala 1963 de bi ingilîzî di bin navê *The Kurdish Republic of 1946* bi destê The Royal Institute of International Affairs li Oxford University Press (142 rûpel) çap bû bû. Werger hin wêneyê din bi ser sê xerîte û 32 wêneyê ku di pirtûka W. Eagleton Jr. de bûn zêde kiriye.

Seyyid M. Semedî berê vê pirtûkê wergerandi bû kurdî û di bin navê *Komarî Mehabad* di 1981 de çap kiri bû (Mehabad, çapxana Seyyidîan, 2 cild).

A.M.

**MIRNIYA Ali, Serdaranî az ilat va tavayafê Darregaz dar xedmatê mihan** (Serekênil el û teyîfeyê Darragazê di xizmeta welêt de), Meşhed, 1982, 224 rûpel. Bi farisi.

Ev xebat li teswîr û nasandina eşirêñ kurdêñ ji sedsala XVII bi vir de li Xorasanê hatine bicîkirin e.

A.M.

**ŞEMZİNÎ Ezîz, Bizûtnewe-y netewayetî rizgarixwazaney gelî Kurdistan, weşanên Yekîtiy Niştimanî Kurdistan, cild I, 136 rûpel, 1982.** Bi kurdî.

Ev pirtük ji ber teza doktorayê ku dirokzanê Kurdistanâ Iraqê, Ezîz Şemzînî sala 1959 li Leningradê pêşkêş kiri bû hatiye girtin. Ev cara pêşin bû ku Kurdeki li ser şere rizgarixwazê gele kurd ji nîvê sedsala XIX bi şûn de xebateke zanistîya giştî pêk dianî.

Di dawiya 1959 de *XEBAT*, rojnama Partiya Demokrata Kurdistanâ Iraqê, jê, bi erebî, birêñ fireh belav kiri bû. Çapa niha bi kurdiya navendî ye, Eseserd (Ferid Rébuwar) wergerandiye û tenê beşike xebata girîngä E. Şemzînî hildigre. Rastî ev e ku berpirsiyaren Yekîtiy Niştimanî Kurdistan hemû bûyeren serekeyen ku piştî Sherê Cihanîye Duwem li Kurdistanâ Iraqê di bin serokatiya Mela Mistefa Barzanî de qewimîne «sansûr» kirine.

A.M.

## EDEBIYAT

**BACELAN, Rostem, Derya, çapxana Hawadis, Bexda, 1981, 81 rûpel.**

Derya berhevoka pêncemî a helbesten R. Bacelan e (ya yekem di 1977 derketiye). Xwediyê pirtûkê li Hewlêrê mamoste ye, helbesten evînê ên kurt û rindik, carna bi beşavend (qafîye) carna bê, dînivîse. R. Bacelan ji pêla nû ya helbestvanen kurdêñ Iraqê ye.

J.B..

**BERGSTRÖM, Gunilla, Alfons û cinawir, Kurdiska Förlaget, Stockholm, 1981, 27 rûpel.**

Çirokekî ji bo zarakan ji swêdî hatiye wergerandinê kurmanciyê. Li Stockholmê çap bûye û tê de wêneyen xweşik hene.

J.B.

**BOZARSLAN, M. Emîn, Kêz Xatûn, Immigrant-Institutet, Ser. D. Barnoch Läroböker, No 8, Borås (Swêd), Invandrars förlaget, 1982, 79 rûpel.**

Kêz Xatûn berhevoket fablén kurdî ye. Kurd ji fablan zehf hiz dikin. Nivîskar berê berhevokên din jî ji bo zarakan pêk anî bû (binêre Hêvi, No 1). Di pirtûkê de gelek wêneyen Ahmet Cantekin hene û ew alîkariya nasîna folklorâ Kurdî dike.

**CELİL Casimê, Emerê Celalî, Wezareta hînkirin û rînişaniyê, idara hîn kirin û weşandina kurdî, rîz No 2, Bexda, 1982, 110 rûpel.**

Berxwedana mîrxasaneya Kurdan li dijî êrişen Shah Abbasê Sefewî ji gelek helbest û romanen re bûye babet. Helbesta Casimê Celil, emerê Celalî jî li ser vê pela mîrxasiya dîroka Kurda ye. Di vê helbesta 1036 misra de Celîl rola girîngä eşîra Celaliyan di vî şeri de nişan dide û bi ya wî Xanê Lepzérin bi xwe jî Emerê Celalî, serekê eşîra Celaliyan bû.

Izzedîn Mustefa Resûl, ku profesore edebiyata kurdî ye li Zanîngeha Bexdayê, vê helbesta ku di 1970 de li Erivanê di *Kilamê Ciya* de çap bû bû, ji tipen kîrilîk (rûsi) qelibandiye tipen erebî. Di pêşgotina kitêbê de I.M. Resûl qala hemû nivîsandinê ku li Yekîtiya Sovyetî û li Iraqê li ser kela Dîmdîmê derketine dike.

Ji bo ku Kurdê Iraq û Iranê baştır tê bigîhîn, ferhengokek kurmanci/kurmanciya xwarê hatiye danîn di dawiya pirtûkê de.

J.B.

**CELİL, Casimê, Zozan, Stockholm, 1982, 186 rûpel.**

Weşanên Roja Nû di vê berhevokê de heşte helbesten Casimê Celîl bi tipen latinî çap kirine. Helbest ji pirtûkên *Rojé Min* (Erivan, 1960), *Kilamê Ciya* (Erivan, 1970) û *Kurdê Bengî* (Erivan, 1980) hatine helbijartin. Di pêşgotinê de Babaê Keleş, bi kurtî jînenigariya,

nivîskar dide. Casimê Celîl, wekî Emînê Evdal, Heciyê Cindî û Ereb Şemo ji nesla pêşîna nivîskarên kurdên Ermenistana Sovyeti ye, ya salên 1930 da peyda bûyî.

J.B.

**CELÎL** Ordixanê û **CELÎL** Celîl, Zargotina Kurda, Erîvan, 1982, cild 2, 255 rûpel.

Her du brayên Celîl çêtirin folklorasên kurd in. Bêtirî bîst salan e ew ji ber dengbêjên kurdên Sovyetistanê û Sûriyê folklorâ kurdî berhev dikin. Dengbêj berebere kêmtir dîbin û bixwe re bireke mezina pêmahiya (mîrasa) çandiya kurdî dîbin gorê ; lewra xebata van her du brayan zehf girîng e.

Ewan gelek destanan civandine. Her guhartoyek hatiye nivisin, îzah û şîro vekirin. Di vê berhevoka nû de tiştên ta niha çapnebûyi hene û nivîskar guhartoyeke nû ya destanên Slêmanê Slivî, Leyli Mecrûm, Zembîfiroş, hwd ... pêşkêş dikin.

J.B.

**CEWERÎ**, Firat, Eriş dikin, 1981, 90 rûpel.

Berhevoka helbestên kurtên şairekî şoresser ji Kurdistana Tirkîyê.

J.B.

**CIGERXWÎN**, Şefaq, weşanên Roja Nû, Stockholm, 1982, 180 rûpel.

Navdartirîn şairê kurmanc Dîwana xwe ya 6a dertîne. Babet wekî yê berhevokên wî yê berê ne, ziman gelek xwerû ye û ji bo zimannasan kaneke giranbiha ye.

J.B.

**ÇAÇAN** Karlêne, **BOYIK** Eskerê, Bahara Teze, Erivan, 1982, 160 rûpel.

Ev berhevoka helbest û çirokan bi helbesteke şairê ermeni H. Tûmanian, ku Heciyê Cindî wergerandiye kurdî, dest pê dike. Tê de helbestên Casimê Celîl, Aramê Çaçan, Karlêne Çaçan, Ferikê Usiv, Xelîlê Mûrad, Eskerê Boyik, çirokên Nado Mahmûdov, Eliyê Evdilrehman, Emerikê Serdar, Tîtal Mûradov hene.

J.B.

**HAWAR**, Yadî Niştiman, London, 1982 ?, 127 rûpel. Navê Hawar ê rastî Muhemmed Resûl e û ew ji Suleymaniye ye. Ew yek ji temsîkarên dawînên şî'ra klasika kurdî, bi zaravê soranî ye. *Yadî Niştiman* helbestên welatparêji ku wî di salên 1961-1974 de nivîsine dighine hev. Hin ji van helbestan berê li Iraqê derketi bûn , hin ta niha çap ne bû bûn. Hawar di 1959 de li Iraqê berhevokek bi navê *Yadî Badînan* (miraniya Kurda ku ji sedsala XIII ta sedsalâ XIX hikim kiriye, paytexta wê Amêdî bû) derxisti bû.

J.B.

**HEWRAMANI**, Muhemed Emin Xeffür, Berhemî Jiyan, diwanî honrawekanî Emin Neqşebendî, Béwey, çapxana Şefiq, 1980, 160 rûpel.

Hin afirandinên şair Emin Neqşebendî di kovarên Iraqê de derketi bûn. M.E.X. Hewramanî tevahiya helbestên wî (xazel û qeside) yê bi soranî, hewramî û farisi nivîsi di vê berhevokê de civandîye. Emin Neqşebendî ji mala şexên Tarîqata Neqşebendîyan e. Di 1931 de li Biyarê (navenda Tarîqatê) hatiye dinê. Pişti qelibandina qraliyetê li Iraqê malbata wî (Şêx Osman, Şêx Muhemed Bahaeddin, Şêx Muhemed Ma'sûm...) diçe li Kurdistana Iranê li Merîwanê bîcîh dibe. Emin Neqşebendî dibe mudirê Radyo - Televîzyona Kurdistan û Merîwanê û li şarî Sinne (Sanandaj) rûdinê. Pişti şoreşa islamiya 1978, hemû ji nû ve vedigerin Iraqê û şair niha li Radyoya Kerkükê dixebite.

J.B.

**ISMAİL**, Ahmed Muhemed, Çaweruwani, Wezerata çand û agahdariye, idara çand û weşanên kurdî, No 73, Bexda, 1982, 42 rûpel.

Berhevokek ji yanzde kurteçirokên di salên 1972-1980 de nivîsi pêk hatiye. Nivîskar jiyanâ rojane ya Kurdan li gund û bajarêن piçûk raber dike...

J.B.

**KERÎM**, Mistefa Salih, **Şehîdanî Qelay Dimdim**, çîrok ; pêşgotina Şikûr Mistefa, çapa 2a, Bexda, 1982, 57 rûpel.

Destana Xanê Lepzérin, serokê eşîra xurt a Bradostan ku li dijî leşkerên Şah Abbas di salên 1608-1609 de berxwe danê kaniyek ilhamê ye ji bo şair û nivîskarêن kurd. Alexandre Jaba destnivisek bi navê «*Hikayeta Serê Serokê kela Dimdimê li dijî Qizilbaşan*» ya. Feqiye Teyran (1590-1660) sparti bû kitêbxana Leningradê. Casimê Celîl di 1961 de li Erivanê helbesteke direj a 560 misre, Ereb Şemo ji romanekî (216 rûpel, Erivan, 1966) li ser ve berxwedanê dinivîsin. Mistefa Salih Kerim, di 1958 de li Sileymaniye romaneye kurtî bi kurmanciya xwarê dinivîsi. Nivîskar niha ve romanoka xwe tevî birekî nû ji nû ve çap kiriye.

J.B

**LINDGREN**, Astrid, **Keça Şerrût Lotta**, Kurdiska Förlaget, Stockholm, 1981, 56 rûpel.

Pirtûkek ji bo zarokan ku nivîsekariya weşanên Hêvî, li Stockolmê ji swêdî werge-randiye kurmancî, ji bo zarokên kurdêن derveyî welêt. Tê de wêneyên bedewên Ilon Wikland hene û xwendina wê xweş e.

J.B

**QAZÎ Ahmed, Dîwanî Seyf ul Quzzat**, Tehran, 1982, 82 rûpel.

Hesen Seyf ul-Quzzat (1874-1944) li Mahabadê hatiye dinê û li wê çûye rehmetê. Ew mamê Qazî Mihemed, Serekê Komara Mahabadê bû. Helbestêن Seyf ul-Quzzat bi kurdîya mukrî hatine nivîsin, klasik in û babeta wan dîrokî ye. Ahmedê Qazî, ku bixwe jî ji malbatâ Qazî ye, van helbestan tevî wêne û jînenigariya şair di berhevokekê de civandîye û çap kiriye. Pêşgotina berhevokê Hejar (Abdulrahman Şerefkendî, şairê neteweyîye Komara Kûrdî ya Mahabadê, ku piştî sîrgûneke direj li Iraqê niha li Kerejê, nézî Tehranê dijî) nivîsiye.

J.B

**QEREDAXÎ, Mihemed Eli**, Keşkoli kelepûrî edebî kurdî, cild 2, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rêz No 6, Bexda, 1982, 250 rûpel.

M.E. Qeredaxî pisپorekî edebiyata kurdî ya klasik e. Wî xasme diwana Mîrza Rehim Wafaî (1844-1914) çap û belav kiriye. Di ve berhevoka duwemina helbestan de, ew afiran-dinêن, bi piranî qet çapnebûyî, 21 şairên heyama klasik pêşkêş dike. Piraniya destnivisan kêm an zehf xesardîti ne, lewre nivîskar mecbûr maye wan wisa natevav û nîvcûn derxîne. Qeredaxî menhûyên (metnêن) bi kurdîya navêndi (Ehmedê Kor, di 1858/1859 de mirîye, ji mîraniya Soran bûye ...) û bi goranî (Ehmedî Beg Koması, sedsala XVIII, xulam şaxan ku li Dîwanâ Ardalanâ jiyaye, Baba Şêx Bêsarane, Xanay Qubedî (17001759), hwd ...) nivîsi helbijartîye ...

J.B

**RESÜL Ismail, Çend basêk derbarey edeb û rexney edebî**, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rêz No 7, Bexda, 1981, 160 rûpel.

Berhevoka neh lêkolînêن edebiyêن I. Resûl ku di kovarêن kurdî yêن Iraqê de (Roşin-bîri Nû, Beyanî, Nûserî kurd, Defterî Kurdewarî, al-Taaxî) derketine.

J.B.

**SAFÎZADE Seddiq, Hiwa**, Tehran, çapxana Ataî, 1982 ?, 38 rûpel.

Berhevokek piçûk a helbestêن nüjen bi kurdîya navêndi, Şair ji eşîreta mezin a Jaf,

ku li her du aliyêñ sînorê Iraq û Iranê dijîn, e. Wergerekî başî kurdî-farisî û farisî-kurdî ye. Niha li Radyo-Televizyona Tehranê berpirsiyarê bernama kurdî (bi kurmancî û mukrî) ye. Ev bernâme her roj sê saet dom dike.

A.M.

**TÎRÊJ, Kovara çande û pîşeyî**, hejmar 1,2,3 (1980), Izmir, 81 rûpel ; hejmar 4, Spånga (Swéð), kanûn 1981.

Kovara Tîrêj ta darbeya eskerî li Tirkîyê derket, piştî wê koçî Swêd kir. Nivîskarên vê kovarê ji Kurdistana Tirkîyê ne û dixwazin çanda kurdên Tirkîyê pêşve bibin. Cêribandinê wan ên pêşîn qenc û hêja ne. Di kovarê de kurteçirok, helbest û çirok bi kurmancî û bi dumilî (ku bi milyonan kurd li Tirkîyê dipeyivin) hene.

J.B.

**XAN Balî û ROHAT, Berevoka Helbestêñ Kurd**, weşanêñ Komkar, Frankfort, 1982, 111 rûpel.

Balî Xan û Rohat ji Kurdistana Tirkîyê ne û dixwazin bi vê berhevokê abîdeyêñ edebiyata kurdî bi welatiyêñ xwe bidin nasîn. Piştî pêşkêşîyeke dîrokî ya kurt li ser edebiyata kurdî, nivîskar ji afirandinêñ sî û pênc şairêñ kurd nimûnan didin. Berî her afirandinê jînenigariya xwedîyê wê bi kurtî hatîye dayîn. Di dawiya vê berhevoka bi tipêñ latînî nivîsi, ferhengokek kurdî-tirkî jî heye.

J.B.

**ZENGANA, Muhemmed Abdulrehman, Welî dêwanew Şem, şanogerî, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanêñ kurdî, rîza şanogerî No 5, Bexda, 1981, 118 rûpel.**

Welî Kemaleyî (1826-1881), li Kurdistana navêndî (merkezi) de kesekî efsanewî ye û bi navê Welî Dêwanê tê nasîn. Dilê wî keti bû Şemsê, keça maleke torin a Seysadiqê nézi Suleymaniyyê. Welî jî ji eşîreke feqîre qebila Jafan bû. Evîna Welî ji bo Şemsê jî wî şaire nexwendewar re bû bû kaniyeke ilhamê. Welî helbestêñ xwe bi zaravayê goranî, û goraniyek gelek xwerû, distirî û hevdemén wî ji berê nivîsine. Pîremerd ji van helbestan wergerandi bû soranî. Beşî kurdî ya Korî Zanyarî Iraqî van helbestan bi goranî çap kiriye.

Muhemmed Abdulrehman Zengana ji evîna yekaliya Welî piyesike şanogeriyê (tiyatroyê) derxistiye. Tê de ew ji rastî û pêkahî wê de diçe û Şemê ne tenê bersiva evîna Welî dide lê gava ku her du dilketî axir digihîn hev, ew ji heyecanê dimre.

J.B.

## OL

**BOREKA YÎ Seddiq Safîzade, Neveştehayê parakande derbareyê Yarsan (ahlê Haqq), Tehran, çapxana Ataî, 1982, 254 rûpel.**

Yarsan navê ku li mirîdêñ mezhebê şîiyê Ehlî-Haqq re di navçeyêñ kurdên Iranê hatîye danîn : Kermanşah, Kengawer, Sehne, Sunqur û Kuliyayî, ...

Borekayı di vê pirtükê de hejmareke mezina légerîn, lêkolîn û nivîsandinêñ li ser Ehlî Heqqan civandîye. Ji bo hêşakirina têgihiştina menhûyêñ goranî, nivîskar ferhengokek goranî-farisî xistiye dawiya pirtûka xwe.

A.M.

## PIRTÜKNASÎ

**CELÎL Celîlê, kitêbêñ Kurdên Ermenistanê, 1930-1980**, Erîvan, 1981, 59 rûpel.

Dîrokzan Celîl Celîl kurê şair Casimê Celîl e, li Zanîngeha Erîvanê mamoste ye. Ew folklornamekî giranbihâ ye û ta niha gelek menhûyêñ (metnêñ) folklorâ kurdî berhev kiriye û çap kiriye.

Pirtûknasiya ku pêşkêşî me dike li ser pirtûkên kurdîyênu ku ji çapxanêne dewletiyêne Komara Ermenistanê derketine ye. Tê de navê 300 pirtûkan hatiye hildayîn :

- 1) afirandinê bi *kurdî* : Ji 1930 ta 1980, 247 pirtûk çap bûne (ji 1938 ta 1945 qet çap ne bûne) ;
- 2) afirandinê bi *fileyî* : ji 1932 ta 1980 44 pirtûk derketine ;
- 3) afirandinê bi *rûsî* ji 1936 ta 1979 6 pirtûk derketine ; û di dawiyê de
- 4) afirandinê bi *azerî* : di 1978 de pirtûkek derketiye.

Ji 1929 ta 1938, pirtûkên kurdî bi alfabe ya latinî, ya ku bi alikariya zimannas Q.I. Maragulov hati bû çê kirin, çap bûne. Ji 1945 bi vir de roman, çîrok, helbest, şanogerî û pirtûkên xwendina zimanê kurdî alfabe ya kîrîlîk (rûsî) bikar tînin.

J.B.

## ZIMAN

**BOREKAYÎ** Seddiq safizade, Ferhengê Med, cild 1, Tehran, çapxana Atai, 1982, 208 rûpel.

Ev céribandina pêşîna Borekayî nîne. Wî di salén 1970 yan de, tevî Mûrad Avreng, mîralayê ordiya Iranê, ferhengeke stûr a kurdî-farisî, bi du cildan derxisti bû. Nivîskar dixwaze proja xwe fireh ke. Ev ferhenga nû ya kurdî-farisî divê bibe ansiklopediyek kurdî. Cildê pêşîn gotinênu ku bi dengdareki dest pê dîkin dîghine hev.

A.M.

**EBRAHÎMPÛR** Mohammed Taqî, Vajenameyê farisî-kurdî, Tehran ?, 1981, 742 rûpel.

Ev ferhenga stûr a farisî-kurdî (sanandacî, avramî, kurmancî) dora 40 000 gotinan civandiye. Beytarekî pisporê hespa û mîralayê ordiya Iranê wê çê kiriye. M.T. Ebrahimpûr ji Sanandacê, serbajarê navçeya Kurdistanê ye û di 1980 de *Destûrê Zabanî Kordî*, ku teswira kurdîya Sanandacê ye çap kiriye û bi farisî romana a'ta kel (1977) derxistîye.

A.M.

**ELÎ Celal Mehemmed, İdiyomle zemanî kurdî da, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, réza folklorê No 1, Bexda, 1982, 504 rûpel.**

Ev bêgûman xebata temamtit e ku li ser ifadeyêni idiyomî di kurdîya navendî (soranî) de heta niha hatiye pêk anîn. Nesrin Féxrî, (Bultena Fakulta Edebiyatê a Bexdayê No 19, 1976), Ewîrehmanî Haci Marif (Wûsey Zimanî Kurdî, Bexda, 1975) û kesen din mîsalen ifadeyêni idiyomî di kurdîya navendî de da bûn. Lî xebata Celal Mehemmed Eli sistematiktir û frehtir e û xwebatên çêtirîn pisporan bingeh distîne : Pîremend, Muhammedî Xal, Ismaîl Heqqî Şaweys, Marût Ciyawok, hwd ... Ifade li gora rêza alfabe hatine pêşkêş kirin.

J.B.

**GOVARÎ KORÎ ZANYARÎ ERAQ**, Destey kurd, No 9, Bexda, 1982, 514 r.

Kovara Akademiya Zanistî ya Iraqê, Destey kurdî, ji salê carekê derdikeve. Ev hejmar seranser li ser pirsên rastnivîsına kurdî ye (kurmanciya xwarê, bi tîpêne erebî).

Tê de bi kurdî panzde lêkolîn hene û yek ji bi erebî. Ewê, dibêjin çapkerên kovarê, li ser ve pirsê lêkolînen din û civînen zanistî bêne pêk anîn. Rastî ev e ku di vî warî de xwendayênu kurd rastî gelek aseyî û dijwariyan dibin.

Va ne çend mîsalen ku légerên Akademiyê pêş tînin :

- 1) Dengê i tenê di destpêka gotinê de tê nivîsin. Ji bo *min*, bi tîpêne erebî tenê *mn* dinivîsin.
- 2) Di nivîsandina lêkerên hevedudanî de tu rastek û qaide nîne. Misal : tê hel çûn bi awayêner jêrîn tê nivîsin : tê hel çûn, tê helçûn, têhelçûn, têhel çûn, tê-helçûn (r. 215)
- 3) Paşdaniya -da ewê bi nav ve girêdayî be, wekî le malda, an cihê be : le mal da ?

4) Gihaneka û çawa biniwîsînîn ?

Em têxîn bir ku Enstituya Kurdî di 23-28 Gulânê da li Parîsê zimannasên kurd civandi bû û ew li ser pirsên yekitiya zimanê kurdî û yên rastnivîsînê xebitî bûn. Kurdên ji her parçeyên Kurdistanê hati bûn vê civinê û gîhişti bûn baweriya ku alfabe ya latînî, ku Kurdên Tirkîye, Sûriye û Libnanê ji salên 1930 an bi vir de bikar tînin çetir bersiva hewce-dariyê nivîsandina kurdî dide. Lébelê, di rewşa îroyî de, ji ber gelek sedeman, Kurdên Iran û Iraqê nikarin vê alfabê bikar bînîn. Heçî rastnivîsin, besdârên civinê daxwaziya ku Enstitu di weşanên xwe yên soranî de îmla ku piraniya mezina xwendayên kurdên Iraq û Iranê pê dinivîsînîn bikar bîne diyar kirin.

H.H.

**KHOSHNAW, Saladin, The Alphabets of Kurdish, Manchester ?, 1982, 50 rûpel.**

Vê alfabê mihendisek ji Kurdistana Iraqê nivîsiye ji bo hînkirina kurdî di Xwende-gahekê Manchesterê (Brîtaniya Mezin) de. Tip li gora rêza alfabe ya latînî tevî misalan hatine dayîn. Niiskar misalên xwe yên kurdî wergerandiye îngilîzî, fransizî, rûsî, swêdî, tirkî, erebî û farisî jî.

J.B.

**KURDO, Qanatê, Zimanê Kurdî, Rêziman, weşanên Komkar, Frankfort, 1981, réz No 9, 194 rûpel.**

Qanatê Kurdo çend pirtükên rêzimana kurdî nivîsiye : *Grammatika zmanê körđi*, Erivan, 1960 ; *Grammatika kurdskogo jazyka kurmandji*, Moskova Leningrad, 1957 ; *Zimanê Körđi, rêziman*, Erevan, 1970 ; *Grammatika Kurdskogo jazyka na materiale dialektov kurmandji i soranî*, Moskova, 1978, hwd ... Ewî wisa ji ferhengeke kurdî-rûsî a 34.000 gotina çêkiriye (Moskova). Vê rêzimana nû bi tipen latînî ji bo Kurdên Tirkîye nivîsiye.

J.B.

**NERÎMAN, Mustafa, Rênuşî kurdî le reg rîşe we, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rêza zimanewarî No 5, Bexda, 1981, 67 rûpel.**

Mustafa Seyyid Ahmed Nerîman niviskaré «*Bibliografya kitêbên kurdî (1787-1975)*» ku di 1977 de li Bexdayê çap bûye. Di vê kitêboka xwe ya dawîn de nivîskar qala dîroka nivîsandinê di navçeya Mezopotamyayê dike û dû re derbasi dîroka nivîsandina kurdî di menhûyên (metnên) çapbûyi dibe. Menhûya pêşin kitêba Mella Mahmûd Beyazîdî (1797-1856) li ser «*Adetên Kurdan*» e ; rehmetiya Margaret Rudenko di 1963 li Moskovayê destnivîsa kitêbê tevî wergerandina wê ya rûsî çap kiri bû. Menhûya duwemîn ferhenga kurdî-erebî a Yusif Ziya al-dîn Paşa al-Xalidî al-Maqdisî ye ku 1893 de li Stenbolê çap bû ye (çapa nû Beyrût-Paris, 1975) ; paşê kovara *Kurdistan* ku Miqdad Midhat û Abdulrehman Beg Bedirxan di salên 1898-1902 de derxitine. Li Iraqê kitêba kurdiya pêşin di 1925 de ketiye çapé. Tewfiq Wehbî ji ber alfabe ya erebî alfabeti kurdî der dixe û hin rastekên (qaïdên) rastnivîsînê datîne (*Destûri zimanî kurdî*, Bexda, 1929). Maweyek bi şûn de (1933) tipen taybeti hatin helbijartîn ji bo neh dengdarên kurdiya navendî (soranî). Piştî damezrandina xwe di 1970 de, Korî Zanyarî Kurdî (ku paşê bû Korî Zanyarî Iraq, Destey Kurdî), komisyonên taybeti danîn ji bo lêkolîna pirsên rastnivîsîna kurdiya navendî.

J.B.

**QAZÎ, Qadirê Fettahî, Hasîya bar farhangî, Mahabad, Tebrîz, 1982. 64 rûpel.**

Qadirê Fettahî Qazî profesor e li Fakulta Edebiyatê a Tebrîzê. Ew ji mêj ve li ser folklor û şîra geleriya kurdî dixebite. Di «*Rêza Edebiyata Gelerî ya Iranê No 1*» a Fakulta Edebiyata Tebrîzê de, helbesta *Mehro Vafa* tevî lêkolînek giran li ser folklorâ kurdî derxistî bû (1966). Salek bi şûn de, wî dîsa di wê rezê de (No 3), helbesta Feqî Teyran Şêx Sen' an çap kiri bû.

Îcar, ev zaneyê ziman û edebiyata kurdî servayîyek (ilaweyek) ji Ferhengê Mehabad (kurdi-erebî, Erbil, çapxana Kurdistan, 1961, 795) a Gîw Mukriyanî pêşkêş dike. Ev «Servayî» bi kurdi-kurdî ye.

A.M.

**SORAN Bahman Farivar, Rêzman** (destûrê zabanê kordî), Tehran, çapxana Atâî, deftera 1, 1982, 87 rûpel.

Ev deftera pêşin a «Rêzimana Kurdî» (Kurdiya navendî, «soranî») ji du birran pêk hatiye : I. Fonetik û alfabe : Nivîskar qala fonetika kurdiya navendî dike alfabeya bi tîpêñ erebî ku xwendayêñ kurdêñ Iraq û Iranê bikar tînin pêşkêş dike.

II. Morfoloji : Di vî birrî de Soran qala nav û pirejmarî dike. Menhûyên kurdî tevî wergerandina farisî hatine dayîn.

A.M.

## PIRTÜKÊN DIN

**JIYAN AZÎZ**, Emperializm ve meseleyê kord, Tehran, çapxana Ketabê Parham, 1981, 36 rûpel.

Ev lêkolîna piçûk li ser rola emperializmê di pêşveçûna bizûtnewa neteweyî ya kurd li Iranê bi destê kurdekkî Mahabadî hatiye nivîsin. Nivîskar li Brîtaniya Mezin edebiyat xwendî bû û îro li İspanyayê li sîrgûnê dijî.

A.M.

**KENDAL**, Etelaati derbareyê owzaê joxrafiyayî ve tarîxi ve siyasi ve edebiyê Kordestan. Şerif Azemî ji fransızî wergerandiye farisî. Tebrîz 1981, 18 rûpel.

Şerif Azemî nivîsandina pêşkêşkirina sêlika «Musique Populaire du Kurdistan, chants d'amour» (Mûsiqiya Gelerîya Kurdistanê, stranê evînê, disque Alvarêş, No 812 B), Ku di sala 1976 li Fransayê derketi bû wergerandiye farisî.

Duwanzde stranêñ vê sêlikê piranî ji folklorê ne û ji nav Kuðdêñ Sovyetistanê hatine girtin. Di pêşkêşîya sêlikê de Kendal bi kurtî qala dîroka gelê kurd, rewşa Kurdistanê, edebiyata devkî û nivîsandî û mûsiqiya Kurda dike.

J.B.

Joyce BLAU  
Abdullah MERDUX  
Helkewt HAKIM

**DUMILI**





## ZARÊ DUMILÎ û MEWLÛDA USMAN EFENDÎ<sup>1</sup>

Celadet BEDIRXAN

Berê çendakî, ber bi xelaskatarî ve diçûm. Dinya li me bû bû tarî. Min û hevaledî xwe me xwe da bû bin çirakî û vîtik dixwend.

Di paş me re kalek dihat. Umrê wî dora pêncê û sêstî de. Silav li me kir û xwe da naskirin. Mela Mihemed Nezîr Kurê Hecî İbrahîm Dêrşewî. Berê panzde rojan ji welêt hatibû û li min digeriya ku jê re an birayê wî ra karekî peyda bikim. Min got :

- Qenc e, sibê were mal em fed kirin.

Lê zimanê wî ne zimanê xelkê cihê Botan bû. Hêj bêtir diçû ser zarê Deşta Diyarbekrê.

Sibetir kalo hat. Biserhatiya xwe ji min re got. Ji ber Tirkân, ji ber sitemkariya wan bazda bû. Di nav axaftinê da min seh kir ku herçend bavê wî Dêrşewî bû lê bixwe di Sêwrekê de ji diya xwe bû ye. Ji lewra zarê wî ne zarê cihê Botan bû.

Mêvanê min mela, melakî medrese dîtî bû. Kêm û zêde bi herfên latînî ji dizanî bû.

Weki min navê Sêwrekê bihist û min zanî ku Mihemed Nezîr mela ye, zarê dumilî û Mewlûda Zazakî hatin bîra min.

Ji mêj ve min dil hebû hinkî bi zarê dumilî mijûl bibim. Nemaza Mewlûda Usman Efendi bêxim dest. Wê bi yekî.re ku rind bi dumiliya Sêwrekê dizane bixwînim, li ber binivisînim û bidim çapkirin. Ji xwe di vê zarê şîrîn de ji wî pê ve tiştekî din nehatîye nivisandin. Hatibe jî min ne dîtiye ne jî bihistîye.

Belê ji zû ve ye ez li vê Mewlûdê digeriyam. Berê du salan niviştek keti bû destê min, lê natevav. Ji pêşê û paşiyê çend rûpel kêm bûn, ên mayîn nîvçirandî û di hin cîhan de pirsên heşifandî hebûn. Digel vê hindê pêlekî ez pê mijûl bûm, bikêr nedihat. Min jî tiştekî hêja û tekûz ne anî der. Ji wî pê ve ji min re arîkarek jî divîya bû. Arîkarekî welê, herçî ku min nizanî bû bikare ji min re mana bike.

Melayê min herçend Kurdmanc lê Sêwrekî bû. Min jê pirsî heke bi dumilî dizanit. Ji xwe ewle û razî li min vegerand :

- Bi qasî kurdmancî bi dumilî jî dizanim. Ji «jinik»ê re «cenêk», ji «meriv» re «merdim» û «av» re «aw» dibêjin.

Lê dilê min li gotina wî rûnedinişt. Ji ber ku bi xwe Kurdmanc bû. Gelek Kurdmanc hene ku bi dumilî dizanin lê di axaftinê de her du zaravan tevlihev dikan û weke xwe nizanin bibêjin. Lê Zazayîn hene ku kurdmanciya wan de tu kêmanî nîne, mîna me bi kurdmancî dizanin. Ji ber ku kurdmancî di navbera Kurdên jorîn de zimanê tavayî ye û stran û dîlokêن zasan bi kurdmancî ne.<sup>2</sup>

Ber wê yekê ji min re yek diviya bû ku dumilî zimanê dê û bavê wî bibit. Min ji Melê pirsî .

- Tu çawan hînê dumiliyê bûyî ?

- Ji diya xwe hîn bûme. Bavê min ji Dêrşewê hatiye Sêwrekê, li Sêwrekê diya min mehr kiriye. Diya min bi xwe Zaza ye. Keça Mela Suleyman e, Mela Suleyman kurê Hafîz Îsa ye, ew jî pismamê Usman Efendî, Muftiyê Sêwrekê ye. Yanî ez xwarziyê Zazan im. Ez bi xwe di nav Zazan de mezin bûme. Ji xwe li Sêwrekê bi dumilî xeber didin. Lê bi kurdmancî jî dizanin. Xelkê dora Sêwrekê jî Zaza ne. Ez tim diçûm gundan û min her gav ji xelkê re Mewlûda Zazakî dixwend.

Edî min zanî bû ku paş çend salan rastê mirovê xwe hatime. Mela Nezîr bi kêre minbihata. Dumilî zimanê diya wî, zimanê wî bû. Lê bi zimanê bavê xwe jî weke xwe, pak dizanî bû. Dikaribû her tiştên dumiliyê ji min re bi kurdmancî mana bike. Melayê min melakî zor, melakî kitab binçeng bû. Mewlûda zazakî, ya Melayê Batê û Nehcul-Enam'a Mela Xelîlê Sérî pê re bûn.

Paş du rojan melayê min ji derî vedâ. Her sê kitêb di bin çeng ...

Mela Nezîr nivişa xwe di sala 1321<sup>3</sup> di panzdehê meha nîsanê de bi xwe nivisandi bû.

Lê iro çavên wî ji ber nexweşiyekî ewçend tarî büne ku destnivisa xwe nema dikare bixwîne. Ji lewra min jê re her beyt yeko yeko dixwendin ewî mane dikir zîr û zeber diedilandin, min jî bi her du herfan, erebî û latinî dinivîsandin. Di dema nivîsandinê û bi hinceta her pirsa nû min bala xwe dida qewaîdê, destûrnêن zimankî danin der û berpêl dinivîsandin. Bi vî awayî ez digiham bingehê zarê dumilî jî û min ew didanî ber kurmanciyê.

Ji hêla din, diviya bû ez bizanîm û ji xwendevanan re bidim zanîn, gelo ev kengê hatiye nivisandin û bi ci awayî ji Usman Efendî re hilketi bû.

Li gora gotina Mela Nezîr yekî ji melayêن Sêwrekê, bi navê Hecî Yusif Mewlûdek bi zimanê tirkî nivisandi bû. Ew û Usman Efendî bihev re nexweş bûn. Heçî ku berberî bihev dikirin. Paş belavbûna Mewlûda Hecî Yusif mîldarîn wî digotin : «Melatî û zanatî holê ye. Ne bi galgalan ...» Ew kurtûpist bi guhê Usman Efendî ve jî dikirin. Ne gerek e em bêjîn ku her du Mela jî Kurd û kurdziman bûn.

Wekî Usman Efendî ew bihistin ji nasêن xwe ra got : «Heke zanatî bi nivîsandina Mewlûdê ye ez Mewlûdekî bi zimanekî welê binivisînim ku pê hêj tu kitêb nehatiye nivisandin, ne bi tirkî ne bi kurdmancî lê bi dumilî ...»

Bi vî awayî û ji wê berberiyê ev Mewlûda ha hate pê. Nik dile min ev

cara pêşin e ku ji berberîya du Kurdan tiştekî qenc ber pê bû. Usman Efendî par li Sêwrekê çûye rehmetê. Rehmeta Xwedê lê bit.

Dîsan li gora gotina Mela Nezir, Usman Efendî Mewlûda xwe bi pênc salan beriya Meşrutiyetê, yanî di sala 1319 de nivisandiye.<sup>4</sup>

Mewlûda Heci Yüsif yanî a tirkî ji xwe hingê keti bû çapê. Lê ya Usman Efendî nediket. Carkî nivişteke wê şandi bû Diyarbekrê, ew nivişta ku min ya xwe li ber nivisand. Lê ji ber ku nizanî bûn bixwînin bi şûn da vegerandi bûn. Herwekî di pelê wê ê paşîn de bi tirkî nivisandiye : «Bîlxassa selam we senadan sonra istîfsar-ı xatir ederim. Mezkûr kîtab wîlayetden gerû ïade edildî. Sebebi : oquyamamışlardır. Baqî selam. 12 Hezîran 1322.<sup>5</sup> Imza nayête xwendin.»

Piştî Meşrutiyetê, pismameki min Faîz Beg Bedirxan bû bû qeymeqa-mê Puturkê. Bavê Mela Nezîr, Hecî İbrahîm cû bû balê. Mewlûd şanî wî da. Pir ne ajot Faîz Beg hate ezl kirin û vegeriya Stenbolê. Mewlûd jî bi xwe re bir ku bêxe çapê. Lê li Stenbolê jî ew nikari bûn bixwînin. Hingî Faîz Beg ji Hecî İbrahîm re nivisand bû ku an ew bixwe an kurê wî xwe bîghînin Stenbolê, Mewlûdê jî wan re bixwînin da ku bikarin çap bikin. Lê ne kur ne bav neçûn Stenbolê û Mewlûd neket çapê û Xwedê ji Usman Efendî re hez nedikir ku keda xwe bi herfîn reş bibînit. Em vê çapê ji bona şakirina giyanê wî pêşkêşî wî dîkin.

\*  
\* \*

Ji hêla din min dizanî bû ku nik Mihemed Eli Ewnî Efendî\* jî nivişte-ke Mewlûdê heye. Min jê re şand û nivîşa wî anî. Me her dû nivîşt danîn ber hev. Me dît ku di navbera wan de kêm û zêde ferqêن hene.

Berê pêşin di destpêka nivişta wî de deh beyt hene, di ya me de tenê sisê ne. Min ev ji Mela Nezîr re xwend. Ewî got .

Bi min beytên zêde paşê hatine biser xistin, herhal yekî ji ber xwe gotiye.

Di vê babetê de ez tiştekî nabêjim. Lê herwekî xwendevan bixwe dê bibînin di wezna wan beytan de xwarî û kêmanî zêde ne. Usman Efendî bi-xwe nikaribû beytên bêwezn an xwarwezn binivisîne. Jêre Mewlûda wî gwah e.

Digel vê hindê em beytan bê ku tiştê wan biguhêrînin, rastbirast diguhêzînin here :

---

\* Mihemed Eli Ewnî Efendî ji xwendayêñ Kurdan ên welatparêz û miliyetperwer e. Bixwe jî xelkê Sêwrekê ye. Li Misrê di Ezherê de xwendîye. Ev deh sal in di Dîwana Qeraînî Misrî de mutercîm e. (Celadet Alî Bedirxan).

Bi namê wahîrê no ard û azmîn  
 Ke ma dest kerd bi no girwe rengîn  
 Şima hemdê xwe Ellayê rê biyarîn  
 Şew û roj qapîdê ey di biqarîn  
 Pêxemberî rê selewatî biwanîn  
 Tim û tim derdê cê ver di binalîn  
 Misalê na dinê zanî ti merdim  
 Ti citêrênî, girwey to jî toxim  
 Ke to zanan kî no dinya senîn o  
 Bizanê a dinê cayê cû nîyo  
 Wedaro ey çê kî citêr bikaro  
 Kî citêr çî karit ey wedaro  
 Beso tobe biyarîn hey xedarîn  
 Dinyay di to hemî hewl bikarîn  
 Gunahdê xo rê arê bin binalîn  
 Birejnîn hersê çiman ra bikalîn  
 Bibo 'efêw gunahê mayê vêrdo  
 Gunehkarî kî 'umrê xo di kerdo  
 Selewatî biwanîn rind û bolî  
 Biresnîn pê dima gandê resûlî

Ji wî pê ve di menhûyê (metn) de, di gelek cihan de navbera nivîşa me û ya Mihemed Elî Efendi ferqêن din jî hebûn. Me ew ferq berpêl û di bin re û yeko yeko nîşan kirine.

Lê ferqêن mîna pêşbûn û paşbûna pirs û herfan û guhêrîna cîwekan ne héjayed nîşankirinê bûn. Herwekî di beyt û misra'ên jêrîn de têne dîtin.

- 1 - Çaxo qurban bî devê Ellay resa (Wexta qurban bî devê Ellay resa)
- 2 - Kam kî adir ra xelas xo rê waşt
 

Wa biwano ê resûlî rê selat  
 (Kam kî adir ra xo rê xelas waşt  
 Wa resûlî rê biwano es-selat)

3 - Kerdo ïnan ard bi Ellay bol nîyaz (Kerd ïnan û ard bi Ellay nîyaz).

Ev e ferqêن bingehî di navbera her du nivîstan. Di nivîşa Mela Nezîr de me tenê tiştên welê guhartin ku berê ve rengêن xwe ên binatî winda kiri bûn û rind nediketin weznê.

\*

\* \*

Zarêñ zimanê kurdî ên bingehî sisê ne. Zarê Welatê Jorîn, yê Welatê Jêrin û zarê dumilî. Herwekî nas e, zarê Welatê Jorîn kurdmancî ye û di kurdmanciyê de ferqêن zarawa û şêwan hebe jî zarê kurdmancî bê tu kêmanî şanî yekîtiyeke zimanekî dide. Lê zarê Welatê Jêrin ne welê ye. Di nav xwe de li zarnêñ din belav dibe û cih cih ci hev vediqete, mîna babakurdî'û

lorî. Ji wê pê ve di wî welatî de zarnê din hene bi gelekî ji zarê Welatê Jérîn dûr in û dikevin nêzingê zarê din.

## ZARÊ DUMILÎ

Ev zar zimanê Kurdên dumili an zazan e. Kurdên dumili di Welatê Jérîn, di rojavayê wî welatî de rûniştî ne. Bi piranî tevlê Kurdmancan in û ji zarê xwe pê ve bi kurdmancî jî dizanin<sup>7</sup>. Li gora ku min seh kir di zarê dumili de jî çend bir hene, lê di bingehî de ev birêñ ha dudo ne. Di nav van her du biran de di denganî û qewaîdê de ferqnêñ eßkere têne dîtin.

Di denganiyê de - Di zarê Sêwrekê de herfa J bi qasê kurdmanciyê nîn be jî, di hin pirsan de tête dîtin. Lê di dumiliyêñ din de mîna zarê Palû-wî de, J yekcar nîne û li şûna wî Z yek an C yek rabûye. Ji lewra heke ji dumiliyan re ji ber ku li şûna J ya kurdmancî Z dibêjin<sup>8</sup> Zaza hate gotin, dumiliyêñ Palû û Madenê ji dumiliyêñ Sêwrekê bêtir Zaza ne. An heke tête gotin zazatir in.

Di zarê dumili de pirsêñ her zarê kurdî têne dîtin, kurdmancî, baba-kurdî, hewremanî, h.p ...

Di vî zarî de V heye û gelek e. Dibe ji kurdmanciyê bêtir jî. Lê di hin pirsan de vê V yê mîna Babakurdan bi W yê diguhêrinin û li şûna av û şevê aw û şew dibêjin.

Di qewaîdê de - Zarê dumili di qewaîdê de ji her zarî bêtir nêzingê kurdmanciyê ye. Berê pêşîn pronavêñ ez û min, pronavêñ zindî, di vî zarî de weke xwe mane û ez jî neketiye. Ji lewra herwekî di kurdmanciyê de ye, di dumiliyê de jî filêñ lazim û muteeddî cihê cihê têne tesrif kirin.

Tenê di mesela cisnê de zarê Palûwî kêm kiriye. Lê zarê Sêwrekê mî û nîrêñ xwe weke xwe hilanîne. Di hin cihan de mesela cisnê di vî zarî de ji kurdmanciyê bêtir, kûrtir û hûrikirtir e. Ewçend ku di filan de jî tête dîtin. Paş ku me ev fergêñ ha, bi kurtî gotin emê ji xwendevanan re menhûkî bi du zaran bidin zanîn, bi yê Sêwrekê û yê Palûwî.

Ev menhû çirokeke Mukrî ye. Par xortekî hejdeh salî ji welatê Mukrî, ev çîrok ji min re goti bû min jî nivisandi bû. Min ev menhû li her dû zarêñ jérîn da wergerandin. Yê pêşîn ji Mela Nezîr û yê duwem ji Muhyeddîn re. Muhyeddîn, xelkê Palûwî ye. Ji Gundê Meman ji Eşîra Qasiman.

Ji bona ku yek di hukmê zarê ê din de nemînit min ji her duwan re menhûwa Mukrî xwendin û jê li zarê wan da wergerandin, bê kû yek ya adin bibîne.

\* \*  
\*

## DUMİLİYA SÈWREKÈ

Rojê rojan di dewên di hawar dekewt. Şarê dew pêro remayê. Dewi miyan di kergên û des leyrekî ca di mendê. Lûyêndo vêşan ïnan ra peyda bî. Kerg xeylî tersa. Lûy ay rê va :

- Ez do to bora tewrê leyrekan.

Kerg cirê va :

- Heta hewt rojî vindir.

Lûy cirê va :

- Qandê çicî ?

Kerg cirê va :

- Leyrek bol werdek î.

Lûy zana dew di kes çinyo veng nêkerd, şî. Kerg kewt qesawet. Tew rê leyrekan dew ra vijiya. Şî aryeyî het. Uja aşwançî ê dînay. Kerg hewar kerd, cirê va :

- Ewro lûyênen ma ra peyda bî. Min rê va : «Ez do to bora». Min cirê va : «Heta hewt rojî vindir». Lûy şî, veng nêkerd. Ti nika tazî û kutikan hadire ki heta Dedi Lûy yenno.

Aşwançî va :

- Bol rind o.

O wext postê lûy neway çeturî kerdê. Aşwançî xeylî pê weş bî.

Kergî rê va :

- Ezo no maydan di lanêñ biken. Ezo tewrê kutik û taziyan deke-win. Eger Dedi Lûy ame tenekî ey dir ra kay bike. Odo to rê vajî :

- Ey kergê, kergê, kergê ! Ezo to borî tewrê leyrekan.

Bado ti ci ra vajî : «Ey Dedo Aşwançî, ti bixwe û kutikê qundî bê teber.»

Lûy ame meydan, venda kerg, kerg şî, cirê va :

- Çunkî ti nika mi borî, min rê weş o tenekî kay keran.

Destê jewbînî girewtî. Kerg cirê va :

- Min rê deyrî biki.

Lûy va :

- Ey kergê, kergê nika ezo to bora tewrê leyrekê to.

Kerg va : «Nobeta min a» dest pa kerd :

- Ey Dedi Aşwançî bê teber, ti bixwe û kutikê qundî.

Lûy tersa, va :

- Hunî mevaji, axir ez tersenno.

Qissey temam kerdî, Dedi Aşwançî vijya. Tazî û kutikan wexto lûy dînayî, girewtî û fetisnay. Aşwançî bi lûy, kergi bi leyrekan bî şay.

## DUMİLİYA PALÛWI

Rwecî rweca dewêkî de hewar kewt. Şarê dew pyero remay. Miyanê dew, ca mend kerg tewlê des lîçikana. Yînê rî lûyek peyda bî zehf veşan.

Kerg zehf tersê. Lûy tira va :

- Ez to borî tewlê lîçikanê tuwiya.

Kerg tira va :

- Vindir heta hewtena rwecî.

Lûy tira va :

- Qey çine ya ?

Kerg va :

- Lîçikî zehf qic î.

Lûy zanani dew di çew çîno, veng nikerd, şî. Kerg kot dişmîş biyayış.

Dew ra tewlê lîçikanê xoya vickyay, şî arye. Üca arbançiyê dî. Kerg hewar kerd, tira va :

- Eyro lûyek min rî peyda bî. Min ra va : «Ez to borî». Min tira va : «Vindir hewtna rocî». Lûy şî, veng nikerd. Ti inkey tanzî û bwecî hedre ki heta Apo Lûy yenno.

Arbançî va :

- Zehf hewl o.

In wexti d' postey lûy neway çeturi kerdiyê. Arbançî zehf pê weş bi.

Xo hedre kerd, kerg ra va :

- Ez in meydan di qulêk bikeyn. Tewlê tanzî û bweciyan dekuwî. Eger kî Apo Lûy ame tay cirî bireqisi. Wi tue ra vaco :

- Hey kergê, kergê ... Ez to borî tewlê lîçikanê tue ya.

Bacî ti tira vac :

- Hey Apo Arbançî, bê teber, ti bixo w bwêcî qundî.

Lûy amey meyda, venda kerg da, kerg şî, tira va :

- Qey gî ti inkey min borî min rî weş o ez bineykekî bireqes.

Lûy va : «Hewl o». Destê yowbînî gured. Kerg tira va :

- Bineykekî ma rî dêrî biki.

Lûy va :

- Hey kergê, kergê, ez inkey ti w lîçikanê ti piya borî.

Kerg va : «Serey min o» :

- Hey Apo Arbançî bê ti bi xo w bwecîy qund ya.

Lûy tersa, va :

- Ano me vac, axirî ez tersenna.

Qalê xo temam kerdî Apo Arbançî vickyay. Tanzi w bwêcî hela g' lûy dî, di hal de guret û xeneqnay. Arbançî bi lûy, kerg û lîçikan şâ bî.

\*

\* \*

Paş ku min Mewlûd û ev benda ha nivîsandin, her du şanî birayê Şêxê rehmetî<sup>9</sup> Şêx Evdirehîm Efendi dan.

Hingî ewî ji min re got ku ji vê Mewlûdê pê ve Mewlûdeke din jî bi zare dumili hatiye çekirin û biser xist : «Li gora ku bîra min de maye ji vî dirêjtir bû û ne bi şîwa Sêwrekê lê ya Piçarê bû. Yekî bi navê Ehmedê Xasi çeki-

ribû».

Lê Mela Nezîr ku ji dumiliya Sêwrekê pê ve tu dumiliyê naecibînit dibêje :

- «Belê, Ehmedê Xasî jî Mewlûdek çêkiriye û ew Mewlûd gîhaye Sêwrekê jî. Min ew dîtiye. Hema sê çar pelik bûn. Ji pirsên kurdmanciyê tijî bû. Lê piştî ku Mewlûda Usman Efendî der ket ew betal bû.»<sup>10</sup>

Lê ji ber ku min dil nîne ez wî betal bikim, ji xwendevanan hêvî dikim heke pê dizanin û dikarin peyda bikin nivîsteke wê ji min re verê kin da ku ez wê jî bêxim çapê.

Şam, Taxa Kurdan  
17 Tîrmeh, 1933

---

1- Vê nîvisandina ku me ji alfabeşa erebî wergerandîye alfabeşa latînî, di hejmara 23 a Kovara Hawarê (di 25 Temûz 1933) de derketiye. Disa di wê salê di Mewlûda Nebî-Biyîşa Pêxember (bi kurdiya dumili, zarawayê Sêwrekê) de ku 46 rûpel e û li Şamê weki weşana 4.a Hawarê çap bûye ji bona pêşkêşiyê cih girtiye.

2- Stran û dîlokêni Zazayan, bi gelemperi kurmancî nînin, dumili ne.

3- Rastî sala 1905 ê Miladî té.

4- Rastî sala 1903 ê Miladi té.

5- Rastî sala 1906 ê Miladî té.

6- Babakurdî : kurdiya xwarê (soranî)

7- Derî Zazayêni ku bi Kurmancan re danûstanêni wan ên nêzîk hene, piraniya mezin a Zazayan bi kurmancî nizanin.

8- Hejmara gotinêni ku té de Zaza di şûna j ya kurmancî z bikar tînin ne zêde ye. Her çiqas, xasme di devoka Dêrsimê de, carna di şûna j de z té bilêv kirin (telaffuz kîrin), carna jî di şûna z ya kurdmanciyê j té bikar anîn. Li vêderê emê ji van her du cure cihêbûnan re çend mîsal bidin :

	Kurmancî	Dumili
J- Z :	jî tajî mij roj	zî tanzî miz (Devoka Dêrsimê) roz (Devoka Dêrsimê)
	Kurmancî	Dumili (Devoka Dêrsimê)
Z-J :	zîn mîz zîndan zuha, zuwa	jîn mîj jîndan joa

Li vêderê em téxin bir ku Kurdên Iraq û Iranê yêni ku bi kurdiya xwarê (soranî) dipeyivin, ji Kurdên ku bi kurmancî (ya jorê) diaxivin re Zaza, ji zarawayê wan jî re zazayî dibêjin.

9- Sêx Se'îd.

10- Mela Ehmedê Xasî. Péşiyên wî ji Gundê Şînê, di navçeya Çewlig (Bingol) ê koçî Nahiya Hezanê (Savat), ku bi Diyarbekirê ve girêdayî ye, kirine.

Ehmedê Xasî di sala 1863 de li Hezanê hutîye dinê. Navê bavê wî Mela Hesen e. Herweki ew ji qebîla Xasé bûye bi navê Mela Ehmedê Xasî hatiyê nasin. Melay Xasî, erebî, farisî û tirkî zanibûye. Wî icaza xwe ji miftiyê kevnê Diyarbekirê İbrahim Efendi stendîye û demekî dirêj li ber destê Sêxê Hezanê maye.

Di dewra Sultan Abdulhemîd de wî, ji ber kurdîtiyê (netewaniya kurdi), sîrgûnî Rodosê kirine û sair bêtirî ses mehan li wir maye.

Melay Xasî, Mewlûda Zazayî di 1900 de nivisiye û dibe ku afîrandinêni wîyêni din jî hebin. Hin kitêbén wî di dema stemêni 12 Adarê de bi destê nebiyekî wî hatine gewitandin. Di milê din de nézikêni wî dibêjin ku çend kitêbén xwe dane rehmeti Kemal Badilli.

Mewlûda Ehmedê Xasî, ji 16 peşkîn menzûm pêk hatiye. Ji wan 14 peşkîn pêşin bi zazayî, her dûyêni dawîn jî bi erebî ne. Di wan de, bi hesabê ebcedê tarixa 1316 (1900 ê miladî) hatiye danîn.

Mewlûd bi qafiyêni dewlemeden hatiye nivîsin, tê de 756 misra hene, her misrakî bi 11 kite (hece) ye. Bi zazayîya Çewlig (Bingol)ê hatiye nivîsin.

Bi awê ku di çapa yekemîna kitêbê de, ku bi tipêni erebî hatiye diyar kîrin jê 400 heb derketine.

Piştî peşka 16a kitêb, bi «Qala Pey» awa diqede :

«Temem viraştişê Mewlidî kerd bi yardımê Xaliqî ... bi destê Ehmedê Xasî Hezan di, henzar û hîri sey û şîyyîs serrî dî, tarîxê erebî, bizan.» Ango :

«Bi alîkarîya Xaliqê Mewlûd temam bû, bi destê Ehmedê Xasî, li Hezanê, di hezar û sé sed û şanzde bi tarîxa erebî, bizan.»

(Binêre : Zaza (Dimîlî) Lehçesinde Yazan Bir Şair : Melay Xasî, Devrimci Demokrat Gençlik (Dergisi), No : 2 (Mart 1978), rûpel 14, İstanbul.)

## **DIMILKÎ MIYAN DI CÎYAYEYA VATIŞAN**

**MALMÎSANIJ**

### **CAYÊ KI DIMILKÎ (ZAZAKÎ) TEDE QISEY BENO :**

Semedo ki xerîta ziwanê kirdkî weş nêviraziyaya, ci cayê Kurdistanî di bi ci zarava qisay beno, weş nîno zanayış. Kurdistanê Tirkiya di duyes (des û didi) wîlayetanê cêrînan di ca ra ca dimilkî qisey beno. Cayê ki tede dimilkî qisey beno nîy ê :

1 ) Qezayanê Hezurim (Erzurum) û ra :

- Xunus (Hinis) : Tay dewanê yê di dimilkî qisey beno.
- Tatos (Tekman) : Tay dewanê yê di dimilkî qisey beno.

2 ) Qezayanê Sêwas (Sivas) û ra :

- Zara : Beypinari û tay dewanê yê di dimilkî qisey beno.

3 ) Qezayanê Bedlîs (Bitlis) û ra :

- Motkî (Mutkî) : Miyan di û tay dewanê yê di qisey beno.

4 ) Qezayanê Sêrt (Siirt) û ra :

- Qozlix (Kozluk) : çend dewanê yê di dimilkî qisey beno.
- Sason : Çend dewanê yê di dimilkî qisey beno.

5 ) Qezayanê Ruha (Urfa) ra :

- Sêwregi (Siverek) : Miyan di û tay dewanê ya di dimilkî qisey beno.

6 ) Qezayanê Semsur (Adiyaman) û ra :

- Alduş (Gerger) : Miyan di û vişaney dewanê yê di dimilkî qisey beno.

7) Qezayanê Muş'î ra :

- Warto : Çend dewanê yê di dimilkî qisey beno.

8 ) Xalpêt ( Xarpêt, El'ezîz, Elazığ) : Miyan di û nî qezayanê yêyê cêrênan di dimilkî qisey beno.

- Maden : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Pali (Palo) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

9 ) Çewligî (Çebaxçur, Bingol, Bingöl) : Miyan di û tay dewan û qezayanê ya di dimilkî qisey beno.

- Darahêni (Genç) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Kêxî (Kigi) : Tay dewanê ya di dimilkî qisey beno.

10 ) Dersim (Tunceli) : Miyan di û qezayanê yê ê cêrênan di dimilkî qisey beno.

- Pilumer (Pülmür) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Nazimîya (Nazmiye, Qizilkilise) : Miyan di û dewanê ya di dimilkî qisey beno.

- Vacixe (Ovacik) : Miyan di û tay dewanê ya di dimilkî qisey beno.

- Xozat (Hozat) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Çimişgezeg (Çemişgezek) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

11) Erzîngan (Erzîncan) : Miyan di û tay dewan û qezayanê yê di dimilkî qisey beno.

- Tercan : Miyan di û dewanê yê di vişane dimilkî qisey beno.

12 ) Diyarbekir (Diyarbakir) : Miyan di û qezayanê cêrenan di dimilkî qisey beno. Labrê miyanê Diyarbekir di hina vişî kirdası (kurmancî) qisey beno.

- Pasûr (Kulp) : Tay dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Liji (Lice) : Çend dwanê ya di dimilkî qisey beno.

- Hêni (Hanî) : Miyanê yê û çend dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Pîran (Dicle) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

- Çermûgi (Çermik) : Miyan di û tay dewanê ya di dimilkî qisey beno.

- Şonkuş (Çüngüş) : Miyan di û dewanê yê di dimilkî qisey beno.

## CA RA CA CÎYAYEYA ME'NA \*

Dimilkî di ca ra ca me'na yew kelîma bedelêna. Çend mîsalî :

Dimilkî

Kurmancî

qefelayîş (B) : westiyan

qefelayîş (P) : 1) qefilin, 2) hatin qefil kirin

şenik (S) : sivik

şenik (P) : piçûk senik (D) hindik

raşanayış (B) : hejandin

raşanayış (D) :	reşandin
rasanayine (D) :	hejandin
fetelnayış (S,P) :	berî dan (berî ... dan)
fetelnayîne (D) :	gerandin

## CA RA CA CİYAYEYA NEREY Ü MAYKEY

Dimilkî miyan di tay kelimey estê ki yew yew ca di nerî, yew yew ca di maykî vajiyenî. Ma vajîm :

Dimilkî	Kurmancî
oda (G), weda / maykî (féminin)	ode/ mê (féminin), menzel /mê
ode (P), wede (P) / nerî (masculin)	ode / mê (féminin), menzel / mê
qusxana (D), quşxana (G) / maykî	quşxane / nêr
qusxane (P) / nerî	quşxane / nêr
roze (D) / maykî	roj / mêt
roj / nerî	roj / mêt
raye (D) / maykî	rê / mêt
rayîr (P) /nerî	rê / mêt

## CİYAYEYA VATIŞÌ (FERQÈ TELAFFUZÌ)

Semedo ki nénusiyawo û semedê gellek sebebanê bînan ra dimilkî di vatisê kelimeyan di ca ra ca gellek ferqî estê. Hina vîsi tay kelimeyê ki bi herfa dengdar (vokal) i dest pey kenê, heryew ca di hewayna vajiyenê. Çend mîsalî :

argûş (B), argoş (B), awriş (S,D), arbêş (G,P), aroş (P), arwêş, erbîş, hargûş : kerguh (K) \*\*

sanike (D), estaneki (P) estoniki (P), istaneki, istoniki (P), istûniki, istaniki, estaniki, fistoneki, vistoneki (Pa) : çîrçîrok (K)

eskici (P), eşkiji (P), eskuçi, iskici, eskiji : mewij (K)  
 espici (P), aspici, espiji, eşpiji (P), eşpici, ispide (S) : spî (K)  
 estrî, estere, estirî, istre, (Ç), iştiri (D) : qiloç (K), strû (K)  
 gelanke, gilangi (P), gilangî (P), gelangi, gerengi, gerange : car, carek (K)  
 esmo (D), esmû, emşo, emşû (P), eşmo, eşmû (P) : işev (K)  
 erdişi, erîşe, eyşi (P), erîşi (P), herdîse (D) : rû (K)  
 mice, mijê, micew, muje (P) : bijang (K)  
 birewî (P), burî, berewî (B) : birû, birh (K)

## CAY XO BEDELNAYÎŞÊ VENGAN

Dimilkî di yew yew kelimaya ki ca ra ca cîya vajiyêna, tede tay vengî  
cay xo yewbînan di bedelnenê. Cêrênan di şima cay xo bedelnayîşê çend ven-  
gan viyenenê :

Dimilkî	Dimilkî	Kurmancî
hesri (P)	hêrsî (D)	hêstir
areye (B), arye (Ç,S)	ayre (P)	aş
emser (P)	esmer (P)	îsal
emşo (P)	eşmo (P)	îşev
nepixiyayîş (S)	nexefiyayîş (p)	nepixîn
vînceli (B)	vilînce (P)	benîşt
hingimên (P)	hemgêñ (D)	hingiv

## KEWTIŞÊ VENGAN YAN ZÎ VÎND BIYAYÎŞÊ VENGAN

Tay kelimey estê ki yew yew ca di cayê bînî gore derg nê zî kilm  
vajiyêni.

A) Kewtişê çend vengan yan zî kewtişê kît (hece) an :

Dimilkî	Dimilkî	Kurmancî
şewi (P)	pesewi (D)	şev
vînce (P)	vînceli (B)	benîşt
kam (P)	kameci (D), kamci,	
şawutiş (B), riştiş (Ç)	kamçin (S)	kîjan
vêretiş (P), viyartiş (P)	erşawitiş (P)	şandin
ray, raye (D)	ravêretiş (B),	
vîr hameyiş, ameyiş vîr	ravêrdene (D)	buhurîn, derbaz bûn
dimi kewtiş (P)	rayîr (P)	rê
	ra vîr amayine (D)	hatin bîr
	ameyine ra vîr (D)	
	era dime kotene (D),	
	kotene ra dime (D)	bi dû ketin

B) Kewtiş (nê zî vînd biyayîş) ê yew vengî : Tay kelimeyan di yew veng  
kewto yan vişî biyo.

I - Kewtişê dengdar (vengdar) an. Çend mîsalî :

1) a -	
aniştiş (S)	niştiş (P)
2) e -	
espar (P)	spar (S)
etiya (Pa)	tiya
eno (H,P)	no
eskeft (D)	şikefti (P)
eya (P)	ya
3) i -	
ino (P)	no
ina (P)	na
inka (P)	nika (D)
4) î -	
îtiya, îta	tiya
înkey (P)	nika

## II - Kewtişê bêdengan :

1) b (mb) - : Cawo ki «b» beynatey «m» û yew herfa dengdari di bibo gege «b» keweno.

embaz, imbaz (P)	emaz (B), imaz (Pa)
embar (P)	emar (B)
sembure (P)	simore (Ç)
şimbêli (P)	şimiyeli (B)
zimbêli (P)	zimêli (Q,B)
teba (Ç,S)	tua (D), toa (D)

2) d (nd)- : Cawo ki «d» beynatey «n» û yew herfa dengdari di bibo gege «d» keweno :

sîndor (D,P)	sînor (Ç)
qolind (D)	qalin (P);

vîndî biyayîş (B), vînd biyayene (D)	vîn biyayîş (P);
şand (B)	şan (P);
erdişî (S,B)	erîşî (P), eyşi (P)
dadza (G), dedza	daza, deza (S)

3) f-	
sifirni (H)	sorni (P)

4) g-	
veng dayış (S), veng dayene (D)	veyndayış (P), vendayış
çeng kerdiş (P)	çe kerdiş (S), çen kerdiş
arguş (B)	arûş (P)

5) h- : Dimilkî di tay kelimeyê ki bi herfa dengdari dest pey kenê, yew yew ca di «h» yeno vernî û bi ayhewa vajiyénê :

hameyîş, homeyîş (P)	ameyîş, amayene (D)
hewtanayîş (P)	ewtanayîş (P), wetanayîş (B)
hard (D)	ard (P)
hengûre (E) ***	engûri (P)
hingimên (P)	engemîn (S)
heze (P)	ze
Gege zî miyanê kelîma ra «h» keweno :	
cahana (B)	cana (P)
şahrestan (B)	şaristan (P)
neheq (P)	neq (D)

6) k-

pêriko (Ç)	pêro (P)
------------	----------

7) l-

palsna (Ç)	başneki (P)
kuçlan (P)	kuçanî (S)
goliki (P)	guke (D)
milosnayîş (P)	musnayîş (H)

8) m-

çimke, çimkî (P)	çikê (D)
kilm (Ç, S, D)	kirr (P)
kemere (D)	kerra, kerre

9) n-

a) n (nc) - : Eke «c» ra ver «n» bêro, gege «n» keweno :	
tinci (P)	tîje (D), tiji (B), tîzi (Ç)
zerenc (P)	zerec (B)
zewnci (P)	zewc
b) n (nç) - : Eke «ç» ra ver «n» bêro, gege «n» keweno :	
qalinçi (P)	qaluçî (Ç)
alinçi (P)	aluç (S)
qonç (S)	qoç (P)
nunçiki (S)	nuçiki (P)
c) n (nz) - : Eke «z» ra ver «n» bêro, gege «n» keweno :	
tanzî (Pa, P)	tazî (Ç), tajî (S)
pîyanz (P), pîyonz (P)	pîyaz (Ç)
hinzar (P)	hazar (D)
d) n (nd) - : Eke «d» ra ver bêro, gege «n» keweno	
îndî (D)	îdî, êdî

e) Cawo ki «-an» («-on») peynîya kelîma di bibo gege «n» wo peyen keweno :

nan, non	na, no
zan, zon	za, zo
ban, bon	ba, bo
giran, giron	gira, giro
caran, caron	cara, caro
varan, varon	vara, varo

bêxeyja nîyan zî «n» yew yew kelîma di keweno :

canmêrd (B)	camêrd (P)
pank (P)	pak (Ç, D)
hewn (P)	haw (B)
tayn	tay
çeng kerdiş (P)	çe kerdiş (S)

10) r- :

bêrsigi (E)	bêsigi (D), bîşigi (P)
darlox (S)	daluex (B)
torsele, tuwersele (Pa)	tosle (P)
verard (B)	verad (P)
lerze kerdene (D)	lezi kerdiş (P)
werantiş (P), werontiş (P)	weontene (D)

11) t- :

datîza (P)	daza, dayza, deza (S)
xelat (Ç)	xela (P)
zaftir (X)	zafér, zavér (P)
set (B)	se (P)
estaneki (P)	sanike (D)

12) w- :

wade (B), wede (Ç)	ode (P), oda (G)
wesar (P)	ûsar (D)
wina, wuna (Ç,S)	ina, ûna (P)
wiskura (S)	eskura (P)
werte	orte (P)
têw dayîş (S)	té dayîş (P)

13) y- :

tenya (Ç), teyna	tena (P)
taynî	tanî (P)
tepîya (D), tepya (S)	tepa (P)
vay dayîş (P)	va dayîş (S)
bizyêk (B)	bizêk (P)

14) z- :

bazilzan (B)

balcani (P)

### BEDELIYAYİŞÈ VENGAN (VURIYAYİŞÈ VENGAN)

Dimilkî di yew yew veng vuriyêno, bedelêno, yewna veng herrinda yê di ca gêno.

A) Bedeliyayışe dengdaran :

1) -ew-

-ow-

-o-

çewt (P)	çowt (P)	çot (D)
kewçiki (P)	kowçiki (P)	koçike (B)
hewl (P)	howl (P)	hol (B)
kewtiş (P)	kowtiş (P)	kotiş (B), kotene (D)
vewre (P)	vowri (P)	vori, vore (D)
vistewre (P)	vistowre (P)	vistore (B)
dewesnayîş (P)	dowsnayîş (P)	dosnayîş
tewre (P)	towre (P)	tore (B)
bewran (S)	bowroni	borani (P)
zewti (P)	zowti (P)	zot (D)

2) -uwe (ua, ue)-

-û-

-o-

tuverage (B)	tûrgi (P)	torgi (P)
ruwen (P)	rûn	ron (D,B)
astuer (B)	estûr (P)	estor (P)
buweçi (B)	bûçi (P)	boçi (P)
cuar cuer (B)	cûr (P)	cor (P)
ruwej, rwej (B)	rûj (P)	roj
suand (B)	sûnd (P)	sond

3) -an

aminan (P)

-ûn

amnûn (D)

-on, -o

amnon (D), omno (P),

ûmno (P)

taneki (P)

tûneki (P)

toneki (P)

anciyayış (P)

ûnciyayış (P)

onciyayış, onceyîş (P)

panc (P)

pûnc (P)

ponc (D,P)

manga (P)

mûnga (P)

monga (P)

ganî (P)

gûnî, gune (D)

gonî

zimistan (P)

zimistû (P)

zimisto

4) -am-

şamî (P)

-ûm-

şûmî

-om-

şomî (P)

kam (P)	kûm (P)	kom (E,P)
zama (P)	zûma (P)	zoma (P)
name (P)	nûme (P)	nome (D)
amortiş (B)	ûmaritiş, hûmaritiş (P)	omartış
name (P)	nûme (P)	nome (P)

5) a-	o
paştî (P)	poştî (D)
mar (P)	mor (D)
tay (P)	toy (P)
awki (P)	owki (D)
vazdayîş (P)	vozdayene (D)
çar, çeher (P)	çor (D)
çali (P)	çole (D)
caran (P)	corû (D)
hak (P)	hok (D)

6) a-	e
araq (D), ariq (S)	erek (P)
kardîş (P)	kerdiş (P)
varg (P)	verg (P)
aspar (B)	espar (P)
alawitiş (S)	elawitiş (P)
astare (D)	estare (P)
nawo	newe (P)

7) a-	i
amnan (P)	imno (B)
hama (D)	hima (P)
tifang (D)	tifing (P)

8) e-	i
hengure (E)	enguri (P), inguri (P)
tera	tira
estare (P)	astari (D)
ena	ina
estor (P)	istor
belingaz (P)	bilengaz (Ç)
neha (Ç,P)	niha
hengi (S)	hingi (P)
dendan (B)	dindan (P)
pilas (P)	pelas (P)
nezdî (B)	nizdî (P)
çarşeme (B)	çarşime (P)

qerefñayış (P)	qirifnayış (B)
tîrkeman (P)	tîrkivan (S)
şefeq (P), şefaq (Ç)	sifaq (D)
cenî (P)	cinî (D)
dewe (D)	dewi (P)

9) e-	<b>o</b>
merdiş (P)	mordene (D)
merdum, mîrdim (P)	mordem (D)
estor (P)	ostor (D)
espar (P)	ospar (D)
estuni (P)	ostine (D)
verek	vorek (D)

10) ê-	<b>e</b>
kêl (D)	kel (P)
kêm (D)	kemî (P)
kêrr (D)	kerr (P)
kêvanî (D)	kebanî (P)
nêr (D)	nerî (P)

11) ê-	<b>ey</b>
qê (B)	qey (P)
kê (B,S)	keye (P)
nê	ney (P)
pê (D)	pey (P)
vêsan (D)	veyşan (P)
têşan (S)	teyşan (P)
kêna (B)	keyna (P)
vêve (B)	veyve (P)

12) ê-	<b>ye, iye</b>
êre (P)	yere (P)
êne (P)	yene (P)
kirê (P)	kirye (B)
verêni (P)	veryeni (B)
engimén, hingimê (P)	engimye (B)
dês (P)	diyes (B,Pa)

13) ï-	<b>ê (e)</b>
nîme	nême (P)
nîweşî	nêweşî (P)
pîro	pêro (P)
sim	sêm (P)

hîra (D)	hera (P)		
14) î-	o		
be'dî, be'ndînî (P)	be'do (S)		
15) u (o)-	i		
qedum (S,Pa)	qedim (P)		
zurna (P)	zirna (Ç)		
murd (S)	mird (P)		
kuşni (S)	kişni (P)		
puf kerdiş (P)	pif kerdiş (B)		
puri kerdiş (B)	piro kerdiş (P)		
guretene (D)	girewtiş (P)		
moreva (D)	mirêba (P)		
16) u-	e (ê)		
wuriştiş	weriştîş (P)		
pullisiyayış (P)	pellisiyayış (S)		
hurend (D)	herrindi (P)		
17) u-	o		
buy (P)	boy (Ç,P)		

B) Bedeliyayışê bêdengan :

1) d-	c-	j-	y
da, day, daye (D)	ca	ja (P)	ya (P)
dî (D), dê (D)	ci (S)	jey (P)	yê (P), yey (P)
dîne (D), dînû (D)	cînî	jînî (P)	yînî (P)
suked (E)	sukic (G,P)	sukij (P)	
be'dî, be'ndî (P)	bacî (B)	bajî	
ispide	espici	espici, eşpiji (P)	
	lacek (P)	lajek (P)	layik (D)

2) c-	j-	z-
çice (P)	çije (P)	cize, cizik (E,D)
panc (P)	panj (P)	panz (Ç)
gicik (P)	gijik (P)	gizik (D)
lac (P,G)	laj (P)	laz (D)
roc (P,G)	roj (P)	roz (D)
nimac, nemac (B)	nimaj (P), nemaj (B)	nimaz, nemaz
qic (X)	qij (S)	qiz (D)
dewic (P, G)	dewij, dewuj (P)	dewuz (D)
kec (G)	kej (P)	kez (D,E)

dec (P)	dej (P)	dez (E)
mic (P)	mij (P)	miz (D)
porcin	pirjini (P)	purozin, pirozine (D)
3) y-	j-	z
yew (P), yo (B)	jew (S), jû (S,D),	zew (D), zu, zû (D)
layik (D)	lajek (P)	lazek (D)
4) s-	z-	d
girs (D)	gîrz	gird (S,Ç)
5) j-	z-	k
jî (S)	zî (B,P)	kî (D)
6) s-	ş (ş- s)	
Sêwaz (P)	Şêwaz (D)	
sew (D)	şewi (P)	
rosn (Ç)	roşn (P)	
meske (D)	meşki (P)	
eskize (D)	eşkiji (P)	
dismen (D)	dişmen, duşmen (P)	
estene (D)	eştiş, eyştiş (P)	
meste (D)	meşte, meşti (P)	
posman (D)	poşman (P), poşmo (P)	
sond (E), son (D)	şan, şon (P)	
sane (D)	şâne, şone (P)	
sehîd (D)	sehîd (P)	
sikir (D)	şikir (P)	
sit (D)	şit (P)	
sen'et (P)	şinate (D)	
sîya (P)	şîya (E,D)	
sém (P)	şîm (D)	
tésan (D)	teyşan (P)	
xelesiyayış (P)	xeleşayene (D)	
7) ç-	s	
çi	se	
8) ş-	z	
beşni (P)	bezn (Ç)	
rişnayış (P)	rîznayış (Ç)	
9) s-	z	
bers (B)	berz (P) barz (P)	
asmên (P), asmîn	azmên (S), azmîn (Ç)	

gisik	gezi (P)
sowbîna, sobîna (P)	zovîna (D)
se ki (P)	ze ke (D), heze (P)
girs (D)	girz
asnawi (P)	azna (D)

10) j-	z (z-j)
bijêk (D)	bizêk (P)
jên (D)	zén (P)
mîj (D)	mîzi (P)
jî (S)	zî (P)
gijik (P)	gizik (D)
tajî (S)	tanzî, tonzî (P)
jêde (D)	zêde (P)
jîndan (D)	zîndan, zêndan (P)
mij, muj (P)	miz (D)
torjen (E)	torzîn (P)
joa (D)	zuwa (P)
berj (D)	berz (D,P)

11) c-	z
cengari (P), cengi (P)	zengar (S), zengi
eşpici (P)	aşpize (D)
çice (P)	çizik (D), cizik (D)

12) c-	j
arcon (P), ercan (Ç)	erjan (P)
nemac (B)	nimaj (P)
qicayış (B)	qijayış (P)
roce (B,P)	roje (P)
locine (Ç), locini (P)	lujini (P)

13) c-	ç
çice (P)	çeçik (S)
xencer (P)	xinçér (Ç)
eşkici (P)	eşkuçî (B)
ciwal (P), cuwal (P)	çiwal (D)
cizik (D)	çice, çije (P), çizik (D)

14) c-	d
dociki (B)	dudiki (P)
eciz (P)	ediz (S)

15) t-	ç
tînci (P)	çînci (P)

16) k-	ç
kêber (Ç)	çêber (D), çêver (E)
dayki (P)	dayç ****
bawk (P)	bawç
kîştiş (P)	çîştene (D)
kêneki, keyneki (P)	çêneki (E), ceyneki (D)
kîse (P)	çêsik (D)

17) g-	c
gamêş (P)	camus (S,E)
genc (P)	cenc (D)
geyrayış (P)	cêrayini (D)
gan (P), gon (P)	can, czan (E)
gi (P)	cî (D)

18) b-	v
teber (P)	tever (D,S,Ç)
labré (P)	lavrê (Ç)
zibil (B)	zivil (P)
qirban (P)	qirvan (D)
dirbetin (S,Ç)	dirvetin (D)
ebi (P)	eve (D)
jubîn (S)	jûvîn (E)
kebanî (P)	kêvanî (D)
mirêba (P)	moreva (D)
xurbetey (P)	qurvetica (D)
xirab (P)	xirab (D)

19) b-	w
mirêba (P)	mirîwa (B)
cebab (P)	cewab (P)
kirbas (P)	kirwas (B)
babî (B)	bawi (P)
arbançî (P), arwonçî (P)	arwançî (S,Ç), arewançî (B)
kerba (P)	kerwa (P)
nobeti (P)	nowete (B)
qabas (B)	qewas (P)
teba (Ç,S)	tewa (E), towa (D)

20) b-	m
boje, bije (S)	mice, muje (P)

21) p-	b
poçi (S)	boçi (P)
xerepnayış	

(xeripnayış) (P)	xerabnayış
pari (S)	bari (P)
paşna (B), palsna (Ç)	başneki (P)
pîya (P)	bîa (S)
lep (P)	leb (S)
piski (P)	bisk (B)
22) p-	f
pirniki (P)	fîrnîk
pilpiloc (Ç)	filfilik (B)
perayış (B)	fîrrayış (P)
23) p-	v
pelg	velg (P)
24) f-	v
fistene (D)	vistiş (P)
findetene (D),	
findayêni (D)	vindertiş, vindetiş (P)
zaf (D)	zav (P)
25) f-	w
hefte (S)	hewte (P)
eftanayış (B)	hewtanayış, ewtanayış (P)
sifirni (H)	suwerni, sorni (P)
26) v-	w
vatiş (P)	watiş (G)
27) m-	v
tîrkeman (P)	tîrkivan (S)
bermayış (P)	bervayis (E), bervayne (D)
semedê (P)	seveta (D)
mil (P)	vile (D)
28) y-	w
ewro (S,Ç)	eyro (P), êri
qawî (B)	qey-î (P)
guwend (P)	guyend (P)
tuwer (S)	tuyeri (P)
riswa (B)	risya, risiya (P)
huwayış (P)	huyayine, huyayış (D)
29) h-	w
hînî (E)	wina, winî (Ç)

hurdî (S,D)	wurdî (P), wirdî (P)
huyi (E), hûy (D),	
hûwe (P)	wîye (P)
huyayini (E), huwayîş (P),	
hiwayîş (P)	wiyeyîş (P)
herkes (P)	wirkes (P)
hewniyayîş (P),	
howneyîş (P)	weyniyayîş, winîyayîş
husk (D)	wuşk, wişk (P)

30) h-	y
wahîr, weher (S),	
wehar (S)	wayîr (P), weer (P), weyer (P)
hîtim (P)	yetîm
kehen (S,B), kohon (B)	keyen (P)
mahîn (B)	mayîni (P)
herê (E)	yere (P), êre (P)

31) x-	y
rîye (D)	rêxi (P)

32) x-	h
xo, xu, xwi, xwu (P)	ho (D)
xora, xwira, xwura (P)	hora (D)

33) x-	q
xeyret (P)	qéret (D)
xeyrî, xeyrê (P)	queerî (D)

34) q-	g
qumqumik (S)	gumgumiki (P)

35) k-	g
kulbizik, kilbiziki (P)	gulbizik (H)
fek (P)	feg (B)
belk (B)	belg (P)
kî, ku	gû (X)
gelanke (B)	gilangi (P), gelange

36) r-	l
per (Ç,P)	pel (H)
miricike (C)	milçiki (P)
perperik (P)	pelpelik, pilpilok (Ç)
perazi (P)	palazi
girze (B)	gilze (P)

labrê (P)	labelê (X)
çuraneki, çuraniki (P)	çilanciki (H)
patîre (P)	patîle (H)
adir (P)	adil (S)
rindêr (P)	rindêl (S)
dormare (P)	dormale (B)
kuçeran (B)	kuçelan, kuçlan (P)
loqra (P)	loqila
zilqitiki	zilqitti (P)
şîrgerm	şîlgerm

37) t-	d
vîyartîş, vêretîş (P)	vîyerdiş (S), vêrdene ra (D)
dat (P)	ded (S)
towqi	dewqi (P), dowqi (P)
hûmaritiş (P)	ûmardiş (X)
gûştaritiş, goştaritiş (P)	gûşdarî kerdiş (X)
vindertiş (P)	vinderdiş (S)
werantiş (P)	werandiş (B)
kirrantiş (P)	kerandiş (B)
tarv (D)	darbi (P)

38) r-	d
'esiri (P)	'esid

39) r-	t
fîrriki (P)	fîtike

40) n-	y
senêñ, senîñ (P)	seyîn (X)

41) n-	t
roşn (P), roşna (P)	roşt, (B), roşta (D)

42) t-	y
hît (D)	hîy (D)

43) d-	g
dergûşî (P)	gergûşî (B)

\* *Cayê ki ma nî kelîmeyê dimilkî tira girewtîm, ma cêr di nawitîm. Labrê beno ki nî kelîman ra tay, cayané bînan dî zî enawa bêré vatis.*

(D) : Dêrsim (*Tunceli*)

(B) : Bingol (*Çewligî, Çebaxçûr, Bingöl*)

(S) : Siwereg, Sêwregi (*Siverek*)

(E) : Erzingan (*Erzincan*)

(G) : Gêl (*Egil*)

(P) : Piran, Piro (*Dicle*)

(Pa) : Pali (*Palo*)

(H) : Hêni (*Hani*)

(Ç) : Çermûg (*Çernik*)

(X) : Mela Ehmedê Xasi, Mewlidê zazakî

\*\* (K) : Kurmancî (*kirdasî*)

\*\*\* Zerteng, Pankisar, Zazakîyê Erzîrganî û Diyarbekir, Tirêj No : 3, ripperr : 7 Izmir.  
1980.

\*\*\*\* Dil Konusunda Bir Araştırma, Devrimci Demokrat Gençlik (*Dergisi*), No : 2  
İstanbul, 1978

## AY WEXT

HEYDER

Şew marda ya  
tarî ya.  
Dest destî,  
çim çimî nîveyneno.  
Mêrdim û dewarî  
pêri rakwenî.  
Keron û lemon ra  
veng û hes çîno.  
Kûm çi zonû  
çî hewnû veynenî.  
Kûm çi zonû  
çî mililin î,  
çî dernexin î.

Serê sibay di  
vay koyû cor di yeno  
hetanî deşt.  
Xafila giron a,  
cor di pêt yeno,  
cêr di sist beno.  
«Heme çî wextê xo di.»  
Tû hin dî,  
roşin bîy şew ;  
destî dest,  
çimî çim dîy  
Mêrdim û dewar  
wariştî ;  
kerey û lem gonî biy,  
qîjî dekewti  
koyûn û deşt.  
Ay wext,  
roj rojê ma wo  
biray mi ! ...

# BÊRÎ

MALMÎSANIJ

## I

Na gami  
ez xo rî bibîynî yew mirîçiki  
biperraynî, bifirraynî  
biniştinî daranê tuyeranê ma ra  
bişîynî, rezandê ma,  
pey welladan,  
serê qotan, miyanê layan,  
lewey banandê ma,  
dolan û çalan,  
no qerraj, ay verroj  
serê tîtikê koyan.

Hinî yo ha  
çimê mi villikî kenê,  
«Yadî yaran û wilatim roj û şew  
Lê heram kirdim qerar û xurd û xew»  
tew gidî tew ! ...  
Ez vano qey  
nika raştan di digam perrenê gedey,  
ha hing-hinga leyîran,  
hakan kenê bin-kulawan,  
odan di kaban.  
Ow tebîstê polê yewbînan :  
«Ar-aro, gjide gjide !  
Nehey werdî, pendusa ...»

## II

Sew cite qedénaya,  
eke vaşî çinay Hêlin di  
eke palî qedénay Mergan di  
velgan néronanî se Lalo ra, Malmisan ra  
vayan raşt nékenê se enka,  
ma'seran ra sew amey war ;  
beno ki şiy seydê zerencan  
yan zî tê reydi şonê xortî û keyney  
mazî û gazîy.

### III

Ez bibîynî yew nîrîçiki,  
biniyaynê mi ra di perrê tenikî  
enka ez bikewtnî cerga yînî miyan  
«rext miyonê polon di,  
giley miyonê kifton di».  
Leyro lurî, ez biyo şarê duri,  
kewt nişka mi vîrî no vate :  
«Sirûşkem ger buwed xûnîn, 'eceb nî,  
Mû an darem ke der xûn rîseem bî»

### IV

Şima qe gûştarita lulîya ma ?  
senfonîya derd û kulan,  
xovero nêceniyyêna.

### V

Keynekî, elbikî çengile di  
xo rê şonê sere bîran, eynîyan,  
tay tira bêriwan,  
binê çiman ra pawenê xortan  
û xortî erzenê qalan û qirfan,  
zerpanê xo nawnenê keynekan  
nêronanê xo vera kardî û xencer,  
nêakenê rextê fişekan.

Meronê heyran  
-mi ra wesî-  
nîy xenceran ow rextê fişekan !  
Ez kû caran nêbibo yew mirîçiki  
-ez zano-  
la ez yeno dekeweno şima miyan,  
ez hima tern û ciwan,  
heze ki vato camêrdan :  
«Ta bimêni nûrî çaw û hézî pé'm,  
Dêm û dêm û dêm û dêm û dêm !»  
«Insan, teyro bêperr o..» vanê,  
hinî nêancêno derdê bêkesey,  
bêrî, bêrî ...  
xerîbey gandê kê fînena,  
nêvîrenê nî şewê tarî.

## DEWA MIXEYLÎ DE

Ali KILIÇ

Verva peroj bî. Çimê mîn raa ra mendî bi. Min xeber rusnayi bî brayê xwû Seyfi re. Mi vati bî, mîvindo rew bêro. Ekê destê xwuyo ju mir der o ju goni der o wa mîvindo bêro.

Sera 1971, asma martî 12 de, eskerîê xafîl de dest eştî bî hokmat taxt ra daî bî waro. Wa rozû jî sera terteli Kurdistanî de lesî gon berd. Hokmatê Tirk, xort û civanêñ ma dewuz û karkerî berdî estî zere. Her sew û roze ya mordem kişiyene, yan kî bîyene dirvetin.

Ez wa sere Universîta Estemolî de student (suxtêle) bu. Min nîada ke hal û vaxtê bakilê mi rind nî o, destê xwu teng o. Brayê min û pil zewezî bu, wua min û brayê min qizikî xeîle beno bar sere hermûne bakile mi re. Sera 1972 de, asma usaria vrene de, eskerîa pê mi gureti bî, ez pêe cû verdu ra. Min ewraqê xwû virastî, muallimêñi wuastê.

Qumandanê sukha ma né wuast mi bo muallîm, wî wuast ke mi rusno eskerîye, bine çeki. Mi né wuast, wu waxt mi filar kerd şiu Estemol. Mi wuska xwû da wê. Pêe cu, min tarixê ewraqê khanî vurna, berd davê direksiyonê suka Îzmîti.

Waxto ke min Dibistanê Xarpêtî qedenayî bî, tayînê mi na sukhe re vejay bî. Ez şû Universîta Erzoromî, seveta wendîşî, min muallimêni ca ver day bî. Hêtê zagonî\* ra, ez haqlî bîu. Min hîre sûkhî wuastî bî. Şewaz, Rize zu kî Yozgat. Mi va «xo ra ginay puro, yene pê cene mi bene ; nêne ke, hair né bî, wulé karê mi kar o.»

Asm û nêm kot wertê, xevere amê pîye mi re ke, naqlê mi vejîo Şewazî û Zara re. Min taftê, bakilê xwu re xevere rusnê ke wû bi xwu bêro Xarpêt. Mi re qatê cilu tei bîyaro. Ma xebera xwu kerde ju. Ez nistu ro hotobozî sû Xarpêt.

Roze verva sû mi bakilê xwu sukha Xarpêtî de dî. Mi re qatê cil ardîbî. Ma pia sîme Garê Trene. Mi Şewazî re bîleta xwu gurete. Min destê bakilê xwu kelê kerd. Çimê bî bî pire hêrşî. Trene bîê rastê.

\* zagon : qanun.

Mî vêre pêncerî ra, rîê wî de niada. Zaf mirozin bî. Trene mergune Xarpetî ser fîтика xwû cinintê. Veré çimunê mi de rîê Bakilê min vind nê bî.

Pesewe, trene de kotu ra. Spede amû Şewaz. Sune mi cayê xwû pers kerd, va ke «Dewa Mixeyl ré vejio. Tû gerekê sere Zara».

Mi ewraqa xwu gurete, şûne hotoboz pers kerd. Verva peroj nistu ro ci şîû Zara. Wa sewe Zara de mendu.

Bî su. Mi hotel kerd sayê. Cile xwu rind nê bî. Ju ca de ma ponc teney kotime ra. Mi ra qêeri wîye bîn dewuz û karker bî. Mi rî dewa xwu ra qesi kerdî. Ard koli kerdî soba. Çay na ser. Ma xeîle movet kerd. Kotime ra. Spede, mi cilê xwu gureti nistu ro hotobozi sîu Serefîê.

Mi namê dewa Mixeyl pers kerd. Va ke «Bi lingî ses saatî, bi ostorî hîreçor saatî.» Mi dewuzê dewe pers kerdî. Va ke «Esmû ta vinde, meste wî yene bazar, ti tey sona.»

Ez wa sewe wuska, hotela jî hevalé kurdî de vinetu. Name wî Niyazî bî. Roza bîne muxtarê dewe ame. Ma xeylê juvîn de qesey kerd. Tenê mend, waxtê barî bi, millî ezanê wendene. Mi ra va ke «Ez son nîme ken, tu nîna ?»

Mi va «Nî, su to re rast bêro. Ez karo nîanê nêken.»

Wu sî nîme kerd amê, ma golige kîra kerd, cile bar kerdî, ju kî mi ostore kîra kerd nistû ro mi va «yallah».

Zimiston o. Vore vora. Gile kou spê o. Roşta tîj ra vore bereqîna. Mi ver, dewuze hevsarê qatîrî gureto sono. Caca hard zaf çamurîn o. Golig zor û bela raa xwu vezeno. Ma bi na hal ameîme Dewa Mixeyli.

Mixeyl, Mikhail, dewa Grekan bîya. Waxto ke Tirku azadiya xwu berde sere, néçar Grekî, na dewi ca verdayî remay bî. Dewe axa wû beganê Tirk re mendî bî. Çor hetê dewe de dewên kurdan bî.

Dewuzê Mikhali Tirkî bî. Hokmatê Tirkî namê Mikhaîl vurnayî bî. Avêñ, kerdibi Feruz, cu kerdî bî Yeşimli. Hema dewuzê na dewe zaf neçar bî. Zav û zeçê xwu viran bî.

Dibistan\* lewê dewe de serê pul de bî. Muallîm ame mi ra va ke «Tu xêr ama». Ez qaïté dibistanî biyu, halê xwu rind nê bî. Ca misna ra mi. Mi çî-miyê xwu ardi zere, nay ro.

Roza bîne, mi nîada ke muxtarê dewe, hak bi most ra dove lazê xwu rusnê. Mi négureti. Mi veng da ra ci ard, mi va :

«Mi rind gost de : ez hokmatî rusnu ta, dersê domonunê sima dîne. Perê mi estê. Mi rî ke çiye lozim bî, ez wî hernen. Sima zere xwu teng mêcerene. Qusur de namedenê. Reyna tuha verê çêverê mi miyarenê.»

Muxtarî sare xwu royna xu ver. Cera ra sî.

---

\* *dibistan : mekteb*

# FOLKLORE KURDÎ EBE ZARAVA DIMILKÎ II

■ MESELEY

■ LAWIKÊ XELKİ

■ LAWIKÊ MODERN û SİYASÎ

■ SANIKÎ

■ VATENÊ VIRÊNAN

ZILFÎ

Not :

1 - Telafuzê fekê Dersimî sero :

Tekstê ke ita waninê, pêro hetê Dersimê rozhelatî ra ê. Lawikê xelki û sanikî be vatenâ virênan ra ebe teksto orijînl nivişiyê. Meseley be lawikê modern û sîyasî ra lete be fekê Dersimê rozhelatî, lete kî ebe Dersimê rozavay (yê Xozatî û Ovacixe), nivişiyê.

2 - Telafuzê fekê Dersimî sero :

Herfê «C» û «Ç» y fekê Dersimî de nîya telafuz beno :

c + vengino qolind (dz) ; cor (dzɔr), cemed (dze med)

c + vengino bari (dʒ) ; cér (dzer), cîran (dʒîran)

ç + vengino qolind (ts) ; çim (tsém), çare (tsarə)

ç + vengino bari (tʃ) ; çî (tʃi), çéver (tʃever)

Seweta işaretê telafuzî niâde «International Phonetik Alphabet.»

## «DÎPLOMÊ BEŞÎNCÎYE»

Nika, sere «bîndoquzyüz altmışdoquz» a. Şîne Nazmîya, niada ke herkeşî dest de kaxite est a ;

- Lao sekenê ?

Va ke :

- Kume «întam, îlkokul dîplomasîye» cême.

- «Pekî» (de rind).

Kaxita de xo kî ma «yazmîs» kerde, berde dê ci. «Neyse» (U henî). Roze amê, ma şîme kotîme ci, «tabî» ondêrê mektevî, ez ci nêşîyo. U «îlkokul bitirme kîtabî» est o, ey wanenune, ez kî van :

«Ney ra çiyê perskerîne ! »

Bira ma şîme nîştîme ro, ardî kaxitî day ma, qelemî day ma. Na «abêê» mi kî uzar o. Birayê xo ré vajî, di xocey amey. Xanim ê hurdêna. Zuye çenek a, zuye kî hermet a. Amey, «temesîre» gurete, texte «yazmîs» kenê. Nê lao a roze kotîme ci, a roza bine kotîme ci, roza hîrêyîne va ke :

- Ewro kî «beden eyîtimî» ve «mûzik dersî» ra est a.

- Ne lao u senên o ?

Ma berdime salon, tek ve tek veng danê ra ma, benê. Reyê mi ra ravêr di teney şî, mi nîade ke Sitqî ha o vano :

- Ala yat, ala atla bilmem ne yap ! ...

(Ala rameredîye, ala xilde, ala nézon çi bike ! )

Yê Hîrêyîne veng da ra mi, ez şîune.

- « Xidir\* sen askerlîyi yaptin ? » va.

Mi va :

- Mudir bey, «askerlîyi yaptim, hama talîm yapmadim».

Va ke :

- «He he ! Ala sen otir qardasine bîr turkî soyle.»

«Nê» mi va :

- «Mudîr, turça, kûrça ?»

\* Mi na name ebe zanayıye vurna (Z)

«Yahu» va ke :

- «Kûrça olir mî, turçe soylersin ! »

Mi va :

- «Jandarma çawuşum ben sana hayranım.»

«Yahu» va ke :

- «Öyle turkî mî olur, başına çalarım ...» hama çimê xo kî sikneno ramî mexsus. Va ke :

- Ti hata na intam, na daqa de çiyê vana ? Kûrçe !

«Ma» mi va «ala sayê, haqî ra ve xêre.» :

Peyê Nazmîye de sono ondéra Golbaşîye  
şîne mi «dilekça» xo dê  
kotu intamê beşinciye  
çêver de vejiye  
çêneka xocîye  
temesîre gurete  
texte ro şîye  
ax ve mi ro vo  
ha o rasna ve Derîye  
kilê haq vo  
ez nêşîyo «Rus Dewletîye»  
cér şîne Mamekîye  
cor şîne Pilemuriye  
nat amu ondéra Nazmîye  
sualê ke ti «yazmîs» kena  
pêro sualê «gîawiristanîye»  
mudîr mi ra vano : «tu kerda eskerîye»  
arde kaxite mi ver de nê ro, vake : «bîwane»  
mi reyê çim tede fetelna ke  
tede çin o qesê de Kirmancîye  
mi va : «mi aqilê xo sas kerdo»  
kaxita sipîye  
çimunê mi ver de bîye gola kêwîye  
qelete na wa bîye dare  
çimunê mi ver de royîye  
a wa ke mi vîrî de bîye  
a kî mi vîrî ra şîye  
mi guret dîplomê na beşinciye  
son ban başqanê Anadolîye  
sima malimunê Nazmîya pêro surgin kan  
rusnan ondéra Rumelîye.

A mi ke henî va, a xocîya zuye nê, a wa bîne va : « haqaret ediyor-sun ! » Mudîrî va ke : «He he, bu boyledir. »

Veng da ra mi, ez şîne «dayra», mudîr pers keno vano :

- «Xocam sen bunun haqinde ne dîyorsun ? »
- Va ke :
- «Bunun ne matematîyi var, ne bîsesi var.»
- «Ma» va ke «biraxalim ?»
- «Yox yox yox» va ke «def et gîtsin basimdan !»
- Diplome da ma, terkit amune.

## QELEMA SURE

Derdanê dîna Ap Alî henî werdo ke, îndî por û zimêlê xo bîyê palax. Heto zu ra sey kotene, heto zû ra derdê feqîrêni, pêroyîne ra zêde kî waxtê herbê hîris û heştine de zulmê Tirkî ... Qeday sero qeda, belay sero bela amo, koto bertengê Ap Alî sero bîyo meyma. Ap Alî çiqas ke bîyo wayirê honde derdan, honde kî tey vêso péso bîyo çîko sur. Yanê çîko siyasi. Îndî zaneno ke mordem bigureo ke, binê bandira zulmkarî ra vejiyo ...

Ma, di-hîrê hevalî terkit şîme, çê Ap Alî de bîme meyma. Cîniya Ap Alî lozine kerde sur, nan mîr kerd, est binê adirî, ma rî zerevetia de hewle pote. Ma mirdia xo werd, pîzê xo kerd mird, xo re kotime qesey. Ma ke kotime qesey, qal ame ra, derdê Ap Alî bî têra, ma rî meselê qesey kerde. Gos dîme ala se veno :

Hona qirkerdena Dersimî nêbî bî. Hokmatê Tirkî Pax\* de mektebê kerdi bî ra. Ma damanê Kirmancî şiyêne tede wendêne. Tayê Çuxure ra, tayê Gomê Mişî ra, taya Xecerîye ra, Usivan ra, Derê Karsanan ra, Ambar ra, Birman ra vejîyêne amêne mektebê Paxî. Dewa Tirkêle ra dayî damanî amêne. Raa tayîne satê ra zêde ontêne. Amnon de oncia tawa nêbî, hama zimistan de, û puk û xedev de «ejîato» ke ma ontêne ! ... Vore henî vorênenê ke, estêne miye. Ma û piyê ma, ma rîwale feqîrêni ra dêne mekteb ke, sola biwanîme, çêverê dewlete de maqamê bicême, na feqîrêni ra îndî bixeleşîme.

Mekteb de derse be tirkî dêne ma. Jê zwanê ma û pî tawa şîrên çîno hama, pê se kena, çimê felekî be kor bê. Gune tirkî bîmisîme. Damanenî de aqilê ma kotî ra şero ser ke, ma benê mektebê xo de kenê Tirk, zwanê ma û piyê ma, kulturê ma werte ra danê we ? U waxt mektebê ma leyê «qereqoli» de bî. Çike Pax, û çax «nahîya» bî. Tede mudirê nahîya bî, «çawis» be «on-

---

\* Pax, merkezê Dersimî de namê zu nahîya o.

başî» ra, zu kî tayê zaftîay bî.

Domonê Tirkan, yanê yê çawis û onbaşı be yê mudirî ra kî ma de pîya kotêne derse. Yê yîne mekteb verê çêverî de bî. Ma domanê Kirmancî, çê ra bîyêne ra rast. hata satê raye ra şiyêne, hona restêne mekteb. Çê ma tayîne, honde dûrî bî !

Malimê ma Tirk bî. Ma be zor û bela, ebe milqî, ebe şîlpaxun gune tirkî bîmisêne, zwanê tirkî qeseykerdêne. Çaxo ke ma nézanêne, yî domanê Tirkî pê ma huyiyêne. Ma kî îndî henî sermayêne ke, hard raqilaşiyêne, ma tiro bîsiyêne ...

Rozê ma mekteb der îme, yê min ê mi, qeleme min a de sure bîye.

Hondê bêçika pîle ya bîye, ya çîne bîye. Leyê mi de kî dewa Xagu ra çê Yivrayîm axay ra lazekê bî, pîyê xo axa bî. Çimê ney çitûrî ke gina ro qelema min a sure, pera we, xafil de vake :

- Ero sebeno, a qeleme bide axayê xo !

Mi va :

- Qelema min a, ez çâ to dîne !

Mi ke henî vake, na raye cêra mi vero, va ke :

- Sebeno a qeleme bide axayê xo.

Lazê axay kî hondê mi pîl o. Nîada ke ez ci nêdan, na raye kî ters da be mi, péma ra mi ser va ke :

- Ero ti çâ a qeleme axayê xo nêdana ? !

Ez kî cêrune ra ci, mi va :

- Nêro na tawa qeleme pîyê tu ya çik a? Zor o, nêdan !

A zuye mi ra, zuye ey ra, na raye kî ame ke ebe zor mi dest ra vezo. Ma uza zuvînî guret, mi qeleme kerda zerê lopa xo, huskia pê gureto. Ey kerd nêkerd ke, bese nêkerd mi dest ra vezo. Teseliya xo ke kote îndî caverda, ma zuvînî verda ra.

Lazê axay şî, çêna mudirê Tirkî ra vake ke :

- Qelema de sura rindeke ha wa ey dest der a.

Ü qesê ey sero, çêneke amê va ke :

- Ala a qeleme sure ku ya ?

Mi çitûrî ke cêvê xo ra vete misnê ra ci, na çêneke firaqet bîye piro, gurete, remê şîye.

Ez amune ra hêrs, mi dima milqiyê ebe Tirkî kerd vake :

- «A ... s ... ! »

Ez zanan ke nu milqîyo de xiravin o, hama aqilê mi hona ser nêsono ke, manê xo çik o, çîva o ?

Çêneke çitûrî ke hesna, ziq bîye, hurêndîa xo de vinete, cêrê ra mi ser, va ke :

- Aaaay, pîîîs ! Ben şîmdî gîder senî şîkiyat ederîm.»

(Wiyyy, qefçilo murdar ! Ez nika son gerê to kan.)

Mi çitûrî ke «şîkiyat» hesna, ters kot mi zere. Deqê ra tepîya honde hesarê xo bîune ke, malimê mao Tirk be çêneke ra vejîay amey. Çêneke be dest ez misnune ra ci, va ke :

- «Ögretmenîm budur.» (Malimê mi, na o.)

Duman mi nêcêro. Ez tersunê xo ra vişûne pêro. Malim ame, ya pers kero çiko, çiva o, ya tawayê, ya teriyê ... Çitûrî ke ame leyê mi, na gosê mino zu guret, tada, tada, tada. Gosê mi yêno ke raqilao, na raye kî gosê mino bîn guret tada, tada, tada. Hêvetu ver çimanê mi ra hêstirî amey, tersunê xo ra nêbervan kî. Malimî gosê mi verda ra, sayê ke û bes nêbî sero tayê ters da mi, ez îndî verdune ra.

Na raye kî ez tersan ke, çeneke sona piyê xo ra vana, û kî emir dano cendermû, yi kî yêne mi benê qereqol, danê mi ro. Çike yîne ma rê henî kerdêne. Ma yi zaftiaun ra zaf tersêne. Malimî be mudirî ma ra vatêne :

- Sima ke leyê zaftiaun ra vêrenê ra, xo rep kerê silam ci dê, henî ravêre şêrê.

Ma kî tersunê xo ra îndî henî kerdêne. Silam dêne ci, hona vêrdêne ra şiyêne. Banê çê mudirî raa ma sero bî. Ma ke mekteb ra vejîyêne şiyêne dewe, ez tersunê xo ver a raye ra nêşiyêne. Ez vejîyêne ro û cor, serenîya bonunê mudirî ro çerexiyêne dot amêne raye ser, kotêne mekteb.

## DERÊ LAÇÎ

Wela wela, wela yaman o  
ordî gurlax amo  
dormê ma qapan o  
bextê Heyder û Demenî rê  
kes xirave névano  
ordiyê Tirkî zaf o  
cayê welaxe ma nêdano  
ma zuvînî qirkeme  
çemê Mizurî cendeg û lesu ano  
ondêrî de dame pêro  
tede şîn û şîwan o

Derê Laçî bivêso  
Yivisê mi gavan o  
bira pêrodê, na qewxa aşîre nîya  
merevê Kirmancî û zalimanê Tirkan o  
destê xo ra xo mecêre

sar ma rê qolaye vano  
pepub bêro biniso  
cêncunê ma rê biwano

Qemerê Hesenî verê mixara de gino waro  
malo şêrê min o beran o  
Hesê Kalî kuno qewxa  
beşlîu ve doş ser ano  
Hemê Civê Kêjî personê  
xismê ordî û tawiran o  
Yivişî xo sano Pulê Pil Xatûne  
hem dano pêro, hem qeydu vano  
vano : «tu hîrê ordî ontê ma ser de  
axir dîn îslam o  
destê haqî dame pêro  
ordîyê to ra neferê nêverdanu»

Derê Laçî bivêso  
Yivisê mi çet o  
ordî gurlax amo  
dorme ro ma gureto  
destê xo ra xo mecêre  
ma hêfê az ve azê xo gureto  
qirkeme qirnêkeme  
nêqedino, ordîyê dewlet o  
kam ke ma ra bimiro  
cayê xo cenet o  
Laçî sero dame pêro  
asmê ra roz vineto

Ordî virenîya to der o  
Yivisê mi xo biçarne kemere  
ordî virenîya to der o, bao gorî  
xo biçarne peyê kemere  
se ke polate ginê ro Yivisê mi  
eskerê Tirkî kot ve dere  
kam ma û piyê to rê bero  
cîgera mi xevere  
vano : bao, pêrode ma pêrodîme  
meyitê mi ca meverte, tey bere  
dîna de coru ontene nîna  
malê tarva cîgera hare  
ewro zor kerdo qolê hetê Pêtere  
Yivisê mi kişîyo

eskerê Tirkî koto dere

Laçî ver de Yivisê mi şuya hîre  
lazê mi dest û bojî semernê we  
koto ra wertê tawire  
biko lerze meke  
ravêr meso, rew memire  
ordiyé na zalimî zaf o  
dîno ma sero kerdo sojia sure  
çê aşîrunê xayînu birijiyo  
qirkerdena ma arda risvet û pere  
sima ke teseliya xo ma ra gurete  
meste-bêro halê sima jê halê Hermenian o  
ma do pêro, héfê xo û hot bedelî gureto  
merdena koy persena, ma ré saltanet o

### LAWIKA EMÎNA\*

Tew dilo, way dilo Emîna  
dorxî bê, dorxî bê, bê çê ma

Vana : «sayirê nanîko amo dewunê hetê ma  
dîrê kilamî ma ré vatî  
kewtî nermikê sarê ma»

Vana : la lao, kelpê mérâtî mi şîyo Mamekîye  
son de ardê xasê manga  
ma nê ro ser, nê ro  
son se ardê meyda  
xaşî derdî, ximajîg yarê xo rê verda  
laze teresi şîyo ma ré qese gureto  
wela adirî arda, peyê çêverî de risna  
sodir usto ra, amo tey nîadano, vano :  
«peyniya îskarpinu na wa nîsta pira»  
«çêçenê ci ra vaze, vindeno windo, nêvindeno  
kosê lozine de nenige nanu pa»

\* Na lawike sera 1956-57 îne de ama meyda. Rozê di hermetî terknene dewa Rimeda'y ke, yi ve mérđunê xo ra hurê néamê, do pêro, çê xo caverdo amê. Nayîne ra namê zuye Emîna bena. Dorme de heşinê pê ke, na hermetî bê mérde ê, her kes wazeno ke, bero çî xo ser. Emîna tayê çêwan de bena meyma, hama zeria xo herkeşî nêkuna ...

Areyiz ke yêno a dewe, derdê Emîna gosdano, vezeno ro ci, lawike ser vano, gosdî-me ala se vano :

Vana : «çêvêsayé, ala vinde, mi ci rê sond werdo  
na rozu lazê tereşî tenê kerdo bêguma  
tew dilo, way dilo, Emîna

Vana : «la lao haqo ke mi ra heredîya  
verê mi çarna ra koyê Taxkîna  
şîne, Melkîs ci ra vanê  
a sewe uza bîune meyma  
sodir ustune ra  
mi cadê Taxkînî ra tepîya da ve ra  
dot ra rastê ma kerde kewranê Şenê Axa  
pîrunê ma û şîxunê Mazra  
ez çarnu ra, ardu berdu  
Mazra de kerdu zerê mafa  
çê Şîx Alî ci ra vanê, vake : «çêvêsay îta vinde  
lazê ma şîyo qezence ra  
payiz ke ame, kemeveyvê sima  
howt sew howt rojî eve torê dînya  
çimê mi raye ra pera  
payiz ke vejîya, terkit ame  
mi reyê tey nîada ke zuyo de timero şîa  
çêvêsayî uwe xo nêesta  
mendo ro qayisê qina qatira  
tepîya vora des û di kou  
kerdo tira, mi rê vora  
xelê çiyê mi bî  
û kî mi ci rê caverda  
kerd axuyê Olî û Mihemedî  
koyê Taxkînî ra day ve ra  
terkit amune, Delav ci ra vanê  
şîne qonaxê, nîya binê raye de  
tede bîune meyma  
vaejiay amey xortê a dewe  
çimê xo mi de pera  
sodir ustune ra ke  
nat û dot ê darê cixara  
tew dilo, way dilo, Emîna

Sodir terkit amey  
ard taşîldarê des û di dewu ro mi salix da  
şîne çê taşîldarî  
ez guretu kerdu zerê mafa  
vake : «îta vinde çêvêsay, lazê mi esker der o  
nika payiz ke ame «tejkîra» xo céno yêno

keme vevvê sima  
ame dool û zurna, eve torê dînya  
tenê lazé xu yo qiz est o  
su ke su bî, yêno piloşîno ma ra  
rozê mozera kutike amê mi, mi paskulê da piro  
metre û nêm mi ra dûrî pera  
bover ra gina dês ro, pa zinga  
pera gina waro  
veng û vaz rzo ci birîya  
«titirmî» ez guretu, mi xo de lerzna  
mi va : «haqo ke mi ra heredîya !  
na lazê herî çitûrî ard kerd qeda, soyна ve ma»  
mi xo est lazekî ser  
tenê porê mi bî, û kî mi sero ruçna  
şîne uwe arde, kerde fek  
tenê paçık pirniku ver de vêşna  
ci ra dûrî vinetu  
mi nîada ke, lazek gira-gira xiska  
tenê ame ra xo, ust ve ra  
çila xo fiste ra ci,  
dormê cayê mi de feteliya  
tepîya mozera kutike amê mi  
mi çimî ardî ve pira  
Vake : «çêvésay, haq kena vinde, tu paskulo ke do mi ro !  
poncas qurso ke mi de bi  
û kî mi dest ra pera  
tew dilo, way dilo, Emîna

Ustune ra, mi tepîya day ve ra  
amune, çê Kaliyê Hemedî ci ra vanê  
a sewe uza bîune meyma  
ey kî ez guretu berdu  
peyê taxtu de kerdu zerê mafa  
vake : «çêvésay sona kotî, ala vinde  
hata ke vore şîye, ra û welax bî ve hîra  
so ne çêver de layêkê vejîya ame  
ci ra vanê Mursa  
a sewe dîr kilamî ma sero vatî  
axir kotî nermikê sarê ma  
tew dilo, way dilo, Emîna

AREYIZ

## LEZA MA

Pêro ma pêrodîme  
honde ke nîya binê  
bandira sarî der îme

Filîstîn û Afrîqa û Latin Amerîqa de  
nîade koledaru sar çitûrî dano waro  
şer kerê çêréne, leza ma meste bêro  
çitûrî biluşkîna kounê Kurdsitanî sero

Pirode ma pirodîme  
honde ke nîya binê  
bandira sarî der îme

Zalimu eve zor ma nîya girê dayme  
kerdîme kole, nîrey bin de vindarnayme  
zerê jîndanunê xo de ma poynayme  
kêm mendo ma koledaru dewna kerîme

Dewna ke ma dewna kerîme  
honde ke nîya binê  
bandira sarî der îme

Edel û bedel o barbarî de dame pêro  
lao xo ver bide, leza ma ravêr şero  
û yo dest-pay kerdî xo ver ra, û senê dêmdar o  
lao xo ver erze, sola leza ma ravêr şero

Dêmde ma dêmdîme  
honde ke nîya binê  
bandira sarî der îme

ZILFÎ

## FEQÎRÊNÎ

Tu mi dîme ra nêkuna feqîrêni  
mi çimê xo kerdî we wenêkerdî  
mi dime ra nêvişina feqîrêni  
ez to ra nêxeleşîune feqîrêni

Erê feqîrêni  
honde ra xo vermekuya  
axir mi rê kî rozê yena  
tu na welat ra peqenan ban  
hot kou ser de kan war  
tu zalima hereviayîye feqîrêni

Tu xaxê mi werdê  
be gonîa mi mird nêbîya  
tu ez werdo, telef kerdo feqîrêni

Tu ci xo kerdo bar, dardo ro mi  
ci bîya girike kota ra mi  
çî zê dirike kota ra mi  
mi ra ci wazena feqîrêni

Honde ra xo vermekuya  
axir ma rê kî rozê yena  
ez tu kisan, kan xax be xaxî  
ez tu wan sanan be didanu ver  
tu çêr-vîr kan nan pêser feqîrêni

Tu ma rê dîna kerda xan û xirabe  
domonê ma roy ver de verday  
honde ra xo vermekuya  
axir ma rê kî rozê yena  
bê ke tu ci werdo  
ez çor kan wertê tu feqîrêni

Erê çîya murdare  
ma ra ci wazena  
nêrê vaze delê delê, vaze  
tu ci ver va mi  
çengele xo vetê girrena  
axir ma rê kî rozê yena  
ez çengelunê to oncan tédimâ  
tu kan xax be xaxî  
tu çêr-vîr kan feqîrêni  
be dev û dîdanu wan  
azê to birnan

ZILFI

## PITIK

Hot biray benê, sonê gezu. Biro pîl vano : «Ma gezunê xo biçinîme, rew şîme çê. Ma ke kotime tarî, dêv yêno, ma weno.» Nî gezu nêçinenê, kunê kay, xo rê kay kenê. Niadanê ke, zu ha nîsto ro ostorî, dot ra vao pir ra rameno yêno.

Yêno, vano : «Lao sima kamî yê ? » Nî vanê : «Ma ameyme xo rê gezu çîneme, kotîme herey, nika kî some dewe.»

Dêv nayîne keno top, cêno, beno çê xo. Nî vanê ke : «Na dêv ma we-no ! » Birao qiz vano ke :

«Ma se kerîme ke ney dest ra bixelesîme ? » Nî vanê :

«Ma dest de tawa çîn o, nu axirî peynîye de ma weno.»

Namê birayê qizi Pitik beno. Pitik birawunê xo ra zof baqil beno.

Dêv ano, ci rê zervetî pozeno. Pitik vano ke :

«Bêrê ma zof sole ci erjîme, vajîme ma bîme têsan, ey awe rusnîme. Ma kî û waxt rememe, some.»

Dêv ke ci rê zervetî pozeno, Pitik sono, tayê sole ano, ménkia erzeno wertê ardu. Dêv yêno, mîr keno, pozeno, ano meyda. Pêro piya wenê, uza ra tepiya kunê ra. Dêv kî xo rê vano :

«Nî rakuyê ke, ez sarabirnîne, xo rê borîne.» Ci ra pers keno, vano : «Sima kotî ra ? » Pitik vano :

«Nê ! Ez têsan o, hewnê mi nîno, ez çitûrî rakune ? »

Dêv vano : «Rakuyê ! » Tenê ke vindeno, yêno ci ra pers keno.

Vano : «Sima kotî ra ? » Pitik onca vano :

«Ez têste merdune, çitûrî rakune ! »

Yê dêvî tencikê xo o be hotqlupin beno, cêno erzeno ra hermê xo ser, sono hêni. Pitik birawunê xo ra vano :

«Çêvésayêne, raurzê ma biremîme. Dêv ha o şî hêni, ma şîme, xo rê bixelesîme.»

Nî urzenê ra, remenê. Eke sonê, Pitik nîadano ke, kardia xo çê dêvî de caverda. Pitik vano : «Ez son, kardia xo con, an.» Birayê bînî vanê : «Pitik, bê ma şîme. Ti ke néama, ma çê de maa xo ra se vajîme ? » «Nê ! » vano. «Ez son, kardia xo con, an.»

Nu cêreno ra, sono, qulika lozine ra nîadano ke dêv amo, verê lozine de nîsto ro, biyo ra şia u sote. Mirodiyê xo verdê ro, vineto. Pitik gira-gira serê qulike de wele keno war. Dêv vano :

«Mere, vindena vinde, névindena urzen ra, çînê Pitikî to ra kan tever ! »

Pitik onca wele keno war. Nu oncîa vano :

«Mere, vindena vinde, névindena, urzen ra, çînê Pitikî to ra kan tever ! »

Pitik xo qulike ro erzeno war, kardia xo cêno, kuno virara dêvî. Dêv ey cêno beno, rindek keno tir-top, keno zere telîşî, sero derzeno, eke bero tencik erzo, bigîrêno boro. Pitikî beno, erzeno axure. Yêno awe nane ser ke, Pitikî bîaro ci erzo.

Pitik kardî erzeno ra telişî, çérkeno, ci ra vejino. Sono, zu miye ano, lingu ci ra keno, hurendia xo de keno zerê telişî. Eve xo, xo axure de dano we.

Dêv yêno ke Pitikî îndî bero tencik erset, bigîrêno, boro. Seke awa sure verdano ra ser, miye zerê telişî de vana :

«Meeee ! » Dêv vano :

«Yaaaa ! Lazê kutikê şîay ! Mi ti fetelna, fetelna, peynîye de pê to guret, nika tu xo rê wan.»

Peynîye de sono, telişî keno ra ke Pitikî zerê ra vezô, bîaro boro. Niadano ke «Weyêêê ! » vano, eke Pitikî ez xapito.»

Sono axure de niadano ke Pitik uza çin o. Dêv îndî qarê xo ra jê dézike beno vila.

Sanike şîye xo rê, sima mendî mi rê.

## KÊKE

Kêkê bena, wayirê gomê malê xo bena. Eke kuno zimistan, îdarê malê kêke qedino. Kêke sona ke velg bîaro, dere cemedino, waxto ke sera sona, somotîna ra, ginena waro, qorê xo şikîno.

Vana :

- Dere, ti çâ cemediya, ez çâ ginune waro, na qorê mi çâ şikîya ?

Vano :

- Ez dere une, na ko çâ şîye keno ro mi ?

Vana :

- Koo, tu qey şîye sanena derey, dere çâ cemedîno, ez qey ginan waro qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

Vano :

- Ez ke ko une, malê to çâ yêno mi ra çereno ?

Vana :

- Malo, ti çâ sona ko ra çerena, ko şîye dano ra derey, dere cemedîno, ez ginan waro, qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

Vano :

- Ez ke mal une, verg çâ yêno me weno ?

Vana :

- Vergo, to çâ na malê mi wena, mal ko ra çereno, ko şîye dano ra derey, dere cemedîno, ez ginan waro qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

Vano :

- Ez ke verg une, kutik qey boa mi oncenô ?

Vana :

- Kutik, ti qey sona boa vergî oncenâ, verg malî weno, mal sono ko ra

çereno, ko şîye dano ra derey, dere cemedîno, ez ginan waro qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

Vano :

- Ez ke kutik une, qey hardî sero lop kenê mi ver ?

Vana :

Hardo hardo, tu sero qey lop danê kutikî, kutik qey boa vergî onceno, verg qey malî weno, mal qey ko ra çereno, ko şîye dano ra derey, dere cemedîno, ez ginan waro qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

Vano :

- Ez ke hard une, mere qey mi lone keno ?

Vana :

- Mere, tu qey hard lone kena, hardî sero lop danê kutikî, kutik boa vergî onceno, verg malî weno, mal ko ra çereno, ko şîye dano ra derey, dere cemedîno, ez ginan waro qorê mi şikîno, malê mi geste mireno ?

- Vano :

- Ez ke mere une, qey pisinge mi wena ?

Vana :

- Pisingî, tu qey merey wena, mere qey hard lone keno, hardî sero qey lop kenê kutikî ver, kutik qey boa vergî onceno, verg qey malî weno, mal qey ko ra çereno, ko qey şîye dano ra derey, dere qey cemedîno, ez qey ginan qorê mi şikîno, malê mi qey geste mireno ?

- A kî vana :

- Ma ez ke pising o, axayê mi qey xanima mi fetelneno ?

## VATENA VİRÊNAN

- 1 - Awe vindena dismê nêvindeno.
- 2 - Awe sona qum maneno.
- 3 - Awa bêvenge ra biterse.
- 4 - Adirê çêriku, doyê kariku, çê veiyiku.
- 5 - Aqil seru de niyo, sare der o.
- 6 - Aze, ternêni de yêna de.
- 7 - Bize ke biz a, mexelê xo kinena, hona tede mêle bena.
- 8 - Biza gerine wertê malî de nêbena.
- 9 - Begî tim ra gonewer ê.
- 10 - Canê herî ke zon da, ostorê hewlî ra zêde voz dano.
- 11 - Ciyê binê vore, rew bo herey bo vejino.
- 12 - Çefê dizdu tarî de yêno.
- 13 - Çimo kor ra roştî nêwajîna.

- 14 - Çowt ronise rast qesey bike.
- 15 - Daro husk demgê tern nêbeno.
- 16 - Deva ra vato : «vilê to ça çewt o »  
vato : «kotiyê mi rast o ke ?»
- 17 - Destê xo sana ra, çimê xo vet.
- 18 - Eve zu gule usar nîno.
- 19 - Eve koçike kerd arê, eve kundêz kerd vila.
- 20 - Ez van : «hes na o», û vano : «rêçe na wa».
- 21 - Felek ve çerxê îsonî nêsanî.
- 22 - Feqîrêni merdene ra zor a.
- 23 - Ga ke gina waro, kardî benê zaf.
- 24 - Gost nenik ra nêbeno.
- 25 - Geme ve zu dare kêm nêbena.
- 26 - Hata çimî rê derman dî ke, çim kerd kor.
- 27 - Hata xiravnîye nébo ke, rindiye nêbena.
- 28 - Herî dîna de zaf ê, pêro zu ca de nîyê.
- 29 - Îsan dîna nêweno, dîna ïsanî wena.
- 30 - Îsan hata waro peyê nêşêro, waro virên ra xo vir nêano.
- 31 - Kardî do ra aste.
- 32 - Korî rê ci çila, herî rê ci wenca, kerrî rê ci dool-zurna.
- 33 - Kelpîç şîyo derdê kemerî rê bervo (silîye ke vorê halê xo sebeno)
- 34 - Lingü ser ra, amune çoku ser.
- 35 - Mor dimê xo de nîadano, mordemek mezela lazê xo de nîadano.
- 36 - Marîfetê herî zirayîs o.

فده نسا ناگریته وه ، به لکو قوتا بخانه يه کي جيها نويه . بويه له  
تا بلوكا نمدا به دووی ههستيک ده گه رېم که ، روژي له روژان ، ناخى  
هه موو مروقېكى ورووزا ندبى . بو من ئەمدىه هونهري جيها نسى .  
له دايىك بعون و پەرەسەندىنى بىرى بەرەھمېك لاي من وەکو لاي ئەم  
هونه رەمندانه نويه کە پەنا دەبەنە بەر خەيال بو داھىنان .  
تا بلوكا نى من له واقيعە وە ھەلّدە قوللىن . ئە و شتانەي لە دەور و  
بەرمدا ن دەبن بە بەشىك لە هونه رەكەم . پېيم دەلىن کە له تا بلۇ .  
كا نتدا مروق يان کە مە يَا وەکو ھەر نويه . من بىھى زۇرى روژم  
لەم ژوورەدا بەسەر دەبەم . بو نمۇونە زۇر جار ئە و كورسىيە لە  
تا بلوكا نمدا ديا رە . كەسى لەسەر نويه . ناتوانم كەسىكىي بۇ  
بخولقىنتم . بەلام ويئەي كورسىيە کە لە خودى خۇيدا هەستى تىدا يە .  
ھەستىش بو مروق دە گە رېتە وە .

\*

\* \*

ئا مانجه کانی پیشان دانی ئه و جوره هونه ره بwoo که به کەره ستهی پلاستیک وەئەنجام دەدري.

ھیوا : به رای ئیوه چین ئه و دیا دانەی کاریان لە هونه رمه ندى كورد كردووه؟

ره مزى : هونه رمه ندى كورد ، يەكەم جار ، رېشمە ئیانا نى خۆي کاري تى كردووه ، ئەمجار بار و دۆخى نەتەوە كەم و پاشان ئه و دیماردە جىهانى يانە ئەم سەرددە مەمى تىيىدا دەزىن ، ئەويش بە يارىدەي ھەموو ئه و دام و دەزگاي بلاوكىرىدە وەي دەنگ و باسى چەرخى بىستەم . هونه رمه ندى كورد بى ئاگا نىيە لە روودا وانەي لە دەنیادا روودە دەن . هىچ هونه رمه ندىك ناتوانى سارد و سر بوهستى لە عاستى ئەوهى لە شوينى كە روودە دا . بۆيە كاتى ئە باسى نەخشە كىشا نى كوردى دەكەين ناتوانىن بلىيەن هونه رېكى نا وچەيىيە .

ھیوا : به پىي ئه و پېشانگايىيە رېكتان خست ، ئا يا دەتowanىن باسى چەند هيلىكى گشتى بکەين كە هونه رمه ندى كورد دەبەستىتە وە بە خۆيە وە ؟

ره مزى : من لەو بىروا يەدام كە چەند لايەن ئەيىھە ھەموو هونه رمه ندانى كورد كۆدە كاتەوە ، ئەويش ھەستە كە يەكەم جار بە تابلۇكەي دەدەن . تاقە كەس نىم كە ئەم رايىم ھەيىھە . زۇر لە برا دەرەنەمان رايىان دەربىرى . پاشان لە رەنگدا ، ھەروا لە شىوهى دابەش بۇونى شتەكان لە چوارچىوهى تابلۇكەدا .

ھیوا : جىا وا زىيەك بەدى دەكىرى لە نېوان تابلۇكانى تو و ھى هونه رمه ندىكەنلىق تر . لاي ئەوان كوردىستان ھەميسە دىيارە . كەچى لاي تو وانىيە . بۇ نمۇونە با سەيرى ئەم تابلۇيە بکەين ( كورسى بىك و كولدانىك و چەند سېۋىيک .. هەتىد ) . چۈن وە كوردىك لېرە دا ھەست دەربىرىۋە ؟

ره مزى : من لە پىش ھەموو شتىكدا وە كوردىك ھەستى خۇم دەردە بىرم . بەلام ، سەرە راي ئەوه ، لەو بىروا يەدام كە ئە و شوينىمە مندالىم تىيىدا بەسىر بىردى كارى تى كردووم و ھەتا ئىستاش ھەم پاشما وەي ما وە . لەبەر ئەوهى سى سالە لە فەرەنسا دەزىم و قوتا خانەي هونه رېي پارىس كارى تى كردووم . قوتا بخانەي پارىسيش تەنبا

- سايان ، له سالى ١٩٥٩ له كوردستانى توركيا لە دايىك بۇوه و له سالى ١٩٨٢ وە له بەرلىن دەزى .  
 - عەلى ، له سالى ١٩٥٧ له زمادى - عيراق له دايىك بۇوه ،  
 له سالى ١٩٧٦ وە له نەمسا دەزى .  
 - عيسا ، له سالى ١٩٥٠ له كوردستانى سوريا له دايىك بۇوه .  
 چەند سالىكە له فەرهەنسا دەزى .  
 - قازى - زادە ، له سالى ١٩٤٧ له كوردستانى ئىران لە دايىك بۇوه و له سالى ١٩٨٣ وە له فەرهەنسا دەزى .  
 - مەتىينى ، له سالى ١٩٤٩ له كوردستانى سوريا له دايىك بۇوه و له سالى ١٩٧٨ وە له بەرلىن دەزى .  
 - يوسف سالح ، له سالى ١٩٥٣ له كوردستانى عيراق له دايىك بۇوه . له سالى ١٩٧٦ وە له ئيتاليا ژياوه و له سالى ١٩٨٢ وە له فەرهەنسا دەزى .

به پىيىستمان زانى چەند پرسىارىك ئاراستەي كاك رەمزى،  
 رىكخەرى ئەم پيشانگا يە ، بىكەين . رەمزى وەكۆ ھونەرمەندىكى كورد  
 له فەرهەنسا و ئەوروپا دا ناسراوه . چەندىن پيشانگاى شەخسىي لە  
 ئەستەمۇول، پارىس، لوان، دووردان، مارلى - لو رووا و سويسرا  
 كردۇته وە .

هيوا : ئا مانجي ئەم پيشانگا يە چى بۇو؟  
 رەمزى : ئا مانجي ئەم پيشانگا يە دەرخستنى بۇونى ھونەرمەندى  
 كورد بۇو . ويستمان پيشان بىدەين كە لملاي ئىيمەيش ھونەرمەندە بىدە .  
 بى هېچ گوما نىك ، مەبەستىكى سيا سىيىشى ھەبۇو .. ئىمرو ھەر باس  
 كردتىكى كورد كارىكى سيا سىيە . چۈنكە ، ھەتا ئىيىستا ، له چەند لايدىك  
 دان نەھىئىراوه بە بۇوشىان . ئەم پيشانگا يە تەنبا بۇ رۆزا وايسى-  
 يەكان نەبۇو ؛ پارىس مەلبەندىكى جىها نىي ھونەرە . ويستمان پيشان  
 بىدەين كە ئىيمەيش ، وەكۆ گەلانى ترى جىهان ، ھونەرى وا مان ھەيە  
 كە شايدى بىتىينە . لەو بروايدام كە پيشانگا كە گەيشتە ئا مانه -  
 كانى خۆي . خەلکىكى زۆر ھاتن بۇ بىتىينى و راشيان باش بۇو لېي  
 با رەيەوە . نەها تبۇون بۇ بىتىينى بەرھەمى فولكلۇرى كورد ، بەلکەو  
 بۇ تە ماشا كردى ھونەرى نىڭا ركىشا نەللاي كورد . يەكىنلى

## پیشانگای تابلوی کوردی

له ئیواره‌ی هی ئۆكتۆبەرە وە هەتا ۲۶ هەمان مانگ ، -  
پاشان دریزه‌ی پی درا هەتا وەکو هی دیسەمبەر - ئەنستیتووی کىورد  
پیشانگایەکی ریک خست لە پاریس بۇ پیشان دانی بەرھەمی ھونھربى  
دە نیگارکىشى کورد. ھەرچەندە ئومىد دەکرا ژما رەمی بەشداران لە وە  
زیاتر بى، بەلام، بەداخوه لەبەر چەند كۆسپیک ئە و ئومىدە  
نەھاتە دى . ئەم پیشانگایەکی گشتى پېشکەش بە ھونھەر دۆستان و  
کورد دۆستانى دانىشتۇوی پاریس و چەند شار و ولاتىكى کە .

سەرەرپا دوورىيان لە ولاتەوە، سەرەرپا بۇنىيان لە  
ناوجەرگەی شارستانىتىيەکى جىا وا زەلەھە لىيەوە ھاتسوون ،  
کوردستان ، بە ھەموو لايەنەكانىيەوە، خۆى لە تابلوکانىاندا  
دەنويىنى ، نەک تەنبا لە رووی با بهتموھە، بەلکو لە رەنگ، ھەست ،  
بزووتتەوە ، ... ھەتە ، تەنانەت ئەوانەش كە كەرەستە و با بهتى  
تابلويان زادەي شارستانىتى رۇزاوا يە و چەندەها سالە كوردستانيان  
بىچا و نەدىيە دەلىن کە رىشەي كوردەوارى لە بەرھەمە كانىيان ھىشتا  
شاڭرا و دىارە .

بەشدارانى ئەم پیشانگایە ئەم ھونھەرمەندانەن:

- بىدەر، لە سالى ۱۹۵۰ لە كوردستانى سورىا لە دايىك بۇوە ،  
لە سالى ۱۹۷۴ وە لە فەرەنبا دەزى .

- تۆپال ، لە سالى ۱۹۳۴ لە كوردستانى تۈركىيا لە دايىك  
بۇوە و لە سالى ۱۹۸۶ وە لە ئەلمانىيە فېدىرال دەزى .  
- راستى . لە سالى ۱۹۴۶ لە كوردستانى تۈركىيا لە دايىك  
بۇوە و لە سالى ۱۹۷۰ وە لە فەرەنبا ژيا وە ئىستا لە جەزاير  
دەزى .

- رەمزى ، لە سالى ۱۹۲۲ لە كوردستانى تۈركىيا لە دايىك  
بۇوە و لە سالى ۱۹۵۳ وە لە فەرەنبا دەزى .

بازرگانی، بو هه لبزا ردنی ناوجهی مه لکهندی (۱۳).

هه رچهنده، ههتا ئیستا، نازانین ئیبراھیم پاشا چون بیرى له کیشى بازگانی کردۆتەوه، بەلام چەند بەلگەیەکی میژویی ھەن، ج له کتىبە کۆنەكاندا، ج لهو گەشە سەندنە سەزسۇرھىيەن بىزۇو-تەنەوهى بازركانى له سلىمامىدا، كە گومان له بۇونى ئەم پالپىوه-نەرە ناھىلەن. بۆيە باسکردنى لايەنەكانى به پىۋىست نابىنین بو ئەم و تارە. كەچى رېگاى گەپان به دووی پالپىوهنەرى سياسى لە مېشکى ئیبراھیم پاشادا تارىكەو پىرە له كەند و كلۇ. ههتا ئيمىرۇ بەلگەی باوه رېپىكرا و مان بەدەستەوه نىيە بو ئەوهى بتوانىن، بى سلکردنەوه، لم مەسىلەمە بدويىن. لمبەر ئەوه خۇمان له قەرەى نادەين.

ئەمپۇ، پاش دوو سەد سالى لەدا يك بۇونى شارى سلىمامى، هەر ھۆيەك بۇوبى پالى به ئیبراھیم پاشا وە نابى بو ئەو كارە، ئاكامى هه لبزا ردنەكەى شارى بۇو كە يەكى لهو میژووه دەولەمندانەمى شارانى كوردىستانى، له رووی سياسى، ئابۇورى، سۆسىۋلۇزى، كولتوورى و مىملانىيى ھەممەچەشىنەوه، دەخاتە سەر مىزى ليكۈلەرەوانى كورد.

---

(۱۳) لهو ليكۈلەنەوهى كە دەربارە سەرەلەنەنەنى تەرىقەتى نەقشبەندى لە كوردىستاندا، له "دراسات كردية"دا، بىلەمان كرددەوه، زۆر بە كورتى تەنبا باسى پالپىوهنەرى بازركانىمان كردووه، بىروانە گۇفارى ناوبرا و، ژمارە يەك، پاريس ۱۹۸۴، ل ۵۸. ئىستا بۇمان راست بوقتەوه كە پالپىوهنەرى شەخسى لهوهى بازركانى كە متىر نىيە.

بەھیز کردنی خۆی و ئەما رەتەکەی لەبیر نەدەکرد. تەما عى دەستەلار تدا رىتى لە سنورى ميرنىشىنە كوردەكانىش نەدەۋەستا، بەلگو بىرى لە ولايەتى بەغاشى دەكردەوە. كە پاشايەتىي با بانى لى دەسەندرايەوە نەدەچوو لە قوزبىنىكدا كش و مات ژيان بەسەر بەرى، بەپىچەوانەوە، ئارامى لى دەبىرا هەتا ئەو حەلمەي دادەنىشتهوە سەرتەختى ئەمارەت. جا، ئايى، ئەگەر ھەلبىزاردەنى شويىنى پايتەختى بايان بە دەستى ئەورەحمان پاشابوايە، ناوجەمى مەلکەندىي ھەلدەبىزادى؟

دەستمان بۇ ئەم خالانە درىزىكەد بە مەبەستى ئەوهى بلىنيين كە ئىبراھىم پاشاي بايان بۇچۇونىكى عەسكەرىي نەبۇوه و كىشى عەسكەرىيەكەن جىيەكى بچۇوكىيان لە مىشكىدا داگىر كردىبوو. بۇيە كە دېيى مەلکەندىي ھەلبىزارد بۇ دروست كردنی پايتەختى شويى بايان توانا يى بەرگىري شار، ج لە رووى تەكتىكىيەوە، ج لە رووى ئىسترا-تىجىيەوە، بۇونىكى لاتەنىشتىيان لەو بىيارەدا ھەبۇوه (11). جە لەو شىكەرنەوەيە، كە گەيا نىدما نىيە ئەم رايە، بەلگەيەكى مىزۈوبىي بايدىدارمان بە دەستەوە ھەيە بۇ پاشىتكىرى كردنى: ئەو دەمەي رىچ لە سلىيەمانى بۇو، سالى ١٨٢٠، لە كورەزاي ئىبراھىم پاشاي پرسى بۇچى باپىرى ناوجەمى مەلکەندىي ھەلبىزارد بۇ دامزرا نىدىپايتەختى نويى ميرنىشىنەكەي، ئەوپىش لە وەلامدا وتنى: "چوشكە حەزى لە را و دەكەد و ئەم ناوجەيە زۆر لەبارە بۇ را وكردن، سەرەرای ئەوه ئاوى زۆرە" (12). بەم شىۋەيە دەگەينە ئەو بىروا يە كە پالپىۋەنەرەرى شەخى نەخشىكى بىنەرەتىي ھەبۇوه، شان بە شانى پالپىۋەنەرەرى

(11) كە رىچ لە محمۇد پاشاي بايانى پرسى بۇچى خانۇوه كانى سلىيەمانى ھەمووى رووخاون و دروست نەكرا و نەتەوە. مەحمۇد پاشا بەم شىۋەيە وەلامى دايەوە: "كى ئارەزووى دروست كردنەوەي شتىك دەكا كە ئومىدى بە ما نەوەي نەبىئى؟ ئەگەر ئىمپۇر دروستىيان بىھىنەوە سېھىنى توركەكان ياخود فارسەكان دېنەوە بۇ رووخانىنى ھەموو شتىك" ، بىرانە سەرچا وەي ناوبراو ، ل ٨٨. قەلاچوالان ھەرگىز واى بەسەر نەھاتبۇو.

*Narrative of a Residence*, p. 88.

(12)

له روانگهی سیاسیه و همه میشه لایه نگری ئیمبرا توربی عوسما نی بووه .  
بجووکترین دوستایه‌تی به رامبه ر به ئیمبرا توربی فارسی نه نواندووه ،  
ئه و شهرا نهی به ئاره زووی خوی کرد وونی ده گمه نن . سه رکردا یه‌تی  
لەشکری ده کرد بۆ جی بجه کردنی دا واي والی بەغا . به تایبەتی ،  
بۆ سه رکوت کردنی عه شره ته را په پیوه کان دز به ده سه لاتی عوسما نی .  
ھیرش بردنی بۆ سمر یه زیدی یه کان ، له سالی ۱۸۰۰ ، به داخوازی  
والی بەغا ، عەلی پاشا ، باشترين نمۇونەی ئەم کرده یه یه . هەر کە  
فرمانی ده رکردنی له پاشا یه تى ده رده چوو یەكسەر تەختى پاشا یه تى  
بەجى ده هیشت و رووی له بەغا يان خانه قىن ده کرد ، له وى ده ما یه و  
ھەتا وەکو والى رقى له جىتىشىنەکەی ھەلددەستا و سەرلەنۋى پاشا یه تى  
پى دە سپارەد .

ئەو تاقە چیروکەی میژوونووسان ده یگىر نه وە له بارەی ناونا نى  
سلیمانی یه وە هەتا رادەيدك يارمەتى تىگە يېشتنى جۆرى سېرکردنە وە  
ئەم پاشا یه دەدا : كاتى كريکاران كاريان له بىنەرەتى كوشى  
پاشا یه تى ده کرد ئەنگوستىلە یەكىان دۆزى یه وە كە وەتە (سلیمان) ى  
لە سەر نووسرا بۇو . ئىبراھىم پاشا دە مودەست بېپارىدا ناوى پا يەخت  
بنى (سلیمان ىيە) . كەچى نامە يەكى له والى بەغا ، سلیمان پاشا ،  
نووسى بۆ ئە وە پى بلى كە شارە كە بە نىيۇ ئە وە وە نېتونرا (۱۰).  
ئەورە حمان پاشا يابان ، ھا وچەرخى ئىبراھىم پاشا ، پيا وينى  
عە سکەرى بۇو ، وەلامى چەكى بە چەك دەدا یه وە . هەر كە فرمانى لادا نى  
له پاشا یه تى دەھات كوتومت سوپاي كۆدە كرده وە و بەرەنگا رىسى ئە و  
ھېزە دە بۇو وە كە فرمانە كە يەپى بۇو و بەرە و سلیمانى دەھات . زۆر  
جا رىش بە سەریدا زال دە سوو و والى يان چار دە کرد فرمانە كەمى  
ھەلۈھە شېنىتە وە ئە مرى واقىع قىبۇل بکا . زۆر بەي ئە و شەرپانە  
ئەورە حمان پاشا بە شدارى تىدا دە کرد ئەنجامى بېرکردنە و ھەلۈيستى  
خوی بۇون . ئەگەر بە داخوازى والىش بوايە ھەرگىز مەبەستى

(۱۰) محمد امین زکى: تاریخ السليمانیة وانحائها ، ترجمة الملا  
جمیل روزبه یانی ، بغداد ، ۱۹۵۱ ، ل ۰۶۵

لىئەدا سەرچا وە ئە زانیا ریيانە دە نووسین كە زۆر گرنگن يان  
تەنها له كون و قوزبىنى چەند كتىپىكى میژوویى دە دۆزرىنە وە .

شەنوا نەدووه . لەو بىروا يەداين ئەگەر ئىبراھىم پاشاي بابان  
 قەللاچوا لانى چۆل نەكربدا مىرىيکى تر لە هەمان سەردەمدا ، يان پاش  
 چەند سالىك ، بە جىنى دەھىشت . بەلام ئا يَا نا وچەرى مەلکەندىسى  
 ھەلّدە بىزارد بۇ دامەزرا نەدى پا يەختى نويى ئەما رەتىكى نەۋەستا و  
 لە پەرەسەندىنى ئابوورى و عەسكەرى و سپاسى ؟

× × ×

بە پىتى ھەموو ئەو مىژۇونۇسا نەي باسى دروست بۇونى شارى  
 سلىيمانى يان كردووه ، ئىبراھىم پاشاي بابان خودى خۆى شوينەكىسى  
 ھەلّبىزارد دووه . روودا وىكى ئەوتۇ مەرۇف ناچار دەكا گۈنگىيەكى  
 تا بېھتى بە كەسا يەتىي ئەم پاشايە بدا . بۇ ئەم مەبەستە پەنـا  
 دەبەينە بەر ئەو زانيا رىيانە لە كتىبە مىژۇوپىيەكەندا دەكەونە  
 بەرچا و ، سەبارەت بە ھىلە پانەكانى ژيانى ، و ، بەراودى دەكەيـن  
 لەگەل "ئەوانەي" ئەورە حمان پاشاي ھا وچەرخى .

دەربارەي مندالىي ئىبراھىم پاشا زانيا رىيەكى دلخۆشكەر  
 وە چىڭ ناكەوى . مىژۇونۇسا نەو رايەدان كە بەشى زۇرى مندالىسى  
 و ھەرزەكاري و لاۋىتىي لە بەغا بەسىر بىردووه . ئەمە يارمەتىي داوه  
 بە باشى و لە نزىكەوە لە شارتانىتىيەك بىگا كە لە ھەموو بارىكەمە  
 پىشىكە و تۈوتۈر بۇوه لەھەمى كە پاشان بۇو بە مىرى میرانى . ئەمە واى  
 لىٰ كردووه حەز لە ژيانى شارىتى بچۈوكى وەك قەللاچوا لان نەكـا  
 مەسەلمەي بەجى ھىشتى لە بىرەوە بىننەتە واقىع . ئىبراھىم پاشا  
 پىا وىكى مەددەنى بۇوه و حەزى لە شەر نەكربادووه . لە زۇرپەي زۇرى  
 مىراسى بابان زىاتر مەيلى ژيانى كەيف و سەفای ھەبۇوه . بە راي  
 مىنۇركى چل ژنى ھەبۇوه<sup>(۹)</sup> . دىارە حەزى لە رۇونا كېرىش كردووه  
 بۆيە لە سەردەمى حوكومرا نىدا ھانى مەلا و خویندەوارانى ئەـو  
 سەردەمى داوه بۇ فيرېبۇون و فيرەكەن و كۆكەنەھە دەسـنۇوس .  
 ئەوە يەكى لەو ئەكتەرانە بۇو كە پاش ما وەيەك سلىيمانى كرد بىـه  
 يەكى لە مەلّبەندە گەورە كانى "زانست" ئەۋـساكە . ئىبراھىم پاشا

---

Encyclopédie de l'Islam, 2e édition, article: KURDES (۹)  
 et KURDISTAN, p. 473.

شان به شانی ئەو پەرەسەندنە گەشە بکا و پېشکەوئى . كەچى قەلاچوالان تەنها پىدا و يىستى عەسكەرى بەرامبەر بە هيئىشى لەشكىرى فارسى و عوسمانى ، هەتا رادەيدك ، دابىن دەكرد .

قەلاچوالان لە نىيۇھى دووه مى سەددەھى حەقدەوه پايتەختى ئەما رەتى با سان بwoo (سالى بە پايتەخت كردشى بە تەواوى راست نەبۇتەوه ، هەرچەندە ھەندى لە مىزۇونووسا ن سالى ١٦٦٩ بۇ دەست نىشا ن دەكەن) . قەلاچوالان كەوتبووه خواروو داروشما نەوه (پايتەختى كۆنى با بان) ؛ لە ناوهندى مىرنىشىنەوه نزىك بwoo . ئەمېش دەسەلاتى مەركەزى بەھىز دەكرد . قەلاچوالان لە ھەرىمېنىكى شاخابى سەخت بwoo ، كە ، مەتمانەيدكى چاكى سى دەبەختى بەرانبەر بە هيئىشى دوزمىنى دەرەوهى كوردىستان . بۆيە گەلىك لە سلىّمانى كەمتر سۈپاي فارسى و عوسمانى توانى بىيگاتى . ئەنگەرچى ئەو شاخ و داخى دەوروبەرى قەلاچوالان لە بارى شەر و بەرگرىيەوه بەسوود بwoo ، بەلام ھەتا دەھات كۆسپى زيا ترى دەخستە رىي كاروانى بازىگاسى ، لە كاتىكدا كە ژمارەھى ئەو كاروانانە لە زىادبۇونىكى سىھا وتا بwoo . لە گفتۇگۇ میران لەگەل رىچ دەردىكەوئى كە گىروگرفتى ئا وىمىشى هەبwoo .

ھەندى لە میرانى با سان ما وەيدكى ژيانيان لە ئەستەمۈول و بەغا بەسەر بىرىدبوو . بە چاوى خۆيان پېشکەوتنى شارستانىتى ئەو شارانەيان دىتبىوو . كە بەراوردىيان دەكرد لەگەل قەلاچوالان دواكە- وتۇوسى ئەميان بۇ نەددەشا رەدايەوه ، نەيانىش دەتوانى گەورەي بکەنەوه ، بۆيە زۆر ئاسايىيە بىرى بەجى ھېشتى قەلاچوالان لە مېشکىاندا جىيگاي خۆي بکاتەوه ، ئەويش عەملەيدكى مىزۇيى بwoo رۆز بە رۆز رىشە دادەكوتا لە نەخشە و پلانەكانى میرانى با بان . لەبەر ئەوه ، لەوانەيدكە راستىيەوه خۆمان دوور خەينەوه ، ئەنگەر مەسەلەي بەجى ھېشتى قەلاچوالان تەشىا بکەين بە زادەي بىرى ئىبراھىم پاشاي با بان . بىريا رېكى وا گرنگ پېيوىستى بە بەكگرتىنى راي زۆربەي میران ھەبwoo ، نەك تەنها ميرى میران ، لە كاتىكدا كە لەشكىرى لەم مىرنىشىنەدا نەخشىكى گەورەي ھەبwoo لە ژيانى ساسىدا و زۆر دۆستا يەتىي بەرامبەر بە ئىبراھىم پاشا

کا مپانیل ، که له سەرەتای سەدەھى نوزدەدا سەرى لە سلیمانی داوه ، میرنشینى با با ان لهو سەردەمەدا يەکى لە دەولەمەندترين میرنشنە - کانى كورد بۇوه<sup>(٧)</sup>.

ئەم پەرهەندنە عەسکەری و ئا بوورىيە و شوينى جىوگرافى - سيا سىي ميرنشينى با با ان - کە كەوتبووه سەر سنورى دوو ئىمبراتورىي دوژمن - گرنگىيەكى سيا سىيان پىي دا . بۆيە ئەستە مۇول و بەغما و كرماشان دەبۇو حيسا بىتكى تايىھتىي بۆ سكەن . هەر لە سەدەھى هەزدە بۇو سولتانى عوسمانى ، بۆ ئەدوھى بە باشى دەسەلاتى خۆي بەسەر ميرانى با با ندا بىسەپىتىن ، بىريا رى دانا و لاپىدى ميرانى با بانى بە تەواوى دايە دەستى والىي بەغا ، چوشكە ئەم لىيانەوە نزىكتىر بۇو و سولتانىش گىروگرفتى گەورەتلى ھەبۇو . ميرانى با با ان ھەركىز بەم بىريا رە قايل نەبۇون ، دەيان وىست يەكسەر پەيوەندىيان بە سولتانى عوسمانى خۆيەوە ھەبى . بۆيە ، لە ھەر ھەلىكدا پېشىان ھاتبى ، ج بەكردار و ج بە قىسە ، نارەزايى و بىگە دىزا يەتىي خويان بەرا مېر بەو بىريا رە دەرسەتووھ ، كەچى ، لە لايەكى ترەوھ سولتان ، بۆ تەكتىكى سيا سىي ، جاروبار ، بۆ دانانى بەرپىۋە بەرلى شارى كويە (لهو كاتانەي كە لەزىر دەستى با با نەبۇو) ئارەزووی ميرانى با بانس پشت گۈي نەدەكرد و ناوبەنا وىش بە گوپەرە دلىانى دەكرد .

لە نىوهى دووهمى سەدەھى ھەزدەدا ميرانى با با ن بىريا لە "كولتۇور و زانست" دەكردەوە و هانى مەلا و روونا كېرانى ئەو سەردەمەيان دەدا بۆ كۆكىرنەوەي دەستووس و فىركردن . شىخ مەممەدى خال دەلى كە كتىبخانەي ميرىسى قەلچوالان ٦٠٠ دەستووسى ھەبۇوه<sup>(٨)</sup> . ئەمە ژمارەبىكى يەكجار زۆرە بۆ ئەو زەمانە و ئەو تاوجە شاخاوېي . ميرانى با با ان بىي ئاگا نەبۇون لەم پەرەسەندنە كە بەشى زۆرى ئاكا مى وىست و كرده وەي خۆيان بۇو . ميرنشينىك ئەم بىرداھى ئا بوورى و عەسکەری و سيا سىي دەبى لە وزەي پا تەختە كەشيدا ھەبى

*Histoire du Kurdistan*, p. 14.

(٧)

(٨) الشیخ محمد الحال: الشیخ معروف التودھی البرزنجی ، بفداد ،

جیا وا زیی لەگەل میرنشینی خویان دەکرد. ئەنچا مەکانى ئەم مەسەلمەیە و كەلکەلەی دىرینى گەورە كردەنی سنور و بەھىز كردەنی ئەمارەت پاڭى بە میرانەوە نا سیاسەتى بەھىز كردەنی لەشکر بخەنە سەرووی نەخشە و پلانەكانى دەولەت و بکۆشن بۇ گەياندنى رادەی لەشکر بە رادەی پېشکەوتى لەشکرى بەغا يَا كرماشان . لەشكىرى با با ان ، لە ھەموو كاتى زۆرتر ، بە سەدان روويان لە نا وچەكانى كەي عىراق دەکرد. بەم جۆرە ، رۆز بە رۆز ، لە كۆشكى سولتانى عوسمانى و پاشاي بەغا و لەنا و دەسودا يەرهى شازادەي كرماشان ناواي با با ان زیاتر دەهاتە نا وانەوە .

با با نەكان بۇ ما وەيەك میرنشینى سۇرانىان داگىر كرد (۳) ; بەشىك لە ئەمارەتى ئەرددەلانيان ھىننا يە ژىر ركىفي خویان (۴) و چەند سالىكىش كەركۈوك و ھەولىريان خستە ژىر دەسەلاتى خویان (۵) و ھەروا بەسەر ئەمارەتى ئا مىدىدا زال بۇون (۶) .

شان بە شانى پەرەسەندىنى عەسکەرى ھىزى ئا بوورىش پەرەرى دەسەند . پەيوەندىي با زرگانى لەگەل شارەكانى كە ، وەكۇ : ئەستەمۇول دىاربەكر ، مووسىل ، كەركۈوك ، بەغا ، سنه ، كرماشان . . . هەتە دەھات فرا وانتە دەبۇو . ھەندى بەرھەمى كشتوكالىي با با ان لە ولاتە عوسمانى يەكاندا دەنگىيان دابۇوهەو . ئەو میرانەلىدە بەرھەمى كوردستان دەزيان ژيانىكى دەس بلاويان بەسەر دەبرد ، كە ، ناتوانىن لە نيشانەي دەولەمندى بەولاؤە شتىكى دىكەلى لى تى بگەين . بە راي

G. Campanile: *Histoire du kurdistan*, traduit de (۳)  
l'Italian par Thomas Pois, manuscrit non publie, p. 14.

مېۋۆو كوردستان، توّما بوا لە ئىتالىيەوە وەرى گىرپا وەتە سەر فەرەنسى . ئەم كارەت توّما بوا ھېشتا چاپ نەكرا وە .

Claudius James Rich: *Narrative of a Residence in Koor-(۴)  
istan and on the site of Nineveh*, vol., I, 1836/1972,  
p. 157.

*Histoire du Kurdistan*, p. 14. (۵)

(۶) س. ھ. لونگريك : اربعه قرون من تاريخ العراق الحديث ، ترجمة جعفر الخياط ، بغداد ، ١٩٦٨ ، ص ٢٤٥

سەرددەمدا . ئەم و تارە خۆی بە يەکى لەو لىكۆلىنەوانە نازانى، بەلکو وەکو چەند سەرنجىكى سەرەتا يى خۆي دەخاتە بەر دەستى خويىنەر . بۇ ئەوهە نەكەۋىنە گىّىزا وى لىكۆلىنەوە سەرددەمىكى دوورو درىز و لەنا و چەندان مەسىلمە قووللۇزدا و نەبىن ، خۆمان بە دوو پىرسار ، كە پەيوەندىيان بە يەكەوهەمەيە ، دەبەستىنەوە و لە دوورىيە هەزاران كىلۆمەتر لە ولاتەوە يادى دووسەمین سالىھى يەكى لە شارانى كوردستانى پى دەكەينەوە . ئەو دوو پىرسىارەش ئەمانەن :

۱) بۇچى بىريار درا قەلاچوالان، پا يىتەختى ميرنىشىنى با با ن پىش سلىمانى ، چۈل بكرى؟

۲) چى پالى بە ئىبراھىم پاشا يى با با نەوە نادەوروبەرى دىيىسى مەلکەندى هەلبىزىرى بۇ دامەزرا ندى با يىتەختى نوپىي ميرنىشىنەكە؟ لە سالانى سەرەتا يى سەددەمە هەۋەزىدە ميرنىشىنى با با رووى لە پەرەسەندىمىكى سوپا يى ، ئابۇورى و سياسى گەنگ كرد . بە پىنى با زىيل نىكىيتىن پەسمانىكى لە نىوان سولتانى عوسمانى و میرانسى با با ن بەسترا بۇو ، تىايىدا ، سولتان لە باج دان دەيان بەختى بۇ مەرجى ئەوانىش ئاما دەيى خۆيان پېشان بىدەن بۇ ناردىنە لەشكەر بۇ ئەو شەرەنە عوسمانىيەكان دەيىكەن و يارمەتىيە لەشكەركەيان بىدەن هەركاتى كە بە عىراقتادا تى دەپەرى (۲). هەرچەندە ئەم پەيمانە لە نىيەرى دووهەمى ئەو سەددەمە ھەلۇوهشايدە و ميرنىشىنى با با ، وەکو ميرنىشىنەكانى ترى كوردستان ، دەستى كرد بە باج دان ، بەلام لە كاتى خۆيدا ، لە رووى ئابۇورىيە و زۆر بەسۈود بۇو بەلام لە رووى سوپا يىيە و نەخشىكى دووسەرەي ھەبۇو : لە سەرىيەكە و ئەو سەرباز و ئەفسەرانە دەچۈون بۇ شوپىن و شارى بە سەدان كىلۆمەتر لە كورد - ستانەوە دوور ، بەشىكىيان نەددەگەرەنەوە و لە جەنگدا دەكۈزۈران ، لە سەرىيەكى ترىيەوە ئەوانەي بە ساغ و سەلامەتى دەھاتنەوە ناو مال و منداڭلى خۆيان ، تاقىكىردىنە و مەكى سوپا يى دەولەمەندىريا ن پەيدا كرد بۇو و بار و دۆخى دەرەوە كوردستانىان بىتىبۇو و ھەستىيان بە

# چهند سه‌رنجیکی سه‌ره‌تایی ده‌باره‌ی دروست بعونی

## شاری سلیمانی

### هه‌لکه‌وت‌حدکیم

ئه مسال یا دی دووسه‌ده مین ساله‌ی دروست بعونی شاری سلیمانی ده‌که‌ینه‌وه . بهم بونه‌یه‌وه ، له گوشا ره کوردی‌یه‌کانی کورستانی عیرا ق چهندان نووسرا و بلاوکرا وه‌ته‌وه (۱) . ئوه‌یه هه‌تا ئیستا چاومان پسی که وتووه بريتی‌به له شیعر یا ان په‌خشانی هوشه‌ری که هه‌ست و نه‌ستی شاعیر و نووسه‌ر به‌رامیده بهم شاره و رووداوه‌کانی ده‌رده‌برن . هه‌رچه‌نده هیشتا کوتایی سالی ۱۹۸۴ نه‌هاتووه و نازانین چی تری بو هه‌لگرت‌تووین ، به‌لام ، لهو چهند گوشا ره‌ی گه‌یشتوونه‌ته دستمان ، له ده‌ره‌وه‌ی ولات ، هیچ جوره لیکولینه‌وه‌یه‌کی میزه‌ووی ، سیاسی ، سوسيولوژی ... هتد ، ده‌رباره‌ی رابوردو و ئیستای سلیمانی ناکه‌ویته پیش چاوه . جیگای داخه ، ئه‌میش ، چون ده‌یان یادی که‌مان - بو نموده یا دی سدد ساله‌ی کوچی دوا یی شیخ عوبه‌یدوللای نه‌هه‌ری ، ۱۹۸۳ - به لاما‌ندا گوزه‌ر بکا و نه‌بیته هانده‌ری پیاچوونه‌وه و هه‌ولدانی گه‌ران به دووی وه‌لامی ده‌ها پرسیار له باره‌یانه‌وه که شایه‌نی کردن و چاوه‌پوانی شیکردن‌وه‌هن . میزه‌ووی شاری سلیمانی یه‌کیکه له و ممسله‌نله‌ی که ، سه‌ره‌پای ئه‌و کتیب و وتارانه‌ی ته‌رخانی باس‌کردنی کراون ، هیشتا پیویستی‌به لیکولینه‌وه‌ی قولله بو تیگه‌یشتی‌به‌شیکی گرنگ له بزووتنه‌وه‌ی سیاسی و کولت‌ووری و ئابووری کوردستانی عیراق لەم

(۱) براده‌ریک له کوردستانی عیراق‌وه‌هاتبوو ده‌یگیرا یه‌وه که له شاری سلیمانی ئاهه‌نگیکی گه‌وره ساز کراوه بو ئه‌م یاده و شیعر و وتاری تیدا خوییدرا وه‌ته‌وه . هه‌روا ، له شویتی دیکه‌ش وتاریان له‌سر ئه‌م شاره‌پیشکه‌ش‌کردووه . به‌داخه‌وه ، هه‌تا کاتی چاپکردنی ئه‌م دیڑانه ، نه ئه‌و نووسرا وانه‌مان وه‌گیز که وتووه نه ئاگاداری با بهت و ناوه‌روکیانین .

بکردا يه .

بهر لمه‌هی کوتایی بهم و تاره (ینین ، چند تیبینی‌ییک دهرباره‌ی و تاره‌کهی کاک ره ووف حمه‌ن تومار ده‌که م که بده‌اخمه‌وه کاک ره ووف مه‌وزووعیانه بوی نه‌چوه که ده‌لیت : " ... به‌لام ئه‌محمد موختار جاف‌له چیروکه تاقانه‌که‌یدا ، (۵۰-۴۰) سالی ژیانی کۆمەلی کورده‌واریما ن سه‌رتا پا به دز و جه‌رده و بی ویژدان و پیاو خراب داده‌نی بو گله‌یی لی ناکات ؟ ! " (۱۲) ، چیروکه‌کهی ئه‌محمد موختار بی گومان لایه‌ره بیکی گه‌شی میزروی ئه‌دبه بی کورديما ن تومار ده‌کات (۱۳) ، کاک ره ووف کاتی باسی شیعره‌کهی حه‌مدى ده‌کات دوای ( مه‌سله‌ی ویژدان ) له جی خویدا نیه ، پیویست بیو له کاتی دیفا عه‌که‌یدا له جه‌میل صائب باسی بکردا يه ، چونکه پیوه‌ندی هه‌یه به هه‌لويستی صائب‌وه له حوكومداری شیخ مه‌حموودی نه مر . کاک عومدر باسی قسه‌کانی ده رویش ده‌کات له چیروکی ( مه‌سله‌ی ویژدان ) من لمه و تاره‌ی که له‌سر چیروکی ناوبراوم نووسیوه ده‌لیم :- "نووسه‌ر و اته ئه‌محمد موختار - بیر و باوه‌ر و پروفگرامی دوا روژی به زمانی ده رویش ده‌ربريوه " .

بی گومان ئه‌گه‌ر هاتو کاک عومدر مارف‌له چاپی دووه‌هه میدا ئه‌م ره‌خنه و سه‌رنجانه‌ی و هرگرت ئه‌وه کتیبه‌کهی له رووی زانسته‌وه سوودبه‌خشتر و پایه‌ی بلندتر ئه‌بیت ، ئیمەش هیوا دارین که نووسه‌ران وەک کاک عومدر دلسوزانه هه‌ول بدهن خامه‌یان بخنه‌ه کار له پیتنا وی لیکۆلینه‌وهی هه‌موو لایه‌نکانی ئه‌دبه بی کورديما ن .

(۱۲) ره ووف حمه‌ن ، هه‌مان سه‌رچاوه ، لایه‌ره ۱۰

(۱۳) جه مشید حه‌یده ری ، "الشاعر الكردي احمد مختار جاف وقصته

( مساعله‌الضمير ) " ، جريدة العراق ، العدد - ۴۶۹ ، فـ

۱۸۷۷/۱۰/۳

دیا لۆگ ، تا بلوی سروشی ، ناخی ده رونوی پالهوان و پیوه‌ندیسی  
با بهت له‌گەل ژیانی کۆمەلایەتی ، شەقلی نەتەوەیی ، ئا وردا نەوەی  
نووسەر بۆ روودا وەکانی میزۇو و داریشتى لە بەرگەکی ھونەريدا ،  
وینەی فۆلكلورى لە چىروكدا .. هەند پیشان بادات .  
بۆ نموونە لە لایپەرە ٩٤ دا باسی فۆلكلور دەکات ، بەلام ھەر  
بە دوو دیئر کوتايی پى دەینى .

لە لایپەرە ١٤٦ دا کاک عومەر دەربارە چىروكى ( قەزوان  
فرۆش ) ئەمینى میرزا كەريم ئەلتىن : " ئەمە يىش نيشانەي مانەوەي  
سيستىمى كۆيلەيەتىيە " ، لام وايد ھەر توپۇزەر كاتى زارا وىك  
( مصطلح ) بەكار دەھىتى پېتۈپىستە چاڭلىنى بکۈلىتىوە ، ئەوسا ئەم  
زارا وەج جۆرىيەك بىت ( سياسى ، زانستى ، ھونەرى .. هەند ) ئەوسا  
بەكارى بەھىتى .

چونكە ولاتى ئىمە بە سىستىمى كۆيلەيەتى تى نەپەرىيەو ، لە بەر  
ئەوھە کاک عومەر دەبوايد بنووسى : " ئەمە يىش نيشانەي دواكەوتىنى  
بارى ژیانى کۆمەللى نىمچە دەرەبەگىھە كە کۆمەلانى كورد ئەوسا تىدا  
دەۋىان " .

لە لایپەرە ١٥٦ دا کاک عومەر دەلى : " چەندىش جوانە كە  
نووسەر ( د . كاوس قەفتان ) دەلى : - دەنگى ھەزار كە بەر زېتىتەوە  
لە ھەممو ئا وازىكى تر خوش و بەسۈزترە . " . گەرنگىي ئەم گۇتنىمى  
دكتور كاوس قەفتان لەۋەدايد كە له‌گەل ياساى ژيان دەگۈنچىي و  
ئا وينەي راستەقىنەي بىرى نووسەرە لە كاتى میزۇو دىياركراوا ،  
دكتور كاوس وەك نووسەر يىكى رىيالىيەت و پېشىكە وتخواز لەم چەند  
وشانەدا ھەست و نەستى خۆى دەرپەرىيە بەرامبەر چىنى ھەزار ، بە  
لای منه وە ئەم وشانە ھەندى جوان نىن ، بەلكو گەرنگى و شۇينى  
تا يېھتىي خۆيان ھەيە لە میزۇو چىروكى كوردى و لە گۈيى  
خويىنەرەي كورد ئەزىزىتەر وەك ھەندى راستەي چىروكەكانى بلە و  
سەجا دى .

پېيىيت وا بۇو کاک عومەر لایپەرەي ١٥١ تەواو بکات بە چەند  
سەرنجىتكى گشتى و دەست نيشان كەردىنى بارى گشتى چىروكە كانى قۇنا غى  
1961-1969 و كاكلەيىتكى بۆ ھەموو لېكۈلىتەوەكەي تىدا تۆمار

دهکات ، زور کاری چاکه که کاک عومه ر تهئسیری موپاسانی دهست  
نیشان کردوه له بەرەمەکانی سالانی ۱۹۵۰-۱۹۶۱ ، بەلام بوئەوەی به  
خويىنەر بسەلمىنى ، پىوېستبوو چەند نموونەيىكى بەراوردىي نيشانى  
خويىنەر بدايە و ئەوەشى دهست نيشان بىردايە له بەرەمە مى كام  
نۇوسمەرى ئەو سەرددەمە ئەو لايەنانە ئاشكرايە و له ج فۇرمىكدا ،  
چونكە له لىكۆلىنەوهى زانتىدا ئەوە كافى نىيە توپىزەر بلىتىت  
فلان نۇوسمەر ياخود چىرۇك نۇوس له ژىر تەئسیرى فلان نۇوسەرەي  
بەناوبانگە ، بەلكو پىوېستە به نموونە روونى بکاتەوە .

نۇوسمەر له كتىبەكەي باسى چىرۇكەكانى ما مۆستا حەسەنلى  
قىزلىجى و پىشىمەرگەكەي دكتور رەحىمى قازى دهکات ، بەلام بەلە لاي  
منەوە نۇوسمەرانى كوردىستانى ئىران پىوېستيان به لىكۆلىنەوهى جيا  
ھەيە ، خۆئەگەر مروقەر بىھەۋىت با سيان بکات ئەوسا پىوېستە  
تەنها يەك نۇوسمەرنەكانە نموونە ، ھەر وەك ئاشكرايە له ئىراندا  
ھەر ئەم دوو نۇوسمەرەمان نىيە ، باسەكەي کاک عومەرىش به تايىھەتى  
چىرۇكى كوردىيى عېراق دەگرىتەوە نەك ھەمۇو چىرۇكى كوردى .  
ئاشكرايە له سورىيا و تۈركىيا و سۆقىھەتدا به دەيان چىرۇك  
نۇوسمان ھەيە ، كە به زاراوى كرمانجى ژۇورۇو بەرەمە خۆيان  
نۇوسييە و چاپ كردوه . سى گومان له كاتى نۇوسييەوهى مىزۇوی  
ئەدەبى كوردى پىوېستە ئەم مەسەلەيە پشت گوئى نەخرىت .

له لايپەرە ۱۳۸ دا کاک عومەر بائى ئەو چىرۇكانە دهکات  
كە دەربارەي لاقا وي سلىمانى نۇوسراون و ياخود چاپ كەن لە دەرددە  
كوشىنەكانى كۆملە دەكەن ( قومار كەن ) بەلام بەداخەوە هەنزاوى  
نۇوسمەركان و ناونىشانى چىرۇكەكان ئەھىنەن و هىچ ھەولىكى و  
نادات ئەو چىرۇكانە شى بکاتەوە ، سەركەوتىن و گرنگىان لە رووى  
ھونەرىيەوه نيشان بادات .

كاک عومەر بە گشتى له لىكۆلىنەوهەيدا خەرىكى نا ووكبۇو و  
لاوهكىش ھەندىچار باسى فۇرم دهکات . گرنگىي لىكۆلىنەوهى ئەھەبى  
لەوەدايە كە توپىزەر بىتوانى رادەي سەركەوشن و بەھەرەي چىرۇك و  
چىرۇك نۇوس دەرخات لە دارىزتنى چىرۇكەكەي و ھەلىۋاردىن  
پالھوان و زمان و تەعبير ، بنياتنانى چىرۇك ، مەنەلۇوگ ،

دزی ژیانی کوچه‌ری و شهپر و شوری نیو عینله‌کانی کومدلی کورده‌واری ئەدوی . گرنگی تا بەتى ئەم چیروکە ( نازدار ) مۇھەممەد عەلی کوردى لەودا يە كە كەره سەتەيىكى چاك سۇ لىكۈلىنەوهى ئىيتتۈگەرا فيي تىندا توْمار كراوه .

كاڭ عومەر كە باسى چیروکەدە ( مدیر بگ ) شاكيىر فەتەح دەكەت دەللىت : " چارەسەر كەرنىكى ئىسلامىيە و لە روانگەيىكى ئايدىا لىستىانەوە مەسىلەكەدە بىنیوھ ، ئەم دىاردەيدىش لايەنېكى دانەبرا وي با بهتەكەنە ئەم قۇناخىيە كە تا رادەيىكەندى نۇوسمەرانى دوا يى گرتۇرەتەوە كە نەيان توانىيە خۆبائى لى قوتار بىكەن و لە با تىيى ( بىدىل ) ئىكىان بو بار و زرۇوفى ئەو روژگارە دانەنا وە " (٩) . نۇوسمەر بەداخەوە ئەو رابىي كە لىنەمەرەوە - تعميم - دەكەت بەسەر قۇناخى چەلەكەندا كە لە جىيگاى خۆي نىيە ، بەلكو نۇوسمەر تۇوشى چەوتى دەكەت ، لە كاتىكدا ئەم قۇناخە چیروکەكەنی بلە - ئىبراھىم ئەممەد و عەلائەدەن سجادى دەگرىتىمۇ كە ئىياياندا پەرەگرافى ئاوا هەمەيە : " پىا و دۇزمى خۆي بە دەستى خۆي بىكۈزى با شە " (١٠) ، ياخود " ... ئاولەسەر چاوهە لىلە . خانو لە بىنەرەتەوە وىرائە ، تەقەلائى هەرەوەرى رېتىك و بىنى ووچان و بازووى بەھىز و ئۇرا تى ئەدۇيىت ، بۇ بەسەرچاوهە رۇون كەردەوە و لە بىنەرەتەوە بىنيات ئانەوەي " ، يادەلى ؛ " چا و ئەپىنە چىنگە خوپىنا و يەكەمى مەرگ بىئى ئەوەي لىتى بىترووكىيىن " (١١) . ئەم چیروکەنە بە هيچ جۆرىيەك ئاچنە رىز ئەو بىرىيەارەي - ئىسلامىيەتى كە عومەر بۇ قۇناغەكەمە دانَا وە ، چونكە لىمە چیروکەكەندا بە ئاشكرا بانگەوازى را پەرين و شورش دەنگ دەدا تەوە .

لە لايپرە ٧٦٥ باسى شىۋا زى چیروکى گى . دى . مۇپاسان

(٩) عومەر ما رف بە رزنىجى ، لىكۈلىنەوهى و بىبلىوگرافىيە ئىچىرۈكى كوردى ، بەغدا ، ١٩٧٨ ، لايپرە ٦٣ .

(١٠) عەلائەدەن سجادى ، ھەميشە بەھار ، بەغدا ، ١٩٦٠ .

(١١) بلە ، كويىرەوەرى ، بەغدا ، ١٩٥٩ .

گرتنه له ده زگای شیخ محمود بەلکو رسوا کردنی رژیمی ده ره به-  
گایه تی و پیوهندیه کانیه تی .

ئەو رەخنانەی له کتىبەکەی حسەین عارفم گرتوه دەربارەی  
چىرۆکەکەی جەمیل ما ئېبەوە ، ھەمانیش دەگرم و نا مەۋى دووبارە يان  
بىكەمەوە . ئەگەر كاڭ حسەین شەقلى رۇزىتا مەنۇوسى دىيار كردۇھ لەم  
چىرۆکەدا كاڭ عومەر چاوى لەۋەش پۇشىوھ .

له لايپەرە ۲۶ دا كاڭ عومەر ئەو زانىارانە دووبارە دەكتاتۇھ  
دەربارەي بىنەمالەي ئەحمد مختار جاف ، كە له پىشەكىيەكەمەي  
( مەسىلەي وىرۇدان ) هاتووه و له کتىبەکەی كاڭ حسەین عارفيشدا  
بلاوكرا وەتەوە ، له كاتىگىدا دەبوايھ كاڭ عومەر ئەگەر زانىاري  
نوىيى دەربارەي زىيان و بىنەمالەي ئەحمد مختار بلاوكىردا بىتەوە ،  
يا خود ھەرچۈنىك با ئىشارەتى ئەو سەرچا وەي بىكىدا يە كە لىتى  
وەرگرتتووه . بىداخەوە دەلىم كاڭ عومەر زۆر زانىاري و رايىكتۇر  
عىزە دىن رەسوللى بلاوكىر دۆتەوە بى ئەوهى نا وي سەرچا وەكەي ھىتىنا -  
بىت .

له لايپەرە ۳۵ دا باسى پىرەمېرىد دەكتات و دەلىت : " ئەم  
با بەتائى كە پىرەمېرىد كردوونى بە نا وەرۆگى چىرۆکەكانى لە  
خۇيدا وشىن و بە هوى ئەم وەممو نا واندۇھ كە تىيەلگىتىشى چىرۆكە -  
كان كرا وە شىۋەيەيىكى رىپورتا زى وشك دەگرن و بە چەشىن بابەتىكى  
رۇما نسى و كۆمەللايەتى تەرى و دلگىرى نا كىرىتە حۆزى ". لام وايمە  
ھەولداشى پىرەمېرىد بە كارھىتاناى روودا وي مېزۇوبىي وەك كەرەسمە  
بۇ چىرۆکەكانى ، هەلکوشن له را بوردوو كورد لە شىعر و پەخشانى  
ھونەرى و ھەروەها زمانى بەرھەمەكانى پىرەمېرىد بە گشتى ئەوهەمان  
بۇ دەسىلمىتىن كە بەرھەمەكانى پىرەمېرىد بە جۆرىكى گشتى دەچىشە  
خانەي رىپەرى رۇما نسى يەوە له شەددەبى كوردىما دا .

دەربارەي محمد عەلى كوردى كاڭ عومەر باشى ٹۇوسييە ، بەلام  
پىيوىست بۇ شا مانجى سەرەكى ئەمچىرۆكە نىشان بىدات ، چونكە  
تەنھا بۇ ئەوه نەنۇوسرا وە كە ئازايەتى و كارمەندى ئا فەرەتتى  
كورد نىشان بىدات . بەلکو جىا وازى زىياشى شار و لادى ، خۇورە وشىتى  
( عادات و تقالىد ) ئى پەتريارخى بە چاكتىر زانىوھ ، چىرۆكەكە

پیشکهش به خوینه‌ری کورد بکات ، هه رووه‌ها ئه و بیر و باوه‌رانمەی له سەر کتىيەكەی حسەين بلاوی کرده‌وه ، بىي خستا يە ناول تىكۈلىنەـ وەكەی ، ئەوسا بىي گومان نرخى كتىيەكەی پتر دەبۇو ، چونكە له وانە بۇو ھەندى لايەنى ترى چىرۇكى كوردى هەر سى قۇناغ كە له كتىيەكەي كاڭ حسەين باس كراون ، ئەم بە قوولتىرلىيان بدوا يەوه و باشتىر رۇونى يكودنا يەته‌وه ، له دوو وتاردا كە بلاوكرا يېنەتەوه له سەر ئەم كتىيە ، زۆر رەخنەى له جى و شويىنى خویدا تۇمار كراون ، بىي گومان كاڭ عومەر سوودىا نى لىي وەردەگرىت له دوا رۆزدە .

ئىستاش باسى چەند خالىنک دەكەين ، كە نۇوسمەرانى ناوبراو بۇي نەچۇون و ياخود من رام لەگەللىان ناگونجى و جىاوازە .  
له لايەرە ۲۶۱ كاڭ عومەر چىرۇكى ( له خەدوما ) ئەم مىيل صائىب دەخاتە خانەى رىالىزمى رەخنەگرىيەوه ، له كاتىنگدا ئەمە راي ما مۇستا جەمال بابانە كە له پىشەكى كتىيەكەدا نۇوسيويەشى ،  
ھەرووه‌ها حسەين عايفىش ئا ما ژەى كردووه .

بەلام بە راي من چىرۇكى ( له خەدوما ) ئەم مىيل صائىب پىيوىستە بخريتە خانەى رىالىزمى تەنۇيرىيەوه چونكە ئەم رېبازە بە گشتى لە ئەدەسى رۆزەھەلاتدا پەيوەندى رەخنە گرتەنە له رېيىمى فيوّدالىزمى لە كۆمەلدا ، نۇوسمەرەكەن يېش دەكەونە خانەى دەستىمى مەنە وەراندەوه ، نويىنەرى برجوازىيەتى تازە سەرەلەلداون ، هەرووه‌ها بەسترا وينىش تەوه بە زۇران بازى چىنا يەتىيەوه . رىالىزمى تەنۇيرى خۆى لە خویدا دېرى شىرىيەتى فيوّدالىزمە و جەمیل صاثېيش وەك منە وەرىكى ئەو سەردەم دەچىتە رېزى نويىنەرانى برجوازىيەتەوه كە بە رۆزە وەندىي لە بناغانە دېرى چىنى فيوّدالە و ئەمە لە لايەك ، له لايەكى تره وە مىۋۇوۇ پەيدا بۇونى رىالىزمى رەخنەگرى پېوهەندىي هەيە بە پەيا بۇونى عەلاقاتى سەرمایەدارىيەوه لە كۆمەللى چىنا يەتىدا .

ئەدەبى رىالىزمى رەخنەگرى هەر وەك ئاڭىرا يە بە جۆرىكى گشتى ئاراستەر ئەمە ئەدەبى سەرمایەدارى و دارودەستەكەيەشى . له كاشى نۇوسمەنلىقى چىرۇكى ( له خەدوما ) كۆمەللى كوردهوارى لە پېوهەندىي فيوّدالىيدا دەزىيا ، ئا مانجى سەرەكى چىرۇكەكەش نەك تەنەها رەخنە

به لام هه ريهك به پتي زانين و تواناي خوي ئوهى بۇ لوايە كردوو-  
يەتى :

دهربارهى كتىبەكەي كاڭ عومەر دوو وتارى رەخنەييم خويىندۇمە،  
يەكە ميان وتارى چىرۇك نووس رەووف حەسەن بۇو كە لە كۆرى يەكە مى  
چىرۇكى كوردىدا خويىندرادەتهو و لە گۆقا رى روشنېرى نەمۈنە  
بلاو كرا وەتهو (٢) تىايا سەرنجى وورد و تىبىتىي خوي دهربارهى  
كتىبەكە تۆمار كردوو ، لەبەر ئوهى زۆربەي سەرنجەكانى كاڭ  
رەووف لەگەل تىبىتىيەكائى مندا يەك دەگەرنەوە ، من ئەوانەياب  
لەم وتارە دووبارە ناكەمەوە ، تەنها چەند تىبىتىيەكى خەمۇم  
دهربارهى نووسىنەكەي كاڭ رەووف لەگەل ئەم خالا شەيى كە نووسەرى  
ناوبرا و بۇي نەچوھ پېشان دەدەم . وتارى دووه ميان هي ما مۆستا  
صەباح غالىيە و لە گۆقا رى ( بەيان )دا بلاو كرا وەته (٨) .

ئەم دوو وتارە كە دهربارهى كتىبەكەي كاڭ عومەر نووسراون،  
وايان لە وتارەكەي من كرد بە كورتى لەسەر چەند تىبىتىيەكى  
گشتى بدويم و كە بەرای من هەردوو نووسەر بۇي نەچوون و ھەندى  
سەرنجى خوشم دهربارهى دوو وتارى نووسەرانى ناوبرا و دەربىرم .

بەر لە هەموو شىڭ من وا بىزانم كاڭ عومەر پېيوىست بۇو  
لە پېشەكى كتىبەكەيان لە پەرا وپىزدا ئيشارەتى كتىبەكەي حسەينى  
بىردا يە ، ھەرچەندە ئەم وتارىكى تايىھەتىي نووسى لەسەر كتىبەكە ،  
چونكە كە كتىبەكەي حسەين كەوتە دەست خويىنەر كتىبەكەي كاڭ عومەر  
نەچووبۇو بۇ چاپ ، وە ئەمانەتى علمىش واى فەرز دەكىرد دوابىدواى  
دەرچوونى كتىبەكەي حسەين ، كاڭ عومەر پىدا چوونەوهېتىكى بىردا يە  
لەبەر رۇشنا يى ئەم شەنجا مانەي كاڭ حسەين دهربارهى چىرۇك پېشى  
گەيشتە كە بىي توانى با لە نووسىنەكەيدا شتىكى نۇي و تازە

(٢) رەووف حەسەن ، لىكۆلىنەوە و بىبلىيۆگرافياى چىرۇكى  
كوردى و شىكردىنەوهېك ، گۆقا رى روشنېرى نۇي ، ژ . ٧٦-٧٧ ، لابەرە  
٣٠-٣٢ ، ٢-١٣ .

(٨) صەباح غالىب ، " پىدا چوونەوه و چەند سەرنجىك لە كتىبە  
لىكۆلىنەوە و بىبلىيۆگرافياى چىرۇكى كوردى " ، گۆقا رى بەيان ،  
ژ . ٥٨ ، لابەرە ٨-١٦ .

له لایه‌کی تره وه زمانه که دهوله‌مند دهکات .  
که کاک حسهین دهلى : " چیروکی ئه وسا لانه مان لم رووه شه وه  
( به تایبەتی لەو دوو پله‌یدا ) بuo بوه ئا وینه‌یەکی گەشى ئە و  
زا سپارییە میژووییە و له چەندىن نمۇونەدا خەباتى سەخت و پىر  
مەترىسى ئەوتىكۈشەرانە نواندوھ ... . به لاي منه وھ چىرۇك نووسە -  
كانمان نەيان توانىيە چەواسانە وھى نەتەوايەتى و چىتا يەتى و ئازار  
و ئاواتى مىللەتكەمان بە تەواوى و قۇولى دەربېرىن و تا ئىنىتەش  
ویتە و تابلوئى ئەو لايپەرە پىر له شانازىيا شەي رەنج و خەباتى  
پەللەتكەمان ئەخستۇتە چوارچىوھى بەرھە مەكانىيائىسى وھ وھ  
پېپەرىستە .

من لام وايە نەئەبوايە کاک حسهين ھەرسى قۇنا غەتكەي لە  
خانەي رىالىزمى رەخنەگرىيدا دابنایە ، چونكە رۆما نتىكىيەتىش لەو  
بەرھەمانەدا شان بە شاشى رىالىزمى رەخنەگرى ئەپروات تاڭ -  
شەستەگانىش ھەر بەرده وامە ، ئەمەۋى ئەۋەش بلىم كە ذۆرپەمى  
چىرۇكە كانى سەجادى و شاکىر فەتاح و حوزى ... . دەچنە چوارچىوھى  
رىالىزمى تەنۇيرىيە وھ . جەنە لەم ورده سەرەنچا مە ئەللىم ئەبوايە  
کاک حسهين گرنگى و بايدىخىكى باشى بىدايەتە زمان و ئۆسلىووبى  
ھەر نۇوسەرييک و بە چەند دېپېرىك بەربى نەكىردىتايە .  
لە كۇتا يىدا ئەم سەرچ و رەختانە من ئەوھ ناگەيەن كە  
كارەكەي کاک حسهين جىنگەي تايىھتىي خۆي ئىيە لە ئەددەبى كوردىما -  
ندا .. نە . لىكۈلىشە وھ كەي کاک حسهين عارف كارىكى بەئىخە و  
كەلىنىكى باشى پىر كردوته وھ .

### " لىكۈلىنە وھ بىبلىيۆگرا فىيائى چىرۇكى كوردى ۱۹۶۹-۱۹۲۵ "

دوا بەدواي كتىبەكەي کاک حسهين عارف ، لىكۈلىنە وھ بىنەكى ترى  
گرنگ دەربارە چىرۇكى كوردى كەوتە دەست خويىنەران و توپۇزەران ،  
ئەویش كارە زانستىيەكەي کاک عومەر مەعرووف بەرزنجىيە . بىن گومان  
ئەم كارە كەلىنىكى ترى كتىبخانەي كوردى پىر كرده وھ . هەرچەندە ھە  
دۇو نۇوسەر ھەر باسى يەك قۇناغ دەكەن لە مىژووی چىرۇكى كوردىدا

هه رووه‌ها کاک حسه‌بن با سی چیروکی ( تا وانم چی بونوای کاکه  
 مه بونتاني و ( دز ) ئه ميني ميرزا كدريم ده‌كا و ئه و هه‌لله  
 قا نووني يانه ده‌رده خات كه ئه م دوو چيروك نووسه تىي كه‌توون . له  
 راه‌شيدها ئه مه ده‌س نيشان كردن‌يکي زيره‌كانه‌ييه و پيوسيت‌نه نووسه -  
 راه‌كانمان زاسيا رئيده‌كى گشتى‌يان هه‌بى ده‌رباره‌ي ئه و شتانه‌ي كه  
 ده‌ينووسن و له به‌رهه‌مه‌كانياندا باسی ده‌كهن . بو نموونه رومان  
 نووپيکي ناسرا وي وەگ عەرەبى شەمۆ ، لە رۆماشى ( قەلائى دەمدەم ) دا  
 لەبەر ئەوهى ئاگاي لە سەرچاوه مىزۇوپىيەكەن نەبووه بە باشى ،  
 بە شىوه‌يەكى سەير دەستكارى رووداوه مىزۇوپىيەكەن كىردووه و  
 ئەمەش شەخى كاره هوئەرىيەكەن كەم كردۇتەوه . هه رووه‌ها کاک حسه‌بن  
 رەختەي لە ( لالۇ كەريم ) د . جەمال نەبەز و ( كەواي نەكرا وي )  
 خاليد دلىر دەگرى . لەبەر ئەوهى نووسەرەكانيان پەرا وىزىيان بىۋ  
 هەندى ئا و وشەي ئا و چىرۆكەكە كردووه و دەلىي : " ئەمەش لە رۇوي  
 سايكولۇزىتى خوپىندەوه هەلەيەكى هوئەرىي گەورەيە " . من لام وايە  
 نووسەرەكان ئا چارى ئەوه بونون ، ويستووپيانه بە هاناي خوتىھەرەوه  
 بىن . بەكار هيئانا ئەم وشەو ناوانە لاي من زۆر سوودىان هەيە .  
 يەكەميان بەكەراھىانا دىالىكتى ئا وچەيى لە سەرىيەكە زمانەكەمان  
 دەولەمەند دەكات و لەسىرىيەكىشە دىالۆگى پالەوانەكە بەھېزىتر  
 دەكات ، چونكە زياتر واقىعى دەبىتى دوور دەبىتى لە تەكەللۇفەوه ،  
 بە هوئى دىالىكتىكەشەوە ئىيمە زياتر شەخسىەتى پالەوانەكانمان بۇ  
 رۇون دەبىتەوه و هه رووه‌ها ئەتنىڭرا فيەكانىش دەتواش لەو دەقە  
 ئەدەبىيانه زۆر سوود وەربىگەن بۇ زانىنى خwoo و رەشت و نەرىتى  
 كورده‌وارى . ئەمە ئەوه ناگەيەنى من بىرم لەگەل کاک خاليد دلىردا  
 جووته ، كە دەلىي هەر كەسە پيوسيتە بە شىوه‌ي خۆپىنلىكىت ،  
 ئاشىگرا يە ئەمە ئازاوه دەخاتە زمانى ئەدەبىي يەكىرىتوومانەوه و  
 ناتوانىن گەشە بە زمانە بىدەين ... من لام وايە دەتواشى ، تەنبا  
 لەو دىالۆگەدا پالەوان دىالىكت بەكەراھىنلىرى . بۇ نموونە  
 نووسەرى گەورەي سوقىيەت ئۆلەخەف نووسىنەكانى پېرىيەتى لە قىسىمى  
 نەستەق و وشەي ئا وچەي كەنارى دون . هەرچەسە ئەمە وا لە  
 بەرەھە مەكان دەكا كە بە تەرجه مەكراوى ئەو تامەيان نەبىت .. بەلام

ده میئیتە وە ، چونکە نووسەر خۆی ویستویەتى سەرئەنجامى ھەندى لە پالهوانەكانى دووا بخات . بۇ نموونە کاک حسەين ژيانى حىمە سوور و مەنالىي ئەوي بە زىاد زانیوە لە چىرۇكەكەدا . من لام وايمە بىوگرافىي ئەو قارەمانە ھېزىك دەداتە جىرۇكەكە، بەلام ڙۇ هىنانى دووهمى حەممە سوور دەتوانرا بىرىتە چىرۇكىنى تر .

لە لايىرە ۱۴۴ دەربارە چىرۇكى ( کاروان ) اى محمدە سالج سەعید کاک حسەين ئاستى ھەلە و ناتەواوی ھوٹەرىي چىرۇكەكەلى لە پىنج خالىدا نىشان داوه و لاي وايمە چىرۇكەكە ناچىتە دلى خوبىنەوە و دەستكىرد دىبارە . من رام لەگەل کاک حسەين چىاۋازە و لام وايمە نووسەر خۆي ئەو پىشەكىيا نەي ئاما دە كردوھ بۇ ئەۋەنجامە . چۈكە هوشىار بە بەھانەيە لە ژەنەكەدى و پېش زەھرى چايدەكەش دەللى : " بەراستى تۈز بە كەلگى مالنارى و مال نەما وىت " ... خۇشە ویستىي کونى هوشىار و دلسۈز مىزۇوېكى تايىھتى ھەمە ، ئەمەش سەرچاوهى ھەمۇ گىرۇگرفتەكانە ، چونکە هوشىار نەي دەۋىست شىرىن بەھىنى و باوكى بە زۇر پىنى هيتنى .

ئەگەر بەھاتايە محمدە سالج سەعید بەشى يەكمەم و دووهمىي چىرۇكەكە ئەۋەندە سوقمى وەسف و شتى لايى نەكىرىدا يە چىرۇكەكە سەركەوتۇوتر دەبۇو .

كاک حسەين عارف سى ناتەواوى زەقى چىرۇكى ( جوان ) مەممۇود ئەحمدەدى پىشان داوه . منىش رام دەربارە ئاتەواوی يەكمەم لەگەل کاک حسەين چو لەيەكە . بەلام دەربارە دووهەم و سېھەم من ئەۋە بە ئاتەواوى نازانم . چونکە زۇر شووسەرى گەورەي رووسى ، بۇ دارشتى چىرۇكەكانىان لە سەرەتادا باسى ژيانى پالهوانەكان دەكەن .. بۇ نموونە چىرۇك شووسى وەك تۆرگىييف و گىرتىسن و ... هەتەد وایان كردوھ .

كاک حسەين دەلىنى " چىرۇكى ( جوان ) لە دوايىدا ئەبىتىش شانۇگەرى " . من لام وايمە نووسەر ئازادە لە ھەلبىراشى شەپەيە دەرسپىندا . نووسەرى گەورەي سۆفيەتى ليونىد ليونەف دەلى : هەر ئىندىيەك باشترين شىوازى ھونەرى لەگەل خۆي دەھىنەتە كايمە . ئەگەر شەراب ھەبى شووشەي بۇ پەيدا دەكرى ." .

صالح دیلانیشی کردوه . شایانی باشه ناوی ( ژیل ) لهو لیکولینه -  
 وهیدا چند جاریک هاتووه . نووسه رهاتووه هیتلی بهره و پیشه وه  
 چونی بهره می ٿم چیروک نووسه مان به روونی بو بکیشی ، لایه نی  
 گهش و ناته واوی و لا وا زمان بخاته پیش چاو ؟ ! حسین عارف ره خنه  
 له چیروکی ( پلهه هورینکی چلکن ) چه مال با با ده گریت . من را م  
 جیا وا زه و لام وا یه ٿه و پیشه کی ٻیدی چه مال با با ن بو چیروکه که  
 نووسیوه نرخی تایبہتی خوی همیه و کورته میز وویه کی قاره مانیتی  
 ئه و شاره بیر روکه کانی ده خاتمه . جگه لهوی وینه یه کی جوانی  
 کیشاوه که گویزه هی به دایک و سلیمانی به منال شوبها ندووه . ئه لئی :  
 " گویزه دایه نیکی به هست و دلسوز بوو ، راست له گه ل قدلا چوالان  
 هاته پیشه وه و کورپه که مه ردانه بو به خینو کردوون ... دایکه  
 گویزه دلی پرر بوو و یاخود به زهی بز ووت و فرمیسکی رشت  
 لافا وی ٿه و فرمیسکانه جیگایه کی لیٹ ناکا ... " چیروک نووس  
 پانارا مهیتکی بدسره رهات و رووداوه کان و قاره مانیتی ٿه و شاره  
 نه به زهی ده رخستووه . ئه مه پیز گیانیکی پر جوشی دا وته به همکھی .  
 منیش له گه ل کاک حسه ینم که ئه بوا یه چیروک نووس به شیوه یه کی  
 هونه ری و ناراسته و خو با سی گری ده روونی پاله وانه که بکردا یه ،  
 به شیوه یه که ئیتمه خومان هستمان پی بکردا یه .. هه رو هه  
 خونه که خا وه ر جیگه سرنجه و کاک چه مال با با ن تواشیویه تی  
 پاله وانه کانی به شیوه یه کی واقعی و به گویزه ئاستی هوشیاری بیان  
 ده رب خات . ئاثکرا یه له کوئه لی کورده واریدا هه تا ئیست ده  
 پاشما وهی ٿه و جوزه بیر کردن وانه و ئه فسانه و همومو ٿه و شانه  
 تر همیه و پیویسته بدرا وردی ئه فسانه و خهون و بیر و برپوای  
 خویان له گه ل هی میله تانی تری رو ڙه لاتدا بکھین بو ئه  
 بگهینه ئه نجا نیکی زانستی و هه لونیستی خومان بدرا مبهه ئه  
 کله پوره ده ربین و له بدر تیشکی زانستدا سوود لهو شانه  
 وه ربگرین و له هونه ردا به کار با ن بهینین .

کاک حسه ین ئه لئی ئه بوا یه چیروکی ( پلهه هورینکی چلکن )  
 له چا پتھری ۱۲ لایه رهی ۷۲ کوتایی بهاتا یه .. من لام وا یه نا وه روز  
 و ئه نجا می چیروکه که لهو لایه رهی وه کوتایی نایه و به ناته واوی

جه مال بابان له چیروکه کانی دووای شورشدا چه وسانمه وهی  
کومه لایه تی خستوته چوار چیوهی هندی چیروکه وه ، به لام بئ شه وهی ج له  
لایه نی فیکری و ج له لایه نی هونه ریه وه چاره سه ری ئم کیشه یسه  
زوردا ریه تی بکات . دیسانده کاک حسهین ره خنه له چیروکی ( ریگای  
ئازادی ) موحه ره ممح مهد ئه مینیش ده گریت ، ده لئی وهک روزنا مه و  
گوقار و ئیستگه کاروبار و روودا وهکان ئه گیریته وه . من لام وا یه  
ده بئ شه و حوره چیروکانه بخهینه خانه چیروکی ( و شائقی - ده کنو -  
مینتالی ) یه وه . زور چیروک سووسی گهورهی سوچیه تی وهک باریس  
په لیقوی و پاوستوفسکی و ئوسپیسکی ) بهم شیوه یه چیروکه کانی  
خویان داشت و ده بات و رولی ئه فسده ره ئازادیخوازه کانی عیراق ئه کات ،  
من کدره سهی وتاریکم دهربارهی ئم چیروکه کو کردوتنه و له  
ده رفه تیکدا بلاوی ده که مه وه . له و تاره دا تا ما ژهی ئه وه م کردوه که  
موحه ره ممح مهد ئه مین یه کم که سیکه ئم زانرهی هینا وه تمه  
چیروکی کوردی یه وه .

له لایه ره ۱۲۳ دا کاک حسهین دهربارهی چیروکی ( خانزادی )  
جه مال بابان شلئن : " به لام داخو جه مال بابانی چیروک نووس له  
رووی ته کنیکه وه با سی چیروکه که نه کردوه به ژیز هر هسیانه وه و له  
کاتی نووسینیدا نه که و توتنه داوی ته قهلا دانی ریز کردنی زور تریین  
ژماره بانه وه ؟ ! " من لایه نم له را کهی نووسه رنی یه و چیروکه که له  
رووی هونه ری یه وه لاوازه . به لام کاک حسهین ئه بوا یه ره چاوی ئه وهی  
بکردا به که ئه وه یه کم بدره می چیروک نووسه و له لایه کی تریشه وه  
له رووی نا وه ره که وه چیروکه که چاره سه ری زور نه خوشی و ده رهی کو -  
مه لایه تی کورده واری ده کات . ئه گهر بدره وردی ئه و چیروکه لە گەل  
چیروکه کانی دوا یی ما موستا جه مال بابان بکهین پیشکه وتن و بمه ره و  
پیش وه چوونیکی ئاشکرا یان تیا بهدی ده کهین .

له لایه ره ۱۲۴ نووسه دیتھ سه ره با سی لایه نه گەشە کان و  
نمونهی گەش و هونه ری و لم باره یه وه با سی بدره می حوت چیروک  
نووسی کرد ووه ، نا وی شەش لە و نووسه رانه له لایه ره ۱۰۸-۹۹ هاتوه  
و بدره مه کانی به باش نرخان دوون .. هەروه ها با سی ژیل - ممح مهد

کاک حسه‌ین رهخنه له ههندی نووسه‌ر دهگريت که پهنايان بردوته بهر  
قسه‌ی نهسته‌ق و وه‌عز و ئا مۆزکاری ، خوشی باش ئاگای لهوه‌یه که  
وه‌زعی سیاسی و کۆمەلایه‌تی واى له نووسه‌ره پیشکه‌وتن خوازه‌کان  
کرديبوو که جاران پهنا بهرنه بهر ئەم جۆره نووسينانه بۆ بلاوكـرـ  
نهوه‌ی بير و باوه‌ری سياسيان و خەلکى پئى وشيار بکەنوه و بـۆـ  
خدبات‌کردن هانیا بدهن . نووسه‌رى داھيئندر و لييھا تووش له هه موو  
جۆره فۇرم و شىۋا زىكدا ، تەناھت لە زۆر مەسەلمەي سياسي و راسته و  
خۇشدا ئەتسواشى و اله بەرھەمەكەي بكا کە شەقلتىكى ھونھرى و بەرز  
وه‌ر بگرى ... بۆچى ؟ جا کە ئەدەب لە لايەنەكاسى ترى ژيانى  
کۆمەل جودا بۇونەته‌وه ؟ هەروه‌کو ئەشتواشى بير و باوه‌ری خۆى له  
مبىتۆد و لايەنە ھونھرى يەكاسى وه‌ك ( مەنەلۆز و دىالۆگ و ئوسلوب .  
هەند ) دەربىرى ھەر نووسه‌ر و رەخنه گرىتكىش له کاتى هەلسەنگانلىقى  
ھەر بەرھەمىكى ھونھرىدا بىھ‌وي بە يەك چا و تەنسىا سەيرى بەرھەم  
بكا ، وه‌ك بەرھەمى ھونھرى و شتەكان بە يەكتەره و نەبەستىتەوه ،  
ناگا تە ئەنجا مىكى زانستى و قۇولۇ و راست . نووسه‌ر لە لايەرە ۱۹۱۶  
با سى ئەوه ئەكات کە چىرۆك نووسى چەركان چىرۆكەكانيان بە وه‌عز و  
( دەسى كۇتا يىيان بە ئا مۆزگارى يەكى تەواو زەق پئى بىننى و داوا ما ان  
لىنى بكا پەيرەوي بکەين ) .. ئاشگرا يە ئەم شبواز له ئەددەبـىـ  
مېللەتـانـى ترى رۆزھەلاتىشـا زۇر با و بـوـوـه و پـەـيـوـهـنـدـىـيـهـكـىـ رـاـسـتـهـ و  
خۇشى بە جولانه‌وهى ( منه‌وه‌ره‌كان ) و هەبـوـوـه . ھەروهـاـ کـاـکـ حـسـهـيـنـ  
لـهـوـ بـەـرـھـەـمـاـنـشـ بـەـ قـوـولـىـ نـهـىـ كـۆـلـيـوـهـتـهـ وـهـ کـەـ دـوـاـيـ شـۆـرـشـىـ چـواـرـدـەـيـ  
تـەـمـوـوزـ ۱۹۵۸ـ نـوـوـسـرـاـ وـنـ نـەـيـتـوـانـيـوـ بـۆـمـانـىـ دـەـرـخـاتـ کـەـ هـەـرـ  
يـەـكـەـيـاـنـ چـۆـنـ لـهـ شـۆـرـىـشـ گـەـيـشـتـوـونـ وـهـ لـۆـيـىـتـىـانـ چـىـ بـوـوـهـ بـەـرـاـمـبـەـرـىـ  
وـ چـۆـنـىـ تـېـنـگـەـيـشـتـوـونـ ،ـ ھـەـنـدـىـ لـهـ نـوـوـسـرـهـ کـورـدـەـكـانـ وـاـ تـقـ گـەـيـشـتـىـنـ  
کـەـ شـۆـرـىـشـ رـوـوـيـدـاـ ئـىـتـرـ ھـەـمـوـ ئـەـ دـەـزـگـاـ وـ دـوـوـکـانـ وـ دـارـ وـ پـەـرـدـەـ  
كـۆـنـ گـەـشـتـىـ لـىـ ئـەـدـرـىـ وـ وـېـرـانـ دـەـكـرىـ وـ نـەـيـانـ دـەـزـانـىـ کـەـ شـەـوـگـۆـرـانـهـ  
ھـەـرـ لـەـسـەـرـهـوـ رـوـوـيـ ذـاـوـهـ وـ بـنـگـەـ بـنـھـىـتـىـهـكـانـىـ ژـيـانـىـ مـېـلـلـەـتـەـكـەـ  
دـەـسـكـارـىـيـهـكـىـ ئـەـوـتـۆـ نـەـكـراـوـهـ .. ئـەـوـشـۆـرـشـ تـەـنسـىـاـ دـەـسـتـەـلـاتـىـ سـياـسـىـيـ  
گـۆـرـىـ ،ـ گـومـانـ لـەـوـهـشـداـ نـىـيـهـ کـەـ پـەـيـوـهـنـدـىـيـ فـىـوـدـالـىـزـمىـ وـ رـەـوـشـتـ وـ  
نـەـرـيـتـ وـ پـەـيـوـهـنـدـىـيـ كـۆـنـهـكـانـ بـەـ دـوـوـ فـوـوـ سـەـرـىـ سـەـرـنـگـونـ نـاـكـرـيـتـ وـ  
گـۆـرـاـسـىـ پـىـنـيـهـپـىـنـىـ ئـەـوـ گـۆـرـاـنـ سـياـسـىـيـهـ نـاـرـوـاتـ .

بکردا یه چند بھشیکی ئا واوه : تیمی هەزاری ، مەسەلەی زەوی و جو-  
تیار و ئاغا ، ئافرهەت و چەوسانەوە ، جۆلانەوەی رزگاریخسازی ،  
تیکوتان لە پىناوی ئاشتیدا ... هەند . دوايىش روونى بکردا يەتەوە  
كە هەر چىرۇك نۇوئى چارى ج مەسەلەيەكى كردووە لە بەرھە مەكانيا و  
چۈنى چار كردوون و جياوازى و يەكتى لە نېوان بۇجۇون و لېكداونەوە  
و بىر و ئەدۇ فۇرمانەدا بەكارىيان ھېنەوا و چىن؟ كاك حسەين لەم  
شتانە دواوه ، بەلام بەسەريەكەوە و نەيتواپىوه جياجيايان بکاتموه ،  
كە ئەمە يارمەتى خويىنەرى ئەدا زىاتر و قۇولۇتر تى بگات ، نەك  
خويىنەر بىت و خۆى ھەولى كېشانى ئەم ھىلانە بىات .. بۇ نمۇونە لە<sup>١٤</sup>  
لایپرە ١١٤ پۇيىستى بە ناونىشان و سەرباسىكى تازەبە .

كاك حسەين حاروبار بەسەھوا ئەچى و ئەكەۋىتە ھەلەمە واوه ،  
كە نابى رەخنەگر يا لىكۈلمەرەوە تىپى بکەۋى ، بۇ نمۇونە چەند  
دىزېتكى لە چىرۇكى م . ب . ھەورى وھرگرتۇوە و لە لایپرە ١١٧ دەللى  
ھى ھەورىيە ، كەچى ھەر ھەمان پەرەگراف بە ھەندى دەكارىيەوە  
دۇوبارە ئەكاتەوە لە لایپرە ١٣٤ دەللى لە ( پەلە ھەورىكى  
چىلەن ) ى جەمال باباتدا يە . ئەمە سەرەرای ئەۋەي دەس نىشانى ئەم  
لایپرەنەي نەكىردووە كە دەقدەكى لى وھرگتۇون . بى گۇمان ئەمەش سەر  
لە خويىنەرى ئاسايى ، بەلكو توپىزەرەوەش ، چەواشە ئەكەت (٦) .

---

(٦) لە لایپرە ١١٧ دەللى : " بەلام ھەورى دېتھەرچى پىاولە  
ئاوايىدا ھەيدە لەبەر ئەۋەي گوايە قەرزازى ئاغان - ھەموويان راپىچ  
دەكا بۇ شار و لە بەندىخانەيان توند دەكا ، تەنھا شوانەكەمى ئاوايى  
لى دەر دەكا كە ئەۋىش ھەر لە و رۆزانەدا نەخوش دەكەۋى و دەمرى و  
شىشتن و ناشتى بۇ ئافرهەتان كە بە بى پىاولە ماونەتەوە ، دەبىتىمە  
گىروگرفت " .

وە لە لایپرە ١٣٤ دەللى : لاي جمال بايان لە ( پەلە ھەورىكى  
چىلەن - ١٩٥٨ ) دەبى خاوهەر ھەرجى پىاولە ئاوايىدا ھەيدە بىما-  
شىتەوە .. بېرىن بۇ شار و فرى بىرىتە بەندىخانەوە و تەنھا  
شوانەكە بىمېنیتەوە .. دەبى ئەۋىش نەخوش بکەۋى و بىرى و ژنان كفن  
ئەردىيان لى بېتىمە گىروگرفتىكى گەورە .. .

پەردا وىزدا ئا وي نووسەر و چىرۇكەكانى بنووسىا يە زۆر بە سەرەت  
ئەبۇو ، بە تايىھتى بۆ ئە خويىنەرانەي كە گۇقا رى گەلەۋىزىا ن چىنگ  
ناكەۋى بىخويىنەوه .

نووسەر لام سەرلایى باسى بەرھەمەكانى شاكىر فەتاج دەكتات و  
بە گۈيرە قۇناغ و چۆنیھىشى بەرھەمەكانى لەھەر قۇناغىتكىدا ما مە-  
لەيان لەگەلدا بکات ، دواي ئەممە بگاتە ئەو ئەنجامە كە دەورى  
شاكىر فەتاج وەك چىرۇك نووسىتكى لە ئەدەبى كوردىدا دەسنىشان  
بکات . شايانتى باسە كاك حسىن لەگەل بەرھەمەكانى عەلائەدىيەن  
سەججا دىدا واي كردووه . بەلام يەكسەر باسى چىرۇكى " مودىر بەگ "  
ئەكتات .

ما مۆستا شاكىر فەتاج جگە لە چىرۇكەكانى كۆمەلە پەخشانىكى  
جواسى ھەيە و دەورىتكى باشى ھەبۇوه لە خۇلقاندى چىرۇكى ھونەرى  
كوردىدا و بە راي من وەك نووسەرتىكى رۇما نتىكى چارەسەرى زۆر  
مەسىلە دەكتات .

كاك حسىن كە باسى " رۇنەزەنگى حەممە ھەسىن " يى ما مۆستا  
سەججا دىمان بۆ ئەكتات ئەلى جا رىتكى ترىيش " مەنۇوچەر " مان دېتىھ  
پېشجا و . لە كاتىكدا ئەو باسى ما مۆستاى چىرۇك نووس - بلە-يى  
نەكىردووه و كەسىك ئەگەر خۆي ئە و چىرۇكەي نەخويىندېتىھ وە يان بۆ  
تۈزۈزەرە وەيەكى بىڭانە ئەلى ئەسى " مەنۇوچەر " كى بى ؟ ئەمىش  
جۇرە تەمىك ئەخاتە بەرچا و تىيگە يشتى خويىھ .

لە باسکەرنى بارى سىاپى و راپەپەرىنى جوتىارانى عىراقىدا  
نووسەر جا روبار بەرودووا بە سالەكان دەكا ، بۆ نمۇونە لە پېشدا  
باسى سالى ۱۹۵۳ دەكا ، كەچى دوواي ئەممە دېتەوه سەر سالى ۱۹۵۲ ..  
ئەممەش وردى و رېك و پېتكى باسەكە تېك دەدا و من لام وايە دەوزى  
ئەو راپەپەريتەنە لە هوشىار كەرنىھەۋى جەما وەرى گەلەكەماندا  
لەوەندەي زىاتر هەلئەگرت كە نووسەر بە چەند دېرېك باسى بکات و  
ئەگەر زۆرتر لە زرۇوف و هوپىانە بدوايە بەرھەمە ھونەرىيەكانى  
ئەو سەرەمەي زىاتر ئەدايە بەر تېشك و باشتى رۇونى ئەكەرنەوه .  
من لام وايە بۆ ئەۋەھى خويىنەر زىاتر لايەنە ھونەرىيەكانى  
چىرۇكى كوردى بۆ دەركەوتا يە ، نووسەر ئەبوايە لىكۆلىنە وەكەمى

ئیتر نه باسی له قاره مانه و نه هه لويستى نه ئه و په بوهندى به ده روونيا نه که شەخسيە تەکەدى دروست ئەكەن و نه ئه و تابلوا نەي کە سەرتاپا چىرۆكە كە پىيکە وە نىن و ئەمانه و لايەنە هونەرىيەكەنلى تريشى پشت گۈي خستووه . لە كاتىكدا با سکردى ئەم لايەنەش دە ما رىكى كا رىگە ولى يېكۈلەنە وەن .

كاك حسەين پروگرا مىكى روون و وردى زانستى لە نۇوسىنە كەيدا رەچا و نەگردووه بۇ نموونە پىيشه كىيەكى سياسى و كۆمەلایەتى بۇ شى گردنەوەي چىرۆكى ( لە خەوما ) نۇوسىوھ ، بەلام كە دېتە سەر ( مەسەلەي وېزدان ) كەدى ئەحمد موختار جاف هەر ئەوھە ئەلىت : " وەك ئەوھە كەدى جەمیل صائىي دەنۇوسى ، بەلام بە بارىكى جىاواز و لە رۆزگارىكى جىاوازىشدا " (٤) . ئاشكرا يە بار و زرۇوفە كەدى جىاوازە و كاك حسەين ئەبوا يە شتىكى كەمىشى دەربارە ئەو بنۇوسا يە ، بەلام من لەگەل ئەو رايەدا نىم كە ئەلى بۇ ھەمان ئاماڭجىش ئەحمد موختار جاف چىرۆكە كەدى نۇوسىوھ . ئاشكرا يە مەبەست و بۇچۇۋى ئەحمد موختار و چىرۆكە كەدى لەوەي جەمیل صائىب جىاوازە . ئەبوا يە نۇوسەر يائىخىكى زۆرتى بادا يەته ( مەسەلەي وېزدان ) . من نىازى نۇوسىنى و تارىكىم ھەيە لەم بارەيەوە ، و تارىكى وا كە شىعرە كەنى ئەحمد موختار جاف بىنە پال پشت و روونا كى بۇ نرخاندى چىرۆكە دىسا نەوە كاك حسەين نەك ھەر سەرنجى خۆي دەربارە ئەو و تارانە دەر نەبرىيە كە لە رۆزنا مە و گۆفەرە كاندا بلاوغرا ونەوە ، بەلكو ھەر ئىشارەتىشى بۇ نەكردوون . لە باس كەردى پىرە مىردىشدا لەوە نەدواوه كە دوورە پەرپىز بۇوه لە دنیا يە سيا سەت و زۆرەي بەرھەمە - كا نىشى لە گىيا مىكى رۆما نسىانەوە نۇوسىوھ .

### نهش و نما كىردىن

لە بەشى نەش و نما كەردىدا باسی ئەو چىرۆكە كەنى كەردووه كە كراوندە كوردى و ئەلى : " چوارىيەكى چىرۆكە كان لە ئەددە بىرى رووسى و سۆقىيەتىيەوە وەرگىپرا ون " (٥) . ئەگەر كاك حسەين لە

(٤) حسەين عارف ، چىرۆكى هونەرى كوردى ، بەغدا ، ١٩٧٧ ، ل . ٠٢٥

(٥) ئەمان سەرچاوه ، ل . ٠٥٧٥

که لەسەر چىرۆكى كوردى نووسرا ون و بشى نرخاندنا يە . بۇ نمۇونە باسى وتارەكانى م . نۇورى و ق . نەبەرد و شىيخ محمدى خالقى نەكىردووه . هەرجى م . نۇورىيە له رۇئىتەمى " ژيانەوه " دا زنجىرە وتارىكى بلاو كردۇتەوه ، باسى بەشەكانى ئەدەب دەكتات و رىڭا پىشانى نووسەران و خويىنەران دەدات . ق . نەبەردىش له وتارى " نامەيەك بۇ نووسەران " دا (۳) ، كە گۈرنگىي تايىھەنەيە وەك بەرنا مەيەكى ئەدەبى . . . هەروەها ما مۆستا شىيخ محمدى خالقى لە گۆڤارى " گەلەۋىز " دا سالى ۱۹۴۸ وتارىكى دەربارە كۆمەلە چىرۆكى " شەبەنگەرە رۇزى " مە مۆستا شاكىر فەتاح بلاو كردۇتەوه ، هەرچەند ئەو چىرۆكە كان بە ( مقالە ) لە قەلەم داوه .

ھەروەها لە مىزۇوېكى نزىكتىريشدا كاڭ حسەين ھىچ با سېكى لەو وتارانە نەكىردووه كە ما مۆستا يان مصطفى صالح كەرىم و دكتۆر ما رف خەزندار و عەبدولرەزا ق بىمار و عەبدولعەزىز خانەقا و خوالى خوشبوو عەبدولصەممى براى و فەرەيدۇون عەلى ئەمین . . . هەند ، دەربارە چىرۆكى كوردى نووسىيوا نە .

ئەمانەتى عىلەمى و زانست داواى ئەوه لە توپىزەرەوە ئەكتات كە ئەم راستىيانتە نەخاتە پشتگۇئى . ئەمە ھەندى تىيېنى بىسوو دەربارە پېشەكى كتىيەكە .

- بەشەكانى كتىيەكە -

سەرەتا و سەرەلدان

نووسەر لەم بەشەدا لەبەرھەمى چوار نووسەر دواوه . لە سەرەتادا باسى چىرۆكى ( لە خەوما ) كەى جەمیل صائىبى كەردووه و جۆرە پاكانەيەك بۇ ھەلۋىتى سياسيي جەمیل صائىب دەكتات ، مەن لەم رووهەدە راي خۆم لە پاشكۆي عىراقتادا ، ژمارە ۳ ، دەربىرىوه . رەنگە ئەمە ھەر كەمەرخەمى و سەھو بىت ، چونكە كاڭ حسەين لە ولىكۆلىنەيەشدا كە بە عەرەسى بلاوى كردۇتەوه ئەلىت كە جەمیل صائىب پالپىشتى ئىنگلىيزى كردۇوه ئەمە لە لايەك ، لە لايەك تىريشە و نووسەر نەھاتووه لايەنەي ھونەرى چىرۆكە كە شى بکات .

(۳) ق . نەبەرد ، گەلەۋىز ، ژمارە ۸ ، سالى ۱۹۴۸ .

## "چیروکی هونه‌ری کوردی ۱۹۲۵ - ۱۹۷۰"

ناوه راستی سالی ۱۹۷۸ کتیبی "لیکولینه‌وهی چیروکی هونه‌ری کوردی ۱۹۶۰-۱۹۲۵" کاک حسه‌ین عارفم بی‌گهیشت . چهند جاریک به وردی خویندمده و وردە تیبیتی خۆم چی ههبوو دهرباره‌ی لە ده فته‌ریکدا نووسیمه‌وهی به هیوای له ده رفه‌تیکدا وتاریکی له‌سمر بنووسم . ئەمە جگه له‌وهی له پیشەکیی نامەی دكتورایدەم و لەم و تارهدا که دهرباره‌ی کتیبەکەی عومدر مارف به‌رزنجی (لیکولینه‌وهی هونه‌ری یان هەلبزركاندن (؟) م نووسی چەند لایه‌نیکی کتیبەکەی کاک حسه‌ینیش هەلسنه‌نگا ندووه (۱). بهم دواسی‌یەش چەند نووسه‌ریکی تریش هەر لهم رووه‌وه بدره‌می خۆبان پیشکەش به خویندرا نکرد و چەند کوریکی گشتیش بۇ ھەمان مەبەست به‌ستران . ئەم چا لاكی یانه خستمیانه سەر كەلکەلەی ئەوهی کە وتاریک دهرباره‌ی لیکولینه‌وهکەی کاک حسه‌ین عارف و عومدر مارف به‌رزنجی و صباخ غالب بنووسم (۲).

كتیبەکەی کاک حسه‌ین وەک نوبىرە دەنگیکی تەواوی دابەوه و چەندین وتار و گفتتوگۆی ھیتا یە کوری ئەدەبیما نەوه .

## "چیرسوکی هونه‌ری کوردی"

بی‌گومان کتیبەکەی کاک حسه‌ین جیگەی تاپەتەی ھەیه له دنیا ی لیکولینه‌وهی چیروکی کوردیدا و ئاشکرا یە کە کاک حسه‌ین نەک ھەدر چیروک نووبیکی هەلکەوتۇو و تازەکەرەوهی چیروکە ، بەلکو لە سالەکانی ۱۹۶۰ وە خۆی بە لیکولینه‌وه و نووسینه‌وه له‌سمر چیروک خەریک کردووه ، ئەمە ئەوه ناگەیەشى کارەکەی کاک حسەین بىكەلەن و کەله‌بەرە . جىگاى سەرسۈورما نى یە کە کاریکی وەها كەم و کورتىشى له ھەندى رwooوه و ھەر تىا نەسى .

نووسەر ئەبوا یە باسی ھەموو ئەو وتار و نووسینا نەی سکردا یە

(۱) جەمشید حەيدەری ، "لیکولینه‌وهی هونه‌ری یا هەلبزركاندن له تەرا زووی رەخنەدا" ، پاشکۆی عېراق ، ژمارە ۲۱ ، ۱۹۷۸.

(۲) له ده رفه‌تیکی تردا ، وتاریک دەنبووسم دهرباره‌ی کتیبە ئافرهت له چیروکی کوردیدا .

## روشنایی و تیشك ، سهرنج و رهخنه له لیکۆلینه وهی چیرۆکی کوردى له عیراقدا

د . جه مشید حیده ری

له سالانی دوايیدا توپزه وانی کورد با يه خیکی زوریان داوه به میزووی ئەددەب و کولتوروی کورديمان ، به تايىھەتى نووسەر و زانايانى کوردىستانى عیراق . لم چەند سالەمی رابوردوو چەندان لیکۆلینه وهی گرنگ بلاوكرايته وە لەسەر سەرەھەلدان و پیش كەوتى چىرۆك ، وهک ژانرىتى تازەی ئەددەبی کورديمان .

له زنجيرە وتارىك كە هەندىكىان ئاماذه كراون و هەندىكىان له رىگا دانە ، هەول دەدەين سەرنج و رەخنهى خۆمان تۆمار بکەين ، بە هيواى چارە كردىي بارى رەخنه و لیکۆلینه وهی ئەددەبى لە روشنايى زانستى لیکۆلینه وه و پیش خستنى .

لم وتارەدا تيشك دەخېيىنە سەر دوو لیکۆلینه وهی ئەددەبى كە له عیراق بلاوكرايىنەوە له سالانى ۱۹۷۷ و ۱۹۷۸ . هەروەها هيوا مان وايە ، لم دەرفەتىكى تردا وتارى تريش بخېيىنە بەر چاوى خويىنەرى كورد و ئەددەب دۆستان و خويىنەرانى " هيوا " .

ئەم وتارە برىتىيە له دوو بەش :

۱- چيرۆکى هونەرى کوردى ۱۹۲۵-۱۹۶۰ ، نووسىنى ما مۆستا حەبر عارف ، بەغدا ، ۱۹۷۷ .

۲- لیکۆلینه وه و بىبلىوگرافياي چيرۆکى کوردى ۱۹۲۵-۱۹۶۹ ، نووسىنى ما مۆستا عومەر مارف بەرزنجى ، بەغدا ، ۱۹۷۸ .

خودا گرتنیکی گرموگور ده چینه ناو شاره رازاوه کاندهوه .  
ج با سیکی ها وری دهستم کرد؟ پیشکه و تینیکی جوانه ؛ ئەویش  
ئەوهیه که ده تو انم به کونه عشقه فیشا لاؤی بە کان پى بکەنم و ، تا  
نه لهو جووته درۈزنانه بدهم - دۇزە خى ئافره تانم دى و لەھو -  
پاشانیش ریپىئى درا و دەبم که راتیم لەناو گیان و لەشىكىدا  
دەسکە وى .

\*

\* \* \*

را هیشتنه سا منا که ! من کلولی رهت ئه که مهوده .

له زستا نیش ده توقم ، چونکه وهرزی ئا سووده بیمه !

ههندی جار له ئاسما ندا که نارانی بی کوتایی ده بینمه و که  
به نهته وهی سپی شادمان دا پوشراون . له سه روومه وه ، که شتی بیه کی  
زیرینی گهوره بیه که کهژاوه ره نگا و ره نگه کانی ده داته بهر بلیسنه  
بهر بیهیان . من گشت جه زنده کان ، گشت سه رکه وتنه کان ، گشت درا مه کانم  
خدلق کرد . هه ولم دا گولی نوی ، ئه ستیره بی نوی ، گوشتی نوی ،  
زمانی نوی بینمه دی . با وه رم به پهیدا کردنی هیزی سه روشتنی  
بوو . ئی چا که .. ده بی خیال و بیره وه ری بیه کانم بنیزم . سربمندی بیه کی  
جوان و گرژی هونه رمه ند و چیروک بیزه .

من ، من ئه وهی به خوم ده ووت بت په رست یا په ری ، له گشت  
ره وشتی بی به ری ، من ده گه ریمه وه خاک له گه ل منه کردنی ئه رکیکدا و ،  
واقیعی زبریش بو به با وه شگردن . لادیسی ! ئا یا هه لخله تاوم ؟  
ئا یا خیره ومهندی ده بیته خوشکی مه رگ بوم ؟ له کوتاییدا دا اوی لی  
بوردن ئه کدم که خوم درو خواردوو کرد و ، با برپوین .

به لام تاقه ها وری دهستی نییه . ئهی له کویوه فریا هه لینجین ؟  
به لی ، سالی نوی به لایه نی که مه وه زور دلره قه ، چونکه نه تو نام  
بلیم که سه رکه وتن پی سه لماندم که جیره دان ، فیشکه ئاگر ،  
نه ناسه هه لکیشا نی تا عونی کز ده بنه وه . هه موو بیره وه ری بیه چمطکان  
ده سرپینه وه ، دواهه مین په شیمانی بیه کانم به خیرا بی پا شه گه ز ده بنه وه ،  
به خیلی بردن به سوالکه ره کان ، جه رده کان ، ها وریکانی مه رگ ، دوا که -  
و تو وه کان له گشت با بهتی ، به نه حلدت بووه کان ، ئه گه ر توله خوم  
سه ندبیته وه ! ده بی به شیوه بیکی موتله قه ها و چه رخ بیت .

هیچ سروودی نییه ، له مشت گرشنی هه نگا وی براوه . شه ویکی  
سه خته . خوینی مه سیو به سه ره روومه وه دووکه ل ده کات ، منیش هیچم نییه  
له پاشماوه ، لم نهونه ما مه ترسنا که به ولاوه ... مل ملانی ده رونیش  
وه کجه نگی بنیما مان و دژواره ، به لام روویا دا دپه روه ری را بواردنی  
خوای تاک و تنهایه .

له گه ل ئه وه بیشدا ئه مه شه وی به ری بیه . با گشت هه ستیکی چوستی و  
سوزی راسته قینه پیشوازی بکهین و ، له گزندگا ، چه کدار به دان به

ئەی کىزەکا نم، ئەی شاژنەکا نم!

### مالوا (\*)

جگە لەو نمۇونا نەي بۇ ھەرىيەكى لە قۇناخەكانى شىعرى رەمبۇ  
ھېيدىنامانمۇد، بە چاكما ن زانى ئەم پارچە شىعرەدى دىوانى وەرزى لە  
درۆزە خىش - مىزۇوى ۱۸۷۳-يى بەسەرە وە دەبىنرى - بىھىن بە كوردى .  
ئەمە دوا شىعرى ئەو دىوانە يە . ئەو پرسىارە ئىستا يىش دەكىرى  
ئەمە يە : رەمبۇ مالاوا بى لە كى دەكا؟ لە عەشق؟ لە تاسەكانى؟ يَا  
لە ئەدەب و شىعر؟ ئەگەر كىشە مىزۇوى داتانى وەرزى لە دۆزەخ و  
درە وشا نە وە يىشمان لە بىر نەچى ، دىئى تى ئەچى ئەم پارچە يە بەراستى  
دوا شىعر بى كە رەمبۇ نووسىپىتى . بەھەر حال ئەو پرسىارانە رى  
بە پايە بلۇندى شىعرە كە خۇي ناگرن . (وهگىر)

وا پا يىزه! بەلام پەشىمان بۇونە وە خۇرەكى هەتاھەتا يىلى  
لە بەر چى ، ئەگەر ئىيمە خۇمان بەستېتە وە بە دۆزىنە وە رۇشنا يىلى  
خوايىھە وە، دوور لەو خەلکە كە لەسىر وەرزەكان دەمن .  
پا يىز . مەنزىلگاي پەروەردە بۇومان لە تەمى نەبزۇودا دەسوو -  
رېتە وە بەرە و بەندەرە كلۇلى، ئەو شارە زەبلاھى وا لە ئاسمانى  
پى لە پەلەھى قور و گىدا . ئاي، سىپالى بۆگەن ، ئانى لە باراندا  
خۇساو ، مەستى، ئەو هەزاران عەشقانى كە چوار مىخيان كىشىما!  
كەواتە ئەم شازنە درنەجە لاشەخۇرە ناتوانى تاقە توزىكىش كۆتا يىلى  
پى بىنلىكى لەم ملىونە گيان و لەشە مردوواشە - ئەوانەي كە پاشان  
دادىان دەپرسىتە وە!

جارىكى تر خۇم دەبىنەمە وە پېستە كە قۇر و ساعە وون  
كراىندۇيىتى . دىئىرە شىعر پى بە قىز و بن بالە ، پاشانىش دىئىرە شىعرى  
گەورە تر وا لە دلدى ، ئەوهە كە ئەو نەزانراوانە گرتۇتە خۇي  
كە نەتەمەن و نە سۆزىان هەيە . دەمتوانى لەوي بىرم ... بانگ

(\*) Adieu ( Une Saison en enfer ).

شگهار لیره و لهوی که سنه بی له پیره میردیکی ته نیا به ولاوه،  
هین و جوان ، که به لوكسیکی (۱) هرگیز نه بیسرا و دهوره دراوه-  
من له بهر شه زنوتانام .

شگهار ئوه بم که گشت بیره وه ریمه کانتاتی هینا وته دی، ئه و  
که سه بم که ده زانی کوتان کا - دهتا نخنکیشم .

کاتی ئیمه به هیزین ، کی پاش و پاش ئه کشیته دواوه؟ زور به  
زه و قین ، کی له بهر گالته لار ئه بینته وه؟ کاتی ئیمه زور به دین؟ کی  
ئه تواني هیچمان لی بکا؟

خوتان بر ازینه وه ، سه ما بکدن ، پی بکهن ، من هه رگیزا و  
هه رگیز ناتوانم عشق به پهنجه رهدا به ری بکه م .

ها وریکه م ، سوالکه ره که ، من داله رمووزنه که . چنده له لای  
تؤ چون یه که ئدم به دبه ختنه ، ئدم پیچ و پهنا کردنا نه و ، سر لی  
شیوا ویمه کا نم . خوت پیمامنه وه ببسته به ده نگه مه حالم کدت ، هنگت ،  
ته نیا دلده ره وه ئدم هیوا برانه هیچ پوچه .

سر له به یانیکی پوشرا و له ژولییدا . تیمیکی خوله میش له  
هه وادا ده فری . بوئی داری نیشتووه سر ئاره ق لمنا و ئاگردانه که ،  
گولی شی بعوه وه ، کاولکاری جی پیاسه کان ، نمده جوگه نسا و  
کیلگه کان . بوجی جاری یاریمه خنجیلانه مه من دالان و بخورت نه بی؟  
ته نافم هه لخست لم قولله زه نگه وه بوئه و قولله زه نگ ، ئه لقه  
گول لم پهنجه ره وه بوئه و پهنجه ره ، زریزه زیر و لم ئه ستیره وه  
بوئه و ئه تسیره و ، سه ما ده که م .

زه لکا وی سه روو به رده وام دووکه ل ده کا . چ جادو و گه ری له سه ر  
خورا وای سپی قوت ده بیته وه؟ چ جروکردنیکی وه نه و شه بی داده به زی؟  
له و ده مهدا که ساما نی گشتی له جه زنی برا یه تیدا ده ریزی ،  
زه نگیکی گری په مه بی له هه وره کاندا لی ده دا .

که تا میکی دلگیری مه ره که بی چین خوش ده کری ، توزیکی ره ش  
له سه رخو ده با ری به سه ره و نخونیمدا . گری چلچرا که کز ده که م ، خوم  
فری ده ده مه سه روینه که تل ده ده م به لای تاریکی یه که دا ، دهتا نبینم

(۱) Luke - به عهره بی : ترف ، بذخ .

رۇخى دنیا ، بەرەو سیمیرى (٦) ئى دەبرم ، كە خۇى لە تارىكى و لە گىزەلۇولەكانەوە كە وتبۇوه رى .

دەبوو سەفەرەكەم ، تەلىسمە كۆبۈوهكانى سەر مىشكەم بخلافىئىنم . لەسەر دەریا ، كە خۇشم دەۋىستەدە بوايە لەلكەيىك پاكە كاتەوە ، دەمدى كە خاچى دلەرەوە بەند دەبىتەوە . من لە لايدەك پەلكەزىپېنىم وە بەنەحلەت كرا بۇوم . بەختىارى چارەنۇوسم ، ويژدان ئازادانىم ، شىعەرم بۇو ؛ ڇىان ھەردەم يەجگار فراوان دەبى بۇ ئەوهى تەرخانى ھىز ، تەرخانى جوانى بى .

بەختىارى ؟ دانە نەرمەكانى تا مەرگ لە خويىدىنى كەلەشىرىدا بە ئاگاي دىئنا مەوه (لە سەر لە بەيانىيەوە تا عيسا ھات) (٧) لە شارە ھەرە تارىكەكاندا .

.....

ئەمە رووى دا . ئەمرو دەزانم سلاۋ لە جوانى بکەم .

#### رستە (\*)

ئەمەيش پا رچەيىكى دىيوانى " درەوشانەوە " يە . بەپىي بۇچۇونى يەكى لە توپۇزەرەوانى رەمبۇ ، دەشى ئەم پا رچەيە لە لىكىدانى دوو شىعەر ، يا زىاتر ھاتبىتە سەر ئەم فۇرمەئىستى ، دەبى سەرنجى ئەوهىش بىدرى كە نا ونىشانى ئەم پا رچەيە بە كۆپە نەك بە تاڭ .

(وەرگىز)

ھەر كاتى دنیا بچووك بىتەوە ، ببى بە تاقە دارستانىكى رەش بۇ چوار چا وى حەپەسا ومان ، بە كەنا رىك بۇ دوو مندالى ئەمەكدار ، بە مالىيىكى مۇسىقى بۇ خۇشە ويستى بىگەردمان - دەتا ندوزەمەوە .

---

(٦) سیمیرى (Cimmérie) : كاولە شارىكە لە قەراغ دەریائى رەش . لە سەددەئى حەوتە مى پېش زايىندا سیمیرىيەكان پەلامارى لىذىيا يان دا .

(٧) لە ئەسلىدا بە لاتىنى .

(\*) Enfence - V (Illustrations) .

.....  
حزم کرد له بیابان ، گولزاره سوتاوه کان ، دوکانه سیس  
سووه کان ، خواردنده شله تینه کان . خوم کیش ده کرد لهنا و کولانه  
بوجنه کاندا و ، به چاوی سووقاوه و خوم پیشکش به خور ده کرد ،  
خوای گر .

" ژنه رال ؛ ئەگەر کونه توپی له سەر سەنگەرە کاولەکان  
ما وە ؛ بوردمانمان کە بە توپەلە گل ، لە ئا وینەی کوگا رازا وەکاندا ،  
لە سالۇنە کاندا . شار ؛ توژە کە خۆ دەرخوارد بە . ژەنگ ھەلبىنە  
بە پلۇو سکە کان . سالۇنچە کان پر کە لە توزى له علی داغ ..."  
ئاي ، وورده مىشى خۇمەست كردوو لە مىزگاي خانە كەدا ، عاشقى  
گولە گا وزوانە ، كە تىشكى دە توپىنەتە وە !

.....  
ئاخرى ، ئەي بەختىاري ، ئەي هوش ، ئەوشينا يېم لە ئاسمان  
دا مالى کە رەشە و ، زيا م ، پريشكىكى زىزىپى رووناکى رووت . لە  
شادى ، تەعېرىيکى گالىتەجار و لەشىا و وونم وەردەگرت ...

.....  
بۈوۈم بە ئۆپىرا يېكى ئەفسانەيى : دىيم کە ھەموو گيان لمېرىكا ن  
ھەتمىيەتىكى بەختىارىيَا ن ھەيە . كار زيان نىيە ، بەلكو رىيگا يەكە  
سۇ بەسەر يەكدا دانى ھەندى هىز ، خۇ توورە كردىكە . رەۋشت  
لوازى مىشكە .

واي بۇ دەچۈم کە ھەرگىيان لە بەرئى چەندان ژيانلى تىر  
قەرزارىتى . ئەم جەنبا نازانى چى دەكەت ، پەرىيە . ئەم خىزانە  
كولانە سەگە . لە بەردهم چەندان پىاودا ، لە گەل تا وىكى يەكى لە  
ژيانە کانى ترياندا بە بەرزى دوا م . بەم شىوه يە بە رازىكە خىوش  
ويست .

ھىچ سۆفيگە رىيکى شىتى ، ئەو شىتىيە كە دەيشا رينە وە لە  
بىرم نەجوو . دە متوانى جارىكى تر ھەمووى بلىيەمە وە ، دەزگاكەم پىيە .  
لەشسا خىم كە وتبۇوە بەر مەترى . توقيين دەھات . دەكە وەنمە  
وەنەوزى چەندان رۇزە وە ، ھەلدىھە ستام ، خەوە ھەرە خەمگىنە کانم درېزە  
پى دەدا . گەيیو بۈوۈم بۇ مەرگ و ، بەرەيگا يېكى سامناك لوازىم بەرە و

۰ شينه ، U سهوزه . شکل و بزووتنه وهی هدر کونسوٽيکم رېك کرد . ئنجا  
شان به شانى رىتىمى غەرېزى به خۆمدا هەلدا کە كردارىكى شىعريىم  
دا هيئناوه ، ئەمرو بى يى سېھى ، بە شىگت با رېكدا تېپەر دەبى . وەرگىرا -  
نەكم گل دەدا يەوه .

ئەمە لە پېشدا لىكۈلىنه وهى بىوو . بى دەنكى و شەوانم دەنۇنى .  
ئەوه نىوت دەكىد كە دەر تاپرى . گىز خواردىم دەچقاند .  
.....

كۇنى شىعري بەشىكى چاك بىوو لە كىيمىاى كردارمدا .

خۆم راھىنا بە هەلپۈزۈكەندى سادەوه : راست و دروست مىڭمۇتىكىم  
دەدى لە جىي كاگەيى . قىتا بخانەسىكى تەپل كە لە لايەن فريشته كان وە  
دروست كراوه ، يايلى بەرى ئاسما نەوه ، سالۇنى لە بىنى گومىكدا . دىيۇ  
و درنجه كان ، نەھىئىيەكان : ئا وي ۋۇدقىلى (۳) سامى بەرپا دەكىد لمپر  
دەممدا .

پاشان سۆفييەتىيە ئەفسۇونا وييكانم بە هەلپۈزۈكەندى ووشە  
دەربىرى !

گەيشتمە ئەوهى كە شىرازە تىك چۈونى مىشكىم بە بەرپىز بېينمۇه .  
بى كار و نىچىرى تاپىكى قورس بىووم . بەخىليم دەبرد بە بەختىارىي  
جا نەوه رەكان - پەپوولە بە كرمى كە نموونە بى گوناھى ئۆلىمبۇسە (۴)  
مېشكىكۈرۈھ (۵) ، وەنەوزى كچىنى .  
خۇوم تفت دەبىوو . بە جۇرە گرانىيىكى دلدارى مالاوايم لە دنیا  
دەكرد .

---

پىوهندىيەكانى بۇدلۇر ، دەيە وى پىوهندىي نىوان پېت و رەنگەكان  
بۇزۇتىتەوه ، ياخود دىتە بەرجا .

(۳) ۋۇدقىلى (Vaudeville) : سووكە شانۇگە رېيىكى كۆمىدىي كورت .

(۴) ئۆلىجۇي (Limbe) : لە بىرۇبا وەرى مەسىحىدا بە و شوپىنە دەلىن  
كە گيانى پىا وچا كان و ئە ساوايانە پېش تەعمىد كردىيان مەردوون  
دەھەۋىتەوه ، بەدهم چاوه رۇانى هاتنى عيساوه ، واتا رۇزى قىيا مەت .

(۵) Taupe (جۇرىكە لە مشكە كۈرۈھ ، زياتر بە مشكە كۈرسەرى  
ئەوروبىي بەنا و باڭە .

## کیمیای کردار (\*)

ئەم يەکىّكە لە هەرە بەنا و با نگترین شىعرەكانى رەمبۇ، كە تىا يدا  
هربارەي شەزمۇوتى شىعرى خۆى دەدوۇ و، پرۇزەي غېب بىنینەكەي  
رەت دەكتەوە . كیمیای کردار<sup>(۱)</sup> لەگەل پا رچەيەكى تردا ناونىشا نىكى  
ها و بەشىان ھەيە : وورپىنه Délires . شيا وي با سەكە رەمبۇ لەم  
شىعرەيدا نا و بەنا و شىعرەكانى ۱۸۷۲ ئى خۆى ، بە دەسکارى كردىنىكى  
زۇرەوه، تى ھەلکىش كردووه . بەلام ئىمە بە راستمان نەزانى ئەم تى  
ھەلکىشان وەرگىپىن؛ بەو مەبەستەي كە يەك زۇر درېئە دەر ئەچى و،  
دەرفەتى بلاوكىرىنە وەتەسک دەكتەوە ، دووپىش چۈنکە خويىنەر دەبى  
ئەو شىعرا نە بنا سىت ، تا بزا نى دەسکارىيەكان چىن، كاتى بەراۋدىيان  
(وەرگىپىن) دەكتەوە .

ھى من ... داستانى يەكى لە شىتىيەكانم .  
لە مىزە شانا زىم دەكىد بە چىنگ خىتنى گشت دەشتودەرى بىم  
لوابى، بە نا و با نگى نىگاركىشان و ئەددەبى ھا و چەرخم بە گالىتەجار  
دەدىيە وە .

ھەزم دەكىد لە نىگارى گەوج، سەردەرگا ، دىكۇر، چا رۆكەى  
تەنافبا زان، سەر لە وەھ، نەخشى مىلى، ئەدەبى بە سەرچوو، لاتىنىي  
كلىسى، كتىبى روو ھەلما لىرا وي بى نا وي نووسەر ، رۇمانى باپىرانمان،  
نەقلى جنۇكان، كتىبە بچۈلەي مەنالى، كۆنە ئوپىرا ، دەور كردەنە وەي  
بىلھى گۇرانى، رىتمى سا وېلکە .

خەوم دەدى بە جەنگى خاچەوه ، سەفەرى دۆزىنە وە كە رى نىمايمان  
نىيە، كۆمارى بى مىژۇو، شەپى ئا يېتىي كې كراو، ثۇرۇشى رەشت، جى  
گۆرپىكىي رەگەز و قارەمان: بىرۇام بە گشت تەلىسەمەكان بىوو .  
رەنگى بزوپىنەكانم داھىنَا<sup>(۲)</sup>: A رەشە، E سېيىھ، I سوورە ،

(\*) Alchimie du verbe ( Une Saison en enfer ).

(۱) كرادىرمان بە ماناي ( فعل Verbe ) وەرگىپىرا . لەم ووشەيە  
شىاترمان تۈوش نەھات .

(۲) يەكىّكە لە شىعرەكانى رەمبۇ، كە تىا يدا ، بە پىي تىيورىي

زورم دان به خودا گرت  
 که هرگیز له یادم ناجی  
 جهفا و ترسه کان  
 بو ئاسما نه کان چوون  
 تینویتی نا پا کیش  
 ده ماره کانم تاریک ده کا  
 هه رووه که و میرگهی  
 ده دریته بهر له یاد چوون  
 گه وره ده بی و شکوفه ده کا  
 به بخورت و گیا کله  
 بو هنگی در  
 سد میشی چه پهل

ئای هه زار به بیوه ژن بیون  
 له گیانیکی ئا وا هه زار  
 که وینهی نی به  
 له (نوتردام) <sup>(۱)</sup> به ولاوه  
 ئا یا نویژی بو ده کری  
 مریه می عه زرا؟

لاویتی به کی به تال  
 که ژیر دهستهی هه موو شتی بیو  
 به سا سکیتی  
 ژیا سی خوم دوراند

(۱) Notre-Dame : دهقا ودهق یانی (خانمه کان، هه-  
 لبته ئه مه نازنا وی مریه می دایکی عیسا یه . له فرهنسا ئه و  
 کلیسانهی بو مریه م دروست کران پیان ده وتری (نوتردام) .  
 له م شیعره دا باش بو م یه کالا نه بیوه که ئا یا ره مبو ممهستی  
 کلیسه که یه یا هر مریه م خوی ، بویه ووشکهم وه ک خسروی  
 هیشته وه .

پی له سالاونگدا ، خه و توه و زه رده خنه گرت و ویه تی  
 ههر و هک چون مندالیکی ندخوش زه رده خنه ده یگزی  
 سه رخه وی ده شکیتی . ئهی سروشت ؛ گه رم رای زهنه ، سه رما یه تی  
 عه تره کان کونه لووتی نا بزوین  
 له بدر خودا بی خدم خه و توه و دهست له سه ر سنگ  
 دوو کوسی سور لمه که راستین

### گورانی ههره بدرزترین قولله (\*)

ئه مه یه کیکه له شیعره کانی قوتنا غی غه سب بیینینی ره مبو .  
 میزوروی (ما یسی ۱۸۷۲) ای به سه ره و ده بینری . ئه م پارچه يه ، به  
 پیچه وانهی زوربدي به رهه می ره مبووه ، هیوا ییکی گهشی تیا به دی  
 ده کری . به ده سکاری کردنیکی زوره وه ، ره مبو هه مان پارچه هی  
 تیکه ل به شیعری (کیمیای کردار) کردووه . موسيقا ئه م شیعره -  
 به زمانه فرهنسی یه که داره ... (وه رگیز)

لاویتی یه کی به تال  
 که ژیرده ستھی هه موه شتی بوو  
 به ناسکیتی  
 ژیانی خوم دوپا ند  
 ئای ده با ئه و زمانه بیت  
 که دلان تیا شهیدای یه ک ده بن

به خوم ووت ؛ لئی گه ری  
 با که سنه تبینی و  
 به بی په بیانی  
 با لاترین شادی  
 ده با هیچ نه توه ستینی  
 ئهی خانه نشینی شکودار

(\*) Chanson de la plus haute tour ( Derniers vers ).

شت شادم دهکه ن؛ بیهکه م ئه وه یه که زۆر برووا م یه ده سپاکی هه یه و،  
به بیانووی دارشتنی وه رگیرانه که له زمانیکی شیعریدا نه هاتووم  
شتی وا به ده م ره مبۇوه هەلّبەستم که ئیسک و پرووسکی له گۆردا  
دا چله کیئنی . دووه م راسته و خۆ لە زمانی شاعیر خۆیه وه ئه و شیعرانه م  
کردووه به کوردى و، با جم به هیچ زمانیکی تر نه دا وه . تنهها لایه نه  
زمانه وانی یه که ده میئنی ، که لەوانه یه فرهنگی ناتهوا وه کەم ياخود  
کوردى یه با زارپی یه کەم چەوانه یا ن کردىم . بەهەر حال ھیوا دارم مەبەه -  
سته کانم زۆر نەشیوا ندیئى . . .

### خەوتتۇوی دۆلەکە (\*)

ئەم شاکارە، رەمبۇ به شانزە سالى نووسیویه تى . دیارە کە  
جەنگى ۱۸۷۰ ئىنیوان پرووسيا و فرهنما به دوور نېيە له ئىلەما مى  
ئەم شیعرە . ئەم روپیش له ئەوروپا بە مەترسی جەنگى ئەتۆم لەرز  
دا گرتۇودا ، ئەم شیعرە رەمبۇ بە ھەمان گەرم و گورى سەرددە مى  
دا نانی یه وه دەما و دەم دەکرى . . . (وە رگیر)

کونى سەوزا بى کە رووبارى تىا دەخويىنى  
سېپالى زیوین شىتى نە خۆی ھەلّدە وائى بە گیا کان نە وه  
خۆرى چىا شانا زەکان دەبرىسىكىتە وه  
ئەمە شىپویىکى بچۈوكە، کە تىشك دەکا بە كەف

سەربا زىيکى لاو، دەم دا چقا و، سەرقۇتىن  
پشت مل نقومى كۈوزەلەى تەپ و شىن  
خەوتتۇوە، له دى، کە رووناکى دەبا رى  
رەنگ زەردە لەسەر پىخەفە سەوزە كەمى  
لە ژىر ئاسماندا، لەسەر ھەرپىزە کە راڭشا وە

(\*) Le dormeur du val ( Poésie ).

بُوچوونی خوی ههول دا سه رجا وهی ئيلها می شيعره کانی بدؤزیته وه، هیچ رئی به ره خنهگری نه گرت که بیت سه را پا شيعره کانی ره مبو به لایمنیکی ئا بینی - کاتولیکی لیک بدانه وه؛ هه موو که سیش هه لویستی ره مبو بدرامبه ر به ئا بین ئا گاداره.

ره مبو شيعريکی دا هیلنا، وه ک خوی ئا ره زووی لی بوو: (بـه هه موو باريکدا تیپه ر ئه بـی) بهلام هه ر وه ک خویشی دانی پیا دهندی: (دانها کليلی ئهم ئا هه نگ گیلر انه کیلوییمه م پـیمه).

ره خنهگری ده لی: ههول و تهقهلاکمی ره مبو سه ری نه گرت، چونکه ئه م شاعیره قیزی له سروشت ئه بووه و، هارمۇنى ئىنسانى ئیوان لهش و گیانی ده رک پـی نه کرد، ئه مەيش را يەکى ترە کە دەچىتە سەر سەدان بېروراچ جۆربەجۆر و ناكۆك دەربارە ره مبو. بهلام كەس دوودل ئىيە له وھی ره مبو به يەکى له هەرە مەزنترین شاعیره تویکان دا بـنی.

ئەگەر شيعرى ره مبو بـی مەنتيق دىتە بەرچا و، دەبـی له ياد نەكەين کە هەر ئەم بـی مەنتيقىيە ره مبو يە کە سورىا لىستەكان دەيان سال پـاش خوی دەيقۇزىنە و دان به چا كەيدا دەنین.

بـه لی، ئە و شۇرۇشى ئا رىيور ره مبو بەرپاى كرد لە شىل و نا وھرۇكى شيعردا، ئا ئە مەرۇش كلىپە دانە مرکا وە تە وھ.

## ھەللىزاردە

وا بـازانم ئەم با سە ناتەواو دىتە بەرچا و گەر بە چەند پـارچە شيعريکى ره مبو پـشت نە بـەستى. بهلام لەم کارە سا مە لى نىشت: چونکە وھرگىلر ان چەند كارىكى گرانە، دەيان ئە وەندە لە وھرگىلر ان شيعردا گرانتر دەبـی، بـويە بـو يە كىكى كەم تواناي وھك منىش خو تىيە گلانىكى تۆقىنەرە. بهلام لەگەل ئە وەشدا شوولم لى هەللىكىشا و، چەند پـارچە شيعريکى ره مبـوم وھرگىلر بـە كوردى، هىنـىدە كە پـەرسەندىنى شيعرى ره مبو رەچا و بـکا. بهلام ئەنچا مەكـەمى، وھك دە بـىيىن و خوپىش دانى پـيا دەنـىم، زۆر ووشك و بـى پـىزە، وـا بـە ناچارى دە يخـەم بـەرچا و تان. لەگەل ئەم هە موو دوودل ئىيەشـدا، دوو

که ره مبۇ لەم دىوانەدا تەقەلاي غېب بىنى خۆي رەت ئەكانتەوه و  
تەنانەت لە شىعرى (كىميائى كىردار) يىشدا گالىتەمى پى دەكەت .

سالى ۱۸۸۶، كاتى ره مبۇ لە بىابانەكەن ئەفريقا تۆزۈ  
دەكەد، گۆۋارى (لافوگ La Vogue ) لە فەرەنسا و، بە دەست  
پىشكەرى ئىرلىق، بەشى ھەر زۇرى دىوانىكى ترى رەمبۇي لەچاپ  
دا، بى ئەوهى شاعير خۆي ئاگادار بى. ئەو دىوانەيش (درەوشانەوه  
Illuminations ) يە .

لىزەدا مەسىلەيىك ھەيدە كە هيىشتا ساخ نەبۇتهوه؛ ئاشكرا يە  
كە رەمبۇ مىزۇوي دانانى لە بن شىعرەكانى نەئەنۇوسى و، ئەگەر  
مىزۇويى لەسىر شىعرى بەرچا و بکەۋى ئەوه ھى رۆزى كۆپى كەنەمەيمىتى،  
نەك دانانى. جا لەبەر ئەوهى (وەرزى لە دۆزەخ) و (درەوشانەوه)  
لە يەك سەردەمدا دانراون، ئەمە كارى رەخنەگرانى ئالۇز كەرددووه؛  
ئا يَا كام دىوانىان پىش ئەۋى تر نۇوسراوه؟ ئەم پرسىارە وەلامىكى  
تىينۇوشكىيىنى نىيە . بە ھەر حال تەنها جىا وا زىي (درەوشانەوه) لەگەل  
(وەرزى لە دۆزەخ)دا ئەوهى كە پارچەكانى يەكە مىان كورتىرە لە  
ھى دووهەم، گەرچى تا رادەيەكىش تەمومما وى تر دىيىتە بەرچا و .

بە شىوه يىكى گشتى دىوانى تەواوى رەمبۇ - ئەمرو - بىرىتىيە  
لە شىعرەكانى سەرەتا ، ئىنجا شىعرەكانى پېرۋەھى غېب بىنин، كە  
واىرى تى ئەچى زۆربەي زۇرى لە سالى ۱۸۷۲ دىوانى نۇوسىسى، ساشان  
دىوانى (وەرزى لە دۆزەخ)، كە تەنها دىوانە رەمبۇ خۆي بەچاپى  
گەيا ندبى، لە كۆتا يىدا دىوانى (درەوشانەوه)، لەگەل ھىئىندى وورده  
با بەتى تر و رەشنۇوى تەواو نەكرا و .

رەمبۇ لە تا ويىكە بىدەنگ بۇو كە گەيشتبوھ لوتكە، ئەميسىش  
بە ھەلزنانىكى بى حوانەوه لە نويۇھ بۇ نويىتىر . بە دەم گەپاندا  
بە شوين نەزانراو، موتلەقاد، ووشەي وەك مىو و بە ئارەزووی خۆي  
ئەشىلا . رەمبۇ دەبۈيستە و فۇرمولە ئەفسۇونا وىيە بىدۆزىتەوه كە  
ئىنسان دەكا بە خولقىيەر و يارمەتىي دەدا دنيا بگۇرى . ئا يَا  
دوزىيەوه؟ لە شىكردنەوهى سەمبۇل لە شىعرى رەمبۇدا كارى نىيە  
ھىئىدە پۈوج و بى سەرەنجا م بى . دەيان كەس دەيان لىكولىيەوه و  
تۈرۈزىنەوه يان لەسىر رەمبۇ و شىعرەكانى نۇوسى ، ھەركەس بە پىيى

کاره ئەوه بۇو کە پاشان لە ئەرشیفی ئە و گۆقا رەدا ئە و شیعرا نە دۆزرانە وە ، چىنگى فەوتا نە يانگە يېتىن . لەگەل تا وسەندىنى ياخى بۇونى رەمبۇدا دىز بە خىزان ، ئايىن ، رەوشت و دەولەت ، شیعرەكانىشى قۇولۇتر دەبنە وە .

۱۵ مايسى ۱۸۷۱ رەمبۇ دوو نامە دەنۈسى . يەكە مىان بىۋۇ ئىزا مبارى ما مۇستاى و ، دووه مىان بۇ حاوارىيەكى ، كە بە (نامە ئەپبىن La lettre du Voyant ) بەناوبانگە . لە دوو نامەيدا رەمبۇ ئىستاتىكى شیعرى نوئى خۆي ئاشكرا دەكا :

... شیعى نابى رېتم گرى بزووتنە وە رۆزانە بىت ، بەلكو دەبى لە پىشە وە بى (۰۰) شاعير دەبى ئاگر دىز بى (۰۰) دەمەوى بىم بە شاعير ، كار ئەكمەن تا خۆم بىم بە ئەپبىن . واتە گەيىشتنە نەزانرا و بە شىرازە تىكدانى گشت بارەكان (۰۰) [بە] گەرانى بەردەوام بە شويىن نويىدا (۰۰) من يەكىكى ترە (۰۰) شاعير ئەپبىن لەنا و گشت خەلکدا دەبى بە گەورەترين نەخوش ، گەورەتريىن تا وانبار ، گەورەترين نەفرىن لىڭ كرا و با لاترىن زانيا ر . چونكە دەگات بە نەزانرا و ..."

ھەر لە دەمانەدا رەمبۇ داوا لە ھا ورپەكانى دەكا كە چى شیعرى لە وەپىشى ئە ويان لايە بىسۈوتىيەن . شیعرەكانى ئەم قونا خەمى ھېشتا كېش و قافىھ دارن ، كەچى كېشيان سووكترە و ، وەك دەلىن زياتر لە گۇرمانى نزىك دەبنە وە . بەلام نا وەرپوکە سەمبۇلىيەكەيان بە ئاشكرا ديا رە .

سالى ۱۸۷۳ و ، پاش ھەراكە بىرۇكىلىندا ، رەمبۇ دىوانى (وەرزى لە دۆزەخ Une Saison en enfer ) دەنۈسى . تەنانەت لە چاپخانەپىكى بەلزىكى نزىك لە يەنابىر و ئىاوارە فەرەنسىيەكانى سەر بە كۆمونىش لە چاپى دەدا . بەلام لەبەر لاتى ، لە چەند دانەپىز زياتر كە بە دىيارى پېشىكەشى بە ھا ورپەكانى دەكا ، دىوانەكە بە چاپكرا وى لە عەمارى چاپخانەكەدا بە ھەتىيو كە وتسووسى دەمېنېتە وە ، تا لە سەرەتاي چەرخى بىستەمدا لە ھەمان چاپخانە وەك گەنجى دەدۆزرىيە وە . شیعرەكانى وەرزى لە دۆزەخ كېش و قافىھ يان نەما وە و ، ھەمۈسى بە شیعرى پەخشانە . بەلام سەير ئە وە يە

چا و لیک ده‌نی. ۱۴ ای هه‌مان مانگ له گوْرستانی (شارلثیل) به خاک  
ده سپیرری.

### غه‌یب بین

که له سالی ۱۸۹۵ دادا ، وتا چوار سال پاش مردنی ره مبو ، کاره  
شیعری‌یه کانی له به‌رگیکدا بلاو بعونه‌وه ، که م که‌س‌ده‌بیزانی ئەم و  
هه موو بلیمه‌تی‌یه به‌ری سی پینج سالن. ده‌بی بکشینه دواوه ، تا  
ده‌گهینه‌ها وینی ۱۸۷۹ ، کاتی ره مبو له کیلگه‌ی خوزانه‌که‌یاندا کاری  
ده‌کرد ، کونه‌ها وری‌یدکی به‌دهم سه‌ردانه‌وه هه‌والی به‌رهه‌می نسوئی  
لی ئه‌پرسی ، ره مبو وه‌لام ده‌اته‌وه : ده‌میکه بیر له‌م‌ه ناکه‌م‌ه‌وه .  
ره مبو له شانزه سالیدا شا عربیکی تهوا و بwoo ، له ماوه‌بیکی کورتا ،  
وهک ره‌خنه‌گری ده‌لی : دوو شورشی به‌رپا کرد ; یهک له شیعردا کمے  
دا پرووخاند ، دوو هدر له شیعردا که نووسی . ئه‌م شورشه‌ی ره مبو  
زور به‌تینه‌وه به‌رده‌واام بwoo ، هه موو روزی شتیکی نویتری دیت‌سا  
کایوه ، تا - وهک هیندی ده‌لین - نوژده سالی ، یا خود - وهک هیندیکی  
تر ده‌لین - بیست و یهک سالی ، شیتر هه‌تا هه‌تایه بیدهنگ بwoo و ،  
تا مردنی هیچی تری نه‌ووت . ئایا ئه‌م بیدهنگ بعونه بريا ریکی  
به‌جدرگ و به ته‌وا وی قهناعه‌ته‌وه بwoo که ره مبو له سری سور بwoo؟  
یا خود وهک هیندی پسیکولوگ ده‌لین بلیمه‌تی ره مبو پیوه‌ندی هه‌یه  
به ته‌نگوچه‌له‌می سه‌رده‌می ده‌مرووتی‌یه‌وه ( به عده‌رسی : ازمـة  
المرأفة ) ؟ وه‌لابیکی تیر و تمسـل به یه‌جگـاره‌کی بزرـه .  
ره مبو - وهک زانیمان - سه‌رـهـتـای شـیـعـرـ نـوـوـسـیـنـی دـهـسـتـپـیـکـرـدـ .

پاشان و ، به هاندانی ئیزا مباری ما مـؤـسـتـای به فـرـهـنسـیـ شـیـعـرـ نـوـوـسـیـ .  
سه‌رـهـتـای شـیـعـرـ رـهـ مـبـوـ زـورـ جـیـاـواـزـ سـیـیـهـ لـهـگـهـ لـشـیـعـرـ بـاـ وـیـ ئـەـمـ وـ  
سه‌رـهـمـداـ . شـاعـرـیـ نـمـوـونـهـ لـایـ رـهـ مـبـوـ تـاـ رـاـدـهـیـدـکـ نـیـرـقـالـهـ ، بـهـلامـ  
زـیـاتـرـ بـوـدـلـیـرـهـ ، کـهـ پـاشـانـ رـهـ مـبـوـ بـهـ ( شـایـ شـاعـرـانـ ، خـواـیـیـکـیـ  
راـسـتـهـقـیـنـهـ ) نـاوـیـ دـهـبـاتـ . رـهـ مـبـوـ زـورـ بـهـ ئـاـواـتـهـوهـ بـوـ شـیـعـرـهـ کـانـیـ  
لـهـ پـاـرـنـاسـیـ هـاـ وـچـهـ رـخـداـ بلاـوـ بـکـرـیـتـهـوهـ ، سـیـ پـاـرـچـهـ وـ نـاـ مـهـیـیـکـیـ پـرـ  
سوـوتـنـاهـوهـ نـارـدـ بـوـ بـاـنـقـیـلـ ، بـهـلامـ بـیـ سـهـرـهـنـجاـمـ . تـهـنـهـاـ چـاـکـیـ ئـهـ وـ

جیا بوونه وهی ڤیّرلین لهو ئا فرهتهی که زۆرى خوشئه ویست: ژنه کەی.  
له ناوه راستى ۱۸۷۲ ره مبۇ و ڤیّرلین را دەکەن بەره و بەلزىكا،  
ئنجا ئېگلتەرا . سەرەتاي ۱۸۷۳ ره مبۇ زۆربەي کاتى خۆي تەرخان دەك  
بۇ خۆپىندەوە له كتىپخانە مۆزەخانە بەريتانى . ئەو دەمە ڤیّرلین  
تەواو دادراوه له نىوان ره مبۇ و ژنه کەيدا . له ناوه راستى ئەمە  
سالىدا (ای ژويىيى ۱۸۷۳)، كاتى هەردوو ھا ورى لە بروكسييل (بەلزىكا)  
ئاوارەن، پاش ھەرزە دەمە قالىك، ڤیّرلین دەست دەبا بۇ دەمانچە کەمی  
و دوو فيشەك دەنئى به ھا ورىكەيە وە، كە يەكىكىيا نەشتى ره مبۇ دەسمى.  
ره مبۇ له نەخۆشخانە دەكەۋى و، ڤیّرلین دوو سال بەندىخانە بەسەردا  
دەسەپى . سەرەتاي ۱۸۷۵ له شتوتگارت (ئەلمانىا) ھەردوو ھا ورى بۇ  
دواجار يەكتىر دەبىتنەوە . ڤیّرلین له بەندىخانەدا گەرا وەتەوە و  
بۇتەوە بە كاتۆولىك و، دەيمەوى ره مبۇيىش را كىشىتەوە بەرە و ئا يىين .  
بەلام ره مبۇ گالىتەي پى دەكا و، ئىتىر چى تر و، ھەتا ھەتايە يەكتىر  
نا بىتنەوە .

لە دەممەوە ره مبۇ سەرى خۆي ھەللىدەگرى: سويسرا، ئيتاليا،  
نەمسا، وولاتە سەندىنا ۋىكَا، ھۆلەندىا، ئەندۇنىسىا، مىسر، عەدەن،  
حەبەش .. نا و بە نا و يىش دېتەوە شارلېيل.  
ساڭى ۱۸۸۵ ره مبۇ دەيمەوى قاچىچىتى چەك بکا له نىوان عەدەن  
و حەبەشدا . پاش بىست وىيەك مانگ ماندوو بۇونى له را دەبەدەر ،  
(مېننەلىك)ي شاي موسىلمانى شارى (ھەرار) له حەبەش چەكەكانى لىنى  
وەردەگرى و پۈولى ناداتى .

ھەر لەو سالاندا ، ره مبۇ دوو لىكۈلىنى دەنۈوسىي، يەكىكىيان  
لە سەر نا وچى (ئۆگا دىن)ي نىوان سۆمال و حەبەش، كە لە بولتەنلى  
كۆمەللى جوگرافىدا بلاو دەبىتەوە (۱۸۸۴)، ئەوى تىريان دەربارەي  
با يەخى ئا بۇورىي نا وچى (شوا) له حەبەش، كە لە سالى (۱۸۸۷)دا  
رۇژنا مەي بوسفۇرى مىسرى بۇيى جا ب دەكا .

سەرەتاي (۱۸۹۱) ره مبۇ ئازار دەكىشى بە هوئى رۇما تىز مىكەوە  
لە ئەزىزىدا كە بۇوه بە شىرپەنچە . دېتەوە فەرەنسا و، لە نەخۆشخانەي  
(ما سىيى) قاچىكى دەبرىنەوە . بەلام بى سوودە . لە كۆتا يى ئۆگىستەسەوە  
دېتەوە ھەمان نەخۆشخانە، تا لە . اى نۇقە مېھرى ۱۸۹۱ دا بۇ دواجار

هوشیاره ده رک پی ده کا ، بیویه تا بُوی ده کری یا رمه تی ده دا ، ههستی  
یاخی بوونی هان ده دا و ، به رهه می شا عیره فرهنسییه ها و چه رخد کانی  
پی ده سا سینی . ها و رییه تی یه کی گهرم له نیوان ما موستا و قوتا بیدا  
شکوفه ده کا . له هه مان سالدا جه نگی نیوان پرووسیا و فرهنسا  
ده لدده گیری ، ره مبو که له و سرده مهدا ده میکه ههستی دز به ئاین و  
ده ولدتی ئیمپرا توری نیشان داوه ، راده کا بدره و پاریس ، به سیازی  
به شدار بعون له بینینی رمانی ئیمپرا توردا . به لام ده گیری و بمه  
که فالهتی ئیزا مباری ما موستای بدره للا ده کری . له گهرا نه وه بیدا بُو  
شارل قلیل ، خوی له کتیب خانه شاره وانی ده خزینی و ، چی بدره سرت  
که وی ده بخوینیت وه ، به تایبته نووسه ره سویالیسته کان :  
پروودون ، با بُوفه لوبي بلان و سان سیمون .

سره تای ۱۸۷۱ ره مبو جاریکی تر هلدیت وه بدره و پاریس ،  
ئه مغاره یان به پی دیت وه بُو شارل قلیل . له هاتنه وه بیدا دا مهزاندنی  
کومونی پاریس (۱۸ مارس ۱۸۷۱) ده بینی ، به ئاشکرا خوش ویستی  
خوی بُو ئه م رژیم نوییه ئاشکرا ده کا و ، به سی پارچه شیعر سلاؤی  
لی ده کا . لیزه دا شتیک هه یه له زیای ره مبو دا که زور رون نیمه ،  
ئایا راسته ره مبو له و ده مهدا خوی گه یاند وه پاریس و به شدار  
بووه له ریزی چه کدارانی کوموندا ؟ زور ریتی ئه چی ، به لام  
به لگه بیکی کونکریت ده سنا که وی .

له سه پته مبه ری هر ئه و سالدار ره مبو دیت وه پاریس ؛  
ئه مغاره یان شا عیریکی ناسرا و ، که به نامه گورینه وه یه کتریان  
نا سیوه بانگی کردووه ؛ ئه ویش پول قیرلینه .

ره مبو له گه لخویدا پارچه یه کی شیعری نویی ده با : به لام  
مهسته که Le Bateau ivre که یه کیکه له شا کاره کانی . ئه م شیعره  
بو ده بیت پاسه پورت له نیو هوته رمند و ئه دیب بُوهیمی یه کانی  
گه ره کی لاتینی پاریسدا . ره مبو له گه لیاندا به ده مهستی ده کا . حمیشه  
ده کیشی و ، به چالکی یه وه بدشداری ده کا له ئالبوومی ئه لق  
زووتیکدا (کومه لی ئه دیب و هوته رمندی نویخوازی ئه و ده مهی پاریس).  
له وساوه ها و رییه تی یدکی توند و گهرم ، ئینجا عەشقیکی ھۆمۆسیکسویل  
قیرلین و ره مبو ده بهستی به یه که وه ، که دره نگتر ده بی به هـوـی

بلیّن که شان بدا له شانی موسیقا . دووه م پیشکه وتنی زانیاری تا  
ده هات سروشتی له چند فورمول و یاسا یتکدا کورت ده کرده و ، ئه و  
کاریگه رئیه پیشینه له ئینسان تالان ده کرد ، هه دنیای ناوه وه ئه ما  
که سه رچا وهی نهینی بی کوتا بی بی . سیمه م چه رخی نوزده هم لـه  
فرهنسادا سدرده می یاخی بون و شورش به رپا کردن بون . فرهشی یه کان ،  
هه ره له کریکاریکی لاته وه تا ووردہ بورژوا ییکی روونا کبیر هه دالـی  
دنیا ییکی نوی بون . بـویه لوتكه ئه م را په رینانه به کومونی پاریس  
(۱۸۷۱) شکایه وه ، که یـه کـه م خـونـوانـدـنـیـ کـوـمـهـلـیـکـیـ دـوـورـ لـهـ دـهـسـهـلـاتـ و  
ره وشت و ئـایـدـیـاـلـیـ بـورـژـواـ بـوـوـ . جـیـیـ سـهـرـسـورـمـانـ نـیـیـهـ کـهـ زـوـرـبـهـیـ زـوـرـیـ  
شا عـیرـیـسـهـ مـبـولـیـسـتـهـ کـانـ ، لـهـ روـوـیـ سـیـاسـیـهـ وـهـ ، بـهـ کـوـمـونـ پـهـ روـهـ نـاسـراـونـ .  
ده بـیـ کـاتـ تـیـپـهـ رـیـ ، چـهـ رـخـیـ نـوـزـدـهـ هـمـ بـهـ سـهـ رـچـیـ وـهـ چـهـ رـخـیـ بـیـستـهـ مـهـ  
سـهـ رـهـلـدـاـ ، تـاـ قـوـتاـ بـخـانـهـ سـهـ مـبـولـیـسـتـیـشـ لـهـ سـهـرـ کـارـبـکـهـ وـیـ وـهـ رـهـوـزـیـکـیـ  
نوـیـتـرـ لـهـ هـونـهـرـدـاـ جـیـیـ بـگـرـیـتـهـ وـهـ ئـهـ وـیـشـ سـوـرـیـاـ لـیـزـمـهـ . ئـهـ وـسـاـ نـهـ وـهـیـ  
سورـیـاـ لـیـسـتـ بـهـ دـهـ مـیـکـیـ لـهـ پـیـشـهـ وـاـکـانـیـاـ نـهـ وـهـ ئـهـ نـدـرـیـ بـرـوـتـوـنـ (۱۸۹۶-  
۱۹۶۶) ، رـاـ بـیـگـهـنـ کـهـ بـنـچـیـنـهـ رـیـباـزـهـ کـهـ بـانـ قـهـرـزاـرـیـ شـاـعـیرـیـکـیـ  
سـهـ مـبـولـیـسـتـهـ ، یـهـ کـیـ لـهـ پـیـشـنـگـهـ کـانـ ، مـهـ زـنـتـرـیـنـیـاـنـ : ئـاـرـتـیـوـورـ رـهـ مـبـوـ .

### هه میشه ویل

بـیـستـیـ ئـوـکـتـوـبـرـیـ ۱۸۵۴ ئـهـ فـسـهـرـ فـرـیدـرـیـکـ رـهـ مـبـوـ وـهـ کـهـ کـهـیـ قـیـتـالـیـ  
کـوـیـفـ دـوـوهـ کـوـرـیـاـنـ بـوـوـ ، لـهـ شـارـیـ (شـارـلـفـیـلـ) نـاـ وـچـهـیـ (ئـاـرـدـیـنـ) ،  
کـهـ دـهـ کـهـ نـیـتـهـ باـکـوـورـیـ فـرـهـنـسـاـوـهـ نـزـیـکـ بـهـ سـنـوـورـیـ بـهـ لـزـیـکـاـ . ئـهـ کـوـرـهـ  
نـاـ وـنـرـاـ (ژـانـ نـیـکـوـلاـ ئـاـرـتـیـوـورـ) . هـیـشتـاـ ئـهـ مـنـاـلـهـ کـهـ وـتـنـهـ ژـیـرـ رـکـیـفـیـ  
بـاـ وـکـیـ دـهـ سـتـیـ لـهـ خـیـزـانـهـ کـهـ بـهـ رـدـاـ وـهـ ، مـنـاـلـهـ کـانـ کـهـ وـتـنـهـ ژـیـرـ رـکـیـفـیـ  
داـیـکـیـاـ نـهـ وـهـ ، کـهـ کـچـیـ وـوـرـهـ مـوـلـکـداـرـیـکـیـ نـاـ وـچـکـهـ بـوـوـ . ئـاـرـتـیـوـورـیـ سـاـواـ  
بـیـرـهـ وـهـ رـیـیـکـیـ تـفـتـیـ لـهـ دـاـیـکـیـهـ وـهـ بـوـ دـهـ مـیـنـیـتـهـ وـهـ ، کـهـ ئـاـفـرـهـ تـیـکـیـ  
بـهـ زـهـ بـرـ وـ بـیـ بـهـ زـهـ بـیـ وـ ئـیـماـ نـدـارـ وـ کـوـنـهـ بـهـ رـسـتـ بـوـوـ .

رهـ مـبـوـ هـرـ لـهـ سـهـ رـهـتـاـیـ ژـیـانـیـ قـوـتاـ بـخـانـهـ یـهـ وـهـ وـهـ کـوـتاـ بـیـیـکـیـ  
ژـیـرـ وـ زـانـاـ خـوـیـ نـوـانـدـ . دـهـ سـتـیـ کـرـدـ بـهـ شـیـعـرـ دـانـانـ بـهـ لـاتـینـیـ . یـهـ کـیـیـ  
لـهـ شـیـعـانـهـ سـالـیـ ۱۸۶۹ خـلـاتـیـ یـهـ کـهـ مـیـ قـوـتاـ بـخـانـهـ کـانـ دـهـ پـچـرـیـ . سـالـیـ  
۱۸۷۰ مـاـ موـسـتـاـ یـیـکـیـ نـوـیـ ، ژـوـرـژـ ژـیـزاـ مـبـارـ ، بـهـ هـرـهـیـ ئـهـ مـوـسـتـاـ بـیـیـهـ

واتا شیعری سه ربہست - قه رزا ری سه مبولیسته کانه . یا ری کردن به ووشه و خو نزیک کردنده له ساویلکه بی گورانی میللی یمه وه دوو دیاردهی ترن که شکلی ئەم شیعره مۆر دەکەن . بی گومان لیکدانه وەی نا وە پوکی شیعری سه مبولی له هەموو شتی ئالوژتره . بەنەلام بە شیوه بەکی گشتی دەتوا نین بلیین که ( نھیئنی یەکان ) کە هەموو رۆژئی یەخ ما ن دەگرن کە ویکی سرکن که سه مبولیسته کان ثوینیان کە وتوون . بو گەیشتن پیان له دیو سنووره کاندەوه ، شاعیر ناچاره زمانیکی وە حی بەخش وشله ئاسا بە کاربینی ، کە له نوشته ئەچی و ناشی وە سفکدر بی ، واتا پەنا بە ریتە بەر سەمبول . خدو یەکیکە له دیو نھیئنی یانه . با یەخی خدو له وەدا یە کە دنیا ی دەره وە رووکەشیتی ، بەلام ئەم دنیا یە سنووری دیا ری کرا وە و ، دنیا ی نا وە وە ( خەیال ) سنووری نییە ، چونکه بوونی نییە ، له نا و خومادا نەبی .

لای سه مبولیسته کان کات دوژمنه ، بۆیە نابی پەرە بسینتی ، ئەگینا کاریک کە کەوتبیتە نا و دنیا یە کە وە کە پیوانەی سەرەکی تیا کاتە ، ناشی بە سەمبولی بژمیرری .

دنیا ی خورەلات لای سه مبولیسته کان ئەفسوونیکی تا بېتىیە هەبوو ، چونکه ناتوانین ئەم دنیا یە له نھیئنی جیا بکەین . لیرەدا دەتوا نم بلیم کە له کەله پووری شیعری کلاسیکی خورەلاتدا ، بەتا بېتى شیعری سۆفيگەری ، واتا کوردىش ، دەتوا نین نمۇونە پەيدا کەین کە نا وە روکیکی سەمبولی هەبی . بەلام دەربارە زمانەکەی دەبی ووریا بین ، چونکه شاعیرانی نویخوازی لای خۆمان ، سەمبول . واش بزانم زۆر جار شاعیرانی نویخوازی لای خۆمان ، نا وە پوک له لایی ، سەمبول و میتا فۆريشیان تېکەل بە یەک كردووه .

ھۆی جى پىقا بىم كردى ئەم رېبازە له فەنسا بەر لە هەموو ثوینیکی تر زۆرە ، بەلام دەتوا نین سیان دەسنىشا بکەین : يەکەم شیعری پارناسى گشت سەربەستىيکى دارشتى لە شاعير دەشارده و زۆر بە زەبر بۇو . شکل پەرشتى لە رادە دەدەری شاعیره پارناسى یەکان بەرەمە کان دەگەرەپەنە دەكەرە دەگەرە وە ، بە پىچەوانە وە ، شاعیره نویخوازە کان دەيا نويست شیعرى

ووتنيا ان پارناسى بسو، بهلام زوو وا زيان لى هينا بو ووتني شعرىكى تر. ئەم چواره: بودلىر، نيرقال، فيرلين، مالارمى و شاعرىكى تريش كه بوى نهلوا له پارناسى ها و چه رخدا بەرهەم بلاوكاتىدە دادەنرىن بە پيشەنگى سەمبولىزم لە شىعردا.

لەتەك ئەمانەدا، شاعىرى تريشەن لە ھەمان سەرددەمدا بە ھەمان شىوه شىعريان ووتلىقى، بهلام نا ويان كەمتر بريشكەدارە، وەك: ژيرمان نووفۇ (1852-192)، شارل كروس (1842-1888)، تريستان كوربيير (1845-1875)، لەگەل نەوهى پاشادا، واتەنەمە شاعىرانە كە بە (ھەرس هيئنا و Décadents) يش ناسراون، ھەموو رى و شويىنى دەرەخسى بۇ ئەوهى سەمبولىزم بېيى بە قوتا بخانە يېڭى با وەر پېڭراو. لە نېيۇ ئەم شاعىرانەدا ناوى كە ديار بىھى ڈان مۇرپياس، لۇران تا يىلاد، ژۇرۇز رۇدەنباش و ئېفرايىم ميكايىلە و، ناوى ژۇول لافورگ (1869-1887) لە پېشەنگى سەمبولىزم لە شىعردا.

### سەمبولىزم

وشهى Symbole لە فەرەنگدا لە Sumblon يۇنانىيە وە رىگىرا وە، كە ماناى نىشانە يا هيما دەبەخشى. ھەر لە يۇنانى كۆندا كاتى ئەركىكىان بە دوو كەس سپا ردوو، شتىكىان كردوو بە دوو پارچە، ھەر يەك لە كەسانە پارچەيەكىان بى بۇوه كە پىئى ووتراوە سەمبول، تا ئەگەر يەكىكىان بە ھا وەلەكەرى گەيشت بە سەمبولەكەدا بىنا سىتەوە.

سەمبولىزم، وەك شىوه يەكى دەربىرين لە چەرخى نۆزدەھەم كۆنترە و، لە فەلسەفە و ئايىندا خۆى نواندۇوە (بۇ نىمۇونە شىۋىرىي بىرەكانى ئىفلاتوون). بى گومان لە شەرىشا لە زۇر شوبىن و كاتى تىراد جىي پىئى دەدۇزىنەوە، بهلام نەبۇوه بە رىنزا زىكى باو. ئەگەر بە شىوه يەكى فەلسەفى لە سەمبولىزم بکۈلىنەوە دەبىنин كە ناتوانرى لە فەلسەفى ئايدىالىزم جىا بىرىتەوە، چونكە لى بۇ كۆتا يىدا ھەر گەرائى بە شوين ئايدىالدا.

لە رووی شەكلىشەوە تىكىشاپى كۆتى كېش و قافىھە، ئەمە يىان -

له بەرھەمەکەيدا پیّوهندیيەکى دۆزیوەتەوە لە نیوان ئە و ھەستە و ئەم ویّنەيدا ، لە راستیدا ئەمە خۆی کتو مت بىنەرەتى سەرەکىسى سەمبولیزمە بە ساکارترین شیوه . جا ئەگەر بەرھەمی بۇدلىرى و ھا و تا كانى لە پارناسى ھا و چەرخدا بەرچا و بکەويى ، ئەمە ئەمە و ھا ناگەيەنى كە ئەوانە شاعيرى پارناسى رەسەن بۇون، بەلکو واديا رە كە لايەرەكاشى پارناسى ھا و چەرخ دەرفەتى بۇوه بۇ گەيشتن بە خويىنەران . بۇدلىرى خۆى دەللى: من جوانى نابىن لە هەر كويىيەك كە كلۇلىنى بىت . جوانى تەواو ئەھريمەنە . هەر لە سەردەمی بۇدلىرىدا ناوى شاعيرىکى تريش ديا رە ؛ ئەويش ژىرار دو نېرقالە (1808-1855).

مردى دايىكى كاتى كە ساوا بۇو و ، عىشقە ناكامەكەي بۇ (جىنى كولۇن) تەواو ۋىيان و بەرھەمەكانى نىشانە ئەكەن . سالى 1840 (فا وست) (گۇته) لە ئەلمانىيە و دەكا بە فەرەنسى . نېرقال زۆر عاشقى خۆرەلات و سۆفيگەرى و ئا يىبىنە بە سەرقەۋەكاشى بىسووه ھ سەفەرەكەي 1843 ئى بۇ خۆرەلات تەواو كارى تى ئەكا . كۆتا يىيەكى ترا ژىيدى چا و ھېرى ئەم شاعيرە دەركا ، ئەويش شىت بۇون، ئىنجا خۇ خنکاندنه .

نېرقال ھەرچەندە ھا وەلى قوتا بخانەمى گۆتى بۇوه ، بەلام ناوى لە ناو شاعيرە پارناسەكاندا وونە . سەمبولىزم لە شىعى نېرقالدا تەنها ويىل بۇون نىيە ، بەلکو بىروا كردىنىكى تەواوه بە بۇوشى دنیا بىيىكى نەھىئى كە هي گيانانە . ئەگەر بمانە وە ئەم چەند ھەرزە دىرە لە سەر نېرقال كۆتا بى پى بىتىنин، دەبى لىلى گەرپىن خۆى بدو:

" ... خەو ڇىانىكى ترە (..) [كە] دنیاى گیانان [تىيايا] خۆىما بۇ ئا وەلا دەكا (..) من نازانم چۈنى باس كەم كە لە بىرەكاندا رووداوه زەمینىيەكان دەياسەتوانى لووتىان بىنى بە لووتى ئەوانەمى سەر سروشىيە وە . ھەست كەدن بە مە ئاستەرە لە وەي بە ئاشكرا روون كرىيە وە .. ."

لە يەكم بەرگى پارناسى ھا و چەرخدا و لەگەل بودلىرىدا ناوى دوو شاعيرى تريش سەرنج رادەكىش: پۇل ۋېرلىن (1844-1896) و ، سەتىفان مالارمى (1842-1898) . ئەمانە گەرجى سەرەتاي شىغىر

له کۆنە دولیل ( ۱۸۹۴-۱۸۱۸ ) او، تیوُدُور دو بانفیل ( ۱۸۹۱-۱۸۲۳ ) و، ژۆزی - ماریا دو هیریدا ( ۱۸۰۵-۱۸۴۲ ) زۆر دیاره . سالى ۱۸۶۶ - یەکم بەرگى ( پارناسى ھا وچەرخ Le Parnasse Contemporain ) کۆمەلە شیعرى نوئى ) دەرچوو، له دوو توپیدا بەرھەمى شاعیرە زۆر یا کەم یا هەر بە ناو پارناسى یەکاسى کۆکردو بۇوه . سەير ئەوهەيدە ، وەك پاشان دەبىنین ، كە لەو بەرگەدا ناو و بەرھەمى چەند شاعیرى بەرچا و دەكەۋى ، كە بە گۇپەلکەشى شیعرى پارناسى دادەنرىيىن . شیعرى پارناسى چەند لە رەووی ناوه رۆكەوه سارد و سې بوو ، ھېنىدەش فۇرمەكەمى رەق و تەق و بى دەرفەت بۇو، بۆيە زۆر نەزىيا . بەلام دەبىي بگەينە ۱۸ سەپتە مېھرى ۱۸۸۰ تا شاعیرى فەرەنسى ڇان مۇرىياس ( ۱۸۵۶-۱۹۱۰ ) لە پاشکۆئى ئەددەبىي رۆزىنا مەدى فيگا رۆدا مانيفېستى سەمبولىزم بلاو بکاتەوه ، بو ئەوهى سەمبولىزم بە رەسمى لەدا يىك بىيى . بەلام وەك لە دىريەكانى داها تۈودا دەبىنین ، شیعرى سەمبولىلىم مىزۇوه لە مىزۇرە .

### چەند ناوى

له یەکم بەرگى پارناسى ھا وچەرخدا ناو و بەرھەمى شاعيرىك قوت دەبىيەوه ، كە لەو دەمەدا زۆر ناسراو بۇو ، ئەويش شارل بۇدلۇر ( ۱۸۶۷-۱۸۲۱ ) . كە كاتى بۇدلۇر لە سالى ۱۸۵۲ تاقە دىوانەكمى ( گولەكانى خراپە - Les Fleurs du Mal ) بە چاپ گەياند ، فەرتەنەيىكى نايەوه كە بۇو بە هوئى كىشى كىشى بۇو بەردهم دادگا . هەر لە سەرەتاوه بۇدلۇر وەك ئىنسانىكى ياخى ھاتە پىش ؛ لە شیعردا ، لە رەخنەدا ، لە وەرگىرەندا ( بەرھەمەكانى رۆما ننۇوسى ئەمرىكى ئەددگار ئالان بۇ ۱۸۴۹-۱۸۰۹ ) كە فەرەنسى ( او ، بىيى كىرده وەيىش : لە ۋۇرىشى ۱۸۴۸ دا با رەووت دەستوپلى رەش كود بۇو . بۇدلۇر تىۋرىيەكى نوئى ھېننەيە شیعرەوه كە بىيى دەووتى ( پىيۇەندىيەكان ) ؛ واتا دۆزىنەوهى پىيۇەندى لە نىلوان ھەست و وىنەدا . ئەمە ئەوه دەبەخشى كە كاتى شاعير وىنەيى دەكىشى ، مەرج سېيە ئەو وىنەيە رەنگدا نەوهى ئەو با بهتە واقىعىيائە بىت كە تىا يىدا باس دەكرىن ، بەلكو دەربىرىشى ھەستىكى ناوه وەيدە ، كە شاعير

چه رخی نوزده‌هدما له فرهنسا گهشایوه . ئا لیره وه و ، له دوو تویی کیشا نی پورتیریتی يهکی له شاعیره سه مبوليسته ههره مازنه کا - نهود ده توانین له سه مبوليزم نزيک بیینه وه ، له سه رجا وه بیگه رده که خویه وه ، نهک له جوگا لیلہ کانی يه وه .

### سەرەتسا

شۇرىشى گەورەئى فرهنسا ( ۱۷۸۹ ) دنسیا کۆنی ناشت و ، جىگۈركىي به چىنەكانى نا و كۆمەل كرد . ئەدەبى فرهنسيش ئەم بارە نوييە لە با وەش گرت و ، كلاسيكى وەك شىوهى دەربىرىنى پېشىن تۈوردا و ، رومانتيزم بۇو بە دەمەستى كۆملەن نوئى ، كە ئەدەبىي مەزن ۋىكتۆر هوگو ( ۱۸۰۲-۱۸۸۵ ) چاكتىrin نموونەيەتى . گەشە سەندىنى رومانتيزم لەو سەرددەمدە بە دوور نى يە لەو ئا واتانەوە كە شۇرش وورۇۋا ئەندى و ، بۇون بە هوئى خەيال گەرم كردىنى ئەدىسا ن . بەلام روودا وەكان زۇر بە پەلە يەك لە دواى يەك رىزىيان بەست : گىلوتىن شۇرىشى شۇرۇشكىيى - تىشى دا پا چى ، بەرز بۇونەوە ئا پلىيونى يەكم و ، بۇونى بەئە ئىمپراتۆر ( ۱۸۰۴ ) ، بەزىنە زەبەلاھەكەي واترلۇو و ، گەرانەوە ئى بەنەمالە بۇورىسىن بۇ سەرحوكم ( ۱۸۱۵ ) ، لە ( ۱۸۳۰ ) و ( ۱۸۴۸ ) دا گەلى فەرنە جارىكى تر ھەلمەت دەباتەوە ، جارى دووه میان رژىيمى كۆمار دىتەوە گۇرى . بەلام كودىتاكى ( ۱۸۵۱ ) و بۇونى ئا پلىيونى سىھەم بە دووه ئىمپراتۆر لاي زۇركەس پۇپە ئىشقا سىكى بەمردەوا م بۇو . ئەمە ھەمووى واى كرد كە ئەدەبى با ويش بچىتەوە قاوخ و ، دوو دىارىدە خويان تىيا سەنوييتن : لە روماندا رىبازى ناتورالىزم ( بە عەرەبى: الطبيعىة ) كەوتە گەر ، كە دەيويىست وىنەسىكى دەقا و دەقى ئە و بارە بکىشى كە زۇربەي زۇرى گەلى فەرنى ئىچىرى بۇون ؛ واتا ھەزارى و كلۇلى . بەلام لە شىعەردا رىبازى پارناس Parnasse هاتە كايدوه ، كە ناوه كەى لە كېلىلى پارناس وەرگرتىبوو و ، لە مىتۇلۇزى گرىكدا نىئىتەجىي ئەپولۇنى خواى موسىقا و شىعرە . پەرنىسىپى ئەم رىبازە ئەدەو بۇ كە ھونمۇ بۇ ھوندەرە و ، شاعير نابى لە جوانى بەولادە هىچ مەبەستىكى ترى سبى . لە نىيو شاعير پارناسى يەكاندا ناوى تىوفىل كۆتىيى ( ۱۸۱۱-۱۸۲۲ ) و ،

## سەمبولىزم و رەمبۇ

### سمکو ناكا م

بۇچى دەنۈو سن: لە بەرچى رەمبۇ دەستى لە نۇو سىن ھەلگرت؟ لە كاتىكدا كە نازانىن لە بەرچى دەستى پى كرد؟ (زاڭ پېقىر)

سەرەتاي سالىھ کانى حەفتا لە كوردىستانى عىراقدا شىعىرى كوردى ، لە رووى شىوه کانى دەربىرىنەوە ، وەرچەرخانىكى تىزى بە خۆيەوە دى . زىاتر بەندى خويىندنەوە بە عەرەبى ، شاعىرە كوردەكان ويسىتىان فرياي ئەو شەمەندە فەدرە كەون كە لە ئەددە بى گەلانى پېشىكە وتۈودا دەمىكە ئىزگە جى هيشتىوو . بەلام ئەم تەقەلايە ، بە هەموو چاڭىيەكىيەوە ، لە شېرەبى و سەرلىشىوان بى بەش نەبۇو . ھەر ئەم رېبازە نۇيىھ بۇو بە ھۆي ھەرايى ، كە ھەر لە دەستە پاستە ئايىنىيەكانەوە تا چەپرەوە تازە پياكەوە تۈوهەكان ، ھەربىك بۇ قازانجىكى خۆي ، بە پاچ و قولنگ تىزى كەون . بەلام كەسيان نەميا سنتوانى رې گرىي خۆيان بەرنەسەر و ، كاروانى شىعىرى نۇي ، بە گشت چاڭى و خراپىيەكىيەوە ، رې خۆي گرتە بەر و ، پاش و پاش نەكشايدى دواوە .

ھەر لەم دەمەدا گەللى ووشە و تىرمى تا ئەو كاتە كەم بىسترا و ھاتىنە نا و فەرەھەنگى كوردىيەوە . يەك لەمانە ، كە شاعىرە نۇي خوازە كان زۆر پىيان لەسەر دائەگرت ، ووشەكانى رەمىز و رەمىزكارى بۇو . بە واتا يىكى تر ، شاعىرە نۇي خوازە كان دەيىان نوبىست بەرھەمەكانىان لەسەر قوتا بخانە سەمبولىزم Symbolisme ( سە عەرەبى : الرمزية ) حىسبىكى . بەلام بۇمان ھەيە پرسىارى بىكەين : ئا يىا بە راستى ئەوشىعرا نە سەمبولىن ؟ تاكە تاكە ، يَا سەرجم بۇيان ھەيە ئەو لافە لى بىدەن ؟ لە راستىدا وەلام دانەوەي پرسىارىكى وا گران نە لە توابانى مندايە و ، نە تارىكى وا كورت دەتowanى بە ھانا يەوە بىت . بەلام ھېنەدە بە خۆمدا رادەپەرمۇم كە نەختى رې بۇ وەلامدا نەوەي خوش كەم ... مىززو دەللى سەمبولىزم لە شىعردا ، وەك قوتا بخانەيى ، لە كۆتا يى

کیژوله‌ی بیله‌کان به شان، به دهست و پهنجه‌ی شمالیت  
چیک‌گولی رازاوه و حوان  
له‌سهر خو گول بزیویکه له مترگی سویسنه و هه‌لاله‌ی  
بون خوشی دیموی میرگه‌پان

بیکه ب، ئیکلیلی گوری، له گیانه‌لاشدا همیشه  
ناوی تؤی له‌سهر زوبان بسو  
به ده م وورینه‌ی مه‌رگه‌وه، یا دی بونی هله‌للان  
ناز و چریکه‌ی چاوكالان بسو

هو که‌وی خال میل نه‌خشین، ده ک فیدای په‌ر و بالت‌بم  
بفره بون تاشی سر لوتکه  
قاسپه‌ت بئی، با نگ‌که ما مه‌ستای زمان و میژوو گه‌رایه‌وه  
بو کوردستان جاریکی که

بلیه و روزه‌ی رووناکی تاریکی شه و راده‌مالی و  
وولات روشن ده بیت‌هه‌وه  
ئه‌وسا چروی پیره داری نه‌وه دو سی سالی (وه‌هی)  
سره‌له‌نوی ده گه‌شیت‌هه‌وه

هو لاو و روشن‌بیری کورد، هه‌رچه‌ن دوورم له کوردستان  
به‌لام به دل له گه‌لتانم  
زور خه‌فتارم نه‌متوانی، شانیک بنیمه ژیز ته‌رمی  
ما مه‌ستای میژوو و زبانم

به‌رهه‌می ساله‌های سالی دهست و پهنجه و بیر و هوشی  
ریزیان کهن له مه‌وزه‌خانه  
هه موو دیزه‌ی نووسینیکی، گه‌نج و ساماشی وولات‌هه و  
جی شانازی کوردستانه

ئا واته خوازى چلووره و ، زه رده‌ی هه‌تا و سه‌ر بـهـفـر و  
شـوـشـهـى سـهـهـلـبـهـنـداـنـتـ بـوـو

جار جار که دلی پـرـ دـهـبـوـوـ ، باـسـیـ بـهـسـهـرـهـاـتـیـ کـوـرـدـ و  
مـیـژـوـوـیـ کـوـنـیـ یـهـکـ یـهـکـ دـهـزـمـارـدـ  
بـهـ قـمـدـ گـهـلـایـ دـاـرـهـبـهـنـ وـ بـهـرـوـوـ وـ مـاـزـوـوـ دـاـرـسـتـانـتـ  
غـهـمـ لـهـ دـلـیـ جـوـشـیـ دـهـخـوارـدـ

باـنـگـیـ دـهـکـرـدـ هـوـ هـنـهـزـارـ مـیـرـدـ کـوـاـ هـهـزـارـ مـهـرـدـیـ جـارـاتـ؟  
کـوـاـ شـوـرـهـ سـوـارـیـ باـبـاـنـتـ؟  
کـوـاـ تـهـپـلـ وـ ئـالـاـ وـ دـهـبـدـهـبـمـیـ رـوـژـاـنـیـ خـانـ ئـمـحـمـدـ خـانـتـ؟  
کـوـانـیـ بـاـ بـاـ ئـهـرـدـهـلـاـنـتـ؟

ئـهـ ماـنـهـ گـرـیـ سـهـرـ دـلـیـ بـوـوـ . . . خـفـهـتـیـ شـهـوـ وـ رـوـزـیـ بـوـوـ  
هـهـتـاـ مـاـبـوـوـ لـهـ ژـیـانـاـ  
بـهـلـامـ کـهـ باـسـیـ خـدـبـاتـیـ لـاوـ وـ رـوـشـنـبـیرـیـانـ دـهـکـرـدـ  
شاـمـهـرـگـ دـهـبـوـوـ لـهـ خـوـشـیـانـاـ

هـوـ پـیـرـیـ موـغـانـیـ دـهـوـرـیـ ئـاـتـهـشـکـهـدـهـیـ خـیـلـیـ زـهـرـدـهـشـتـ  
بـهـ سـوـزـیـ گـاـتـهـیـ ئـاـ وـیـسـتـتـاـ  
خـوـتـ ئـاـسـاـیـ وـهـکـ دـلـسـوـزـیـکـ ،ـ کـوـرـیـکـیـ گـهـرمـ وـ گـوـرـ سـازـ کـهـ  
بـوـ شـینـ وـ پـرـسـهـیـ مـاـمـؤـسـتـاـ

کـاـکـهـیـ شـوـانـیـ شـمـشـاـلـ ژـهـنـیـ رـابـهـ مـهـرـیـ گـونـدـیـ (ـزـیـوـیـ)ـیـ  
مولـخـواـرـدوـوـیـ نـزـیـکـ گـوـرـسـتـانـ  
قـورـبـانـیـ پـهـنـجـهـ وـ لـیـوـتـبـمـ ،ـ دـهـیـ سـاـ ئـاـ واـزـیـکـیـ بـهـمـؤـزـ  
لـهـ جـیـاتـیـ تـهـلـقـینـ وـ قـورـئـانـ

دـهـ خـيـلـتـ مـيـمـكـهـیـ نـاـ وـ رـهـشـمـاـلـ ،ـ بـهـ کـاـسـهـیـ دـوـیـ خـمـسـتـ وـ خـوـلتـ  
جـوـشـ دـلـیـ دـاـ مـرـیـنـ وـهـ  
بـهـ بـاـیـ فـهـقـیـانـهـ وـ چـاـ رـوـکـهـتـ -ـ تـهـمـ وـ مـئـیـ هـهـرـدـوـوـ چـاـوـیـ  
راـ مـالـهـ وـ بـیـ رـهـوـیـنـ وـهـ

پیره مهگروونی گه ردن کهش ، دوستی دیرینی ( که رده که ) و  
نیشانه سنه ربه رزی وولات  
وا ما مُستای زمان و میژوو به کوّل و باری خمهوه  
بُوئیچگاری هاتمهوه لات

ئه وا توفیقی ( پیر و هبی ) کوچ و باری پیچایهوه و  
بهره و نیشتمان که وته ری  
دهسا توفیقی ( پیره میرد ) ریگای خیلی پی نیشان ده و  
بیگه یینه ههواری نسوّ

کوریک بهستن به یادی کون ، لەگەمەل ئەمین زەکى بەگى  
خاوهنى میژووی کوردستان  
چقلی چاوى دوزمنانه ، ثاخىكەی پیره مهگروون و  
مامەياره و گردى سەيیوان

با وەچەی ئەم سەردهمەی کورد گۆئى لە دەنگى هەرسىكتان بى  
داخى سەر دللى دوزمنانه  
دەستوورى زمان ، شىعر و میژوو ، سى چەپكە گولى گوشاده  
بەرهەمى ئىلۇھى مەزنە

ھو وولاتى نەوهى كاوه ، ئەوا روڭى جەركۈشەي  
دۇورە وولات و ئاوارە  
گەرايەوه بىگەرە باوهش ، بەينىكە ئىچگار بىناز و  
دلشكاو و خەفەتبارە

زۇر سەرۋى ئاتەشكەدەي ھەزار سالەي نا و دەرىبەند و  
ئەشكەوت و لاقەدىپالىت بىو  
شەو و رۇز ويردى دەمى بىوو ، شەيداي دىيمەنى دلگىرى  
لۇوتکەي بەرزى خال خالىت بىو

تىنۇوى ئاوى ساردى كانى و بەفرا وي تاڭە و قەملەزەي  
چيا و دۆلە كويستانت بىو

## بۇ كۆچى دوايى مامۇستا تۆفيق وەھبى

هاروار

"... وەكۈ ئاگا دارن ، بەداخوه ، ما مۇستا تۆفيق وەھبىما ن  
لە كىس چوو . بەداخوه زۆر شتەببىو دەبوا يە بىكىدا يە لە كاتى  
خۇيدا ، كە هيىز و گورپى تىا ماببۇ . بەلام ئەو شتانىم زۆر بە  
ئاللۇزكارى و پەرىپۇوتى بەجى ھېشتۈوه . جا نازانم ئەكەوييٰتە لايىكى و  
چى بەسەر دى! زۆرمە حەز دەكىد كە بىتوانيا يە لە كاتى خۇيدا ھەندىك  
لەو بەرھەمانەيم رىك بخستا يە . بەلام ئەوەندە تىكەل و پىكەل و  
بلاون و مسوەدەكانى تىكەل ئىشى يەك دوو كەسنى يە . دەبى چەند  
لىژنەيەكى بۇ پىك بەھىنرى بۇ رىك خىتن و ئا ما دە كردى ...

لەسەر داخوازى خۇى كە هەتا ما ببۇ زۆر جار دووبەارەى  
دەكىدەوە ، كە هيچ شتىك داوا ناكات جە لەۋەى كە مرد تەرمەكەى  
بېھنەوە بو كوردىستان و لەسەر چىاي پىرەمەگروون بىنیزىرى ... و  
ئاواتەكەى ھاتە دى و بە هييمەتى براادەران و دۆست و دلسىزەكانى  
تەرمەكەيان بىردىوە بو كوردىستان و لە پىرەمەگروون نىزرا .

بىر لە مردىنى كە هيشتا هوشى ما ببۇ ھەموو جارىك لىيەم نېرسى:  
تۇ خۆت خەلکى چوارتاي بۇچى تەرمەكەت نەبەنەوە سەرسىرى پاشت  
چوارتا ، كە ھا وينەھەوا رىكى زۆر خۇشە؟ ئەى ووت نە ... زۆر شىتم  
لەگەل پىرەمەگرووندا ھەيە . چونكە نىشا نەي بەرزى و گەردن كەشى  
كورده ، بۇيە حەز دەكەم لەۋى بىم . ئىنجا داواي ئەۋەى لىي كردى كە  
لە دواي مردىنى ھونرا وەيەكى بۇ پىشكەش بىكەم . منىش ئەم ووت : تۇ  
شويىنېكتە لېڭىزدا كە بەسەر ئەو لوتكەوە مەگەر كەۋى سەرتاشە  
بەرد و شوانە مەرى رىي زىيۇي و كچى بىلەكان بە شان بىننە لات .  
جە لەوانە لەو شويىنەدا چى دەس ئەكەۋى؟ لە وەرامدا ئەى ووت: جا  
چى لەوانە باشتىر ھەيە! ... وَا منىش لەسەر ئەو داخوازىي ئەم  
ھونرا وەم پىشكەش كەرد .

TELEPHONE 01-748 8330.

7 FERRY ROAD.

BARNES,

LONDON, S.W.13

۱۹۷۵ مایس ۲۸

### د. که مال فریادی خوشم دیستم،

که در ده سنتوره س زمان م کوئرد <sup>د</sup> که در س نوسم <sup>د</sup> تویله : یه لئک س بزر حامیستا کانه،  
و ه بزرگ ده کان. یه لئک س حامیستا کان که بعد امیر به لوبهه کان س  
ده سنتوره که یه، برپه و ده بقیه ل لکل لینه وه پیش س زمان م کورد پی، به هنری گه و دانیارندو.  
که ل ده سنتوره که دا پا ده پورتی.  
له پیش باسی سه رن و نه همه که س حامیستا گه و ده م علاوه شیب پیش بگه بازان سی  
په جهه پی ده کم، با پیشی به پیشان به نه وه س که میزد نایینه م کورد، ده دم که نایینه که  
خاده نی چه خوشیک س به رزو زانیار لک س فراوان بود له زانسته کانی ده سخانه که مانزا،  
ده سخانه = مدره سه. ده فیلان بزم نیشن، نه وانه س زادا هدل و ناقر لولی <sup>د</sup> « فرگه هی  
به هشیده به تاریک پیشه کانان » نه که به فرقانه <sup>د</sup> ». .  
علاوه شیب بگه بازان پیش ل زانه کانی کوردی و عاره پی و فارسی، شاهزادی جه غایباه مبابد  
نه نه سه و جه بیشی بز، ده ل مانه دا ده رزی ده وونه ده.  
نه وه لکستا گه ده که د تکا ده کم پیش پا بگه بینه، برپیشه ل فوتک پیشیکی م خانمه که ل باپیشان.  
و ه گه ل، هی صدمیش مه شپی، هی ده لوبهه پیشی له گه ل و پیشیک س سرف س پیش ده  
فیصل. همه هنر ل نه سنته متول به خردتی که بیشترم، ده کتبه که بیم دیبو.  
که مهاره نه و نه . پیش به خوانان ده سیتم، وه دو عالم هنر ده کم بزر هوتان و مال و  
مناکه که تان.

دستی و متن

د. که حال فوئادی هرشه ریست،

کاغذه زه که تا نم به هرچی و هرگزت، سپاس نهم چاره له که طایانه وه همه نه و نه تان بتو که  
دو کاغذه زم بتو بتوست. و هکو شوه نیزه هاک یه بیان یه بردوه نه ز له کاغذه نوشیدن نزه  
ستم. به لوم شوه همانی لادی. بعدم برو گور سستی ناکن له کاغذه نوشیدن ناردندا. نهم وایه  
نه، له باره ای نهم کرده وه نایه سنه نه وه ششتم همه یه به دهسته وه که بی کم به بیزه پیزسته  
هزاره، هه ویش نهیه هزاری مشکله به بجهبهه کده. دروس پاییزه شامه مه بیان ودت: « درمن »  
جهسته مبنی...»

نه بیکم به گل دانیاری یهشت چه شنده وه که دده ورق پایان یه پنجم همیش بیسته ده نگی  
نه و زه تله دایلهه کشنه دا که له کاتی کوچیده پاده وه شسته. به لوم هه فشوس، کاتی هه و زه هگم  
بیکسید بتو ده زرنگنتره هم که من هشتاد نزه فیاضم مانی که. پیشکشی کورده تازه له همه و هذله  
سادم نه کو دیه. هرزگه هه میرق. ده زکار بدهه بیکهان ببرایه به گشت. کارگرد و نوکه مو له فزاری میویسته داد  
که زیسته له وندنا له کاردا بدمایه له گل ل گلوهه ماناندا پیشکه وه بتو بوز کورنهه نگی (تفانه) کرده.  
شما پیشنه ده سه، پرسیاره کاشتاف:

نه د که سه ناد برانه که پیگوان نوکه مری عرسانیه بون، وانه له خزه قه همیش عرسانیه بون،  
نایان نام. به لوم لام ناستکاریه که عهد و لوا پاشا هه رگیز نه گارهه ته وه سلتانی، عهد و لوا  
پاشا سه برای همیر: نه محمد پاشا (نه میر) سه، ختنه بایان ۱۴۵۴ - ۱۴۵۶، قاده پاشا  
(پایهه گهوره عصیاند بدگ بایان)، نه محمد پاشا (باوک همداد) بدگ بایان. نه مانه کربلا سلیمان  
پاشا د ۱۴۵۶ سه رهخت - ۱۴۵۷ (حدیک) بون

عهد و لوا پاشا، دیاره، لا یانگری عرسانیه بره، چندکه له پیش شه به نقد و ماده که « پیزهه تو » دا (پدرهه لوق  
کویی) به پیوارسان. (۱۴۵۸) شپس گرد له که ته نه صد پاشا باید له « کله نزهه ده »، وه شکا، قادر  
پاشا ناد برپی کردن، والپی به غذا نه بیپی پاشا که سلطانیه گرت، لمپاش. هدلوتی نه محمد پاشا له پیزهه تو (۱۴۶۷)،  
عهد و لوا پاشا کرد به هاکی سلطانیه و ماک نوکه بیکی عرسانیه. نه مسا محمد پاشا برای تهگیری نی کرد.  
عهد و لوا پاشا بینی زانی، وه گرفت. محمد دیاش خود وه براز کرد له به نهیانه و پای کرد بتو بعده بتو لای نه بیپی  
پاشا. نه هیب پاشا عهد و لوا پاشا باانه بیغه غذا. نه هیب پاشا له پاشه نهوده که و پیزهه دست و پیو  
کرده

نهم فوج بایه، همه در کلیاف گشته وه له بعند او تیمسا عیل پاشا نادنکه ترکی کرد به  
منه سه پیغی سلطانی، وه بعم دواییه دا به وه که بایانی بینی، هیچ نهیه ». بد منه سه پیغی  
سلطانی، هده نا نه میتوه.

نهش شن، هطا پیکا پیغی شاد بینه وه به یهک و بتو و هیان خزه قه. فهره نگی کورد پیوین.

سەرەرای کۆمەلیک و تاری زمانهوانی و میزۆیی و فەلسەفی لە سۇقا رەکانى: گەلاویز (بەغدا ۱۹۳۹-۱۹۴۹)، دەنگى گىتىي تازە (بەغدا ۱۹۴۳-۱۹۴۷) و سومەردا (سومر گۇۋارىكى زانستىيە لە لايەن مدیرىيە الاشار القديمة وە لە بەغدا بە عەرەبى و ئىنگلېزى و فەرەنسىي و ئەلمانى لە سالى ۱۹۴۴ وە ناوبەناو بڵاوئەكرىتىدە .

گەلىك بەرھەمى بە دەنپۇسى ما وەتهو، كە پىويستىان بە بىزارىرىدىن و بىلەكىرىدىن وە هەيە. گەلىك پىروزەن نۇپىسىنىشى بە دەستەوە بو، بەتا يېتى لە بارەي بىنج و بنا وانى زمانى كوردى و گرا مەرى زمانى كوردىيەوە، كە بە ناتەواوى بە جىي ھىشتۇن، بۆيە زمانى حالى ھەميشە لەگەل نالىدا ئەيوت :

" وەكى نەھارى بەھارى درىيىز و پايىزى كورت

ئەمەل گەلىك و طەولىل و عەمەل كەمىك و قەصىر "

ما مۆستا وەھبى پيا وىكى كەلەگەتى بەخۇ بۇ، تا ئەم سالانىدى دوا يى تەندروستى زۆر باش بۇ، بىرى زۆر تىيىز بۇ. جىڭ لە زمانى كوردى و شارەزا يى لە زارا وە جۆربە جۈرەكانىدا، زمانى سوركى، فارسى، عەرەبى، ئىنگلېزى و فەرەنسىي ئەزا نى. شارەزا يى لە زمانى ئەلەمانى شدا ھەبۇ. سەرەرای پايدەر زى و زانا يى لەخۇ بايى نەبۇ رۇخۇش و قىسە خۇش بۇ، زۆر حەزى بە يارمەتى داتى خەلک ئەكىرد . وەك زانا يەكى پايدەر زى بۇ، ئەفسەرنىكى لېيھا توش بۇ. لە سى سالى دوا يى دا تەندروستى باش نەبۇ، بەتا يېتى پاش كۆچى دوا يى ئاسىا خانمىيەن، كە ئەوپۇش ژنېتكى زانا بۇ وە زۆر يارمەتى ما مۆستا وەھبىي ئەدا . ھەر دوكىيان دۇ كۈرپىان لىنى بە جىي ما وە : دكتور سزا كە پىزىشكە و سروش كە ھونەرمەندىتكى مۆسيقا رە .

لەگەل ئەم و تارەدا وىتەيەك و چەند نىمۇنەيەك لە نامەكانى ئەخەينە بەرچا و . ھیوا دارم كە بەرھەمە چاپ نەكرا وە كانى بە زويى بىزار بىكىن و بىلەكىرىن وە .

" كى نەپاي چەرخش شادمانى كەرد

كى داخى حەسرەت وە گلگۇ نە وەرد" \*

(\*) ئەحمد بەگى كۆماسى ( ۱۷۹۲-۱۸۷۶ ) .

یەکەمی سالی ١٨٩١ لە شاری سلیمانی ھاتوته دنیا وە . (وه‌هبي) نازناوه ، لەبەر زيرەکى و پىشکەوتى لە خويىندىدا پىى بەخشاھ .

پاش تەواوکردنى خويىندى سەرەتايى و ناوه‌ندى لە سلیمانى چۇتە بەغدا (١٩٠٥) ، تا سالى ١٩٠٨ لە قوتا بخانى سەربازى بۇوه ، ئەمجا بۇوه بە ئەفسەر لە سوپاى عوسمانىدا . لە سالانى ١٩١٣-١٩١١ لە شەرىھ کانى بەلقاندا بەشدار بسووه ، ئەمجا لە جەنگى جىها نى يەکەمدا . پاش جەنگ گەراوه‌تەوه بۇ عىراق و گەلىك فەرمانى مىرىي بىنیوھ . لە سالانى ١٩٢٩-١٩٢٥ بۇوه بە ما مۆستا لە كۈلىيچى سەربازى لە بەغدا ، ئەمجا كراوه بە (متصرف) اى سلیمانى . پاش راپەرىنى شەشى ئەيلولى ١٩٣٠ لە سلیمانى دور خراوه‌تەوه و رەوانەي دەرەوهى عىراق كراوه . ماوه‌يەك لە شام و بىرۇت بۇوه ، پاشان گەراوه‌تەوه بۇ بەغدا . لە سالانى ١٩٤٤-١٩٥٠ چەندجار وەزىرى زانيا رى و ئابورى بۇوه . لە ١٩٤٨-١٩٥٦ ئەندىدا مى (مجلس الاعيان) بۇوه . لە كاتى شۆرچى چواردەي تەممۇزى ١٩٥٨ لە توركىيا ئەبىت ، ئىتىر ناگەرىتەوه بۇ عىراق . ئەچىت بۇ لهندەن و لەۋى ئەمېنېتەوه تا كۆچى دوايى ئەكالات لە كانۇنى دووه مى ١٩٨٤ . لەسەر راسپاردهى خۆى تەرمەكەي براوه‌تەوه بۇ سلیمانى و لە چىاپىرە مەگرون نىڭراوه .

ما مۆستا وەھبى خاوهنى زانيا رايىھەكى فراوان بۇ لە زانستى زمانەوانى و فەلسەفە و مىژۇدا و يەكەم كوردە كە لەسەر بنا غەمى زانستى زمانە ئىندۇئەوروبىيەكان لە زمانى كوردىي كۆلىوه‌تەوه . لەم بارەيەوه گەلىك كىتىپ و وتارى نىسىوھ كە گرنگىتىرينىان ئەمانەن :

- دەستورى زمانى كوردى ، بەغدا ١٩٢٩ .

- خويىندەوارى باو (نوسىنى كوردى بە لاتىنى) ، بەغدا ١٩٣٣ .
- قواعد اللغا الکردية ١ و ٢ ، بىرۇت ١٩٥٦ .
- بەرام گور (بە عەرەبى) ، بىرۇت ١٩٥٧ .

- The Yazidis are not Devil-Worshippers , London 1962.

- A Kurdish-English Dictionary , Oxford 1966.

( بە ھاوكارى لەگەل : ( C. J. Edmonds

- Kurdish Studies I , London 1968.

تریش بگیرینه وه ، که په یوه‌ندیان به کوردی به که‌ی ما مۆستا وه هبی  
یه وه هه یه :

ما مۆستا وه هبی زۆر جار نوینه‌ری سلیمانی ئەبیت له په رله‌مانی  
سەردەمی پاشایه‌تىدا له عیراق . بەلام له هەلبازدنی سالى ۱۹۴۷ دا  
ناوی لەناؤ ئەو کەسانەدا نابیتکە خۇیان داناوه بىنە نوینەر .  
ئەم مە سەرنجى ھەندىك له خویندەوارە کانى ئەو سەردەمە  
رائەكىشى . ما مۆستا برايم ئەمەم بە ناوی خۆى و ئەو کەسانەوە  
ئەم بروسكەيەی له سلیمانی يەوه بۇ ئەنیرىت بۇ بەغدا :  
" بۇ شالىارە كۆنى ئابۇرى ، كاكل چىيە بۇ خۆنەپا لۆتنىان  
بۇ نوینەر ؟ " .

كا برا يەك ھەبۇ له بەغدا ، ناوی زەکى بۇ ، بە رەچەلەك كورد  
بۇ ، بەلام چونكى له بەغدا گەورە بۇبۇ ، كوردىي باش نەئەزانى ، زۆر  
بە گەرمى هاتوجۇئى دوكانەكەي وەستا بەشىرى ئەكرد . لەگەل بەشىر  
بە عەرەبى قسەي ئەكرد . كا برا ئەبىسىتکە له (يا نەي سەركەوتىن)  
دەورەيەك كرا وەتهوھ بۇ فيرکىدى زمانى كوردى بە سەرپەرشتىرى  
پا يەبەرز (معالى) تۆفيق وەھبى . بە پەرۋەھوھ ئەچىت بۇ يانە و خۆى  
نا و نۇس ئەكاد . پاش دۈپسى مانگ سەرېكى دوكانەكەي بەشىر ئەدات و  
بەو كوردىيە لەوي فيربووه دەست ئەكاد بە قسەكىرىن . بەشىر لىنى  
تىن ناگات ، بە عەرەبى تىنى ئەخورىت : انت شتگول " . ئەو ھەر بە  
كوردى وەلامى ئەداتوھ . له بەشىر وا يە عەرەبى لەبىر چۆتھوھ ،  
لىنى ئەپرسىت : تو ئەم كوردىيە له كوى فيرپۇيت ؟ " ، كا برا بە  
شان زىيەكەوە ئەلىت : له يانەي سەركەوتىن ، لاي پا يە بەرز تۆفيق  
وەھبى بەگ " . بەشىر ئەلىت : زەکى ئەفەندى ھەر ئىستا بە غار بچۈ  
بۇ يانە ، بلى وەھبى بىڭ ھا ئەمە كوردىيە كەت ، عەرەبى يەكەم  
بەھر وھ ؟ " .

ئەم قسەيەم بە ئامادە بونى ئاسىا خانمى خېزانى ما مۆستا  
وەھبى و سروشى كورى گىرایەوە ، زۆر بىكەنин . ما مۆستا وەھبى و تى:  
راستم پى بلى ئەو كەرە عەقلى بە قسەي وَا ئەشقا ؟ " .

ئەمجا با بىيەم سەر ئەفلى مەقصەد :

ما مۆستا وەھبى ناوی تۆفيق كورى مەعرۇفە . له ۳۱ کاشۇنى

نهت بیستووه ضرب المثل سهند قەل و بەردی"

له یەکیک له هەجووه کانی شوکری فەضلی (١٨٧٠-١٩٢٦) ش دا ئەم

فەرده ئەھینیتە وە یاد، کە ئەلئى:

"ھەر وەکو مەستىم بە فەردى ... خوا رۇخەم بەرى

"مولحیدى کافر مەزەبگەر تۈش بە ئە و مولحەق نەكەم"

گەر دىلنيا نەبوما يە لەۋەسى ما مۇستا وەھبى شەھزى لە شىعرە-  
کانى شىخ رەزا بۇ، ئەم باسم بەئەھينىا يە كايمەو، ھەر خۇلەبارەي  
شىخ رەزا وە گەلەنیك قىسى خۇشى بۇ گىزرا وەمەو، دامناوە لە وتارىكى  
تا بېھتىدا لمسەر شىخ رەزا و شىعرە بلاونەكرا وەکانى بىانلىقىم.  
پېش ئەۋەسى لە قىسى خۇش بگۈزىنەو، حەز ئەكەم لەبەارەي

ما مۇستا وەھبى شەوە چەند قىسى يەكى خۇش بگىزىمەوە :

سالى ١٩٤٢ ما مۇستا وەھبى وەزىرى زانىارى (معارف) بۇ، كورىئىك  
ھەبۇ خەلکى سلىمانى، ناوى مصطفى قادر بۇ، پىيان ئەوت (مچە قالە)،  
ئەۋسالە قوتا بخانە ئاماھىي تەواو كردى بۇ. لە بەغدا ئەجىتىھ لاي  
ما مۇستا وەھبى، تا يارمەتى بىدات بۇ وەرگەرتىن لە يەكىنلىك لە  
كۆلىيەتىھ كانى بەغدا. ما مۇستا وەھبى وا ناسرا بۇ كە ئەۋەندەي پىنى  
بىكەت يەرمەتىھ مو كەسىك ئەدات كە بچىت بىلە لاي. ئە و  
رۇزە زۆر كەس چوبۇن بۇ لاي، نەختىك ما ندوئەبىت، ئەلەنیت : كورم  
گەوادىيىكى كە نىيە بچە لاي؟ ؟ ئە ويش ئەلئى ، قورباڭ زۇزن ، بەلام  
تو لە ھەمويان باشتىرىت".

ھەر ئەۋسالە بە بۇنەي بىريا رى دا بەشكەرنى فەلەستىن و نۇئى  
كەرنەوەي پەيمانى ١٩٣٠ اى عىراقى ئېنگلىزىيەوە، لە بەشى زۇرۇشەرە-  
كانى عىراق خۆپىشا ندا نىتكى زۆر ئەكرا . بەرىۋە بەرى زانىارى (مدیر  
المعارف)ى سلىمانى ئەوكاتە (عبد المجيد حسن وەلى) بۇ، تەلەفۇن  
ئەكەت بۇ ما مۇستا وەھبى ، ئەلەنیت : قوتا بىيەكان دەواام ناكەن، ھەمو  
رۇزىك دىنە سەر جادە و ھاوار ئەكەن بىرپۇخى ... بىرپۇخى، نازانىن  
چىيان لەگەل بکەين " ما مۇستا وەھبىش ، كە ناسرا بۇ بە داھىنەرى  
زۆر وشە كوردىي پەتى، ئەلەنیت : پىيان بلى لەمەولا مەلەن بىرپۇخى،  
بلىن بىرمى ! ".

چونكە ھاتىنە سەر باسى وشە كوردىي، پەتى ، ئەبىت دو باسى

توخوا پیاو ده م ئەخاتە ده م جنیوفروشیکی وەک شیخ رەزا وە! با پیرم  
حەزى لە شەرەجتیو نەکردووه". پاشان واي پیشان دا کە ئەبىت  
شیخ مەبىتى لە مەستىيەكى تر بىت ، کە هەر لە و  
سەرددەمدا ژیا وە . ئەمجا وتى: فەرمۇ، ستابىشەكەي ئەحمد پاشاي  
با بان بخويىنەوە ، توخوا ئەمە ستايىشە!". هىچ دەنگم نەکرد ، بەلام  
ئەمزانى کە شیخ رەزا راست مەبەستى لە مەستىيە فەندىي با پىرى  
ما مۆستا وەھبى بۇوە . شیخ رەزا لە ھەجووھەكىدا ئەلىت:

"ھېننە... ھەتىوان بە ... چووه داکىسى

دەستىكى شكا بۇ بە مىنالى لە شەكىم دا

حەققەن کە مەجيىدى كورى زۇر طەبعى جەۋادە

سەد ... بە يەك لەحزە بە بى پۈل و درەم دا"

مەستىيە فەندى دەستىكى گۈچ بۇوە ، يەكىن نە كۈپكەن باشى ناوى  
مەجيد بۇوە ، کە براي رەشید مەستىيە و ھەردوکيان ئەبنە خالى  
ما مۆستا وەھبى .

كوا يە جارىكىان شیخ رەزا لە سلىمانى ئەبىت ، ئەچىت بۇ  
مالى مەستىيە فەندى ، ئەللىن لە مالنى يە . ئەوپىش وا تى ئەگات لە  
مالە و نايە و پىت بىبىتىت . لەسەر خواجا نشىنەكەي بىمەر مالىان  
دا ئەنېشى ، شتىك ئەنۇسىت و ئەلىت : باشە کە ھاتەوە ئەم نامىيە  
بەدەنئى ". نامەكەش بىرىتى ئەبىت لە ھەجووھ بەنا و باڭھەكى ، کە بەم  
جوّرە دەست پى ئەگات :

" دەستىكى ھەيە مەستىيە فەندى لە كەرەمدا

میوانى عەزىزى ھەيە دائىم لە حەرەمدا

ئەلەحق ڙنەكەي موشىقى دەر حەق بە غەريبان

سەد... بە رۇم داوه ، ھەزارى بە عەجهمدا "

وەک من بىستۇمە مەستىيە فەندى شەھىزى لە شەرەشىعەر كردووه .

ئەللىن جارىكىان لە مەجلىتىك دا رو ئەگاتە شیخ رەزا و ئەلىت :

" بۇ شۇرۇشى ئەستۇم دەخورى شەر ئەفرۇشى

با بىستەوە مەيدانى قسە گەر ھەيە مەردى "

شیخ رەزا شەدمە دەست بەم فەرددە وەلامى ئەدا تەوە :

" من داکى ھەزارى وەکو سۇم ... بە فەردى

# به بُونه‌ی کۆچى دوايى مامۆستا تۈفيق وەھبى يەوه ( ۱۹۸۴-۱۸۹۱ )

د. كەمال فوئاد

بەرلىن ۱۹۸۴/۴/۲۱

يەكەم جار مانگى نيسانى ۱۹۶۸ بۇ كەچاوم بە ما مۆستا تۈفيق وەھبى كەوت، لە مالەكەى خۆى لە لەندەن چاوه رېئى ئەكردىن. بەر لەوه دەمېك بۇ نا ويم بىستىبو، زۆرىش پەرۋىش دىتنى بۇم، بى- تايىبەتى چونكە زۆرى نۇسىنەكانىم خويىندبۇوه و سودم لىتى وەرگرتىنون. پاشئەوه هەرچەند رىيگام بکەوتا يە لەندەن زياتر لە جارىيە سەرم لىتى ئەدا. تا ئەو توانى نۇسىنى ما بۇ نامەمان ئەگۈزىيەوه، بەتا يىبەتى لەو سالانەدا كە لە زانستگەي سلىيمانى كارم ئەكرد ( ۱۹۷۴-۱۹۷۱ ). بەداخوه ئەو نامانەم لىم بەر دەستدا نىيە تا هەندىيەكىان بىخەم بەرچاوه، بۇ ئەوهى خويىنەرانى بەرپىز سۇدى لىتى وەربگرن، ئىستا تەنبا سى-چوار نامەم لە لايە، كە سالانى ۱۹۷۵-۱۹۷۴ بۇيى ناردۇم بۇ بەرلىن، ئەويىش لە وەلامى چەند نامەمەكى خۆمدا. ئەوهندەي بىم پىيويىستى بزانم لە پاشكۆي ئەم وتارەدا ئەيان خەممە بەرچاوه.

دواجار كەچاوم بە ما مۆستا وەھبى كەوت، مانگى نيسانى ۱۹۸۲ بۇ، لەگەل ماموستايان: برايم ئەممەد، عومەر دەبابە و حەممە رەسول ھاوار چۈپىن بۇ لاي. لە مالەكەى خۆى لەسەر جىيگا كەوتىبو، بەلام لە قىسە خۆشەكانى نەكەوتىبو. ئەيزانى من حەز لە شىعى شىخ رەزا ( ۱۸۳۶- ۱۹۱۰ ) ئەكەم، كە چاوى پېيم كەوت و تى: ئەزانىت شىخ رەزا بە درو خستوتەوه! ". مەبەسى لەو شىعەي شىخ رەزا بۇ كە تىايادا ئەلىت:

" پېير كە كۆكى و ... دورە لە مردن ھېشتا

ورده ئاھنگى دواى كۆكە نيشانە ئەجەلە "

جارىكىان لېم پرسى: ما مۆستا، من وەكى بىستومە با پېرتان ( لە دايىكەوه ) مەستىيە فەندى پىا ويىگى زانا و سى بىوهى بۇوه، ئەبى جىي كەردىيەت كە شىخ رەزاي بەو جۆرە لە خۆى وروۋاندۇوه! " و تى: جا

کورده‌کان و ما موستا کان .

من له کاروباری سیاسیدا هیچ کاتی‌ها و کاریم له‌که‌ل توفیق ووه‌هی نه‌بووه . به‌لام هه‌میشه حورمهت و ریزم کرتووه . وه که له پاش شورشی چوارده‌ی ته موزوی ۱۹۵۸ له له‌ندهن ما‌یوه دیسا نموده ئه‌وه‌نده‌ی پی‌نه‌چوو که مالی ووه‌هی به‌گ بو به یانه‌ی ئه‌وانه‌ی که حهز له شیعر و ئه‌دده‌ب و زمانی کوردی ئه‌که‌ن وه زۆربه‌ی ئه‌و کوردا نسمه‌ی تا مه‌زروی ده‌وروبه‌ریکی کوردانه بوون . منیش وه‌ک زۆربه‌ی دوسته‌کانی هه‌رچه‌نده ریم بکه‌وتایه له‌ندهن چا و پیکه‌وتئی توفیق ووه‌هی و گسوی گرتن له قسه خوشکانی یه‌که‌م کار بوو که ده‌ستم ئه‌دادیه .

له‌بدر ئه‌وه‌ی که مردن له چاره‌ی هه‌موومان نووسراوه و توفیق ووه‌هیش عومریکی دریزی به سه‌ریه‌رزی را بوارد ، هه‌رچه‌نده حه‌زیشم نه‌ئه‌کرد بمریت به‌لام که مرد پیتم خوش‌بوو که به دیاریه‌وه بـووم ، وه ئه‌وی شانا زی پیوه ئه‌که‌م ئه‌وه‌یه که نه‌نم هیشت لیره بـنیژریت و سدرکه‌وتم له‌وه‌دا که تدرمه‌که‌ی بـبریت‌وه بـو وولاته‌که‌ی خوی له‌سـه‌ر پـیره مـهـگـروـون ، ئـهـوـ کـیـوـهـ بـهـرـزـهـیـ کـهـ نـیـشـانـهـ بـوـونـ وـ مـانـیـ کـورـدـهـ بـهـ پـیـ وـهـ سـیـهـ تـهـ کـهـیـ خـوـیـ بـنـیـژـرـیـتـ .

جا به بـوـنـهـیـ چـلـهـیـ ئـهـمـ کـورـدـهـ دـلـسـوـزـهـ وـهـ دـاـواـلـهـ هـهـ مـوـوـ کـورـدـهـ زـماـنـهـ وـ پـیـپـوـرـهـ کـاـنـاـنـ ئـهـکـمـ کـهـ هـدـتاـ ئـهـتـواـنـ هـهـوـلـ بـدـهـنـ کـهـ بـهـرـهـ مـهـکـانـیـ بـبـنـ بـهـ ماـیـهـیـ پـیـشـکـهـ وـتـنـ بـوـ گـهـلـ وـ نـیـشـتـمـانـهـ کـهـ مـانـ کـهـ ئـهـمـهـشـ ئـاـ وـ اـتـیـ هـدـرـهـ بـهـرـزـیـ ژـیـاـنـیـ بـوـ بـهـ مـهـشـ ئـهـتـواـنـیـنـ سـزـاـیـ بـدـهـ بـینـهـ وـهـ .

مه زبه‌ته و ته لگراف نووسین بُو "عصبة الام" و دهولته به ریتانيا  
 بُو دا واکردنی ما فی ره وای خویان. لم کاته ناسکه‌دا به ریتانيا و  
 عیراق ویستیان له خوشه ویستی توافق و هبی و ناوبانگی باشی له  
 نا و کوردادا که لک وه رگرن به شکوه و بتوانی نه که هر ئه و هه رایه‌یان  
 بُو سکوژپنیتیه و به لکو هه لبزاردنیکی ناره واشیان بُو ریخات تا  
 بتوانن به پارله مانیکی ده سکرد به گورجی موعا هه ده که یان جی به جی  
 سکه‌ن و به رگی شه رعیتی له بدر هه لدروون. بُو یه جیهینانی ئەم  
 فرمانه گرنگه توافق و هبی‌یان له مایسی ۱۹۲۹ کرد به موته سه‌روفی  
 سلیمانی که به کووره‌ی ئاگره که یان دائده‌نا . به لام‌ها تنسی توافق  
 و هبی بُو سلیمانی له هه مwoo روویه وه پیچه‌وانه‌ی ئاواتی ئەم‌وان  
 به ری دا وه هه مwoo خه لکی کوردستان به مژده‌یه کی خوشیان زانی که  
 له کاتیکی وا ته نگانه‌دا کوردیکی وا به ناوبانگ و زیره‌ک و تیگه-  
 یشتولیان له ناودا بیت . جگه له وه ش توافق و هبی خوی که به رهئی  
 زور که س هر له سره‌تا وه په یوه‌ندی له گه ل سمرکرد، کانی بزووشنووه که  
 بووه و پرس و رایان وه رگرتووه که هاته سلیمانی و کاری گرته‌ده است  
 یه کدم ئا مانجی ئه وه بووه که خزمتی ئا مانجی گه ل و نیشتمانه که دی  
 خوی بخاته پیش هه مwoo شتیکی تر . بؤیه وه کیکیک که وته کار که بُو  
 ریکختن و به دی هینانی داخوازی‌یه کانی گه ل که دی ها تبیت . که  
 به ریتانيا و عیراق له وه گه یشت که توافق و هبی به خزمتی  
 کورده وه خه رسکه نه ک خزمتی ئه وه نان به پهله ئا خرى ئاغستوسی ۱۹۳۰ .  
 نه ک هر گواستیانه وه له سلیمانی له وه زیفه‌ش ده ریان کرد سره‌رای  
 هه مwoo ههرا و هوریا و دا وای خه لک بُو گیرا نه وهی .

توافق و هبی له جه زای ئه مهدا هه تا ئینقلابی به کر صدقیی  
 دوستی به ده رکراوی ولاتی و بر سیتی ما یدوه که به لای مندوه ئەم  
 ما وه یهی چهند ناخوشی خوی و خیزانه که دی تیا بووبیت ده ئه وه نانه  
 خیری بُو زمانی کوردی بووه چونکه خوی خه ریک کرديبوو به مهراقه  
 کونه که یدوه که زمانی کوردی بزار بکات . نووسینی کوردی پیشخاته  
 لوا ن پی بگه یه نیت . وه لم سالانه دا ماله که دی له گه ره کی سینه کی  
 به غدا بیو بیو به یانه لوانی کورد ، ئه و کوردانه که بُو خویندن  
 ئه چونه به غدا . هه روا بیو بیو به زیاره‌تگای شاعیر و ئه دیبـ

له ئەستەمۆول، له م کاتانەدا، بىستمان كەوا شىخ مەممۇدى نەمر حکومەتىكى كوردى دروست كردووه و تۆفيق وەھبى يەكتىكە لەو زا باتانەي كە لەگەللىرى.. ئەم حەزەرە هەمۆ زابته كورده كانى خستە جموجول، چونكە تۆفيق وەھبى زۆر بەنا وبانگ بىسو، وە بۇونى ئەو له لاي شىخ مەممۇد خوشى و ھىوا يەكى زۆرى خستە دەلما نەوه. وە لەو باۋەرەدا م كە ئەگەر تۈركەكان رىگەيان لىنى نەگرتىينا يە زۆرى ئەو زابتا نەي كە هەتا دوا يى لەگەل تۈرك مانەوە ئەگەر پانەوه بۇ وولات.

من يەكى بۇوم لەوانەي له سەرەتاي ۱۹۶۲ بە فيەرارى گەرپا مەوه بەغدا يەكمە كەس كە له وەزارەتى دىفاىى عېرەقا دا چاوم پىتى كەوت تۆفيق وەھبى و بەكىر صدقى بۇون. ئەمە له كاتىكىدا كە ئەتوا نام بلېيم لە صەدا حەفتا و پېينجى زابته كانى مەقهپىری وەزارەتى دىفاع كورد بۇون. وە ئەمانە دەستىكى درېژيان بۇو له دامەزراندىن و رېكخستان و فېرگەندى جەيشى عېرەقا دا. وە ئەمە يەكمە چاۋپىكە وتن و قىسە كەردىن بۇو لەگەل تۆفيق وەھبىدا، وە لەسەر تەلەفۇنى ئەوان بۇ "نۇورى سەعىد" كە مودىرى شورتەي عام بۇو لەگەل تۆفيق وەھبى چووم سو لاي و لە چاۋپىكە وتنەوه دوا رۆزى من گۇرما، وە وازم له خزمەتى جەيش هيىنا، وە بۇوم بە زابشى پۆلىس.

له ۱۹۶۹ مەسىلدەي گۆرىئىنى پەيمانى بەرەيتانىا و عىّراق، وە دووا يى هيىنا بە ئىينتىدا ب و ئىعتراف كەردىنى بەرەيتانىا بە دەولەتى عىّراقى سەربەخۇھاتە ئاوانەوه. كە ئەمە پەيوەندىكى زۆر زۆرى بە دووا رۆزى كوردى كوردستانى خوارووه وە بۇو كەوا بە پىتى بېرىارى كۆمەللى نەته وەكان "عصبة الامم" وە لەسەر بناگەمى پا راستىنى ما فى نەته وَايەتى كورد و دامەزرا ندى ئىدارە يە بە دلى دا نىشتۇوه كانى كوردستانى خواروو (وولايەتى مۇوسىل "بەسترا بۇو بە عىّرا قەوه وە رەدووكىيان خرا بۇونە زېر ئىنتىدا بى بەرەيتانىا لەزېر چا و دىريىي "عصبة الامم"دا. وە ئەم گۆرىئىنى بىنەرەتىيە كە بەرەيتانىا و عىّراق خەرېك سوون لە بەينى خۆياندا، بە بىتىھا و كاۋارى و ئاكادا رى كورد، جىيەجىي بەكەن، ھەستىكى كوردا يەتى قوقۇل و فراوانى كلىپە پى سەند له سەرانسەرى كوردستاندا. خەلکى كەوتتە خۆكوكەرنەوه و

## بیره و هری

### عهلى کە مال

لام وا يه ما مۆستاي گەورەي كورد تۆفيق وەھبىي خوالى خوش بۇو نەكەر لاي ئېيەرى بەرپىز، كەوا دۆست و خۆشە ويستى بۇون، لاي ھەموو كوردىيىكى دلسوز ئەۋەندە ناسراوه ھىچ پېيويست بە پى تاساندن ناکات. تەنبا ئەۋەي كە لە بارەت تۆفيق وەھبىيە وە پېيويستى بە باسکەردن و لەسەر دووان و لېكۆللىينە وەھدەيە ئەو بەرھەم و نۇوسىنا نەيەتى كە ھەموو ژيانى لە پېيەندا بەخت كرد. بەلام وەكۈ ئەمان بەداخەوە ئەو فرمانە گەرنگە نە لە وزەيى منايە و نە دانىشتەنە كە شمان بۇو ئەۋەيە، وە ئەركى ئەو فرمانە گەورە و گەرنگە ئەكە وىتە ئەستۆي كور و كچە شارەزا و لېزانە دلسوزەكانى نەتەوە كەمان وە هيوا م ھەيە لە پېيەندا وى خزمەتى گەلهەكەيان و بە فيرپۇنەچۈونى رەنجى ما مۆستاي گەورە تۆفيق وەھبىدا بە ھىچ جۇرىك درېتىغى نەكەن.

جا سەبارەت بەو هوپىانە ئەوى من ئەمەوى بىاسى بىم لە بارەت خوالى خوش بۇوە و جۆر و چۈنىيەتىي ناسيا وىي خۇمە لەگەللىدا، وە ئەو سەرنجاتى دۆتايەتىي دوور و درېzman لە مىشكما پەيدايى كردووە بەرا مېرى .

تۆفيق وەھبى بە هوئى ھەلکە وتۇوېي و لېپەشا وەبىيە وە ھەر لە زووە وە لەنا و خويىندهوار و تازە پېيگە يشتووى كوردا نا وى دەركىدىبوو. بىرمە لە مەكتەبى ئىيعدادى عەسكەری بۇوم لە بەغدا ئەمان بىيىست كەوا فوئاد مەستىي رەفيق مەكتەبىم برايەكى زۇر زىرەكى ھەيە ئەركانى حەربە. رۆزىك بىيىستان كەوا براڭەي فوئاد ھاتتوو بۇ مەكتەبە كەمان دەرسى (سەھەريات) ئەللىيە وە بە ئاخىر سەنف. ھەموو شاگىرە كوردىكە كان را وەستان كە ئەم كوردى ھەلکە وتۇوە بېيىن . كە لە سەنفەتە دەرى لاوىتكى قۆز و شۆخ بە جلى زابى عوسمانىيە وە نىشانى سەنفي مەترالىيۆزى ھەلگەرتۇوە، زۇر لە لامان شتىكى خوش بۇو... لە پاش بىيىستان دوواى چەند جى گوركىيەك كراوه بە زەليت روکنى جەبەھى فورات . پاش بىرا ندوھى شەپى يەكە مى جىيەنلى تۆفيق وەھبى بۇ بەشدارى كردن لە خزمەتى گەل و نىشتەنە كەيدا لە ١٩١٩ ئەگەر يە وە شارى سلىيمانى، كە سەرچاوهى بزووتەنە وە كوردا يەتى ئەبى لە كوردىستا نى خواروودا .



## مامۆستا تۆفیق وەھبى کۆچى دوايى كرد

سەعات يەك و نىوي دواى نىيەر رۆزى رۆزى پىنچىشەممە ، رېكەوتى ۱۹۸۴/۱/۵ ، ما مۆستا تۆفیق وەھبى لە نەخۆشخانەي مىۋۇل سىكس ، لە لەندەن ، كۆچى دوايى كرد . ئەم ھەوالىنە ناخۆشە زۇو دەنگى دايەوە و خەلک لە چەندان شار و ولاتىمۇه روويان لە لەندەن كرد . لەسەر وەسىتى خۆى تەرمەكە برايەوە بۇ كوردىستان و لەۋىش خەلکىكى زۆر ھاتن بە پىرىيەوە و پاشان لەگەللىا چۈون بۇ پىرە مەگروون بۇ ئەوهى بە يەكجارى بە خاكى كوردىستانى بىسپىرن .

رۆزى ۱۹۸۴/۲/۱۳ ، لە لەندەن ، كۆبوونەوە يەك پىك ھات بە بۆنەي چەلەي كۆچى دوايى ما مۆستا تۆفیق وەھبىيەوە . مامۆستا عەلى كەمال و ما مۆستا ئىبراھىم ئەممەد و كاڭ دارا عەتار و تاريان تىئىدا خويىندهوە . ما مۆستا ھاوا رىش شىعرييکى خويىندهوە ( كە لەگەل و تارەكەي ما مۆستا عەلى كەمالدا بلاۋىان دەكە - يىنهوە ) . ھەروەھا كاڭ كەمال فۇئاد و تارىيکى خۆى و دوو نامە و وينەيەكى ما مۆستا تۆفیق وەھبىي بۇ ناردووين .

رۆزى ۱۹۸۴/۳/۴ لە ئەنسىتىتۇرى كورد ، لە پارىس ، پاش پېشان دانى فلمىك لەسەر ما مۆستا وەھبى ، خانم جۆپىن بلۇ - و تارىيکى بۇ ئامادە بوان خويىندهوە ، كە دەقدەكە لە بەشى كرمانجىي ژۇورۇو ئەم ژمارەيەدا بلاۋ دەكەيىنهوە . بە كۆچى دوايى ما مۆستا تۆفیق وەھبى مەرقىيەك و زانا - يەكمان لە كىيس چۇو كە هەتا دلى لەكاردا بۇو نەددەوەستا لە خزمەتى زمانى كوردى .

(ھيوا)

ههندی تیبینیشم له سه ره ردوو لاینه کهی رهیه . به لام لاینه نی گهش و روونا کی زور له ورده تیبینیانه زالترن .. حذر ئەکەم لە وەش دلنيا بیت کە ئەگەر هيوا يەکیک نەبی لە گۇقا رە هەرە چاکە كانى ئەم سەرەمەی گەلهەمان ، بى گومان يەکیک ئەبی له و گۇقا رانەی کە ناویان له مىژۇوي ئەدەب و كولتوورى گەلهەمان ناسرىيته وە .

فازل كەريم ئەحمد

### گۇقا رى " ھەلۋىست "

بە هەول و كۆشى دلىزىانەي چەند روونا كېرىيکى ئاوارە گۇقا رىكى نۇئى هاتە سەر خەرمانى كولتوورىي گەلهەمان . ناوي " ھەلۋىست " و هەموو وەرزى جارىك دەرەچى . ژمارە يەكى ، كە لە بەھارى ئەمسالدا گەيشتە دەستى خويىنەران ، جىڭ لە روون كەردىنەوهى ھەلۋىستى لېپرسراوانى ، چەند وتا رىكى گىرنگ و بەسۈودى تىيدا يە ، وەك : سەرەتاي ئىش ، بۇتانى لە نىوان خالى يەكەم و بازىنەدا ، راپەرىنى گەلى كورد لە سالى ١٨٨٠ ، نۇوسىنىي جەللىي جەللىل ، بەرە و مروقى گەردوونى و هەرۋەھا پرۆگرا مى " ئا مۇزگانى رۆشنېرى و ھونەرى كورد " ( ئا رۆك ) .

لە كاتىكدا كە ئەم ھەوالە خۆشە بە خوبىنەران را دەگەبەن ، پې بە دل ئا واتى سەركە وتن بىز ئەم روونا كېرىرە دلىزىانە دەخوازىن و ئۇمىيە وارىن رىشەي ھا كارىيەكى توند و بەتىن لە نىوانما ندا داكوتىن بە هيواي ئالۇگۇركردىنې بېرۇبا وەر و خزمەتى بىزىر و كولتوورى چەوسا وەي گەلى كورد .  
( هيوا )

nûsin) dewrî serekî debînê. Boye legel giringî dan be wişê - pêwîst e giringîş be - (giramer) wate rêzmanekî yekgirtû bidrê, we be lay minewe, lem layeneşewe, pêwîst e zimanî edebî yekgirtû, wek le Iraq da gelale bûwe, bikrête nimûne, be taybetî ke şêweyekî pêşkewtûwe we le heman kat da asanî wergirtûwe, wek nebûnî nêr û mî bo nimûne. Boye cêgey xoyeti ke hewl bidrê rêzimanekî kurdî wa gelale bikrê ke bitwanê şêwekanî tirîş bigrête xoy.

Derçûnî Hîwa be sê mang carêk zor keme we legelxêrayî em serdemeda naguncê. Boye we bizanim govareke dewrêkî ewto nebinê ger be lay kemewe nekrête sê mang carêk. Ca ger (îmkaniyatî) darayı tan hebê, wa bizanim îmkaniyatî nûsîniş debê.

K.M.

Namey duwem

« ... jimare yekî Hîwam pê geyişt, zor supas û be germîş pîrozbayî tan lê ekem bem boneyewe. Hiwadar im derkawtinî Hîwa bibête handerêk bo hemû nûser û şaire dilsozakan û bibête kokerewe û bizwêneryan bo ziyatir geşepêdanî kultûrî gele man.

Be giştî şewe we nawerokî govareke be dil bû, herçend hendê têbînîm le ser herdu leyenekey heye. Belam layenî geş û rûnakî zor lew wirde têbiniyane zaltirin ... Hez ekem leweş dilniya bît ke eger Hiwa yekêk nebê le govare here çakekanî em serdemey gelke man, bê guman yekê ebê lew govaraney kî nawyan le mêtûy edeb û kultûrî geleke man nasirêtewe.

Fazil Kerîm Ehmed

کوردانه‌ی (تورکیا و سوریا) رونوں بکریت‌وه و نزیک بوونده‌وه لـه زمانی ئەدەبی یەکگرتووه‌وه و فیربوونی که تاکه ریگایکه بـو شاره‌زا بوون له کەلچه‌ری ئیستا مان - ببیتە ئا مانجی سره‌کی هیوا و - ئەنستیتووی کورد. بـویه نووسین به پیتى (عەرەبی) زۆر پیویستترە بو ئەوهی نهوده کانمان له میراتە دانەبرین و ئەوانەی شاره‌زاشى نین بتوانن کەلکى لـی وەرگرن.

گرنگی دان به زمان و هەولـدانی نزیک کردنه‌وه و یەکخستنەوهی شیوه‌کان و دروست کردنی فەرەنگىکى گشتى - کاریکى پیروزه - بـلام دیساـنـهـوـه (شیوه‌ی نووسین) دهورى سەرەکى دەبىنى، بـویه لەگەل گرنگی دان به وشه - پیویستە گرنگىش به - (اگرا مەر) واتە ریزمانىکى یەکگرتوو بدرى ، و به لاي منه‌وه، لم لايـنـهـشـهـوـه، پـیـوـیـسـتـەـ زـمـانـى ئەدەبی یەکگرتوو، وەک لە عـىـرـاقـداـ گـەـلـلـەـ بـوـوـهـ، بـکـرـیـتـەـ نـمـوـونـهـ، بـهـ تـاـيـبـتـىـ کـهـ شـبـوـهـ يـهـكـىـ پـیـشـكـهـ وـتـوـوـهـ وـلـهـ هـمـاـنـ کـاتـدـاـ ئـاسـانـىـ وـهـ رـگـرـتـوـوـهـ، وـهـكـ نـهـ بـوـوـنـىـ -ـ نـبـرـ وـ مـىـ -ـ بـوـ نـمـوـونـهـ. بـوـیـهـ جـیـگـەـیـ خـوـیـتـىـ کـهـ هـەـوـلـ بـدـرـىـ رـیـزـمـاـنـىـکـىـ کـورـدـىـ وـاـ گـەـلـلـەـ بـکـرـىـ کـهـ بـتـوـانـتـىـ شـیـوهـکـاـنـىـ تـرـیـشـ بـگـرـیـتـەـ خـوـىـ .

دەرچوونى - هیوا - بـهـ شـەـشـ مـاـنـگـ جـاـرـیـکـ زـۆـرـ کـەـمـ وـ لـەـگـەـلـ خـىـرـاـيـ ئـەـمـ سـەـرـدـەـمـدـاـ نـاـگـوـنـجـىـ. بـوـیـهـ وـاـبـزاـنـمـ گـۇـقاـرـەـکـ دـەـوـرـیـکـىـ ئـەـوـتـۆـ نـاـبـىـنـىـ گـەـرـ بـەـلـايـ کـەـمـوـهـ نـەـکـرـیـتـەـ سـىـ مـانـگـ جـاـرـیـکـ . جـاـ گـەـرـ (ئـىـمـكـاـنـىـاتـىـ) دـاـرـاـيـتـاـنـ هـبـىـ، وـاـبـزاـنـمـ ئـىـمـكـاـنـىـاتـىـ نـوـوـسـىـنـىـشـ دـەـبـىـ .

ك . م .

### ناھى دووه

" ... ژماـرـهـ يـدـکـىـ هـیـواـمـ پـىـ گـەـيـشـتـ زـۆـرـ سـوـپـاـسـ وـ بـهـ گـەـرـمـىـشـ پـیـرـۆـزـبـاـيـتـاـنـ لـىـ ئـەـكـەـمـ بـهـ بـوـنـهـيـهـوـهـ . هـیـواـدـارـمـ دـەـرـکـەـوـتـنـىـ هـیـواـ بـبـیـتـەـ هـاـنـدـهـ رـیـکـ بـوـ هـەـمـوـوـ نـوـوـسـەـرـ وـ شـاعـىـرـ دـلـسـۆـزـەـکـانـ وـ بـبـیـتـەـ کـۆـکـەـرـەـوـهـ وـ بـزوـیـنـهـرـیـاـنـ بـوـ زـیـاـتـرـ گـەـشـپـىـدـاـنـىـ کـولـشـوـرـىـ گـەـلـەـکـەـمـانـ . بـهـ گـشـتـىـ شـیـوهـ وـ نـاـوـهـرـۆـکـىـ گـۇـقاـرـەـکـەـمـ بـهـ دـلـ بـوـوـ، هـەـرـچـنـدـ

## NAMEY HAWRÊYAN

*Paş derçûnî jimare yekî «Hîwa» çend nameyek man le hawrêyanewe pê geyişt, tiyawda ray xoyan derbarey ew Jimareye derdebrin. Ëmeş waman be baş zanî em du nameyey xuwarewe bixeyne ber destî xôneran û le heman kat da dûpatî bi bikeynewe ke laperekani em govare kiraweyen bo hemû core rexneyeki lépirsiraw, hemû core birûrayek ke geşe pê danî kultûri gelî kurdî kir-dibête binaghey hewl û koşîşî xoy.*

*Zorbej biraderan lew rayey kak K.M. dan ke salî du Jimare zor kem e ; xoşman ew raye de rast dezanîn. Belma, bedaxewe, komalé kosp hen ke, heta ésta, le régay amadekirdinî salî du Jimare ziyatir westaw in. Hîwadar in le dahuşyekî nizik da hendê lew kospane text bikeyn û be lanî kemewe salî sê Jimare lem govare pêşkeş be xôner bikeyn.*

HÎWA

Namey yekem

« ... Jimare yekemî Hiwam bînî. Karekî baş e, gerçi çawerêm dekird zor be héztir û pêztir bê. Şitî zor lawazî têda ye. Cige leweş ewe rast niye ke (kelçer) rûnakbîrî kurdî wa nîşan bidrê le (sifrewe) dest pê deka ... Ëme esta zimanêkî edebîy zor pêşkewtû man heye ke le Iraq û Iran da hezaran kitabî pê nûsrâwin û be lay kemewe le sal 1918ewe le Iraq da her berdewam e we berew pêşawe. Boye be lay minewe - mîratî neteweyî man be şeweyekî serkî biritîye lew kelçerey bew zimane edebîye nûsrâwe, pêwîst e em rastiye bo ew bira Kordaney (Turkiya û Sûreya) rûn bikrêtewê û nizik bûnewe le zimanî edebî yekgirtûwewe we fêrbûnî ke teke rîgayeke bo şarezabûn le kelçerî ésta man - bibête amancî serekî Hîwa û Enstitûy Kurd. Boye nûsin be pîti (erebi) zor pêwîstire bo ewey newekan man lew mîrate danebrêñ û ewaney şarezaşî nîn bitwanin kelkî lê wergirin.

Giringî dan be ziman û hewldanî nizik kirdinewe we yek xistinewey şewekan û dirûstkirdinî ferhengêkî giştî karékî pîroz e, belam dîsanewe (şewey

## نامه‌ی هاوریان

پاش ده رچونی زماره یه‌کی "هیوا" چند نامه‌ی کمان له  
ها وریانه وه پی گهیشت، تیایدا رای خویان دهرباره‌ی ئه و ژماره‌یه  
ده رده برضن . ئیمه‌ش واما ن به باش زانی ئه دوو نامه‌ی خواره وه  
بخه‌ینه بدر دهستی خوینه‌ران و له همان کاتدا دووباتی بکه‌ینه وه  
که لابه‌ره کانی ئه گوّقاره کراوه‌ن بو همو جوره رهخنه‌یی‌کی  
لیپرسراو، ههمو جوره بیرو را یه‌ک که گه شه‌پی‌دانی کولتوروی گه‌لی  
کوردی کردبیتله بهردی یناغه‌ی هه‌ول و کوششی خوی .

زوربه‌ی برادران له و رایه‌ی کاک‌ک.م . دان که سالی دوو  
ژماره زور که مه . خوشمان ئه و رایه به راست‌ده زانین . بسلام ،  
بهداخه‌وه، کومه‌لی کوسب‌هن که، ههتا ئیستا، له ریگای ئاما ده  
کردنی سالی دوو ژماره زیاتر وه‌تاون . هیواداریمن له  
داها توویه‌کی نزیکدا ههندی له و کوسبانه تەخت بکه‌ین و به لانی  
که مه و سالی سی ژماره لەم گوّقاره پیشکه‌ش به خوینه‌ر بکه‌ین .

( هیوا )

### نامه‌ی که

" ... ژماره یه‌که می هیوا م بینی . کاریکی باشه، گه‌رجی  
چاوه‌ریم ده‌کرد زور به‌هیزتر و به پیزتر بی . شتئی زور لاوازی  
تیدایه . جگه له‌وه‌شئوه راست‌نیه که (که‌لچه‌ر) روونا کبیری  
کوردی وانیشان بدری له (سفره‌وه) دهست پی ده‌کا ... ئیمه ئیستا  
زمانیکی ئه‌ده‌بیی زور پیشکه‌وتومان هه‌یه که له عیراق و ئیراندا  
ھه‌زاران کتیبی پی نوسراون و به لای کەم‌مەوه له سالی ۱۹۱۸ وه له  
عیراقدا هه ر به‌ده‌وامه و به‌ره و پیش‌هه‌وه چووه . بؤیه به لای منه‌وه -  
میراتی نه‌ته وه بیمان به شیوه‌یه کی سره‌کی بريتی‌یه له و که‌لچه‌ره‌ی  
به و زمانه ئه‌ده‌بیسیه نوسراوه، پیویسته ئه م راستیه بو ئه و برا

35	رۆژه‌ن بەرتاس	ل سەر پا تىيى چەند گوتىن
39		بنەفشا نارىن و جەمبەلىيى ھەككارى
55	شاھينى سوّره‌كلى	جەتا پىيغەمبەران

### ھەلبەست

61	عوّسما ن سەبرى	زمان
62	رەشيد سموّ	بىانى
64	جا نکورد	وەلاتىي زا يىينىن تەزە
65	ريّزان	قى پەسانى
66	ئە مىين س. سەيد دو	ھەۋالا بن
69		پرتووكىن نۇو

### دوملىكى

79	چەلادەت بەدرخان	زا رى دوملى و مەولۇودا عوسما ن ئەفەندى
88	مالكىسانىز	دەملکى ميان د جىا ييا فاتشان
106	حەيدەر	ئەى وەخت
107	عەلى كلچ	دەوا مخەملى دە
109	زلفى	فۇل كلۇرى كوردى ئەبە زاراقا دەملکى ۲

## ناوه روک

### بهشی کرمانجی خواروو

نامهی ها و پریان

٦

ما مؤستا توفیق و هبی کوچی دوا بی کرد

بیره و هری  
عملی که مال

به بوئنه کوچی دوا بی ما مؤستا توفیق

وهبی یه وه (١٩٨٤-١٨٩١) د. که مال فوئاد

بو کوچی دوا بی ما مؤستا توفیق و هبی هاوار

لیکولینه وه

سه مبولیزم و ره مبو  
روشنایی و تیشك، سه رنج و ره خنه له

لیکولینه وهی چیروکی کوردی له عینرا قدما

د. جه مشید حه یده ری ٥٣

چهند سه رنجیکی سه ره تایی ده رباره دروست

بوونی شاری سلیمانی  
هدلکه و ت حه کیم

پیشا نگای تا بلؤی کوردی

### بهشی کرمانجی ژووروو

ژ " هیقی " یئی ره نامه

بیرانینا توفیق و هبی  
به لگه

بیرانین ئیحسان نووری پاشا

زمان و ئەدەسپیات

چهند ئالیین ره وشا زمانی کوردی  
فەرھاد شاکەلی

کرمانچ د دهولستا دنیدا  
ثایا ب چ و هجهی مانه مه حرووم؟  
بیلچوبله زبو چ بوونه مه حکووم؟  
ئەحمدەدی خانى  
(سەددەی حەقەدەیسەم)

### نەورۆز ئەكەم

نەورۆز ئەكەم، نەورۆز ئەكەم،  
نەورۆزیکى بەسۆز ئەكەم،  
جەژنى گەلى پیرۆز ئەكەم،  
وەك كوردىكى دلسوز ئەكەم:  
ئاھەنگى نەورۆز تۆز ئەكەم،  
نەورۆز ئەكەم، نەورۆز ئەكەم!

نەورۆزى من بەھارىيە،  
زەردەخەندى رووي سروشى،  
لە دەشتى رەنگىن ديسارىيە،  
ھەر هيى من نا، جەژنى گشته:  
رۆزى ژىسانەوهى گەلە،  
ھىي گۇر و گىايە، هيى مەلە.

نەورۆز ئەكەم، نەورۆز ئەكەم،  
نەورۆزیکى بەسۆز ئەكەم،  
جەژنى گەلى پنيرۆز ئەكەم،  
وەك كوردىكى دلسوز ئەكەم:  
ئاھەنگى نەورۆز سۆز ئەكەم،  
نەورۆز ئەكەم، نەورۆز ئەكەم.

گۇران

ئەم گۇقا رە سالى دوو جار  
ئەنسىتىتووى كورد دەرى دەكىا.

# مۇا

كۈلەيکى رووناڭىزىيە گىشتىپ



ژمارە ۲ / مايسى ۱۹۸۴

# ENSTÎTUYA KURDÎ

Enstituya Kurdî malbendeke çandîya serbixwe ye. Di sebata 1983 bi destê ronakbîrînê kurdên ji her aliyên Kurdistanê, hatiye danîn. Amanca wê beşdarbûna şerê ji bo parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd e.

Civandina gencineyên çanda kurdî, çekirina ferheng û rezimanên kurdî, lêgerînên li ser edebiyat, pî şe û dîroka kurdî, çapkirina kovar û kitêbên kurdî, pékanîna kaset, sâlik û filmên kurdî şaxêن bingehîyên xebata wê ne. Karekî wê yî serekeyê din jî nasandina çanda kurdî bi gelên cihanê ye.

Enstitû dixwaze bibe cigehekî xebatê ji bo hemû zimanzan, nivîskar, dîrokñas, hinermend, pîşkar û ronakbîrêñ kurd û dostêñ gelê me.

Ew ji bo jiyan û pêşveçûna xwe, hewcê alikarî û tevkariya her Kurdê welatparêz e.

Hîmdarêñ Enstituya Kurdî:  
CEGERXWÎN, Ordîxanê CELÎL,  
Heciyê CINDÎ, Yilmaz GÜNEY,  
HEJAR, KENDAL, Qanatê KURDO,  
REMZÎ, Osman SEBRÎ, Ismet Şerif  
VANLÎ, Tewfiq WEHBÎ, Nûredîn  
ZAZA.

ئەنسىتىتووی كورد

ئەنسىتىتووی كورد مەلّبەندىكى كولتۇورىي سەربەخۆيە . لە ما نگى قىقىريي 1983 بە كۆشى چەندان رۇونا كېرى كوردى ھەموو بەشەكانى كوردىستا ن دامزرا . ئاما نجىي بەشدا ربوونە لە خەبات بۆ پاراستن و پەرەپىدا نى كولتۇورى گەللى كورد .

كۆكىردىنە وەي گەنجىنە كولتۇورى كورد ، نۇوسىنىن فەرەنگو رىيىزمانى كوردى ، لىكۆللىنە و دەربارەي ئەدەب و ھونەر و مىژۇوى كورد ، چاپكىردىنى گۆقا ر و كتىبى كوردى ، ئاما مادەكردىنى كاسىت و قەوان و فلمى كوردى ، ئەمانەن بىنچىنە چالاكييەكانى ئەنسىتىتوو .

ئەنسىتىتوو دەيەۋى بىيى بە جىڭايى كارىردن بۆ ھەموو زمانناس ، نۇوسەر ، مىژۇوناس ، ھونەرمەند و رۇونا كېرىيەكى كورد و دۆستى كورد . بۆ مانە وەي ئەنسىتىتوو و پەرە - سەندىنى ، پىيوىستى بە ھاوكارى و بەشدا ربوونى ھەموو كوردىكى نىشتمان پەروھر ھەيە .

# صبا

کوثریکه رووناکیه نگشته



ژماره ۲ / مایسی ۱۹۸۴